.

# ***Li ser wêjeya kurdî***

•

*Abdusamet Yîgît*

Weşanên SORAN

**Li ser wêjeya kurdî**
Weşanên SORAN e
.
Tabaxa 2018
Edîtor : Zeynel Abidîn Han
Berpirsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han
.
email: han-grafik@hotmail.de
https://www.facebook.com/kovaraxwenas
.
Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
.
ISBN 978-3-981668-67-1

**Li ser wêjeya kurdî**

Welatekî ku hê wilo zêde wêjeya wê ne hatibe nivîsandin, li ser sekinandin ji hinekî dile mirov bi dilperî dike. Kurdistan welatekî her weha ya. Ev dilperbûn, ku kurd bixwe jî li wê xwe dimeyîzênin di xwe de wê hîs dikin. Dema ku mirov li ser wêjeyê wê di hizirê mirov vê yekê her weha dibîne. Wêjeya kurdan, hê wilo zêde li ser ti lêkolînên mazin ne hatina kirin. Hê divêt ku ji gelek alîyan ve lêkolîn li ser bêtên kirin. Hê divêt ku ji gelek aliyan ve were têgihiştin û fahmkirin. Mirov, di wê wêjeyê de çawa bicih e, divêt ku ew were dîtin û ser ziman. Wêje di xwe de û di hebûne xwe de xwediyê nerîneke ku were têgihiştin a. Bi vê yekê û nêzîkatiyê, em nahaka li ser wêjeya kurdî bisekin in û bênine ser ziman. Bêguman, deme ku me biryar da ku emê li ser wêjeya kurdî bisekin in, me zanibû ku ev bêja bi serê xwe çend kûr û mazin a. Wê di vir de, ji hemû aliyên xwe ve wêjeya kurdî newê ser ziman. Lê wê tenê ji aliyê jinê ve were ser ziman. Jin jiyana. Deme ku jin jiyan bê hingî ji wê çaxê mirovm dema ku li ser jinê di wêjeyê de rawastihê, mirov hinekî ji li ser jiyanê weke ku wê rawastihê bibêt. Ev yek wilo ya. Wêjeya kurdî, ku mirov lê dimeyîzenê û li ser dihizrê mirov dibîne ku çend kur û mazin a bi dîroka xwe ye ku jîn kiriya. Bi vê yekê re tê berçavên mirov. Li kurdistanê, bixûsisî ji, di vê demê de li ser wêjeya kurd sekinandin ji, wateyeka wê ye rojane jî hebê. Ew ji her weha di têgihiştine hebûna mirov de xwe bi wate dike. Mirov, î ro, bêhtir hewceyî pê heya ku bitêgihiştin bêt. Î ro, kurdistan, bi nirx û hebûna xwe re demeke pir girîng de ya. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji pirr baş û qanc fahm bike. Li kurdistanê, wêja çiya? Ku mirov li ser vê pirsê bi teybet di rawastihê, mirov bi teybetî pêşketineke mazin dibinê. Bi vê yekê re emê hewl bidin ku çavekî li wê pêşketinê ji bidin. Ev yek ji, her weha girîng a, û pir jî girîng a, ku mirov li ser bisekinê û bêne ser ziman. Wêja dema ku mirov li ser dihizirê, mirov bi têgihiştin rastî hebûna têgihiştine felsefê bixwe jî têt. Têgihiştin bixwe, di hîmê pêşketin û derketine wêjeyê de jî ya. Divêt ku mirov vê yekê her weha di serî de bêne ser ziman. Çawa ku felsefe, dîrok û zanist di xwe de xwediyê nerîneke li jiyanê ne, her weha mirov karê ji bo wêjeyê jê bêne ser ziman. Ya rastî, mirov karê her weha jî bêne ser ziman û bêje ku hebûna jiyanê ya ku bi têgihiştin bûya bixwe jî ya. Bi vê yekê jî her weha mirov karê lê meyîzenê. Li kurdistanê, çend ku dîrokeke mazin û ku pir pêşketin têde hene û jînbûna heya ji, wilo zêde li ser wê ne hatiya sekinandin. Deme ku mirov bêje li ser ne hatina sekinandin, hingî ji, divêt ku mirov wê jî bêje ku gelek sedemên wê hena. Di serî de, ew metîngeriye li kurdistanê serwer sedema wê bixwe ya. Lê ku mirov li jiyanê û hebûnê meyîzenê, mirov sedemekî din ji dibîne. Ew ji her weha kurd bixwe na. Kurd, heta vê deme, çendî li ser çand û wêjeyê xwe rawastaha na? Ev jî pirseke ku ew ji li xwe bikin û bi dil û wijdan bersivne rast û dîrokî bidinê de. Ev yek, her weha pir girîng e, ku mirov bêne ser ziman û bitêgihiştin bisekinê.

Li kurdistanê, ku mirov bêje û bi pirsê û bêje ku ma wêja çiya, mirov her cara ku ev gotin weke pirsekê got û anî ser ziman, mirov karê bersiveke nû ji bidiyê de. Ji ber ku pir mazin pêşketneka mazin ye ku ew hê dest lê ne hatiya dayin û bi nivîsê heya. Bi vê yekê re, emê hewl bidin ku dest jî bidine wê. Lê em di serî de bêjin ku ev mijar pir kûr e. Mijaraka pir mazin û kûr a. Divêt ku mirov di serî de, vê yekê têbigihê. Di vir de, berî ku em di mijaraka xwe kûr û dûr bidest çûnê bikin, em vê ji her weha bêjin û bênine ser ziman. Ji bo ku wêjeya kurd û kurdistanê were ser ziman, divêt ku têgihiştina felsefê,

drokê û kevneşopîyên civakê û yên demên ber ku ew heya mirov jê hebe. Ev yek jî, her weha pir girîng a. Divêt ku mirov vê yekê bêne ser ziman. Lê deme ku me bahsa felsefe, dîrok û kevneşopîyan kir, divêt ku şaş jî newê fahmkirin û biteybetî ji kurdistantî, felsefe û dîroke wê û kevneşopîye wê bi dîroke wê yê demên wê yên berê re were têgihiştin. Ev yek, vê yekê her weha bi me dide têgihiştin ku divêt ku hêst û ramana kurdistanê baş û qanc were têgihiştin, Ji xwe, wêja jî, hinekî hêst bixwe jî nîn a, ma? Belê. hinekî jî hest bixwe ye. Lê heste ku hatiya jîn kirin bixwe ya. Ya ku hatiya jîn kirin bixwe ya. Dema ku mirov bitêgihiştin hinekî li demên berê yên ku jîn bûna dimeyîzenê, mirov jiyaneka ku di rêya xwe de hatiya jîn kirin dibîne. Ev dîtin, deme ku mirov bitêgihiştin lê dihizirê û dimeyîzenê ji, mirov têgihiştineke din ji di derbarê wê têgihiştine bixwe deji di serê de kifş dike. Ev ji her weha têgihiştine jiyanê ya û hebûne bûna wêja bixwe jî li ser wê ava ya. Ji ber vê yekê, hinekî bitêgihiştin û nirx û felsefe, divêt ku mirov li jiyana berê meyizenê. Jiyana berê, bi awayekî wêjeyî ku rast were ser ziman, hingî, mirov têghiştina wê bixwe bi teybet jî dibîne. Wêja, bi vê yekê, ku mirov bi nêzîkatiyaka felsefê lê meyîzenê, hinekî ji mirov karê vê ji her weha bêje, Wêja, têgihiştina têgihiştinê ji ya. Divêt ku bi vê yekê re, mirov her weha li ser bisekinê. Di rastiyê de, her weha mirov xwe gihanda wê têgihiştina wê têgihiştinê, hingî, mirov bi serê xwe de têgihiştinekê di berbarê felsefe wêjeyê bixwe de ji dike û têne ser ziman. Ji xwe, bi xwe, anîna ser ziman ye têgihiştina têgihiştinê, anîna hinekî felsefe wêjeyê bixwe ji ya. Divêt ku mirov vê yekê ji her weha di serî de kifş bike û bêne ser ziman. Her nirxek û an jî hebûneka ku di wêjeyê de cih girt, bi xwe re, dibê, nirxekê an jî nerînek jî. Her weha mirov karê bêje ku di wêjeyê de, her tişt, çend ku ji nerînekê ya wilqasî jî dibe temen û bingihe nerînne nû yên ku wê bibin. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku wêje di xwe de, hertimî bi vê yekê û bi xwandina xwe re ji, nûjeniyeke ku mirov têbigihê di xwe de diparezê. Ev yek jî, rastiya wêjeyê bixwe jî ya, ku mirov wê fahm bike. Wekî din jî, rastiya wê ya ku mirov wê fahmbike têne ber mirov. Her weha divêt ku mirov vê yekê fahm bike. Estetîk, têgîneka adilandinê ya. Hinekî nêzîkatiya felsefê jî di nav de levanîna. Hinekî dî jî ji wê zêdetir, spahîkirina xweşikbûnê bitêgihiştinê ya. Hebûne hest û têgihiştinê bi hev re lev anîna wan û bi hev re dîtina wan ji ku di nav de nirx û hebûne wê bi nêzîkatiyaka felsefîk bitêgihiştin li berçav girtina. Spahîkirin, her weha bi vê yekê re xweşikbûna têgihiştinê ya bi nêzîkatiya felsefe re. Spahîbûn, hem têgihiştine gotina adilandinê û hem ji ya xweşikbûnê bi hev re di xwe de dihawêne. Têgihiştine xweşikbûnê jî divêt ku mirov ji bîr neke ku di nav de ya. Hebûna spahîbûn û xweşikbûnê û têgihiştine wê, di jiyanê de, bitêgihiştine felsefê re di jiyanê de di ahengê wê de li berçav a. Cihe nerînê ji, di wê yekê de, bi hebûne têgihiştineke ku di serê mirov de adilîya pêve heya. Nerîn, têgihiştin, felsefe û adillandin, bi vê yekê re mirov karê bêje ku di nêzîkatiyaka ku bi hev re di ahengeke ku bi hev re li berçav a. Ew nerîne li berçav ye ku pir xweşik tê dîtin jî, xwediyê têgihiştineka ku mirov bi bêje wêjeyê re bêne ser ziman a jî. Bi hebûne wê re jî ya. Ji ber vê yekê re, êdî têkîliyek di naqabîna têgihiştina estetîkê û wêjeyê de tê berçavan. Ew adilandin jî, di jiyanê de ya. Jiyan jî, hebûn a. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku wêja hebûneka mirov ya jiyanî jî têne ser ziman.

Wêja û felsefe, felsefa û rastî, Rasti û xweşikatî di rêze xwe ya ku pê tê ser ziman de bi vê yekê wê, bi hebûn û gotina estetîkê di wêjeyê de cih û war digire. Bi vê yekê re her weha, êdî mirov karê bêje ku wêja, di xwe de biqasî ku xweşikbûnekê di hewêne

wilqasî ji bitêgihiştin û felsefa wê re nêzîkatiyaka xweşikkirin û afirandinê ji dihewêne. Her weha divêt ku mirov vê yekê bêne ser ziman. Divêt ku mirov vê yekê her weha kifş bike di serî de. Xweşikkirin an ji afirandin, karekî mazin e. Karekî ku jê re pir têgihiştin û mejî divêt e. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku wêja, bi serê xwe, weke cihanaka ku mirov têde jîn dike jî ya. Ew jiyan, bi her awayê ya. Nerîne jiyanê di wêjeyê dibe jiyan. Her weha wêja hebûna vê yekê bixwe jî ya. Bi vê têgihiştinê divêt ku mirov li dîroke wê bixwe jî meyîzenê. Çendî, têgihiştin bi weyna di pêşketin, hebûn û nêzîkatiya wêjeyî de? Ev jî her weha pirseke ku mirov li ser bisekinê û fahmbike ya. Divêt ku mirov li ser hebûna hizre wê bisekinê. Lê divêt ku mirov bi vê yekê re ku mirov hebûne jiyanê jî ji berçav dûr negirê, mirov karê bêje ku wêja rastiya têgihiştina jiyanê ya ku bûya jiyan bixwe jî ya. Ew rastî, bidîrok û hebûne. Mirov çawa karê xwe bigihêne dîroke wê jî? Ev jî pirseke wêjeyê bixwe ya ku bipersivêne ya. Her weha divêt ku mirov vê yekê bitêgihiştin bêne ser ziman û bêje. Kurd, î ro, ji her demî bêhtir pêdivîya wan bi wêjeyê û naskirina wêjeyê heya. Lê deme ku bahsa wê vê yekê tê kirin jî, bahsa vergerandina çend pirûkên wêjeyê li kurdî tê kirin. Ev yek, vê nêzîkatiyê nayêne ser ziman. Ya ku wê nêzîkatiyê wê bêne ser ziman jî, her weha têgihiştine xwe ya ku bixwe bi bixwe hatiya afirandin bixwe ya. Divêt ku vê yekê her weha were têgihiştin.Têgihiştin wêjeyê, têgihiştineke ku dîrokê û roja ku mirov têde jîn dibe digihihê hevdû û di demeke de bi mirov dide têgihiştin bixwe ya. Her weha ku mirov nêzîkatî lê kir, hingî, mirov wê rastiya wê pir baş û qanc fahmbike û bêne ser ziman. Rastî, di hebûne têgihiştine wêjeyê de pir mazin xwediyê rastteqiyeke mazin ye dîrokî ya. Ev rastiya dîrokî jî, bi xwe ji, bi dîroka. Ew dîrok jî, bi wêjeyê tê ser ziman. Bi wêjeyê ku hata ser ziman jî, bi wêjeya jînkirinê bi demê re dide kirin. Nêzîkatiya wêjeyî ye bi hizir, her weha di vir de, divêt ku mirov hinekî li ser bisekine û fahm bike. Ev yek pêdivî pir pê heya. Ev yek, wê bixwe re mirov bigihêne pir rastiyan. Wêja û felsefe wê, di temenê pêşketinên li jiyanê ku dibin hemûkan de cih û war digihê. Mirov ma karê têgihîna zanistê û qada wê ji vê yekê dûr bike û dûr bêne ser ziman? Ev jî pirseke dî ya ku mirov li bersive wê bigerihê ya. Divêt ku mirov pir li ser wê û hebûne wê bisekinê û bêne ser ziman. Ji ber ku wêja bi ancamaka têgihiştine bi têgihiştin û weke têgihiştine tê ser ziman, her weha bi felsefê re jî tê û pêşdikeve. Deme ku ew bi felsefê re bê jî, her weha mirov nikarê wê ji rastiya zanistê dûr bêne ser ziman. Wekî din jî, mirov karê weha bêjê, ku mirov nikarê zanistê ji rasti û pêşketine xwe dûr bêne ser ziman. Ya din wê, pêşketine ahlaqê bê ku wê, weyn bileyizê, di wêjeyê de bixwe ya. Ya ku wê di gelek qadan de digihêne rêk û pêkan jî wêja bixwe ya. Wêja, divêt ku mirov her weha hinekî bi nêzîkatiyaka felsefîkî a jîyanî jî wê bêne ser ziman.

Wêja, li kurdistanê, bi dîroke xwe ya kevn re heya. Li kurdistanê, mirov nikarê bêje ku pêşketin û têgihiştine wê nîn a. Lê divêt ku mirov wê jî li gor hebûn û teybetmendiyên wê kifş bike û bêne ser ziman. Hebûn û teybetmendiya wêjeya kurdî li kurdistanê çi ya? Ev Pirs, pirseka ku mirov pir li ser bisekinê ya. Ev pirs, pirseke ku mirov bi dîrokê re li ser bisekinê ya. Lê li Kurdistanê wêje, weke xamlekê xwe bi ser jiyanê re diberde û tê ser ziman a. Wêja, li kurdistanê, pêşî xwe di serî de û di dil de dide nivîsandin li kurdistanê. Civat û levcivinên ku dibin, cihê wê yê wêjeyî ku heya ya ku wê were ser ziman a. Li kurdistanê wêja, deme ku mirov lê dimeyîenê, mirov pir nirxên ku têde weke ku nirx û kevneşiopîya kurdan e, têne ser ziman. Deme ku mirov li wêjeya welatekî an jî xalkekî meyîzenê, mirov wê xoslet û teybetmediyên wê têde rast û

rast bibîne. Ji ber vê yekê, rastiya jiyana wê xalkê bi nirx û kevneşopîyên xwe re di wê wêjeya wê de tê ser ziman. Ji ber vê yekê, wêja pir barekî girîng didêne ser pişta xwe. Divêt ku mirov vê yekê her weha di serî de di vir de bi rûmet kifşbike û bêne ser ziman.

Di demên berê de wêja, ne tenê keleke ji dil têne ser ziman. Wêja, hebûneke ku jînbûyî ya dîrokî bi nêzîkati, hêst û felsefeyîya xwe re bi dîroke xwe re têne ser ziman. Her weha divêt ku mirov vê yekê pir mazin kifşbike û bêne ser ziman. Li kurdistanê, mirov divêt ku bêne ser ziman ku dîrokeka mazin ya ku jîn bûya heya. Ji ber vê yekê, zimanekî jiyanî yê ku pir mazin xwe di xwe de pêşxistiya heya. Ziman, bi wêjeyê bitêgihiştine mazin dibêt. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji, divir de mazin kifşbike. Zimanê kurdi, bi xoslet û teybetmedniyên xwe re zimanekî wêjeyî ya. Divêt ku mirov vê yekê, bi teybet kifşbike û bêne ser ziman. Ziman, çend ku karê bide afirandin, xwe diafirêne. Her weha mirov karê bêje ku wêja jî xwediyê xosletekî bi wî rengî ya. Kurdî, di jiyanê de mazin bicih bûya. Ev jî, bê ku xosletne weke xosletên wêjeyî pêre şîn nebin wê nebe. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku xosletên zimên yên wêjeyî her weha pir mazin bûna. Kurd, li jiyana xwe meyîzenên û serweriyeke wan ye li zimane wan hebe, wêke jiyanaka xwe ye kevn ye ku bi gotineke ku î ro tê ser ziman ye klasîk wê bênina ser ziman. Wêja, hertimî di anîna ser ziman û di afirandinê de, xwezabûnê ji mirov dixwezê. Xwezabûn, xosletekî afirandinê yê wêjeyê bixwe jî ya.

Bixweza ku mirov li jiyanê meyîzend, mirov wê çi bibîne? Mirov wê tişte ku bi berçavên mirov dikeve wê bibîne. Ew tiştên ku bi ber çavên mirov dikevin, di wê heyemê de, ew rewşa jiyanê û demê ya ku mirov lê dimeyîzenê, xosletên wê jî na. Her weha divêt ku mirov wê jî kifşbike. Her yek, ji aliyê xwe ve biwate ya di jiyanê de. Her yek, wateyeka wê ye ku bi dijî jî heya. Ti tişt di jiyanê de, ne bê wate ya. Wêja di serî de, vê yekê jî her weha kifşbike bi nêzîkatiyeka xwezayî. Xwezabûn, her weha divêt ku mirov bêne ser ziman, nêzîkatiyaka wêjeyî ya. Felsefa, xwe jî wê nêzîkatiyê di jiyanê de diafirêne. Bi wê felsefeyîya xwe re, di demên xwe yên pêşketinê de, awaye xwe yê pêşketinê di wêjeyê de jî diafirêne û bi hişmendîya mirov re wê têne ser ziman. Bi vê yekê, wêja û xwezatî, di qada jiyanê de bi hev re di têkiliyekê de na. Têkiliye mirov ya di jiyanê de bi dora mirov re, bi jînkirina xwe re, hebûne wêjeyê di xwe de diparezê. Mirov deme ku ew jîn dibê, mirov karê bi aqilê xwe re derkeve dervî xwe û li xwe û jînkirina xwe ya wê demê meyîzenê?. Wêja, ku mirov wê bike, pir afrîner dibê. Wêja, her weha, di xwezabûnê de tê ser ziman. An jî bi wateya ya xwe ya rast, bi xwe re têne ser ziman. Rastî, di wêjeyê de di jiyanê de de bihebûn a. Wêja rastiyê çawa têne ser ziman? Ev pirs, bi hizire wêjeyê, ku mirov lê meyîzenê, mirov bitêgihiştinekê digihê/digihînê rastiyê. Bi vê yekê her weha divêt ku li wêjeyê meyîzenê û bêne ser ziman. Berî ku em bi buhurine di dîroke kurdî de wêjeyê ye bênine ser ziman, em divêt ku çend gotinan li ser estetîkê re jî bi wê re bênina ser ziman.

Di sadsala 11´min de mirovên zanist yên weke Êlî Herîrî wateyaka wan ya pir mazin di vir de heya, ku mirov fahmbike û bêne ser ziman. Wan, mirov karê weke kifşkarne vê qadê jî bêne ser ziman. Êlî Herîrî, di aslê xwe de, bi zimanê xwe yê xweş re, bi me, estetîkeke zimên ku afirîya di demê de dide têgihiştin. Divêt ku mirov vê yekê her weha kifş bike û bêne ser ziman. Aliyê Êlî Herîrî yê zimên yê ku bi zimên re jî pir weke ku estetîke, mirov di wê qadê de bi xwe re bi têgihiştin dike. Bi vê yekê re, divêt ku mirov hinekî li ser wê bi sekinê. Wêja, di hebûn û pêşketinê xwe de, zimanê pêşketinê dixwezê/dihawênê. Divêt ku mirov vê yekê di vir de kifş bike. Zimanê kurdî, hê di

deme sumeriyan de, xwe gihandiya wê aste ku mirov jê re bêje bi hebûne têgihiştine êdî bi pêşdikeve û di buhurê deman.

Estetîzim û felsefe wê ya ku di wêjeya kurdi de, pir xurt û bitêgihiştina. Estetîk wê bixwe jî, bi lev a. Divêt ku mirov wê bi levbûna wê bi felsefeya wê ya ku heya re bêne ser ziman. Bi vê yekê re divêt ku mirov wê kifşbike û bêne ser ziman. Wêjeya kurdî xosletê wê yê herî li pêş di jiyanê de bi têgihiştinê re diafirine. Di civatan de çawa ku dihata ser ziman û ne dihata ji bîrkirin û piştre di civatên piştre de jî dihata ser ziman, her weha wê yekê bitêgihiştin dike. Zimanê têgihiştine, ku mirov wê bi wêjeyê re bêne ser ziman, xweşikatiyaka felsefîkî bi wêneyî bi gotinê diafirinê û têne ser ziman. Her weha divêt ku mirov vê yekê di serî de kifş bike. Felsefeya estetîkê jî wê, her weha li ser vê yekê bidest pêşketina xwe dike. Felsefeya estetîkê, di dîroka wêjeya kurdî de, mejuya diçê demên pir berê. Bi felsefeyê û wêjeyê bixwe jî yên ku anîna ser ziman ew, bi farqî an jî ne bi farqî anîna ser ziman. Lê Êlî Herîrî bi farqî anî ser ziman. Divêt ku mirov vê yekê bi êmin bêne ser ziman. Wê di gotina xweş de israr kir. Wî gotina xweş ji dil didît. Wî rastiyaka bi rastteqîni di wê gotina xweş de didît. Wî hebûnek di wê xweşikatiyê de dianî ser ziman. Wî wilo hizir dikir. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku wê zanistitiyeke felsefî ya ku mirov bi têgihiştin bi hebûna estetîkê re wê, bêne ser ziman anî ser ziman. Hebûna xweşik axiftinê û anîna ser ziman wê, ji awayê hizirkirin û afirandina meji ne dûr a. Awayê afirandinê jî ew, di zimên de jî hinekî biwate ya. Bi vê yekê re wê, têkiliya estetîkê û meji her weha di gotinê de tê ser ziman. Gotin çend xweşik hata ser ziman? Weke ku wê di vir de, li rastiyakê bê lêgerandin dihata ser ziman. Bi vê yekê re wê, bi hebûneka têgihiştî a de di jiyanê de bi wê bihizre û wê kur bibê. Vê yekê, mirov karê weke kurbûna wêjeyê jî di jiyanê de bêne ser ziman. Aliyê wêjeyî wilo ya.

Wêja, estetîzim û felsefe wê, hebûna xwe mazin tênina ser ziman di wêjeyê de. Wêja, rastiyaka civakî û kevneşopîya jî. Bi vê yekê re wê, hertimî wêja, nêzîkatiyaka rast û pak li xwe dixwezê ji mirov di jiyanê de. Wêja, bi nêzîkatiyak rast, bi qasî ku afrîner a, wilqasî ku mirov wê kifşneke û bêne ser ziman çekerîyeka jî. Wêja, ji ber awa di diyê de, ji ber vê yekê, bitêgihiştin nêzîkatiyê ji mirov dixwezê. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bitêgihiştineka kûr wê bêne ser ziman. Dema ku mirov wêjeya xalkekî din dixwêne, mirov dixwezê ku wî nasbike û fahmbike bi her aliyê wê ve. Li kurdistanê ku mirov li ser wêjê di sekinê, mirov, dîrokeke ku binivîsêne rastî wê têt. Lê ji gelek aliyan ve divêt were ser ziman. Di çerçoveya mijara me de emê, li ser cihê jinê di wêjeya kurdî de jî li ser wê bisekin in. Bi vê yekê re wê, di rastiyê de cihê jine di civaka kurd de jî wê cihê wê were ser ziman. Bi vê yekê re mirov, divêt ku wê li ser bisekinê. Lê ku mirov li ser wê kurdî bisekin ê, û ku mirov ji aliyê dîrokî ve wê hilde dest, hingî, divêt ku mirov herê demên berê jî. Divêt ku mirov bi sereke jî bê, li ser demên berê hinekî bisekinê û xoslet û awayê pêşketina wê demê jî bi hinek gotinna bêne ser ziman. Ev yek, her weha pêdivî pê heya. Ji demên berê ve wê, pêşketineka çawa li kurdistanê jîn kir? Ji demên Sumeriyan ve wê, navê kurdistanê bi navê kurdan dihata ser ziman. Ku dihata gotin kurd, navê welatê wan jî bi wê dihata ser ziman. Hinekî em li wan demeên berê meyîzenên bi vir ve girêdayî wê werênina li ser ziman.

.

**JI DEME SUMERIYAN HATA DEME HÛRÎ û MÎTANIYAN Û JI WIR JI HATA DEME GÛTî Û NAÎRIYAN WÊJE**

Ku miov bahsa wêjeyê li ber diclê û firate ye ku pêşketiya bike, divêt ku mirov hinekî di dîrokê de rêvaniyaka dûr û dûr bike. Ev yek pêdivî pê heya. Ji bo fahmkirin û têgihiştineê ev yek pêdivî pê heya. Li be rdiclê û firate, çi wêja û çand pêşket, ku mirov lê dimeyîzenê, mirov ji pêşketinên dîrokî yên wê fahm bike. Ji wan pêşketinên wê yên dîrokî mirov digihê hest û hizreke pir mazin ji. Her weha divêt ku mirov vê yekê pir mazin bi êmin bêne ser ziman. Ji deme sumeriyan ve, ku dem tê bi vir ve, êdî mirov dibîne ku wêjebûnaka mazin dibêt. Ew wêjebûn, bi têgihiştine ku diaifrê re dibêt. Jiyan pêş dikeve. Rêveberî pêşdikeve. Bi rêveberiyê re, rêvebirin pêş dikeve. Ev hemû ji hinek ancamên têgihiştine ku derdikeve holê ne. Her weha divêt ku mirov vê yekê pir mazin bi teybet bêne ser ziman. Li kurdistanê, ku mirov wêjeyê bêne ser ziman, divêt ku mirov li gor prensîba ku çand û felsefe çawa ku pêşket û têgihiştin di jiyanê de çêkir û pêde, ku bi pêşketine civakbûnê re civaknasî xwe bitêgihiştin kir û di derbarê de pêşketin bû û bi vê yekê re ji, ziman êdî li gor wê û demê wê pêşket û awa stand, mirov jê dûr nyêne ser ziman. Her weha ev yek pir girîng e. Wêje, li jiyanê, bi nivîsandina hizran re diafirê. Lê li Kurdistanê, hinekî xosletên wêje hene ku mirov wan hem bi serê xwe û û hem bi teybet bêne ser ziman in. Ew ji her weha xoslet û teybetmendiyên devkî û bidevkî bi helbetkî ne. Ev xoslet, zimên ji biawa dike. Bi wê re ji, têgiiştinekê têne ser ziman û di jiyanê de serwer dike. Lê di wê pêşketinê de, mirov nikarê "pîroziyê" ji berçav dûr bike. Wê ji kiriya ku di wê qadê de pêşketin bibin. Berî hertiştî kirîya ku li berçav bê girtin. Bi vê yekê, mirov divêt ku mirov bêne ser ziman. Pîrozî, di têgihkirin û pêşketine têgihiştinê û felsefê wê de bingihek mazin diafirêne bi xwe re. Ew bingih, her weha dike ku di jiyanê pêşketin bibe û di anîna ser ziman û nivîsandin pêşketin derkeve hole. Bi vê yekê re pêşketin mazin dibin. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku têgihiştin derdikeve hole. Têgihiştine wêjeyê, bi pêşketine têgihiştine bi mirov re ya. Her weha bi wê re dibêt. Çend ku mirov kifş dike û têne ser ziman, têgihiştinekê jî bi xwe çêdike. Ev xal, weke prensîbekê xwe dide berçavan. Lê ku mirov li awayê pêşketinê yê ku hatiya hata roje me, mirov lê dimeyîzenê, mirov di du xatan de pêşketinê mirov li berçav dibîne. Mirov aliyekê pêşketinê bi derketin û pêşketine olê re dibîne û aliyekekî din ji bi jiyana leheng û gernasan re dibîne. Herdû awa ji, di jiyanê de bi têgihiştin hene. Lê ku mirov wêje ji têgihiştine dûr nyêne ser ziman, divêt ku mirov êdî bi nêzîkatiyaka olê ji jê ne dûr bi sîrovekirinê bêne ser ziman. Di wêjeya kurdî de wê, bi destanên weke destana Gilgamêş, Rûstemê Zal û hwd, yên ku demên wan wilo zêde ne kifş in, xwediyê cihekî pir mazin û kifşkar in. Bi wan re mirov divêt ku mirov ji bîr neke û bahsa destanên weke ya Şahmaran û hwd jî bike. Ev hersê destan ji destanna ku mirov pir li ser wan sekinê ne. Li herême botan û dore wê, ku bahsa Şahmaran dihata kirin û ew dihata ser ziman, pir bi nirx û kevneşopî dihata ser ziman. Di civatan de, weke nirxekê dihata ser ziman, û ji gotinan dihata gotin ku temamê vegotine wê, heft şev û heft rojan bi dawi ne dibû. Her weha pir dirêj û mazin bû. Deme ku dihata gotin ji, bi dû awayan dihata gotin Awayek, weke ku mirovek helbestekê ji dil bixwêne wilo xweş û bi dilperî dihata gotin. Awayê din ji bi vegotin ku mirovên ku dengên wan wan xweş bû, bi wê dengê xwe yê xweş digotin û di gotinê de didana ber hevdû. Her weha wilo xweş û bilez û têj digotin. Bi wê re ji, mirov divêt ku vê ji her weha bêne ser ziman û bêje ku deme ku dihata gotin, yên ku digotin, ne tenê didana berhevdû di deme wê vegotinê de. Ew

vegotina wan, bi awayekî ku yekî gotina xwe, ku diwastaha bidawî dikir û yên din yên ku amee bû, di cih de mafê vegotinê dihilda dest û bidest vegotinê dikir. Bi wê awayê, her weha vegotin dirêj dihata vegotin. Heman awayê vegotinê ji bo destana rûstemê zal hebû. Destana rûstemê zal, ne tenê bi vegotineke ji rêzê bû. Her weha cih bi cih gotinên şîretî ji têde dihatina vegotin û li ser dihata axiftin ji di deme vegotinê de di civatê de.
Bi vê yekê re, her weha mazin dihata vegotin. Di civatên kurdan de, awayekî vegotinê yê ji bo destan û vegotinên weha hebû. Ew awa, di her civatê de, dihata bicih. Li ber mîr û key, deme ku dihata ser ziman, jê re xweşkirin ji, weke nirxekê dihata dîtin û pejirandin. Bi vê yekê, her weha êdî mazin anîna ser ziman dibû. Levanîna gotinê û li dûv hevdû vegotin jî ji nirxê dihata vegotin. Kî zimanê wan xweş bû, wî di serî de mafê axiftinê dihilda û diaxift. Yên ku têgihiştine hebû, diaxiftin. Weke ku di nav xalkê de dihata gotin ´kî bizanebûn bana, wî pêşî li ber mîr û key xaber dida´. Zimanxweşî, divêt ku mirov li ser bisekinê. Zimanxweşî, ji nirxeke civakî dihata hasibandin. Wekî din jî ji zanebûnekê dihata dîtin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje, xweşvegotin û anîna ser ziman, dihişt ku gotin û tişte ku hata ser ziman mayînda bibe. Her weha weyneke xweşgoinê ji hebû. Bi vê yekê, wêjeyeke devkî pir mazin û bi nirx derdive pêş. Ku mirov bahsa dengbêjiyê ku kurdan di nav xwe de hata î ro ji, hê ji, parastiya û weke nirxeke civakî ya, mirov bêne ser ziman, mirov wê bibîne ku ew awayê pêşketinê çend mazin hebû. Dengbêjî, ku îro ne li gorî wan xosletên xwe yên demên berê mabê ji, lê dise mirov karê bêje ku bi hebûne xwe re hata îro hinek nirxên ku têde dihatina ser ziman ji, parastiya. Dengbêj, yên ku karibûn, destanên xalkê zimanekî helbestî ji serî hata binî bênavber bênina ser ziman bûn. Jê re, xêveke xurt divîya. Têgihiştineke mazin pêre hebû. Mîr û keyan, ji ber ku ew mirov her weha bi têgihiştin û felsefe bûn, hertimî her mîrekî dixwest ku dengbêjekî an jî du dengbêjan di civata xwe de bihişta. Mîr, bê dengbêj, li civata xwe ne dirûnişt. Çawa ku deme ku civata qasên wan li dar diketin û herkesek li wan dicivî, bi wê civandinê re, şêx û seyda ji li wir amede dibûn û ji zanebûna xwe diaxiftin, her weha dengbêj ji dibûn û ji hiskirin û zanebûnên xwe divegotin. Destan û jiyangerîyên miroveên mazin yên ku zanibûn, ji civatê re, bi zimanekî pir xwe dianîn ser ziman. Li her civatên mîran, bi qasî ku mêran karibû ku lê rûnişta û bigotina, bi heman awayê jinan ji karibû ku ku lê rûnişta û bigotina.

Cihê jinê di jiyanê de pir mazin li pêş bû. Hata wê demê jî mirov karê bêje ku pir li pêş bû. Di civakê de, gelek pêşketinên ku dibûn di afirin ji, jinê, weyna wê têde pir mazin bû. Di heyamên berê de, di şer û pevçûnên ku bûna, di gelekan de di bi dawibûna wan de jin xwedi weynbûn. Deme ku jin di deme li berhevdû sekinandinê, çûbana û hamawîya xwe avêtibana naqabîna wan de, êdî şer û pevçûn di sekinî. Ev yek, weke xalaka sereke ye ku herî bênîqaş jê re rêz û pêk digirt bû. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku çandak û kevnşopîyeke ku pîrozî ji têde hebû afirî bû. Di jiyana kurdî de weke xalên jinê, ziman, mîr, civat û hwd xalên ku li pêş yên ku çand û wêjeya kurdî pêşketine wê didana kifşkirin bûn. Bi vê yekê re, bi çend xalan ji bê em divêt ku van xalan bigotin bênine ser ziman.

1.jin, Xala pêş emê jinê hildine dest û emê bênine ser ziman. Deme ku mirov bahsa jinê bike di nav kurdan de, mirov bahsa tiştekî pir mazin dike. Mirov di serî de bahsa nirxeke pir mazin dike. Jin, di jiyanê de di rêvebirine jiyanê de ye herî kifşkar a. Ji wê pêde, di jiyanê de pêre pîroziyak ji her weha dihata ser ziman. Deme ku bahsa wê dihata kirin, bahsa çandakê jî dihata kirin. Ji ber ku wê di jiyanê de bi hebûn û girêdana xwe re

xamlek diafirand. Cil û bergên wê ji, bahsa wê dihata kirin. Bi teybetî ji, ku pîr dibû, êdî gotinaka bi nirx jê dihata hisandin. Gotina wê bi nirx dihata dîtin. Li gotina wê dihata hisandin. Piştî temenekî xwe re, êdî wê karibû li nav civatan rûnihê û aqil bide yên ku lê dihisandin. Bi gotina xwe re wê karibû ku şîretan li wan bike û rê şanî wan bide. Lê dihata hisandin. Pir mazin jî lê dihata hisandin. Bi vî awayî, wê jiyanak dida kifşkirin. Lê wekî din ji, wê di jiyanê de bi kirin û hebûne xwe re jiyanak jî dida kifşkirin. Ku civat lev dirûnişt ji bo hinek berberîyne û an jî ji bo hinek levanînne, ew ji têde amede dibû. Wê jî, gotin dianî ser ziman. Deme ku di deme levrûniştinê de di civatê de nexweşiyek derketana, wê karibû ku pêşiye wê bigirê. Ew hêz û rêze wê hebû. Ahmedê xanê, vala di wê nexweşiya di naqabîna Mem û Mîr de jin dernexistiya pêş. Dema ku mem û mîr têne li her hevdû dirabin û têne berhevdû, hingî, pîrka Zîne tê û hamawîya diavêje naqabîna wan de û ew jî di sekin in. Li wir, êdî ti pevçûn û nexweşî rûnadin. Xweşbûnak çêdibe. Piştre, mîr men diavêjê zindanê ku bisalan têde dimêne. Lê ew rewş ji, êdî bi awayekî di dihata ser ziman. Ew jî bi gotina mîr dihata ser ziman. Mîr ku gotina xwe jî divê xwe got, êdî ti kesek jî li ber wê gotina wê ne di sekinî. Ku xalat jî ji devê wî derketibana, êdî wî gotina xwe gotibû û wê bicih bihatana.Her weha mirov karê wê bêne ser ziman.

Jin, weke ku Ahmedê Xanê bi hebûna Zînê re anî ser ziman di demeke xwe ye pêşketi de bû. Hebûn Zîne bi awayê ku Ahmade Xanê anîya ser ziman, li pêşiya deme xwe bû. Wê weke ku deme xwe ye pêş hizirkirie û anîbe ser ziman. Her weha tê berçavên mirov. Zinê, jinaka bi kevneşopî û bi nirx e. Lê di xwe de di şaxsiyate wê de weke ku Ahmadê xanê anîya ser ziman, pêşketine mazin li pêşiye deme xwe jîn dike. Ew awayê şaxsiyatê yê ku Ahmadê Xanê anîya ser ziman, yê ku divêt ku were têgihiştin e. Ew awa, bi felsefe û nirxê xwe re divêt ku were têgihiştin. Mem ji, her weha mirov karê ji bo wî bêne ser ziman. Di hebûna mem de, Ahmadê xanê nêzîkatiyaka civakî li jinê dike. Ev yek, xala serî ya ku mirov wê kifş bike ya. Divêt ku mirov wê kifş bike. Deme ku mirov şaxsiyat Mem hilde dest û weke ku têne bi evinekê î ro tê ser ziman, dûr tenê bi têgihiştine Ahmadê xanê hildê dest û bêne ser ziman, mirov wê bibîne ku çawa ku Ahmadê xanê li şaxsiyataka bi felsefîk hiziriya. Mirov wê yê her weha pir baş û qanc dbîne. Mem, ji şaxsiyatê zêdetir, bi Ahmadê Xanê re, weke ku tê ser ziman hizreke mazin ye pêşketî ya. Ew hizir, mirov li ser dihizrê, mirov di serî de, têgihiştineke demê ya ku heya dibîne. Mem, mirovekî bizane ya. Yekî ku evîn e. yekî bi evîn û zanebûna xwe ve girêdayî ya. Berî hertiştî, weke ku Ahmadê xanê anîya ser ziman û xwestiya ku bide têgihiştin, yekî rast û bi rastiyê ve girêdayê ya. Berî hertiştî Mem yekî bi rastiya xwe ve girêdayî ya.Zînê ji, her weha yekê ku bi rastiya xwe ve girêdayî ya. Ahmadê xanê, ku mirov li wê demê û nirx û kevneşopîyên wê demê ji dihizirê, mirov dibîne ku hinekî derketiya ser wan ji. Li ser wan ji anîya ser ziman. Mirov vê yekê her weha pêre pir mazin bi nirx dibîne. Di anîna wî ya li ser ziman de ji ev yek xwe dide der. Lê di vir de, berî ku em ji vê xalê bi buhrin, emê gotinaka din ji bi mem û Zînê ve girêdayê bi Ahmadê xanê re bênine ser ziman. Ew ji her weha deme ku me anî ser ziman, emê, bi vegotina mem û zinê re, Aqîda wî ya Îmanê ji li berçav bigirin û bêjin. Bi hizrên ku Ahmadê Xanê di vegotina Mem û Zînê de têne ser ziman re, felsefeyeke têgihiştinê ku li gor roje me bêkêmesîya têne ser ziman. Bi nêzîkatiya aqîda îmanê re, mirov di vegotina Mem û Zînê ye Ahmadê xanê de aliyekî wî yê din ji kifş dike. Ew ali ji, her weha aliyê wî yê zanistîtiyê ya. Wî têgihiştineke mazin ye ku mirov bi felsefeyeke hemdem re

bênine ser ziman û di cewherê wê de têgihiştine lêgerîne rastteqîniye heya, mirov kofş dike.. Di vegotina Mem û Zîne de, Ahmadê xanê bi dinyewîtiyê ve bi sînor ne mêne. Her weha hinekî Afsûnkariyê ji tevlî dike. Ev nêzîkatî mirov divêt ku bi nêzîkatiyaka hizrî nêzîkatiyê lê bike û fahm bike. Wê hingî rast bê fahm bike. Di nav xalkê de her weha ji tê vegotin:

"Mem ji kure mirovekî ku ji malmîran bû. Ew ji bavê wî xwedi qasr bû. Zîn ji keça mîrê bota bû. Lê rojeke hersê keçên mîrê cinan dixwzin ku tiştekî bikin û tişte ku bi hev re dikin ji, her weha diçina cem Zîn û Gûstîlka xewê dikine destê wê de û ew êdî di xewê ve diçê. Piştre ew ji, dirajihina Zîne û tênine mezele Mem ku ji ye Zîne ne cudatira. Deme ku ew Zîne tênine wir, hingî, ne Mem û ne ji ti kesekî din wan nabînê. Li wir li mezele Mem Zîne dirabê ser xwe û deme ku dirabê ser xwe ji, dimeyîzenê ku wa zilemek wê li cem wê ya. Li wir pir dimêne şaş û mat. Di cih de bi dengekî bilind, jê di pirsê ku ka ew kî ya. Ew ji, jêre dibêje k ew Mem e û ew li mezele xwe ya. Lê Zînê jê bawer neke û dibêje ti hati mezele mîn. Hingî. Mem ji dibêje ku ´ev mezele mezele min e´ û piştre dimêne sekinî. Lê Mem ji û zîne ji herdû ji, dû mirovne ku pir biaqil bûn. Piştre Mem ji Zîne re dibêje ´ka em herdû emê gazî berdergvanên xwe bikin, ka yê kê hat, ev mezel ya wî ya´. Zîne dibêje bila û piştre Mem rê dide Zînê û Zîne gazî berdergvanê xwe dike, lê ti kesek nayê di wê demê de. Piştre, Zînê hinekî weke ku hers ji bûya dimêne sekinî û cihê bakirinê ji Mem re dihêle. Deme ku Mem di cara pêşî de deng dide, yê ku li ber derîya berdergvan deve derî diveke û dikeve hundur de. Piştre Zîne bawer dike ku ew mezel ya wî ya, lê ew çawa hatiya wir, ew ji wê nizanê. Mem ji weke ku di dixewê de ne. Piştre herdû bi hev re diaxivin û di dawiya axiftina xwe de gûstîlkên xwe dikine telîyên hevdû de. Di wê heyemê de hersê keçkên mîrê cinan ji, caraka din gultilka xewê dikin telîye wan de û Zîne ji wir tênine mezele wê û mem ji bi tenê dimêne. Piştre ku dibe sibeh, êdî herdû ji xewê dirabin. Herdû, mesele ji dê û bavên xwe re tênine ser ziman. Lê ti keseki wilo zêde ji wan bawer neke. Lê di telîye Mem de gûstilke Zînê û di telîye Zînê de ji ye Mem heya. Ew yek, weke nşanayaka wê ykê ya ji wan re. Piştre Mem dike serê xwe de ku herê û wê keçikê bibîne. Piştre rê digirê û tê navende Cizîre bota. Li wir, hingî, şahiya newrozê heya. herkesek ji bo newrozê li hevdû civiya ya. Deme ku Mem tê nava koma ku newrozê pîroz dike, hingî, Zînê bi Sîtê re di cih de li ber wî re weke bayekî tê û di buhurê. Hingî, çavên wî bi wê dikeve û çavên wê ji bi wî dikeve. Her weha êdî hevdû dibînin".Her weha tê vegotin û hê hinekî din ji dirêj tê ve gotin. Êdî piştre rewşa wan tê ser wan û êdî bahsa serpêhatiyên wan tê kirin.

Zînê û Mem, herdû ji, şaxsiyat û hebûne wan divêt ku baş û qanc were têgoihiştin. Ji aliyê hizrî ve û ji aliyê pêşketine wan ve divêt ku werine ser ziman. Bi vê yekê, êdî wê rastiya wan baş û qanc wre têgihiştin. Bi vê yekê êdî wê ew baş û qanc were têgihiştin. Hingî, wê were têgihiştin ku ka Ahmadê xanê ji aliyê hizrî û felsefê xwestiyê çi bêne ser ziman. Ev yek her weha pir girîng e ku mirov li ser bisekinê. Şaxsiyate Mem ji û ye Zînê ji cuda bi cuda di çand û wêje kurdî xwediyê hebûneke bi nirx in. Ji aliyê wêje ve, ku mirov lê di meyîzenê, mirov dibîne ku pêşketineke mazin ye dîrokî ya. Ahmadê xanê wilo xweşik û di ahengekê de ew anîna ser ziman, ku mirov li ser û şaxsiyat wan di hizirê, mirov bandûr dibe. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybetî bêne ser ziman. Wê jiyan û rastî, mirov û hizir bi hev re hizir kiriya û nivîsandiya. Ahmadê xanê bi Nivîsandina Şaxsiyat Mem û Zînê re di wêje kurdî demeke nû temenê wê diafirêne. Her

weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Li ser Mem û Zînê û Ahmadê Xanê û felsefê hê gelek aliyê wî yên ku werine ser ziman hene. Emê hinekî di berdewamîya nivîsa xwe çav bidine wan aliyan ji. Lê di vir de, ji bo ku aliyê wêj kurd û jine bi hev re hinekî pir baş were têgihiştin, emê bahsa Şahmaran ji bikin.
Şahmaran, vegotina wê, ji aliyê çandî û kevneşopîyê ve di deman de ji herkesek di farqê wê de ya. Ji aliyê nirxbûn û hebûne nirxbûnê ve pir mazin têgihiştinek di derbarê wê de heya. Şahmaran, Nirxeke pîroz ye çanda kurdî ya. Divêt ku mirov vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Bi hizir û nirxkirina hizir re, şahmaran kevneşopîyeke civakî ya. Ji aliyê pêşketin û têgihiştine wê ve ji, vegotina Şahmaran, ye deme civakatiyê ya. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku civaka kurdî astaka xwe di wê de bi têgihiştina xwe anîya ser ziman. Vêgotina Şahmaran, bi hev ve hemû ku tê ser ziman, weke ku di nav xalkê de ji tê ser ziman, heft şev û heft rojan dihata vegotin lê ne dihata xilaskirin. Li ser şahmaran, keçikan naqş çêkirin û ew têde naqş dikirin. Şahmaran, weke ku tê zanîn nêvî jineke ku pir xweşik û nêvî ji mar e. Lê rojhilatê kurdistanê, hinek wêne bi naqş ku hatina çêkirin têde, aliyê ku jina, mêr ji hatiya afirandin.Lê axlabe ji jin têde derketiya pêş. Ji ber ku di deme meyîzendinê û afirandinê de, hertimî weke ku li xweşikbûnekê lêgerîn hatiya kirin. Wê xwe têde daya der. Deme ku mirov lê dimeyîzêne mirov vê yekê pir baş û qanc dibîne. Şahmaran, têde zanêbûn, xweşikbûn, bawerî, xiyenet weke hinek mijarna sereke derdikevine pêş. Têde, weke hiskirin ji heya. Wêne şahmaran, di qasran de dihata girtin. Pir qadr û qiymet jê re dihata dayîn. Weke dageriya mazinbûn û asîltiyê dihata dîtin. Her weha pir wateyên wê hene. Di malên kurdan de wêne Şahmaran ji vegotinê dihata naqşkirin û bi malan dihata dalaqandin. Ew dalaqadin, ne tenê ji bo xweşikkirinaka malê dihata kirin. Wekî din ji, bi wê yekê û kirinê re, nirxek ji dihata ser ziman. Baweriyak ji dihata ser ziman. Li Şahmaran baweriyak ji hebû. Di rastiyê de, weke ku di civatan de dihata vegotin, xweşikbûn û rasti di baweri û hebûna şahmaran de lev digaha hevdû. Ku mirov li wêne Şahmaran dimeyîzenên bandûraka wê li ser mirov çêdibe. Deme ku wêne wê dihata çêkirin, bi teybetî ji bal dihata kişandin li serçavên wê. Pir bi bal çavên wê têne çêkirin.Ev yek ji, her weha sedemeke wê heya. Ew sedem ji, her weha, ji baweriye lê dihat. Şahmaran, her çend ku nêvî mar û nêvî jina ji, di vegotina wê ya di nav xalkê de tê ser ziman, şaxsiyatak pir biaheng û bêqusur hatiya afirandin. Weke şaxsiyataka mînaq e. Bi wê şaxsiyate wê ve girêdayê ew xosletên wê yên ku hertimî dixwezê alikariyê bide mirovan ji derdikeve pêş di vegotinê de. Şahmaran, her çend ku vegotin ji bê, wilo xwşik tê vegotin, ji wê xweşik vegotinê ew wêne wê ye ku tê naqşkirin tê afirandin. Ew wêne, di aslê xwe de nîgaraka wêje kurdî ya zîndî ya ji.

Bi hebûne jinê re wêne Şahmaran û e Zînê, ji gelek aliyan ve weke felsefe bûna wêne şaxsiyat jina kurd. Berê ji, wilo hatiya dîtin. Keçkên kurd, yên ku hê ji nû ve balix dibûn ku dihatina deme zawacê, ku cehîzên xwe diafirandin, ne mumkun bû ku naqşaka şahmaran têde ne bana. Wan, her weha weke barekî ku li ser milê wan bê, ew wêne çêdikirin û di hildan û di birin bi xwe re mala û deme xwe.Zînê ji û Şahmran ji, ku çend şaxsiyat ne jev cuda ji hatibin ser ziman, lê dise di hebûnekê de her weha hevdû temem dikin. Divêt ku mirov vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Di wêje kurdan de, şahmaran, Zîne Ahmadê xanê û Dilberê Feqiyê teyran, hersê ji pir mazin bi bandûr in. Hersêk ji, ne tenê weke hinek vegotin an ji hinek afirandin in. Hersêk di jiyanê de ne. Hersêk ji, bizanebûn, nirx, kevneşopî, evîn, bawerî û felsefe ne. Her weha divêt ku

mirov pir mazin bi teybet bêne ser ziman. Feqiyê teyran, deme ku mirov bahsa Dilberê ku ew bahsa wê dike û di derbarê wê de anîya ser ziman tê kirin, weke ku bahsa felsefeyekê civakê ye bi nirx bê kirin bahs tê kirin. Her weha pir mazin bahs tê kirin. Bi Dilberê re rastî, hevaltî, zanebûn, kevneşopîyeke bi têgihiştin, evin û evîndarî, êşa ji dil û ye dil û hwd hevdû dihûnin bi hev re. Lê di vir de, divêt ku em her weha vê ji bi girîngî bênine ser ziman. Hersê şaxsiyat ji her yekê di demekê de jîn bûna û her yekê dervî van xoslet û hebûnên wan bi hinek xosletên sereke re têne ser ziman û berçavên mirov. Deme ku mirov li ser Şahmaran di hizirê, zanebûn tê bîr û berçavên mirov. Deme ku mirov li Dilberê di hizirê bi serpêhatiya wê, êş tê bîr û berçavên mirov. Bi Zînê re ji, evîn tê bîr û berçavên mirov. Lê bi hersêkan re ji, jidilbûn, bawerî, têgihiştin, safîbûn, hijkirin, nirxbûn, mazinbûn û êşî û hwd heya. Weke xalaka ku bi hersêkan re ji derdikeve berçav ji baxt û bêbaxtiya.

Li vir, hinekî dî ji bi çend gotinan ji bê, divêt ku em hinekî li ser Dîlbere Feqiyê Teyran bênine ser ziman. Dîlberê xwediyê şaxsiyateka çawa û bi çi rengî bû? Ev ji pirseke kuu mirov di vir de bi çend gotinan ji bê bi bersiv bike ya. Dîlberê, Keça mîrekî kurd bû. Li herême botanê wanderan bû. Li mala xwe bidilê xwe mazin bû. Heval û hogirên wê, hertim li cem wê bûn û ew ji bi wan rebû. Bidile xwe mazin bû. Hertimî ji, di nav xalkê de bû. Ku wê dîtibana alikariya ji yekê diviya, wê ku ev yek di wê heyemê de di cih de dîtibana, êdî wê di cih de xwe digihanda wan û alikariya ku jê hatibana ku biçi awayê bana dide wan. Her weha bi vê yekê ji, di nav xalkê de li dore tê naskirin û navê wê ji derdikeve. Di malbata wê de ji, dubendiyek berî hingî bûya û naqabîna bavê û emê wê xirabûya. Emê wê ji li cihê ku ew lê bicihbûn, ji wir dicê û hinekî ji wan wirde li mergekê cihê xwe çêdike û li wir mala û dore xwe mazin dike. Piştî vê yekê re, êdî Dîlberê ji mazin dibê û kurê emê wê Dilşad ji mazin dibe. Piştre, ew ji, di şahiyeka Newrozê de hevdû dibînin û dil didine hevdû. Dilberê û kuremê xwe, hij hevdû dikin. Lê piştî ku hij hevdû dikin, êdî fêr dibin ku emê wê û bavê ne lev in û heya ku li ber wan ji sekinî ban. Dilşad ji di wê qanaate de ya. Piştre herdûk ji di nav xwe de digihine biryarekê ku ew werin û bigihine hevdû. Piştî ku ew gihiştine hevdû, êdî wê malbatên wan ji wê li ber wê gihiştine wan ye li hevdû ne sekin in. Ew ji, di serê xwe de wilo hizir dikin. Mirovên ku piştî bûyaran wan re li ser wan diaxiftin ji, digotin ku hebû ku bavê wan li ber wê gihiştine wan ye hevdû ne sekinî bana. Ji xwe, ew ji ahlê hevdû bûn. Lê Dilberê û Dilşad, biryara xwe didin ku herin û weke demekê xwe li mîrekî din bigirin. Li wir bizewicin û piştre ku dê û bavên wan ji pê hisahan êdî ku ew ji hatina cem wan, êdî bi hev re veherihine malên xwe û li wir êdî bidil û şahî bi hev re jîn bibin. Xiyele Dilşad û Dilberê evnakê ya. Lê bi alikariyê hinek hevalên Dilşad cih ku wê xwe gihandibanê de xwe digihênine de. Lê mirovê ku wê çûban cem wî, ew çûya ser dilovaniya xwe û kurê wî ku jê re dibêjin ku navê wî Raşît beg e, di rûnihê di wê heyemê de. Dilberê û Dilşad, diçin û lê malê di bibine mêhvan û piştre pirsgirêka xwe ji Raşît beg re tênine ser ziman. Lê di wê heyemê de tiştekî dî ku hîç cihê wê di kevneşopîyê de nîn e, dibêt. Ew ji her weha çav berdana Dilberê ye Reşît beg e. Hingî Dilberê xweşike, çavên herkesekê li ser wê ne. Raşît beg ji dixwezî ku bibe xwediyê wê xweşikatiyê. Piştre, Raşît beg, ku dibe evar, êdî dikeve mezele ku Dilşad têde dirazihê û êrîşî wî dike û wî dikujê. Dilberê ji, di wê heyemê de berî ku Raşît beg bigihê wê, ew difilitê û bazdide û xwe li çiyayê Reş digiherê. Demeke dirêj li wir dimêne. Hata ku rojekê Feqiyê teyran jê re dibe nesib û di wir ve diçê û li wir rastî wê têt. Êdî ji wir

pêde, wê jiyanê wê, hatiya dawiya xwe, wê biêş ku Feqiyê teyran ji jê re şahidiyê dike dibuhurê. Bandûra wê û jiyanê, pir mazin li ser Feqiyê teyran dibêt. Feqiyê teyran, wê pîroz dike û bi navê wê ji xaynî anînêyên xwe yên li ser zimên qasîdeyan ji diafirêne û dibêje. Bi vê yekê, êdî bi gotina feqiyê teyran mayindabûnak dibêt. Biqasî ku tê gotin, Feqiyê teyran, di dawiyê jiyane xwe de, her weha gotinaka ku hîç ji aqilan dernekeve ji di derbarê Dilberê bi ser waqas vegotin û nivîsên xwe dike. Ew ji her weha tê gotin, "wê dilê wê yê qanc û pak, bi xalate wê, şahiyaka bi pîroz a". Ji devê zanistê mazin Feqiyê teyran, li ser Dilberê di nav xalkê de hê gelek vegotin û gotinê bi vî rengî yên ku têne gotin û vegotin ku jev cuda ne ji hene. Lê deme ku mirov li wan vegotin û gotinan ji dihisêne, mirov xalaka hevbeş di hemûyan de dibîne. Ew ji her weha êş û kula ku piştre bi Dilberê re çê bûya û wê şaxsiyata wê ya ku bêqusur bû. Dilberê, di nav xalkê de heta ku tê deme ciwaniya xwe, biqancî û zanebûna xwe derdikeve pêş. Ew keçak bû lê wê ji weke gelek hevalên xwe li cem seyda bisalan xwandibû û wê xwe bizanebûn kiribû. Bi vê yekê, bi zanebûn û qancîya xwe ye ji dil di nav xalkê de deng dabû û derketibû pêş. Hijkirinaka mazin ji yên ku ew nas dikirin jê re hebû.

Şaxiyata Dilberê, şaxsiyata pir pêşketibû. Bi qasî ku mirov jê fahm dike, pir mirovaka zanebû. Wekî din ji, weke ku tê ser ziman, pir mazin, mirovaka dil tenik bû. Bi wê dil tenikîya xwe, xwediyê dil safîbûnekê ji bû. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Safîbûn, diltenikbûn û zanebûn, weke ku di nav xalkê de dihata vegotin di wê şaxsiyata wê ye qanc de lev gihabûbû hevdû.Bi vê yekê, ku mirov hinekî ji bi nêzîkatiyaka bi têgihiştine deme û felsefîk li wê şaxsiyeta wê ye pêşketi dimeyîzenê, mirov digihijê hinek encamne têgihiştinê di derbarê wê û bi wê re demê de. Her weha ji divêt ku mirov wan ji bi çend gotinan bêne ser ziman. Bi vê yekê re, mirov divêt ku vê yekê ji bêje ku şaxsiyeta Dilberê, hem bi demên xwe yên pêş yên ku di deme ciwaniya xwe de weke mînaqakê ya û hem ji bi wê êşe û kulê xwe re ji, wilo derketiya pêş. Ji ber vê yekê di nav xalkê de, weke gotinaka xalkê ku bûya û tê gotin, dibêjin "ku mirov kule Dilberê fahm neke, ma mirov wê çawa bêje ku êş û dilêşî fahm kiriya!". Her weha ji tê gotin. Ev gotin bixwe ji, ku mirov li ser dihizirê, mirov têde têgihiştineke ku di nav xalkê de afiriya dibîne. Dilberê bi hebûne xwe re, weke minaqakê ya, ji wê fahmkirin û têgihiştina wê re. Bi vê yekê re, mirov divêt ku bêje ku Dilberê Feqiyê Teyran, bi serê weke ekoleke têgihiştine ye felsefe ya di wêje kurdî de ya, ku mirov wê fahm bike. Bi vê yekê, deme ku mirov şaxsiyeta Dilberê fahm dike, mirov ji aliyê pêşketine ve ji, hinek têgihiştinên deme ji têdigihê. Mirov, hinekî di derbarê demê de ji dibe xwdi zanebûn. Zanebûna deme çawa ya, mirov wê ji her weha bi têgihiştin û rast fahm dike. Mirov, bi wê re dibîne ku ev yek her weha. Hem di anîna wê û êşe wê ye li ser ziman de û hem ji di şaxsiyeta wê ye ku hatî ser ziman de, mirov vê yekê her weha pir baş û qanc fahm dike û têdigihê. Feqiyê Teyran, ji xaynî zanistiya xwe ye deme ya hizrî, zanistitiyaka vê yekê ji bi teybet kiriya û daya nîşandin. Her weha, ku mirov bi têgihiştine Feqiyê teyran re li Dilberê ji û li rewşe wê ji dimeyîzenê, mirov digihê hinek têgihiştine mazin yên dîrokî. Bi çavên feqiyê teyran meyîzendin, têgihiştineke demî ku ji têgihiştine dîrokî û felsefî ne dûre pêdivî pê heya. Bi teybetî Dilberê Feqiyê teyran û Zîne Ahmadê xanê, mirov her weha pir mazin di têgihiştine demê de kur û dûr dibin.

Di wêje kurdî de, her weha Dilberê Feqiyê Teyran ji û Zîne Ahmadê xanê ji xwediyê weyneke mazin di pêşketinê de. Bi vê yekê re, divêt ku mirov pir mazin bahsa Şahmaran ji bike. Şahmaran, pir mazin binirx e. Bi Şahmaran ve girêdayî, çandaka

mazin ye dîrokî ye civakî afiriya. Wê çanda gelekî awakirinaka mazin di ser û dilê xalkê de kiriya. Ku bahsa wê ji tê kirin, weke ku bahsa nixeke pîroz bê kirin tê kirin. Bi wê wê yekê divêt ku mirov bahsa Rûstemê zal ji bike. Rûstemê Zal di çanda kurdî de, xwediyê weyneke pir mazin e. Jiyan û serpêhatiya rûstem û bavê wî di nav kurdan de di civatên wan de pir mazin hertimî li serziman bû. Piştî ku Firdewsî ew destan nivîsand, êdî di nav xalkê fars de ji bicih bû. Vê yekê ji divêt ku mirov bi teybetî bêne ser ziman. Ji xaynî rûstem, Pir mazin bahsa Bahlûl tê kirin. Di nav kurdan, ku bahsa bahlûl tê kirin, alimak, mirovekî ku ji rêzê dijî û hwd tê bîr û berçavên mirov. Bahlûl weke mirovekî ku hertimî bidiljênî û bûjênî dijî bû. Weke "mirovekî ku çavên ne li mal û milkê li dinyê bû" dihata ser ziman. Şaxsiyeta bahlûl ye ku tê ser ziman. Hata sadsala 17. min û 18. min ji, pir mazin li ser zimanan bû. Pir bahs dihata kirin. Li ser dihata sekinandin. Bi teybetî, ku mirov li herême botanê li civatên mîr û yên di nav xalkê de lê dirûnişt, mirov di dît ku çend bahsa wî û kirinên wî dihatina kirin. Li ser wî pir mazin dihata sekinandin. Di nav xalkê de, kirin û gotinên wî, weke yên bi şîretî dihatina ser ziman û bahsa wan dihata kirin. Li herême Botanê car bi car ku bahsa wî dihata kirin, ew bi navê "bahlûlê dîn" ji dihata binavkirin. Li rojhilatê kurdistanê ji, bi wî ve çandaka mazin heya û ku di nav de "bahlûlê bizane" ji di nav de bi hinekî navê din ji dihata ser ziman. Li hinek civatan jêre "bahlûlê baxdî" ji dihata gotin. Bi van navan re li herême botanê, hê hinek navên wî yên din ji ku ew pê dihata bi navkirin hebûn dihata gotin. Bahlûl, deme ku dihata ser ziman, weke dageriya safîbûn, jidilbûn, rastbûn, bawerî û zanebûnê dihata ser ziman. Her weha bahs lê dihata kirin.

Şaxsiyeta bahlûl ye ku dihata ser ziman bi hinek xosletan re, ku mirov wan xosletên ku pê ew dihata ser ziman, li wan û awayê wan dimeyîzenê, mirov dibîne ku ew şaxsiyet yê deme têgihiştin û felsefêkirinê ya. Wî, jiyanaka ku di nav xalkê de li sikakan derbaskiribûn. Hertimî di nav xalkê de bû. Deme ku diaxift, gotinên wî di serê yên ku lê dihisandin de cih û war digirtin û mayînde dibûn. Ew ji, ji wê jiyana xwe ne bigilah bû. Deme ku bahsa jiyana wî dihata kirin, her weha minaqaka ku ji bo ku wê jiyana wê bi mirov bidine têgihiştina dihata ser ziman di civatan de. Dihata gotin ku birayekî wî ji ku jê re xaro Reşîd dihata gotin hebû. ew pir dewlemend bû. Lê bahlûl ti tiştekî wî ne bû. Birayê ji, çi dixwest ku bide Bahlûl, lê bahlûl erê ne dikir. Bahlûl weke xwe dijî. Rojekê ku birayê Bahlûl di nav civatê de rûniştiya, hinek mirov dikin hinek tahnan bidine wî. Jê re dibêjin ku "ti wilqasî dewlemendî û xwedî hebûnî, lê Bahlûl ne xwediyê ti tiştekî ya. Ew ji, ji bo ku xwe bi parezê, ji wan dibêje ku "ez çi didime de lê ew erê ne û nabê".Di wê heyemê de, yek dike ku aqilekî bide wî dike û her weha jê re dibêje,"de ka sewîlekî tişî zêr bike dêne ser riya ku ew têve wê herê carekê û bila ew ji wê sewîlkî bibîne, ka wê bê an ji nabê". Birayê bahlûl ji dirabê ku ew mirovên li dore wî ji hemû pêrene bi wan re wê yekê dike li ber çavên wan. Sewîlkekî tişî zêr dikin û didênine ser riya ku ew ji dûr wa têve tê. Bi birayê Bahlûl re, mirovên din ji li wir li dore wî li cihekî dî ku wan xwe bişûn ve daya li cihekî di sekinin û li Bahlûl û hatina wî temaşa dikin. Bahlûl, ku hinekî dî ji tê û digihê nêzîkî dehma sewîlk, êdî hizrek dikeve serê wî de û ew ji xwe re dibêje "ka ezê weke koran bikin ku ka ew çawa karin bi meşîn û herîn. Ew ji wilo dike hata ku tê dehma sewîlk û hinekî jê di buhurê. Piştre, birayê Bahlûl ji dore xwe re dibêje ku "win dibînin ma, ne wilo .." û piştre dimêne sekinî. Piştre herkesek ji wê kêlîkê pêve ji bo wî dibêjin ku ´xwûdê li vê dinyê nadayê de mal û semyan, hemû tiştê ku bidiyê de

li dinye dî ya´. Her weha şaxsiyeta wî tê ser ziman. Bi vê yekê re, hê weke vê gelek vegotinên ku li ser wî li herême botanê û wanderan têne vegotin hene.

Weke şaxsiyetên wêjeyê û çandî yên ku ser û dilê mirovên kurd biawa kirina, yên sereke yên ku hatina nivîsandin û ser ziman ev in, lê ne ev tenê ne. Hê gelek hene. Lê yên ku pir mazin ji aliyê vegotinî ve pir mazin derketine pêş ji ev in. Hinek navên ku bûna weke dager, her weha Şahmaran, Rûstemê Zal, Bahlûl, Dilberê, Zîne û hwd in. Bi wan re, gelek awayên vegotinan hatina afirandin. Li ser wan, bi gelek awayan vegotina di civatan de hatina vegotina. Di civatan de, weke ku emê di berdewama nivîsandina xwe de di vê nivîsê de ji bênine ser ziman, pir mazin têgihiştineka mazin hebû. Felsefe civakî di wanderan de bi awayê rêzanî, rewşenbîrî, çand, wêjeyî û hwd dihata afirandin. Civat, weke saziyaka civakî ya rêzanî, çandî û wêjeyî ya ji. Ji gelek aliyan ve, saziyaka civakî ya ku mirov wê bêne ser ziman a. Ji deme Gûtiyan ve û vir ve, bi awayekî bi sîmset, di wan de, felsefe û her weha afirandina hizir tê ser ziman. Hizir û têgihiştine ku di wanderan de tê ser ziman, civakê bi nirx dike û bi rê ve dibe. Di vir de, ji aliyê wêjeyî ve ji, wate wê heya û maf dike ku mirov bi teybet ji bêne ser ziman. Rasti û rastiya civakê ji her awayê e di civatan de dihata ser ziman. Di cvatan de, bi nêzîkatiyaka wêjeyî û bitêgihiştinî ziman ji pêşketî bû. Ku yek di axift, li zimanê wî dihata meyîzendin ku ka baş û an ji ne baş, ka zane bi peyivê û an ji nizane bi peyivê. Bi vê yekê ve girêdayî, divêt ku mirov bêje ku ziman ji xosletekî mirov dihata dîtin. Bi vê yekê ve dirêdayê dise em bêjin, nêzîkatiya wêjeyê û çandî ye pi xurt û mazin lê dihata kirin. Weke ku di civatan de dihata gotin, "kê xweşik û baş zanibû ku lev bêne, ew yê ku pir baş û qanc zanibû ku bi peyivîbana". Nahaka pêde, em zimên ku di nav de di mijara xwe de anîna ser ziman berdewam kin.

2. ZIMAN: Zimanê kurdi ku mirov bahsê bike, divêt ku mirov dîrokeke ku pir dirêj bêne ser ziman. Zimanê kurdî dîroke wê ye ku tenê em zanin ne bin 8 hezar salan re ya. Hê gelek pêvajoyên pêşketine wê ji em nizanin. Di derbarê wan de wilo zêde ti zanebûna me ye mazin nîn e. Ji deme suermiyan û vir de, em hinekî xwediyê têgihiştinekê ne. Lê di deme sumeriyan de ji, pêşketineke çawa û bi çi awayê di xwe de jîn kiriya, di derbarê wê de ji, wilo zêde agahîyên me nîn in. Deme sumeriyan bixwe ji, çiqasî dirêj berdewam kiriya? Ev pirs ji, deme ku tê pirsin, li ser deme hinek qanaatên aqadamikî têne rojeve. Hinek zan têne rojeve. Lê yên ku wan qanaat û zanan ji tênine rojeve, bi xwe ji dibêjin ku "deme sumeriyan û ev pêşketinên ku me anîna ser ziman, heya ku hinek awayên wan yên hê cudetir ji hebin". Vê hizrê ji tênine ser ziman. Lê deme ku mirov li wê demê û pêşketine wê wan, ew awayê wê yê ku î ro ji, hinekî ji bê hatiya kifşkirin, ku mirov lê dimeyîzêne, mirov dibîne ku pêşketineke mazin jîn kirina. Tenê parastgaha ku li gundê Rehayê hata dîtin, biserê xwe karê hinek hizrên aqadamikî yên ku hatina afirandin û îro ji di rojevê de serûbin bike. Li gor hinek zanan, tê gotin ku ew parastgah "berî zayîna di naqabîna 13 û an ji 13 hezar salan de hatiya avakirin. Her weha hinek hizir têne ser ziman. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku pêşketineke mazin ye ku mirov wê kifş bike li herême jîn bûya. Hê ji gelek aliyan ve ji, pêşketine wê, ne hatiya kifşkirin. Aliyên ku hatina kifşkirin ji, têne yên rêveberî û an ji her weha yên desthildatdarî ne. Wilo zêde li ser jiyan û û pêkhatinên wê kifşkirinên mazin ne bûna. Ev yek, bi serê xwe ji, mirov dikê nava hinek hizirne de, ku ew pêşketine wê çend mazin e. Li herême zimanên ku herî kevn yên ku pêşketine herême di xwe diparezên, kurdî, farsî, arabî û asurî ya. Ev herê ziman zimanên ku ji wan deman mana. Farsî

dîroka wê hinekî î ji bi vir de têt. Lê kurdî hê bêtir dîroka wê bi asûrî re bi wirde diçêt. Divêt ku mirov vê yekê ji her weha di serî de kifş bike.
Deme ku mirov bahsa zimên bi xwe ji bike, divêt ku mirov zanibe ku mirov bahsa çi dikêt. Kurdîya ku îro em bi kar tênine, ti çarî ji ne weke ye wê demê ya. Ji ya wê demê çûdatira. Bêjeyên kurdiya îro, li ser hîm û temenê têgihiştinê yên ku avabûna na. Divêt ku mirov vê rastiyê di serî de kifş bike. Ev yek her weha ku mirov wê di serî de kifş kir, êdî wê mirov di serî de bigihêne hinekî rastiyên in ji. Her weha wê di serî de, pirseke ku mirov bi pirsê û bersive wê bide wê ji me kê. Ew pirs ji, her weha, di zimanê kurdî de, demên wê yên berî deme têgihiştinê çawa na û çawa pêşketina na. Ev pirs, pirseke serekê ya ku mirov bi pirsê û bersivekê bidiyê de. Kurdî, hata nahaka wilo zêde li ser lêkolîn ne hatiya kirin. Hinek, bêjeyên ku ji deme sumeriyan mana weke "ga" ji, hinek hizirne di serê mirov de çêdikin. Ev bêje ji, bêjene ku mirov wan li ser wan bihizirê û hinek analizên ji temen bike ne. Ev bêjeyên halo, hinek pêşketinên ku wê demê bûna di xwe de tênine ser ziman. Ji xwe, ku mirov li ser zimên di hizirê, mirov vê yekê ji her weha dibîne. Zimanê deme pêşketinê, bêjeyên xwe yên axiftinê ji, her weha li gor xwe diafirêne. Bi vê yekê re, mirov karê karê bêje ku dem bi dem û pêvajo bi pêvajo pêşketineke ku rû dide dibêt di zimên de. Di kurdî de ji, di zimên kevn yên ku ji wê demê mana de ji ev yek heya û bûya. Di serî de, ku mirov li kurdî dimeyîzenê, mirov vê yekê her weha pir baş û qanc dibîne. Kurdî bi civaka kurd re bidest pêşketine xwe dike. Ji ber vê yekê mirov karê bêje ku dîroke wê, dîroka civaka kurd e. Kurd, ji wê demê pêde, çend ku bidest pêşketine xwe ye civakê kirin her weha zimanê wan ji, li gor wê bidest pêşketine xwe kir.Bi vê yekê re, zimanê wan, di rastiyê de, dîroka pêşketine wan ya civakatîyê bi awayê kurdî "kurmancitiyê" re têne ser ziman. Kurmancî, ku mirov li ser bihizirê, mirov wê bibîne ku ne tenê zaravayakî zimanê kurdî ya, her weha zimanê demeke pêşketina kurda bixwe ji ya. Ku mirov lê dimeyîzenê, mirov vê yekê her weha di serî de, pir mazin kifş dike.

Hata îro, wilo zêde zanistaka ku zimanê kurdî bi serê xwe û bixwe lêkolîn bike ne afirîya. Lê ku zanistaka wilo ye lêkolînkirinê hebene, wê kifşkiribana ku zimanê kurdî, bi awa û hebûne re, ji wan kêvalbar(teblet)ên sumeriyan yên ku mana hata roje me, ji wan bêhtir pêşketinên wê demê di xwe de diparezê ya. Di serî de divêt ku mirov vê yekê her weha kifş bike. Kurdî, zimanê pêşketinê ya. Vê gotinê mirov karê ji bo kurdiya roje me bênine ser ziman. Kurdiya roje me, ya deme pêşketinê ya. Bêjeyên wê ji her weha yên deme pêşketinê ne. Her hevok û bêjeyên wê, di xwe de hinek pêvajoyên pêşketinê yên ku bûna diparezê. Ev yek, di serî de rastiyaka ku bûya di zimanê de kurdî de. Kurdî, bi vê yekê, divêt ku ji gelek aliyan ve were têgihiştin. Li ser lêkolîn bêne kirin. Ev yek, di serî de ji bo kurdan bixwe pir girîng e. Lê di çerçoveyeke gerdûnî de ji, wê mirov bigihêne pir pêşketinên demên berê yên ku bûna. Kurdî, her weha xwediyê hinek xosletên ku îro ji hê ji, ne hatina kifşkirin in. Li ser zimên, deme ku mirov bihizirê, ku ev ziman kurdî bê, divêt ku hinek têgihiştine civaknasî û kevneşopî ji di ser mirov de di wê kêlîkê de zîn û jîn bê. Ev yek, her weha pêdivî pê heya. Ev yek, wê mirov bigihêne hinekî rastiyên din yên ku bûna. Wê mirov, çêtir û zûtir serwaxt û serwer bike di kifşkirin û pêşketinên zimên de.

Zimanê kurdî, ji deme sumeriyan ye duyemin pêve, ku hata ku digihê deme Mîtanî û Hûriyan, pêvajoyaka deme xwe ye pêşketin bi awayê têgihiştine jîn dike. Bi wî awayê ku pê pêş dikeve ji, têgihiştineke mazin di xwe de çêdike. Bi wê têgihişine, êdî weke ku

xwe ji nû ve ji bi afirêne lê tê. Bêjeyên deme pêşketin ye têgihiştine, êdî zû bi zû diafir in û serwerî jiyanê dibin. Bi vê yekê anîna ser ziman ji, mazin pêş dikeve. Mirov wî awayê pêşketine zimên ji, awayê axiftin û nivîsandina wan fahm dike. Awayê axiftina wan weke ku helbestekê bixwêni e. Deme ku kurd di civatên xwe de li hevdû di civin û lev dirûnihin, her weha jêvre tênine ser ziman. Bi wê awayê anîna ser ziman ji, êdî hin bi hin jiyana wan ji di awayê pêşketine xwe de mazin bidest pêşketineke mazin dike. Jiyana wan, bi têgihiştine pêş dikeve. Di deme Gûtî û naîriyan de awayekê hizir yê bitêgihiştin ku pêşketiya, her weha vê yekê bi me dide fahm kirin. Ew awa ji, her weha di hizir de, nêzîkatiyaka teherîye ye ku di jiyana wan de bi têgihiştinekê bihizir pêşketiya ya. Naîrî, bawer dikin û baweriya xwe bi felsefe dikin. Bi vê yekê dihizir in û di afirênin. Hizrên xwe yên ku tênine ser ziman ji, geyretê dikin ku jev ne qûtbin. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku pêşketineke mazin bi wan re di serê wan de heya. Pêşketinên ku berî wan bûna, di wan de sentezeke xwe çê dikin. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku têgihiştineke wan ya pir mazin heya.

Di zimên û hizir de, têkiliyeke civakê ya ku mirov bi felsefê bêne ser ziman heya. Ew têkilî ji, di jiyanê xwe bi wate dike. Naîrî di deme xwe de, di hizre xwe de, demeke antîkî li kurdistanê jîn dikin. Bi vê yekê û hizrê divêt ku mirov wan fahm bike. Zanistên wan ji, weke ku ji demên sumeriyan hata wê demê berdewam kiriya, mirovên ku di civatan de di rûniştin û bi zimanekî xwe derdiketine pêş bûn. Ew hizre ku wan dianî ser ziman, pir mazin di nav xalkê de cih û war digirt. Lê wilo zêde navê wan dernedikete pêş. Bi vê yekê, ew zanistne bênavbûn. Her weha ji mirov karê bêje û bêne ser ziman ji bo wan. Ew, bi hîşmedî, xêv û dengê xwe yê xweş li pêş bûn û hebûn. Hertimî ji wilo dihatina ser ziman. J idevê wan, hiskirin, têj ji bo gotinê ji dianî. Ew awayê ku wan pê dianî ser ziman yê "zargotinî", di çerçove mijara me de, emê li ser bisekin in. Ew awa, awayekî ku mirov bêje ku wêjeyî bû. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov wî awayî baş û qanc fahm bike û têbigihê. Deme ku mirov bahsa wê awayê gotina wan ji kir, divêt ku mirov bahsa wê şert û mercên ku wan têde dianî ser ziman ji bike. Bêguman, ew şert û merc ji bi civatan diafirî. Divêt ku mirov vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Li hevdû civîbûn û jevre anîna ser ziman, weke kevneşopîyeka civatê ya. Ji wê ji, weke nirxekî civakê ya. Her weha divêt ku mirov li ser bisekinê û bêne ser ziman.

Di zimanê kurdî, bi awayê ku dihata bikar anîn, ji afirandina nêzîkatiyaka wêjeyî re pir mazin bingeh diafirand. Ji deme sumeriyan û piştre bi derketin û pêşketine hebûna civakatiyê re, zimanê kurdî awayê xwe yê kurmancî ji diafirêne û li jiyanê serwer dike. Ji deme Mîtaniyan û Hûrîyan û hata deme Naîrî û Gûtîyan, mirov karê weke pêvajoyên wê awayê zimên yê ku hebûna kurmancitiyê pêş diket, pêvajoyên pêşketinê û binirxbûnê bêne ser ziman. Her weha mirov karê bêje ku di wan deman de ji, zimanê kurdî bi kurmancî, mirov karê bêje ku ji serî hata binî, bi bêjeyên têgihiştinî xwe diafirêne û serwer dike. Ku mirov di vir de, bi vê yekê ve girêdayî, ji bo zimanê kurdî bigiştî gotinakê bêne ser ziman û bêje, mirov karê her weha vê bêje; zimanê kurdî ji aliyê pergala xwe ve hê pergala ku di demên berî demên Mîtaniyan wan de afirya bi kar têne. Wilo zêde ti guharandinên mazin hê têde çênebûna. Ji rewşan re bêje afirandin û anîna ser ziman, hê ji, di roje me de ji, derneketiya pêşiya ya wê demê ya ku hatibû afirandin. Hê ji, em dev û bêje û di hin rewşan de hevokên wê demê ji bikar tênin. Divêt ku di serî de, em vê yekê kifş Dikin. Di wêje kurdî de ji, ew rewş xwediyê afrînertiyaka ku mirov kifş bike û bêne ser ziman a. Nivîkarî weke karekî ku dihata kirin, ji deme

sumeriyan ve hebû. Lê bi nivîskariyê re ji, di xêv de girtin ji, hebû. Zimanê kurdî, bi teybetî ji, hinekî awayên pêşketina kurmancî derfeteka mazin ji mirov diafirand ku mirov di hiş û bîrê de bigirê. Bi vê yekê, bi civatan ba û an ji bi zargotinan ba, wêjeyeke devkî ku hebûna xwe ji deman di buhuranda deme afirî bû. Tirsa windabûnê bi mirovan de çênedibû. Ji ber ku ji xwe bawerî ji bo bibîranîna hebû. Ev awayê pêşketinê, ji deme Gûtî û Naîrîyan ji di buhurê û tê hata deme Medan ji. Ji deme wan ji di buhurê. Di deme medan de, nivîsandin bûbû. Medan, ji demên xwe yên berê yên ku hata wê demê her weha bi dev û bîrê anîbûn di rîjênine ser rûpel ji. Çand û nivîsên Êzîdîyan ji wan pêk dihatin.Lê piştî Medan re, ku dem tê piştî zayînê ji, deme ku êdî çûna bi ser kurdên êzîdî û olan wan de çêbûn dibe, êdî gelek nirxên wan bi pirtûkxane têne şawitandin. Nivîsên ku di deme Medan de hatibûbûna nivîsandin ji, di nav wan tûfana şawitandinê de têne şawitandin. Bi vê yekê, êdî demek bi hebûn û nirxên xwe re weke ku ji dîrokê tê birin. Di nav wan şawitandinan de divêt ku mirov pirtûka pîroz ya melekê Tawis û "pirtûkên Zerdeşt" ji bi hasibêne.Bi nivîskî têne şawitandin. Lê yên ku di bîran de ne, bi ser ve dem bi dem ji demên dirêj di buhurin, lê hebûna xwe bitememî winda nakin. Di vê xalê de, divêt ku mirov dise bi kurmancî re hebûne xêvê birêz bibîr bêne. Ji ber ku bi sayaserê wan ye hebûna wan ye bi hev re, gelek rewş û nêzîkatiyên têgihiştinî xwe ji tinebûnê xilas dikin.

Zimanê kurdî, bi kurmancî, ku tê sadsala 9. min û 10. min piştî zayînê, êdî dikeve deme xwe ye nûjên weke ye roje me ku zimanên cihanê jîn dikin. Zanistên kurd yên di wê demê de derdikevin yên Êlî Herîrî bi pêşketin, têgihiştin û awayê anîna ser ziman ye xwe, vê yekê radixina berçavan. Êlî Herîrî, ne tenê ji aliyê zanistitiya wî û têgihiştine wî ve divêt ku mirov wê şîrove bike û bêen ser ziman. Ji aliyê zimanê wî ve ji divêt ku mirov wî şîrove bike, fahm bike û bêne ser ziman. Zimanê wî yê ku pê diaxift û dianî ser ziman, xwediyê hebûn û têgihiştineke estetîkî ji bû. Ev aliyê wî, ne tenê pêşketineka mazin di wî de radixê berçavan û bi me dide têgihiştine. Ji xaynî wê ji, ji aliyê zimên ve, hebûne pêşketineke ku bitêgihiştin ye ku xwe daya der ji dide têgihiştin bi me. Her weha Divêt ku mirov vê yekê ji pir baş û qanc fahm bike. Ew rastî û pêşketin, hinek hizrên din ji bi me re çêdike. Ew ji hizir ji, her weha weke hizrên pêşketin û bitêgihiştinbûna hebûne wêjeyî ya. Ziman, pêşketine xwe, bi bikaranîna xwe re jîn dike. Her weha afirandina hizir ji, di vê yekê de divêt ku mirov fahm bike. Ji xwe, deme ku mirov li Êlî Herîrî di meyîzenê, mirov di awayê pêşketin û anîna ser ziman ye hizrên wî de tiştekî bi bal û li berçav kifş dike. Ew ji her weha, têgihiştineke ku bi nêzîkatiyaka felsefîk hatiya şiştin, wî pê hizre anîna ser ziman û hizre ku anîna ser ziman ji, aliyê wê yê wêjeyî asta wê ji asta roje me pêşketî ne kêmtira. Divêt ku mirov vê yekê her weha pêre kifş bike û bêne ser ziman. Ew ne tenê zanistekê mazin yê hizir ku em jê re bêjin fîlozofekî mazin a. Ew bi wê re ji, aliyê wî wêjevanî ji pir mazin heya û derketiya pêş. Wî di axiftin û nivîsandina xwe de pir mazin girîngî daya xweşik û rastî axiftinê. Xweşik û rast axiftin ji, têgihiştineke mazin ye ku bi hizir û têgihiştine wê serweriya wê divê, divêt ku hebe. Bi vê yekê re, wî ku mirov bêne ser ziman, ji divêt ku mirov aliyê wî zanistî pêre wêjevanîya wî û her weha pêre ji wî weke zimanzanekî pêşketî ji û bi vê yekê de bitêgihiştin bêne ser ziman.

Piştî Êlî Herîrî re, zanistên kurd yên weke Meleyê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ahmadê xanê, divêt ku bi heman awayê mirov bi rêz bi bîr bêne. Bi Teybetî ku mirov li meleyê Cizîrî di meyîzenê, mirov her weha pêşketine di wî de pir mazin di bîne. Wî hizir bi

têgihiştin di anî ser ziman. Wî pergalaka têgihiştine ye ku mirov wê bi felsefeyeke mazin kifş bike û têbigihê, bi hizre xwe ye ku anî ser ziman re anî ser ziman û da têgihiştin. Wî rastî di jiyanê de û di xwezabûnê de di dît. Bi vê yekê, hizreke wî ye felsefî ji diafirê di demê de. Deme ku ew bi wê zimanê xweyê xweş têne ser ziman, her weha bitêgihiştin û awayekî wêjeyî ji dide hizre xwe û têne ser ziman. Wî zanebûnaka ku ji mirov ne qût anî ser ziman. Piştî wî re, Feqiyê Teyran, ew di xwe de di felsefe xwe de da berdewam kirin. Feqiyê teyran, hê divêt ku ji gelek aliyan ve were têgihiştin. Ji aliyê felsefê zimên, û wêje ve were têgihiştin. Feqiyê Teyran, Hizre Meleyê Cizirî ye bi pergal bi pêşxist û da rûnandin. Meleyê Deme ku têde bû, fahm kiribû û li gor wê dianî ser ziman. Deme ku Feqiyê Teyran ji ew fahm kir, êdî wî ji wî da berdewam kirin. Bi vê yekê re, di têgihiştineke hizrî, felsefî û dîrokî de berdewamên hevdû ne.Ahmadê Xanê, weke ku zanistê wê deme ku Meleyê Cizirî pêşxistiya û têgihiştine wê bi felsefê wê re anîya ser ziman û bi vê yekê re pergala wê bi têgihiştin afirandiya ya. Ahmadê Xanê, weke ji wî tovê ku meleyê Cizîrî çandiya û Feqiyê Teyran avdaya û mazin kiriya bûya. Her weha tê berçavên mirov. Bi vê yekê re, demeke nû mirov karê bêje ku afiriya û xwe pêşdixe. Zanistên kurd yên weke Mele Hisêne Batê ji divêt ku mirov divir de navê bi bîr bêne û rêzekê bide wan ji. Di nav kurdan de, dergah hene. Li dergahan, piştre Medresa bi nav zêde têne ser ziman û bahsa wan tê kirin. Medresa ji, yên çanda wê demê ne. Berê wê demê ji hene. Lê di wê demê de, mazin binav dibin.Dibine bingihê wê pêşketine bi pergal ye ku dibe. Wê, temenê wê diafirênin û bi pergalî wî pêşketinê didine berdewam kirin. Her weha Medresa ji weyneke dîrokî di leyizin. Medresa, cihên ku zanebûn dihata bi rê ve birin. Kevneşopîyeka wan ji di civakê di afirê û piştre li jiyanê serwer dibe. Medresa di nêzîkatiyê de ne dûrî dergahan bûn. D rex dergahan de dihatina dîtîn. Li dergahan şêx rûniştî bûn. Şêxan pergala civakê ji aliyê xweve bi rê ve dibir. Serweriyaka wan ya pir mazin di civakê de hebû. Mele Hisêne Batê, aliyê wê medresavanî bêhtir li pêş bû. Lê wî, xwe bizanebûna we da pêş. Di civakê de, li ce van, her weha yê ku pir mazin bi nirx û li pêş bû ji mîr bixwe bû. Deme ku mirov bahsa mîr bike, divêt ku mirov zanibe ku mirov bahsa çandaka bi kevneşopî ye civakê ye ku bi hezar salan li ser pîyan bû dike. Bi vê yekê re bi wê çanda wî re aliyekî wî yê wêjeyî ji hebû. Em hewl dibin û di çerçove mijara xwe de wî aliyê wî bênine ser ziman.

3. MÎR. Mîr, ku mirov bahsa wî kir, mirov zane ku li Kurdistanê çandaka mazin ji dike. Her weha ev têgihiştine heya. Mîr, serokê civakê ya. Divêt ku mirov vê yekê kifş bike û bêne ser ziman. Mîr bixwe, bizanebûna xwe re civakê bi nirx û kevneşopîye wê re bi rê ve dibe. Her weha ew mazin a. Li qasra wî, hertimî civata wî li dar a. Hertimî, li dore wî, mirovên ku bizane ne, hemû ji li hevdû bicivîn in. Bi vê yekê, ew bi nav û deng e. Pir mazin ji bahsa wî tê kirin. Ew bi cilên xwe yên ku wî hertimî mazin û kifşkar didine nîşandin li civata xwe, li cihê ku hertimî wê li berçav bê dirûnihê. Ku diaxivê ji, dengê wî bilinde û bizanebûn diaxivê. Gotina wî ji, nayê ji bîrkirin. Di aqilan de di mêne. Ku bahsa wî hata kirin ji, di nav xalkê de, herkesek zane ku bahsa kê û mirovekî çawa tê kirin. Her weha ew yekê ku nirxdar e. Wilo ji lê tê meyîzendin. Di nav xalkê de, ku lê tê meyîzendin, bi meyîzendine lê, hinek tişt jê hertimî têne xwestin. Ew tişt ji, her weha nirxên ku ew li ser wan rûniştiya parastina wan e. Bi vê yekê re, mirov karê wî bi sereke bêne ser ziman. Lê divêt ku mirov zanebe ku mîr, çiya û çawa ya. Li gor nirx û kevneşopîyê tiştên ku jê dihatina xwestin çi bûn. Mîr, di aslê xwe de, rêveberekî civakê yê bi kevneşopî bû. Lê bi nirx û kevneşopîyên ku ew pê jîn dibû di parast, divîya ku wî,

jiyanaka xwe ya ku wî dijî di nav xalkê de li berçav bû bijîyana. Her weha ev yek ji, bi anîna wî ya ser ziman, wê hin bi hin bigihêne aliyê wî yê çandî. Wî di civata xwe de, hertimî bi zimanê xwe diaxift û dianî ser ziman. Li kevneşopîye xwedî derdiket û diprast. Di parastinê de, ew li pêşiya herkesekî bû.

Wî, divîyabû ku nirxên xwe li ti darî nedabana binpêkirin. Ev yek, weke sînorekî wî bû. Ji deme Gûtî û naîrîyan ve, ev yek pêre bitêgihiştin bi pergal dimeşî. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Şaxsiyata wî, şaxsiyeteka civakî bû. Li gor civakî di hizirî. Herttimî ji, ev yek jê dihata xwestin. Wekî din ji lê dihata girtin. Ku mirov bi nêzîkatiyaka bi têgihiştine wêje nêzîkî wî bibe û bêne ser ziman, ne tenê bi awayekî bi gelek awayan divêt ku mirov wî bêne ser ziman. Bi vê yekê ve girêdayî, mirov karê vê ji bêje ku çavên herkesekî hertimî li ser wî û kirinên wê yên ku wî dikirin bû. Ku wî di kevneşopîye xwe de kêmesiyak ji kiribana, dihata berçavan. Dihata dîtin. Bi vê yekê, êdî bahsa wê dihata kirin. Ew kêmesîya wî j ne dihata ji bîrkirin, weke kirinên wî yên ku wî baş kiribûn. Mîr, her weha divêt ku mirov bi teybet bêje ku ne tenê xwediye weyneke bû. Ew xwediyê pir weynan bû. Bi weyne wî ye kevneşopî re aliyê wî yê çandî û pêre ji wêjeyî derdiket pêş. Li qasre wî, di civata wî de, mirovên zane hertimî rûniştibûn. Bi wan re, mirovne ku ne kêmî wê di civakê û hebûne civakê de bi hebûna xwe re xwedi hebûn û weyn bûn bi dengbêjan re dima û ew dida axiftin û gotin. Mîr dikir, di civatê li ser wan kirinên wî dihata axiftin û yê ku diaxift û hertimî bi zimanekî pir xweş ji dianî ser ziman ji dengbêj bixwe bû. Dengbêj, bi vegotin û bi awayekî zargotinê vegotina gotinên xwe re, wî nav û deng mîr her weha mayînda ji dikir. Dengbêj, bi deng û zargotina xwe re wêjevanê civatê û civakê bû. Bi vê yekê re divêt ku mirov her weha vê yekê mazin bêne ser ziman. Dengbêj, xwediyê xêvekê pir xurt bû û wî destan û vegotinên ku hiskiribûn, karibû ku wan bi awayekî zargotinî bianîyana ser ziman ji dore xwe re. Bi vê yekê, dengbêj, bi xêve xwe re weke pirtûkxaneyê û bi gotina xwe re ji wêjevanekî ne bin re bû. Lê ew wêjevanekî bi devkî bû. Wî hertimî her weha bi dev digot. Bi vê yekê, wî weke ku di roje me de, pirtûkek tê nivîsandin û çawa ku bideng di dwdîyakê de tê xwandin û piştre tê lê hisandin, her weha wî bi wê hebûn û xêve xwe re, weyneke wilo ji dileyist. Bi vê yekê, wî çandak bi xwe re diparast..

Di nav mîran de, ku bahsa wan tê kirin, navê mîrê bota di cih de di serê mirov de şaq dide. Ew, her weha xwediyê şaxsiyata mazin ye ku weke mînaq dihata dîtin bû. Wilo lê dihata meyîzendin. Jê ti carî kêmesî ne dihata dîtin. Ku dihata dîtin ji di seran de pir mazin dima. Şaxsiyeta wî, bi li xwedi derketina wî ya li nirxê xwe re dihata berçavên herkesekî. Çawa ku li şaxsiyeta Rûstemê Zal dihata meyîzendin û jê mêrenî dihata berçavên mirov, her weha ji ye wî ji mazinbûn dihata berçavên mirov di her heyemê de. Mîr, ku mirov bahsa wê bike, divêt ku mirov pêre weke dû xalên girîng, careka din pêre dengbêjiyê û pêre ji civatê bêne ser ziman. Ev weke nirxne ku hertimî di qasre wî de di civata wî de lev digah hevdû bûn:

A. Dengbêjî; Ku mirov bahsa dengbêjeyê bi mîre ji neke nabê. Mîr, hertimî di qasre xwe de, li cem wî ku rûniştibûn û ku di kete derba xwe de bidest gotinê dikirin dengbêj hebûn. Di civatên mîr yên qasrê de, hertimî yên zane levdirûniştin. Bi vê yekê re, hertimî, li pêş bûn. Lê divêt ku mirov bêje ku çend ku weke ku dihata ser ziman, axlabê wan zilem ji bana, lê dise divêt ku mirov bêje ku car bi car yên ku jin bûn û dengê wan ji pir xweşbûn hebûn û digotin. Di civatên xalkê de, gelek caran jin li pêş bûn di gotinê de. Wan, car bi car, di deme ku levdiruniştin de, didana ber mêran di gotinê de. Bi vê

yekê, civatên xwe bi şêx û şeng dikirin. Ku mirov di dengbêjyê de di vê xalê de bahsa jinan bike, divêt ku mirov serî li civatên xalkê yên wan di nav xwe de dikirin bide. Ji ber ku li wanderan, ev yek, her weha pir mazin li pêş bû.Lê ku mirov di vir den bahsa gotinê û jinan bike, divêt ku mirov ji bîr neke û bahsa avêtina ser ji bike. Di deme mêreniyekê de an ji di deme ku yekê ku pir jê dihata hiskirin di mir di avêtina ser de jin hebûn. Jinan pir diavête ser wan. Di deme mirî veşartinê de ji, axlabe jîn li pêş bûn. Wan diavête ser di deme veşartinê de. Di jiyanê de, her weha ku avêtinên ser hevdû ji çêdibûn ji, êdî ne dihatina jî bir kirin û piştre di civatan de dihatina dûbara kirin ji hevdû re. Bi vê yekê re, êdî ew avêtina ser hevdûbûnê bi awayekî mayînda dibû. Bi vê yekê re, her weha êdî careka din civat derdiketine pêş di nav xalkê de di jiyanê de.

B. Civat; Ku mirov her weha bi vê yekê re bahsa civatan kir, divêt ku mirov bêne ser ziman ku nirxne civakî yên ku diafirîn dihatina ser ziman û bi mayînda hebûne xwe barî pêşarojê dikirin. Civat, weke ku me li jor ji anî ser ziman, bi dû awayan hebûn. Civatên ku xalkê dii nav xwe de dikirin û civatên ku li qasra mîr dihatina li dar xistin.. Her weha du awayê civatan hebûn. Di yên qasrê de ji jin di gotinê de car bi car hebûn. Hinek jinên ku bi dengê xwe pir mazin derdiketine pêş û navê wan dihata bihîstin hebûn. Ew dihatin û li civatan dirûniştin. Lê divir de divêt ku mirov bêje ku di herdû awayên civatan de jin dirûniştin. Axlabe ji, jinên ku navserî xwe bûn, li civatan dirûniştin û li pêş bûn. Li gotina wan dihata hisandin. Navê wan ji derdiket. Navê wan bi şaxsiyeta wan re dihata ser ziman. Dihata bihîstin di nav xalkê de. Yên ku bahsa wan dihata kirin ji, bi rêz bahsa wan dihata kirin. Jiyan, deme ku di vegotinaka k civatan de dihata gotin bitememîya xwe dihata ser ziman. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku jin ji, hem bahsa wê dihata kirin û hem ji ye bahs dikir ji car bi car ew bixwe bû. Her weha divêt ku mirov bêje ku cihê wê ji hebû di civatan de. Mafê gotina wê ji hebû. Lê di demên piştre, ku hin bi hin dem bi vir ve, tê, êdî hinek guharandin dibin û cihê û gotina wê di civatan de bi ber kêmbûnê ve diçê..

Mîr, her weha di qasra xwe de mazin bû xwediyê waqasan bû. Wî, her weha di qasra xwe nirxne mazin di parastin. Bi wan nirxan ji, di nav xalkê de, hinek pêşketinên ku mirov bi hebûna civakê ye ku pêşdiket re bahsa wê bike derdiketina holê. Dengbêjiya di qasrê de pir mazin bi qadr û qiymet bû. Navê wê hebû. Weke ku felsefeyeke wê hebû dihata berçavan. Bi vê yekê re, mirov divêt ku bêje ku pêşketin dibû. Di qasran de, pirtûkxaneyên ku hebûn, bi pirtûkên xanistan tişî bûn û ew pirtûk têgihiştin û pêşketine jiyanê bûn. Di wan de, nirx û pêşketine civakê hebû. Ew, weke wêje ku nivîskî bûn. Lê ji dêla wan, dengbêj ji, weke ye devkî bûn. Mîr li herdûyan ji di qasra xwe bixwedi bû.. Ew rewş hata ku tê sadsala 15. min û wan deman berdewam dike. Ji sadsala 15. min û wan pêde, êdî wê demeke nû xwe dabana berdewam kirin..

.

**JI SADSALÊN 15. MIN Û VIR VE ÊDî WÊJE KURDÎ** ..

Ji sadsala 15. min û bi vir ve, ku mirov li dîroka kurdan ye pêşketinê dimeyîzenê, mirov pêşketineka mazin ye bitêgihiştin ji dibîne. Mirov, demeke nû ye pêşketinê dibîne. Ji sadsala 15. min û bi vir ve, pêşketinên ku dibin, di temenê wê de, destêpêka demê ye ku bi meleye Cizîrî re destpê kiriya û bi Feqiyê teyran re hebûna xwe daya berdewam kirin û bi Ahmadê Xanê û Mele Hisêne Bate re têgihiştine xwe mazin kiriya dibîne. Bi zanist û yên weke wan re, ku mirov li wan dimeyîzenê, mirov rastiyekê dibîne. Ew rastî ji, ji zimanê wan û afirandina wan ye hizrî xwe dide dîyar bi me. Ew ji

her weha zimanê wan ya ku bi helbestgerî ya. Ew zimanê wan, dibe temenê wê wêjevanîya wan ye dîrokî ji. Bi vê yekê re divêt ku mirov bahsê bike. Ziman, divir de, divêt ku mirov careka din bahsê bike. Ziman, di pêşketine têgihiştine û felsefe û wêje kurdî de weke fîlozofekî her demê ya. Divêt ku mirov vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Ziman, di mirov de û di xwezabûna jiyanê de xwe dîyar dide berçavan. Di pêşketinê têgihiştine kurdî de, awayê wêjevanî xwediyê weyneke mazin e. Minaq, bi vê yekê, divêt ku mirov qasîdetiyê, destantiya ku ji wê ne kêmtir bi awayekî helbestgerî dihata ser ziman û hwd bêne berçavan û ser ziman. Meleyê Cizirî ji û Feqiyê Teyran ji, zanistvanê mazin bûn. Lê deme ku li civatekî di rûniştin, bi zimanê xwe yê xweş di cihê de karibûn bi awayê qasîdetiyê biafirandinan. Her weha divêt ku mirov vêyekê bi teybet bêne ser ziman. Ev awayê afirandinê, ne tenê weke karekî divêt ku mirov hilde dest, divêt ku mirov weke xoslet û teybetmediyekê ji hilde dest û bêne ser ziman.

Meleyê cizirî bi têgihiştine xwe re pir mazin li pêş bû. Pêşavan bû. Divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Wî, hizreke bi pergal afirand û anî ser ziman. Felsefe Meleyê Cizirî, divêt ku li gor xwe û rastiya were têgihiştine. Wî, nêzîkati li civakî û civaknasî çawa kir? Wî hizir çawa û bi nêzîkatiya anî ser ziman û çi jê xwest? Wî, weyne hizir û bi gelemperî felsefe weyne wê di pêşketinê de çawa dît û anî ser ziman? Her weha divêt ku mirov wî fahm bike û bêne ser ziman. Têgihiştine wî ye ku me fahm kir, ji dixwest ku em tenê bi awayê wêje nêzîkatiyê lê nekin. Ji ber vê yekê, di vir de, me hewcetî dît ku her weha bi pirsin û bênine ser ziman. meleyê Cizirî bixwe ji, ku mirov li mirovên ku alim yên kal ku mirov ji wan wî lê dihisêne, mirov bi awayekî pir baş tê digihê ku wî di deme xwe de hinek nivîsên mazin ku em weke pirtûkan bi nav bikin nivîsandina. Lê mixabin, haya ku me ev nivîs nivîsand ji me xwe ne gihanda wan nivîs an ji pirtûkên wî. Mirov her weha karê ji bo Feqiyê teyran ji bêne ser ziman. Feqiyê Teyran, bixwe ji, di hinek axiftinên ku weke helbestekê kirina û di roje me de weke helbesteke wî ji têne ser ziman vê yekê bi bal ji dîyar dike. Di helbesteke xwe de her weha têne ser ziman, "Agirê pêta di dil de/Me´niya daxan ku hilda/**Ev kîtab maçin du cilda**/Hafizê Medhan im ez/**Min û hê wasfê xwe hilda/**Xweşmîsal in çûn dû cilda/Çerx û kovan çûn di dilda/Ay dil min ay dilo ../". Feqiyê teyran, di van rêzên xwe de, bahsa hinek pirtûkên ku nivîsandî ne û ji hinek cildan pêk tên dike. her weha têne ser ziman. Wekî din ji, bahsa bi dawibûna wan dike. Di rêzeke xwe de dibêje ku ji bidawikirina cildê yekê buhurîne cildê dûyan dike. her weha têne ser ziman. Bi hinek vegotin û hiskirinên ku hatina guhên me ji, em digihine wê qanaate ku Meleyê Cizirî ji û Feqiyê Teyran ji, hinek pirtûk û an ji hinek nivîsên pir dirêj nivîsandina û li şûn xwe hiştina.

Ku mirov li gotin û vegotinên di derbarê de lê dihisêne, mirov bi êmin digihê hin qanaatne wilo di cih de. Deme ku bahsa Mele Hisêne bate ji tê kirin, her weha di hinek vegotin û gotinne bahs tê kirin. Di navxalkê de, li ser wan her weha pir vegotin hene. Lê ew vegotinên ku têne gotin ji, tenê di gotinê de dimênin. Ji bo Mele Hisêne bate, deme ku tê ser ziman, hingî, ku di deme wî ji jîn bûya, bahsa "Mîr Hisên" tê kirin û tê gotin ku di naqabîna wan ji pir xweş bûya. Her sal ew diçû serdana wî. Mîr Hisên ji, weke ku tê gotin, mirovekî ku alim û zane bûya, Di qasre wî de, pirtûkxaneyaka mazin ji hebû ya. Mele hisêne Bate ji, di deme ku diçû wir, li wir ji dima û weke tê gotin, "wî ji tiştek ji xwe li wê pirtûkxaneya wî hiştiya". Ji vê gotinê mirov fahm bike, ku wî ji hinekî nivîsandiya. Biqasî ku tê gotin, li ser felsefe û hizir û dîrokê hinek nivîsandinên wî yên

pir dirêj hene. Her weha ji tê vegotin. Mirovên weke van mirovên zanist û ku navê xwe bi zanebûna xwe ji deme xwe buhurandina demên pişt xwe re ji, ne mumkun e ku mazin ne nivîsênin. Mirovên weke meleyê Cizîrî, feqiyê teyran, Mele Hisêne Bate û Ahmadê Xanê, bandûraka wan ye pir mazin li ser dore wan û têgihiştinê heya. Vê yekê, xwe pir mazin û bi dîyarî daya der. Bi vê yekê ji, mirov karê bêje ku wan pir mazin anîya ser ziman. Piştre wan ji, di demên pişt wan re de, êdî pêşketinên ku dibin û zanistên ku derdikevin ji bandûra van zanistên mazin yên bi rêz li ser wan heya. Pişt wan re demeke nû ye bi têgihiştin dibêt. Zanistên ku derdikevin û wêjeye kurdî ji ye ku diaifirê ji, bandûra wan li ser wê heya. Lê divêt ku weke ku me li jor ji anî ser ziman, wan têne her weha bi aliyê wêjeyî ve fahm neke. aliyê wan yê zanistî û felsefî pir mazin ji li pêşiye vê ya. Divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Ew bitêgihiştinî tênine ser ziman û tevdigerihin.

Ji sadsala 15. min, hata ku dem tê sadsalên 16. min û 17. min ji, êdî kurbûnaka ku mirov bi çav dibîne dibêt. Ew kurbûn, li gor şert û mercên kurdistanê li derfete xwe digerihê ku xwe werêne ser ziman. Her weha mirovê yekê dibîne. Lê hin astangên ku ji rêveberên serdest dibin li pêşiye vê yekê ji astang in. Lê dise, di nav xalkê de hatina ser ziman dibêt. Nivîsandin û anîna ser ziman de, ew astangî piştre ku dem tê sadsalên 18. min û 19. min ji, êdî bi dîyarî xwe dide der. Mirov wê yekê li berçav dibîne. Li sadsala 18. min wilqas raperînên ku dibin, hemû ji bo wê yekê ne. Mirov nikarê wan raperînan ji vê yekê ûr bêne ser ziman. destanên kurdan yên weke "adulê" ji di van deman de diafir in. Destana "Hemê Zerê" ji ya demên piştî berî van deman e. Di nav xalkê de, ev destan, destanên ku pir ji wan tê axiftin in. Li ser wan tê sekinandin. Di civatan de têne ser ziman. Lê bi devkî ne. Lê divêt ku mirov bêje, ku çend ku bi devkî ji bin, ji yeke nivîskî ne kêmtir û tememtir têne ser ziman û hebûna diparezên. Her weha mirov karê ji bo "binavşa narîn û cembelîyê mîrê hakariya" ji wilo bêne ser ziman. Ev destan û vegotin, yên ku di nav xalkê de deng vedana. Navê wan heya. Hê weke van destan û vegotinan bidehan yên ku mirov navên wan hilde û bêne ser ziman hene. hemû ji, di ahengekê civakî de hevdû temem dikin. Ev destan û vegotin, hemû ji pir girîng in. Ji ber ku di xwe de têgihiştin, xêv û bîr û baweriya civakê di xwe de dihawênin û diparezên. Şaxsiyata hemê Zerê, ji şaxsiyata mîrîtiyê wirde, yeke kevneşopî ji ya. Şaxsiyetaka ku di deme xwe de car bi car li gor deme xwe dijî û car bi car ji bi têgihiştine xwe ji deme wirde dijî. Bi vê yekê, têgihiştinek ji pêre heya. Bi vê yekê ji dixwezê ku were têgihiştin ji aliyê dore xwe ve. Her weha şaxsiyata Mîr Xalid axa ji, mirov karê bêne ser ziman.Bizanebûn, qancitî, têgihiştin û pêşketi tê ber mirov.Şerê di naqabîna hemê Zerê û Mîr Xalid de, ku mirov lê dimeyîzenê, xoslet û teybetmediyênku didine berçavên mirov netenê weke yên aşriyê ne. Ji wê ji hinek wirdetir, weke ku hinek yên ku têgihiştine demê ji di xwe de diparezên, têne ber çavên mirov. Di civat ku jiyana rojena de ya kurdan de, ew ji têne ser ziman. Ew destanne devkî ne. Lê di ser û dilan de pir mazin cih û war girtina.

Li kurdistanê, her weha mirov dimeyîzenê, mirov çandaka mazin ye pêşketî dibîne. Kurdî, ji bo pêşketine xwe, pê hewcene ku wê li gor xwe kifş bikin û bênine ser ziman. Ji ber ku ew rastiya wan e. Ku rastiya xwe fahm kirin û naskirin, wê çêkirin, di pêşketin û têgoihiştine xwe di bi pêşveçûna wê de xwedi weyn bin. Wêje û çand, hinekî hewl dide ku bide naskirin. Armancaka wê ji her weha ev yeka bixwe ya. Bi vê yekê, divêt ku mirov bi teybet bêne ser ziman. Di cewherê çand û wêje de hebûne têgihiştine û

pêşketinê ji, ku mirov j ianîna ser ziman dûr nekê divêt ku mirov bi perwerde bêne ser ziman. Çand û wêje, bi serê xwe, dibistanên civakî yên hiş in. bi vê yekê, hewceyî pê heya ku nêzîkatiyaka rast lê bê kirin û nîşandin. Wêje ku çanda, şaxsiyeta mirov diafirêne. hertimî li gor demê ji, afirandin têde pêre çêdibe. Weke ku piştî sadsala 15. min re, di deme sadsala 15. min de, çawa ku bi weke minaq şaxsiyetên weke Dilbere Feqiyê teyran, Zîne Ahmedê Zanê afir in. Her weha piştre ji, bi destan vegotina Binavşa narîn û cembelîyê mîrê hakariya re şaxsiyata "Binavşê" bi şaxsiyetan civakî û di destan û vegotina hemê Zerê û Mîr Xalid axa de ji şaxsiyata "Xanimê" yên jin derdikevin pêş. Binavşê, bi evîn û dilsoziya xwe re bi têgihiştinekê dibe. Û Xaninmê ji, bi zanebûn, bîrewerbûn, serwerbûn û her weha bi şaxsiyeta xwe ye kifşkar ye xurt û bihêz derdiekve pêş. Her weha di heman vegotinê de Şaxsiyate "Bijînê" ji heya û derdikeve pêş. Ew ji ne kêmî ye xannimê derdikeve pêş. Di van şaxsiyetan tenê de ji, mirov bersive ku şaxsiyetan demî çawaye û divêt ku çawa bê dihilde. Her weha ji bo mêr ji û mîr ji, şaxsiyeta Mîr Xalid axa weke minaqake ku hertimî di civatan de dihata li ser axiftin û ser ziman bû. Bi vê yekê, çand û wêje kurdî, çend ku li pêşiye wê gelek astang ji bo pêşketine wê hebin, kêm ji bê, weyneke xwe ye dîrokî dileyîzê.Di awayê pêşketina çandê û wêje û têgihiştine wê de, mixabin, roje me ne li pêşiye demên xw eyên buhurandiya di têgihiştine xwe de. Bi vê yekê, ku di roje me de, em demên xwe yên berê yên ku hatina buhurandin em fahm bikin, em digihine têgihiştine wê. Divêt ku vê yekê bibe. Şûnpê me, çawa bû, divêt ku em bibînin û fahm bikin û têgihiştin û felsefe wê di xwe de ku bicihkirî bênine ser ziman. Ji bo vê ji, her weha xala herî girîng û sereke ji ziman bixwe ya. Berî hertiştî divêt ku li ser zimên bê rawastandin û pê xwe perwerde kirin mazin pêş bikeve.

Jin, li kurdistanê, di jiyanê de hertimî bûya xwediyê hêzeke têgihiştinî ye afirandinê. Her weha divêt ku mirov bêneser ziman. kevneşopîyên ku bûna wê li ser lingan hiştina. Wê, jiyan bi rê ve biriya. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi wê ve girîdayî bi rêz bêne ser ziman. Hebûnaka wê ya ku aramiya li kurdistanê dparast hebû. Kevneşopîye hamawiyê nîşanak û temen û hîmê vê yekê ya. Dem, li kurdistanê k tê sadsala 19. min û bi vir de, êdî pêşketinên n rû didin. Jin, di wê demê pê de wilo zêde êdî ne li jiyanê bidîyar e. Weke ku ji jiyanê bi şûn tê kişandin. Her weha tê berçavên mirov. Lê bi çand û hebûne kevneşopî re li jiyanê afrînertiya wê hebûne xwe dide berdewam kirin. Dengbêjin ku di sadsala 20. min de derdikevin yên weke meyremxan û Ayşeşan minaqên vê yekê ne. Her weha yên weke wê hene. Wan, çanda ku afirand, di qada pêşketinê de pir mazin xwe dîyar dide berçavan. Li Kurdistanê, di jiyanê de, dengbêji, weke kevneşopîyeka civakî ya pir kevn e. Aliyekê wê kevneşopîyê ya ku li ser lingan girtiya jin bixwe ya. Divêt ku mirov vê yekê bi teybet û bi rêz bêne ser ziman. Jin, di wê kevneşopîyê de, di avêtina ser de, pir li pêş in. Di kevneşopî dengbêjiyê de, sê bêşên girîng hene. Yek, bi dengbêjin an ji bi gotinaka din ji bi zargotinê vegotina destan û nirxên weha yên ku ji demên berê mana û hatina hiskirin in. Ye din ji, her weha di jiyanê de, bi awayekê bixweza di cih de li gor rewş û pêkan bi dengbêji gotina û bi wê gotinê afirandin. ye sêemin ji, her weha bi avêtina ser e. Xala sêyemin, tenê mirov karê bêje ku bigişti jin jê bi berpirsiyar bûn. Kêm hinekî, mêran her weha gotiya û strandiya. Lê jin hertimî wê gotiya û strandiya. Gotina "zargotinî", di aslê xwe de di dengbêjiyê de, têne bi zêdeyî ji bo awayê s xala sêyemîn dihata gotin. "Zar" bêjeyeke ku ji nala nalê dihat. yanî ji dilêşîyê ji gotinê dihat. Kî dikira zara zar, yên ku dilê wê pir biêş û kul bû.

Yên ku windabûnên wan hebûn. Yên êşeke mazin ku ji ber çi bana di dilên wan de hebû. Deme ku gotina zar, bi ser peyve gotinê ve dihata kirin û dihata gotin, êdî ji êşgotinê dihata ser ziman. Her weha xwediyê vê gotinê ji jin bûn. Wan bêhtir êş jin dikir û hîs dikir.

Di demên berê de qasîdetî di nav dengbêjiyê de ne dihata hasibandin. Ew, nirxeke olî bû. Wilo dihata dîtin. Wê, dîroka û hizre olî bizimanekî ku ji dil û xweş bi gotinî dida gotin. Di vir de, em gotinaka ji bi bal bênine ser ziman. Ji dêla strandinê, car bi car bêja "gotinê" dihata bi kar anîn. Ev di demên berê de, bi zêdeyî ji dihata gotin.

Ku mirov awayê dengbêjiyê li ser bisekinê û bêne ser ziman, divêt ku mirov hinek dirêj û biteybet li ser bisekinî û bêne ser ziman. Dengbêji, awayekî ku mirov pir li ser bisekinê ya. Bi hezar salan dîrokaka wê ye ku bê nivîsandin ji heya. Wêje kurdî bidevkî bi wê hata heta roje me. Bi vê yekê, divêt ku mirov wê bi rêz bi bîr bêne ser ziman. Jiyanaka dengbêjiyê ya ku mirov fahm bike ji heya. Dengbêji, li gor kevneşopîya xwe heya û bi wate ya. Her weha divêt ku mirov wê bêne ser ziman. Di civatan de dengbêji, li ser lingan bû. Di nav xalkê de her weha pê gelek nirx ji dihatina parastin. Dengbêji, li gor nirx û kevneşopîya xwe ye dîrokî weke dokumenteke dîrokî ye çanda kurdî ya.Bi vê yekê û nêzîkatiyê divêt ku mirov nêzîkî wê bibe û fahm bike û têbigihê. Bawerî, hizir, felsefe û têgihiştine ku hebû bi dîrokê re di wê de dihata ser ziman. Weke hêzeke civakî ya afrîner bû dengbêjî.

Di dîroka Kurdistanê de, pêşketinên ku bûna, mirov karê bêje ku hema bêja bi giştîyên wan bi dengbêji di hatina gotin. Densta û vegotinên ku hebûn, bê ku dengbêji tevli wê ne hatibana kirin ne dihata gotin. Di destana Hemê Zerê û Mîr Xalid axa de ji, her weha, ku mirov lê dimeyîzenê, mirov vî awayî li gor nirxekî û kevneşopîyekê dibîne. Weke ku pirtûkaka anîna ser ziman ye jiyangerîya çandê bê nivîsandin dihata ser ziman. Piştî Meleyê Cizirî û Feqiyê teyran ji, yên ku di derbarê wan û jiyana wan de xwedî agahî bûn, ku ew divegotin, ji destpêkê bahsa wan dikirin û cih bi cih ji bi dengbêji qasîde û helbestên wan yên zanibûn digotin. Li ser ew helbest an ji qasîde hatibû nivîsandin, ew ji her weha dihata ser ziman, di rewşê wê de di cihê wê de dihata gotin. Ev yek, weke nirxeke pîroz dihata bicih anîn.Bi vê yekê, di civatan de bana û an ji di cihne din de ji bana, jiyanaka civakî ya çandî û wêjeyî ye ku afirî bû dihata ser ziman û berdewam kirin. Di gotin û vegotinê de, guhdana xweş û xweşik gotinê ji, weke nirxekî dî yê aliyê vê pêşketinê ku hebûna xwe dide berdewam kirin bû.Bi vê yekê çand û wêjeya kurdî ji deman di buhurî demên din yên ku dihatin.

.

**DI WÊJEYÊ DE AQIL**

Li ser wê wêjeye kurdî, mirov karê pir tiştî bêne ser ziman. Berî nahaka, nivîsa ku li me li ser cihê jinê di wêja kurdî de nivîsandibû, me hinekî cih dabû cihê wî û pêşketinê wê ye di wêje û hatina wê ye li ser ziman. ..Ev mijar, pir mijaraka mazin e. Me, deme ku nivîs nivîsand, me hizir kir ku em hinekî ji bê bi sereke wê bênine ser ziman. Lê piştî ku me nivîs nivîsand û piştre ku me lê meyîzend, me dît ku wa têr wê û hatina wê ye li ser ziman nakê. Dîrokaka wê yê ya pir kur û demdirêj heya. Pir demên pêşketinê hene. Wêje, bi têgihiştine ku bi hizir re pêşdikeve re bi pêş dikeve. Ji pêşketine felsefe û her weha ye hizrê ne dûr e. Bi hev re di riyekê de rêhevaliyê ji ji hev re dikin. Lê ev rê hevalî, divêt ku rast were dîtin û ser ziman. Pir baş û qanc were têgihiştin û fahm kiirn. Kurd, dîroka wan ye wêje ku tê ser ziman, hê bêhtir mejî wan rastiya wê û **pêşketiye wê**

**ye ku bûya têde tê ser ziman. Ji ber vê yekê, pir girîng e, ku mirov li ser wê bisekinê û wê fahm bike. ..**

Zimanê kurdî, weke ku me di nivîsa din de hanî bû ser ziman, pir kevne. Dîroka pêşketine wê ta deme sumeriyan diçêt. Di wê deme de, bi teybetî ji di deme sumeriyan ye dûyemin de demne pêşketin yê bi têgihiştin ku xwe têde diafirêne jîn dike. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Bi rêzê, deme Hûrî û mîtaniyan û ji wir hate hatina deme Gûtî û Naîrîiyan û ji wir ji hate hatina deme Medan û ji wir ji hate hatina deme Şadadî û Merwaniyan demne pêşketinê yên sereke yên teybet in. Ev dem, bi afirandinên di xwe de û bi xwe re di wêje kurdî de di pêşketinê wê de cih û war digirin. Her weha ev yek, deme ku mirov li ser bidest hizirandin dike, mirov kifş dike. Pêşketine, di wêje de, ku newê fahm kirin, û berî her tiştî ku hebûna xwe berdewam neke, wê di pêşketinek civakê de pêşketine wê nebe û li şûn ve mayîn wê bibe. Ji ber vê yekê, wêje ne tenê mijaraka demên buhurtî yên ku hatina jîn kirin a, mijara demên pêşarojê yên ku wê werin ji ya. Divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Wêje, çawa tê ser ziman, mejiyê civakê li gor wê awa distêne. Her weha awayê hizirkirin û afirandina wê ji bandûrê li ser dike. Di gelek cihan de ji dibe sedeme pir pêşketinên mazin yê bi hizir û felsefe di nav civakê de. Her weh divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Kurd, dîroka wan ye wêje, ye demên buhurti, bi sereke ji bê, em di vir de bi çend gotinan bênine ser ziman û werine ser deme me. Di demên berê de, pêşketine kurdan di astaka civakî de pêş dikeve. Kurd, deme wan ye civakê ye herî pêşketî ku em ji gelek aliyê pêşketine wê ve ji ye roje me cude neyênine ser ziman ye deme Gûtiyan e. Her weha divêt ku vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Pêşketine wan, navende wê, li Cizîre bota bû. Tenê qasr û kelehên wan yên ku li şûn mana, û an ji şûnpêyên wan yên ji vê yekê ku têne berçav, vê hizrê bi me re pir hesanî didina çêkirin. Piştre pêşketineke mazin li ser wê pêşketine xwe dijîn. Zimanê wan, bûya zimanê pêşketine. Bi hevok û bêjeyên di xwe de li gor deme têgihiştine diafir in. Bi vê yekê û awayê ji têne ser ziman. Çîroke Şahmaran yên ku li herême botanê tê gotin, hizreke mazin bi me re çê dikin. Wek, tê zanîn, Şahmaran, nirxeke mazin ye wêjeyê ye çand û wêje kurd e. Mirov divêt ku vê yekê bêne ser ziman. gelek nirxên civakê pêve hatina afirandin. Di her malên kurdan de wêjeyên şahmaran bi naqş dihatina çêkirin û bi hêtan ve dihatina dalaqandin. Şahmaran, vegotineke kurdan ye deme civakatiyê ya. Her weha mirov karê ii bo vegotine Rûstemê Zal û bahlûl ji bêje û bêne ser ziman. Bi vî rengî hê gelek afirandinên ku hatina afirandin hene. Mirov divêt ku wan ji li ber çav bigirê ji bo ku mirov karibe wê pêşketinê fahm bike. Lê vegotina Şahmaran û ye Rûstemê Zal ji yên demên berî deme hatina musulmanetiyê ne. Divêt ku mirov vê yekê j bi teybet bêne ser ziman. Di vegotina Şahmaran de Şaxsiyeta şahmaran bixwe û ye Cemsîd û di vegotina Rûstamê Zal de ye Rûstemê û zal, her weha hinek şaxsiyetne ku di nav xalkê kurd de hatina rûniştandin in. Divêt ku mirov vê yekê ji her weha bi vê yekê bêne ser ziman.

Di deme Medan de, şaxsiyeta Kawa, û hebûna Şaxsiyeta Zerdeşt, û pêre her weha şaxsiyetên ku bi xoslet hatina hene. Ev ji di nav xalkê de bi wate ne. Têne ser ziman û pirt ji bahse wan tê kirin. Mînaq, Harpagos, weke dagarê şaxsietiyeke ku bêbaxtiyê ji xalkê ku jê ya dike tê ser ziman. Qiyakser weke yekî ser bixwe û key tê ser ziman. Her weha hinek minakên din ji yê yên ku têne ser ziman hene.

Ku mirov di deman de hinekî dî bi vir ve tê, mirov her weha ku hê bêhtir dem bi dem zêdetir dibin, rastî şaxsiyetên u bûna û di nav xalkê de cih girtina tê. Minaq, Pir mazin bahse Manî tê kirin. Ew şaxsieyteke k di asta pêxembertiyê de tê ser ziman. bandûra wî pir mazin heya. Wî hizre ku hanîya ser ziman, di afirandina hizre civakê re cihekî ku mazin cih girtiya. Weke nirxekî hatiya ser ziman. Cihên ku têde nirxên kurdan bi vegotinî dihatina ser ziman ji, civatên wan bûn. Piştî hatina Musulmanetiyê re, êdî piştre ne bi gelekî re, yên ku derdikevin û wê nirxitya musulmanetiyê ji bi hizre xwe re di dikina nava xwe de û pê têne ser ziman hene. Minaq, Şexsiyete Weysel Qaranî heya. Ew şaxsiyet, pê hebûna musulmantiyê li Kurdistanê bicih dibe û bi nirx dibe. Mirovên ku bi şaxsiyeta xwe re bûna malê xalkê, piştre bi hizir û vegotinên li ser wan û bi wan ve re ji her weha pêşketinên mazin didina çêkirin. Di Kurdistanê de ji wilo bû. Ji aliyê wêjeyî ve ku mirov lê dimeyîzenê, mirov bi teybetî rastî xosletên wan mirovan têt. Bi vê yekê re mirov rastî şaxsiyeta wan ye ku bi bûna minaq ji xalkê re çawa weke xosletekî tê berçav mirov dibîne. Her weha ev bûyina wêjeyitiya.
Ku mirov tê deme Salahadinê Eyûbî bixwe ji, çendî ku ew mirovekî ku mazin û li jiyanê hebûna wî heya, pişt wî re ne tenê ji aliyê hizrî û têgihiştine wî re bi wê re aliyekî wî yê ku di civatan de pê tê ser ziman ku mirov di vê yekê de ji bêne ser ziman heya. Ew ji hebûna jiyana wî bixwe ya. Ewji jiyangeriya xwe de bahse xwe û xatûna xwe Şamsa dike. Deme ku hevdû nas kirin. Deme ku hate deme zawacê, wî bi çi hizirî biryar da ku pêre bicewic. Têde gotinaka wî bala me dikişêne. Dibêje ku "gelek keçik hebûn. Yên arab û ji miletê din hebûn, lê min xwest ku bi yeke ji miletê xwe ku kurd bê pêre bizewicim". Ev hizire wî bala me dikişêne. Bi vê yekê re, awayekî şaxsiyetê yê deme ku pêşketî û bitêgihiştî ji dide nîşandin. Salahadînê Eyûbî, xwe û dora xwe nas dike. Zane ku ka çi çiya.

Şaxsiyetên ku hatina naskiirn û bûna, di nav xalkê de bûna weke mînaq. Bi vê yekê, hebûnaka wan ye wêjeyî ji afirîya bi wê yekê di nav xalkê de. Her weha mirov karê ji bo Êlî Herîrî, Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran û hwd. Mirov karê her weha hê gelek şaxsiyatan bide. Lê bi teybetî, deme ku mirov bahsa wêje kir, em dizanên ku bahse ew şaxsiyetên ku bi vrgotinê hatina afirandin û di nav xalkê de bûna minaq dikêt. Wekî din ji, em dizanîn ku ew şaxsiyetên ku hatina afirandin û çendî ku di vegotinê de di ahangekê de bin, wilqasî hebûna wan ye wêjeyî hatiya jîyîn û mazin di dil û seran de cih û war girtina. Minaq, Şaxsiyeta di berhemên Feqiyê Teyran de tê ser ziman ye jinê ye Dilberê heya. Piştre Şaxsiyeta ku di Zinê ye ku Ahmedê Xanê hanîya ser ziman heya. Her weha mazin têne ser ziman. Jinên ku bi têgihiştine xwe mazin bûn êdî di civatan de bahse wan dihate kirin. Ku li jiyanê ji ban, pir mazin li gotina wan ji di civatan de lê dihata hisandin. Deme ku em navê Ahmedê Xanê tênine ser ziman, em fahm dikin ku dayika wî navê wê "Xanê" ya û pir navdar bûya. Bi vê yekê Ahmedê kurê wê ji bi navê wê ji tê ser ziman û jê te tê gotin êdî Ahmedê Xanê. Ev ji çandaka civakî ya. Lê hinek xosletên wê di vî navî de û navên weha de têne ser ziman. Her weha mazinbûn û navdayina şaxsên ku jin ji têne ser ziman. Roje me de ji her weha bi vî awayî nav hene. Minaq, tê gotin Dilşanê ribhê û hwd. Her weha, ev yek, li gor naskirin û hatina naskirinê têne afirandin. Kî li gor xwe û rastiya xwe çawa nav da, wilo navê wê tê ser ziman. Di vê de awayê wêjeyî her weha hebûna şaxsisyetê ye ku di nav xalkê de wilo tê ser ziman e. Ev yek ji di nav kurdan de pir mazin e. Ev nêzîkatiyaka wêjeyê ya, ku li jiyanê bixweza serweriya wê heya û bûya û hatiya berdewam kirin.

Di vegotina "Hemê Zerê û Xalied Axa de" şaxsiyeta "Xanime" ye bi serwer û bi aqil heya. Têde ya "bijîne" ji heya. Ev şaxsiyetên ku di nav xalkê de bêqusûr in û hertimî bizanebûn têne ser ziman in. Weke wan Her weha ku mirov di demê de hê bêhtir bi vir ve tê, mirov rastî minaqên wilo ku şaxsiyetên kurd yên ku bixoslet têne ser ziman hene. Minaq Şaxsiyeta keça kurd Adûlê, ma ka kê ne bihîstiya? Ne ti kesekî. Herkesekî navê wê û evine wê ye ku wê di cihê xwe de pê jîyaya dizanîn. Pêre Şaxsiyeta Dewrêşê Evdî ji heya û tê zanîn. Ew bi mêrenî tê ser ziman. Ev şaxsiyet hatina ser ziman. Piştî wan re, ew bi xosletên xwe re hatina hiştîn li jiyanê. Bi vê yekê re em divêt ku vê ji bêjin, Wêje kurd, şaxsiyet û nirxên xwe yên ji wan û têgihiştine ji jiyandinên li jiyanê digirê. Her weha divêt ku mirov vê yekê bêne ser ziman. Ev qudret û hêze kurdan heya ku wan şaxsiyetan bi kina şaxsiyetna ku bi vêgotinê hertimî wan bênine ser ziman. Ev ji, ji awa û hebûna pêşketinê ye bi têgihştin têt.

Ev şaxsiyetên wehan yên ku êdî di hebûn wêje de bi hatina ser ziman re cihgirtina, gelek kodên pêşketin yên pêşketine kurdan di xwe de diparezên. Ji ber vê yekê ew pir girîng in ku mirov car bi car li ser bisekinê.Bi vê yekê divêt ku mirov ji gelek aliyan ve wan fahm bike.Wêje bixwe ji, ne bê şaxsiyet e. Ew ji şaxsiyeta wê heya. şaxsiyeta wê, hertimî ye ku di xwe de afirandin û hanî ser ziman e. Bi vê tê ser ziman. Bi vê yekê çawa ji bê, nirxeke û hizreke têne ser ziman. Wêje kurdî, hate ku tê sadsalên 17 û 18 û wan, êdî demne pêşketinê yên pir mazin têde têne jînkirin. Mirov divêt ku vê j bi teybet bêne ser ziman. Piştre, ji bo pêşketine kurdan, bi vê yekê ji bo aliyê wêjeyê û bi teybetî ji yê civakî pir mazin derfetên mazin hene. Kurdan, hate wê demê wilo zêde ew bi kar ne haîna. Diwê demê de ji afirandin hene. Lê rastî divêt ku mirov bêje ku di kifşkirina wan de ya. Di kifşkirina wê pêşketinê de ya. Rastî, bi têgihiştinê ji xwe diafirêne û dihêne ser ziman. Wêje bi jiyanê û şaxsiyetê re wê têne ser ziman û radixe berçav.

Di vir de, ji vir pêde divêt ku mirov hinekî ji aliyê roje me ve, yanî ji aliyê deme me ve hinekî li ser wêje kurdî bi sekin in. Ev yek her weha pir girng e. Wêja kurdî, î ro bi çanda wê re di bin zilmekê de ji bê, di hatina wî ye li ser ziman de, ev şert û mercên zor, divêt ku têde werine ser ziman. Kurd, di cih rewşê de ne, divêt ku têde werine ser ziman. Divêt ku di vir de fahm kirin, bi çandî û wêjeyê ji hebe. Minaq, zarokakî ku zimanê wê lê hatiya qadaxa kirin ku pê perwerde bibîne, hest û ramana wê çiya, çawa dihizirê. pirsgirêkên çawa dijî di şaxsiyeta xwe de. Di demên xwe yên ku ciwanti û her weha yên piştre de ji, çi pirgirêkên wê hene. Ev hemû mijarên wêje kurd in. Wêje kurdî, em ji nahaka de ji bêjin têde êdî şaxsiyeteka wilo afiriya. Lê têne li bendê ya ku were ser ziman. Lê çawa ku di demên berê de bi civatan û vegotinên di wan de wêje ku hebûna wêje bi devkî bê û bi nivîskî bê dihate parastin, î ro, di roje me de, ji wê zêdetir, gelek alîyên ku têde were ser ziman hene. Şano, tîyatro, û hwd, çend ji wan in. Lê mixabin, ev hê wilo ne hatina pêşxistin. Pêşxistina wan, wê bi sedeme ji gelek aliyan ve parastina wêje û nirx û hizrên civakê yên ku têde têne ser ziman. Bi vê yekê, wêje kurdî hê gelek kar û karên wê yên ku bêne kirin hene.

Di vir de, bi mijara me ve girêdayî li ser nerîn û dîtin û dîmenan ji divêt ku hinekî li ser bisekinê. Î ro di roje me de, pir mazin pêşketineke mazin ye bi teknolojiyê heya. Ew ji bandûra wê bêgûman li ser wê pêşketine ku wê di roje me de bibe û dibe de heya. Lê bi awayekî baş jê fêde girtin ji her weha girîng e. Di roje me de ev yek pir girîng e ku bê kirin.

Dîroka kurd ye wêjê, têde gelek pêşketin û nirx hene. Hate nahaka çendî ew pêşketin û nirx hatina rijandin li van qadên ku me navên wan hanîna ser ziman? Ev ji, di rastiyê de xamginiyekê bi me re dide çêkirin.Çend ku kurd bêjin, dîrokeka me ye mazin ye heya û çiqas ku ev rast ji bê, ku her weha di van qadan de ev newê ser ziman, wê ti wate vê gotinê nebe. Bi vê yekê re, divêt ku em balê bikişênine pêdiviya pêşketine divan qadan de ji bo pêşarojê. Ev yek, ye ku wê di pêşarojê pêşketinê bide kirin a.

.

**WÊJE Û BI ZANÎNÊ RE ZIMAN** ..

Li ser wêje kurdî, rewşe wê ye î ro mirov karê karê gelek tiştên bêne ser ziman. Lê gelek tiştên ku mirov wan bêne ser ziman, gelek ji wan ji li bendî bicih hanînê ji mirov. Bi rêxistinkirina wê û bi pergal harina wê ye ser ziman û gihandina civakê û kifşkirin û hanîna ser ziman û li gor demê nirxandina wê û hwd, hê gelek aliyan ve weke mijar mirov karê hildê dest û bêne ser ziman. Ziman, di serî de pirsgirêkaka herî mazin ye wêje kurd e. Ew pirsgirêka zimên ji qadaxakirina wê û hate ku digihê bi karhanîna wê, ji gelek aliyan ve pirsgirêkên wê ne. Bi teybetî ji ev pirsigrêlên wêjê, pirsgirêkên wêja kurd bixwe ne. Bi navê pirsgirêkên wêja kurd mirov divêt ku wê bêne ser ziman.

Wêja, şaxsiyetên ku lê meyîzenênin p wê fahm bikin bi têgihiştinekê dêrokê re ku bênine ser ziman ji mirov dixwezê. Berî hertiştî ev xwesteka wêjê ya ji mirov, xwestekeke civakê xwe ye demî ji ya. Divêt ku mirov wê her weha bêne ser ziman. Kurd, di çand û hûnera xwe de çendê li pêş in. Bersive wê pirsê mirov karê ji du aliyan ve bide. Ji aliyê hebûna têgihiştine wê ye ku têde heya ve mirov karê bide û ji aliyê demê ve ji mirov karê bide. Ev pirs, pirseke wêjê ye her demî ya. Her demî, wêje bersive wê pirsê li gor wê deme ku têde tê jîn ji mirov dixwezê. Jiyan bi pêş dikeve. Ji ber vê yekê, wêje ji bi pêşdikeve. Û li gor deme ku têde tê jînkirin hanîna xwe ye li ser ziman û dewlemendkirina xwe ji mirov dixwezê. Ev xosletê wê yê sereke ye têgihiştina wê ya.

Wêje divêt ku mirov bêne ser ziman ku bi mirov û jiyana mirov re di wê xate jiyanê ya ku mirov têde dijî, weke mirovekî ku mirov re her demî bijî dijî û tê ser ziman. Ew hebûna mirov ye demê ji ya bi vê yekê. Kurdan, hebûna xwe ye demên berê, di wêjeye xwe ye de pir mazin hanîna ser ziman. Çendî ku civak xwediyê pêşketin û pirsgirêkan bêt, her weha wêje wan dibîne û di xwe de bi nirx û felsefe dike û têne ser ziman. Bi vê yekê, hebûna wêje ye demî diafirê û tê ser ziman.

Î ro, di roje me de, pêşketinên ku di bin, ji aliyê zanistê ve di qada tekonolojiyê û qadên zanistê de ku dibin de hemû ji bi hev re çandekê bi mirov re diafirênin. Ew çand, çandaka civakî ya. Tê gotin ku "civaka zanist". Xosletên civaka zanist çina? Ev di wêjê û felsefe wê de xwe bicih dikin û bi xwe re wêja civakê ye wê demê wê diafirêne. Her weha wêje bi felsefê xwe re heya. Wêje, felsefe wê, nirxdariyê derdixe pêş. Bi nirxkirin û di çerçoveyeke ku bi pêşketine wê rewşe re wê rewşê têne ser ziman re, nirxê wê bi xwe re di xwe de dide kifşkiirn û li gor felsefe civakê bi civaknasiyaka demî ku têde tê jînkirin, bi nirx têne ser ziman. Her weha êdî jiyana demê bi kevneşopî ji dibêt. kevneşopî di vir de têkiliyeke wan bi wêjê û pêşketine û demên wê yên pêşketî û pêşketinê re heya. Divêt ku mirov vê yekê ji biteybet bêne ser ziman. Bi vê yekê, wêje, têkiliya wê bi deme re çiya? Ku mirov bersive wê li gor demê bide, mirov wê bêje ku ew jiyana ku di wê demê de tê jîn kirin bi hebûn û nirxên ku pê dijî ku têde tê kifşkirin û ser ziman, bixwe ya. Her weha mirov karê vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Jiyan,

çendî ku bi têgihiştinê bi pêşket, ewçendî ji pêşketineke ku mirov bi kurahiya wê re bêne ser ziman derdikeve holê. Wêje î ro, hin bi hin kirasê estetîkê li xwe dike. Divêt ku mirov vê yekê ji bêne ser ziman. Ev li xwe kirin ji, weke xosletekê gelemperî yê wêjê yê gerdûnî derdikeve holê Mirov karê wê j bi teybet bêne ser ziman. Bi vê yekê re, her dem li gor xwe û pêşketine xwe dixwezê ku mirov wê bêne ser ziman. Her weha roje me ji wilo ji mirov dixwezê ku mirov wê bêne ser ziman.

Felsefe wêjê, di roje me de di qada ku wêjê têde tê fêrkirin de weke xalaka girîng derdikeve pêş. Lê ev, wê di demên pêş de bi nirx û pêşketine mazin ku mirov wê bi teybet ji fahm bike, heya ku derkeve pêş. Jiyan, jiyana ku em dijîn û jiyana ku em jîna û di hebûne wêjê de tê ser ziman ji, di xwe de di berdewam xwe de êdî bi vê yekê ahangekê ji mirov dixwezê. Ev ji, xalaka wê felsefê ya herî girîng e ku wê bê ser ziman. Wêje, felsefe wê, têgihiştine jiyanê di xwe de bicih dike û tekoşîna wê dide. Di wêje de xiyal û rastî, rastî û jiyan, jiyan û jiyandin, jiyandin û awayê jiyandinê û mirov bi hev re bi hinek awayên ku mirov wan fahm bike hene.

Lê bi teybetî ji, divêt ku mirov bêne ser ziman ku wêjê pir girîng e. hebûna wê pir girîng e. Li jiyan û şaxsiyeta mirov bandûra wê pir mazin e. Di wêjê de şaxsiyetên ku hatina ser ziman, minaq; Şahmaran, Rûstemê Zal, Dilberê, Xanimê, Adûlê û hwd, hinek şaxsiyetên ku jin yên ku di demên berê yên dîrokê de afîrîne. Her weha mirov karê di çerçove bêje wêje ji de ji aliyê dinê ve ji bêne ser ziman. Ev nav, bi hebûnên xwe re nirxne ku pê bi awayê wêjeyî di nav xalkê de û di deman de bicih bûna hene. Ew di deme me de, ji mirov nirxandinakê dixwezê û bi vê yekê li gor demê hatina ser zimên ji ji mirov dixwexê. Wêje, rastiyaka ku mirov bi xweza di jiyanê de dîjî û li berçav e têne ser ziman. Awayê ku têne ser ziman a ji, ji yê ku hatina jînkirin ne cuda ya. Wê têne ser ziman. çendî li gor wê were û werêne ser ziman, ewçendî ji wêjetiye wê mazin û bi nirx dibêt. Her weha berhemeke giranbûha ye wêjê.

Rastîya roje me, ji me bi pêşketin û pêşxistin, gelek tiştên di qada wê de dixwezê. Divêt ku mirov zanibe ku nirxên civakê yên ku hene û afirîne û di demê de diafirin ji di wêje de têne ser ziman. Her weha wêje, cihekê pir giring digirê di nav hebûna civakê hanîna wê li ser ziman de.

Pêşketinên roje me, ne tenê bi aliyekî ne. Bi gelek aliye na. Bi teybetî ji di roje me de weke televizyonê, û radio hinek amûrên ku ji dîtin û nerîn û hiskirinê re ne. Ev di vê yekê de pêşketine mazin dihildina ser milên xwe di nav civakê û pêşketine wê de. Nirxandin û afirandin û dana hizirkiirn ji di nav de gelek tiştan dide kifşkirin. Bi vê yekê, pêşketinên ku di bin dide kifşkirin. Berî hertiştî ji awa û riya pêşketinê ji dide kifşkiirn. Di qada wêjê û zanistên din de li ser vê yekê çendî ku î ro hinek hizir yên bi rexneyî ji tenê ser ziman ji, lê dise weyne wê ye di pêşketinê e nayê binçavkirin. Lê aliyê ku tê gotin ku "ji dêla min dihizirê", weke hizrekê ku tê ser ziman û rexne lê têne girtin ji hene.

Wêje, wê di roje me de, di pêşketin û serwerbûna pêşketinan de xalaka ku ti carî divêt ku newê piştguhkirin e. Divêt ku mirov vê yekê her weha fahm bike. Ji aliyê têgihiştin û pêşxistina wê ve weyneke wê heya. Rastiyên ku têne ser ziman yên roje me û yên demên berî xwe ji, der bi der di nerînekê de di buhurêne û têne ser ziman. Ev ji, rastiyekê têne ser ziman. Lê di nav çanda ku têde têne ser ziman de li gor wê di nerînekê de di buhurêne. Her weha mirov divêt ku vê yekê bêne ser ziman. Her civak, weke her mirovî çawa ku nerîne wî ye ku pê dimeyîzenê, her weha ye wê ji heya. Mirov divêt ku

vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Ji ber vê yekê, her pêşketine ku dibe ji, bi vê yekê di çavika xwe de di buhurêne û di xwe de têne ser ziman û bi vê yekê û kirine dike temen û pêşketinek. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji fahm bike. Wêje, van kirinan hemûkan di xwe de bi pergal dike û di nav civakê de bi nirx têne ser ziman. Civak, ji mirovekî bigire hate ku digirê her tiştên din ne bê hest û raman a. Yê ku heste wan heya û tênine ser ziman û yên ku jê hest û raman hene û têne ser ziman, hene. Her weha mirov vê yekê di wêjê de kifş dike. Ji ber ku wêje aqilê wê bi têgihiştin û bi awayekî pêşketî li gor demî têne ser ziman û radixe berçav. Deme ku du mirovan bi nerîneke ji dil li hevdû meyîzend û jê hestek hate fahm kirin, ew hest bi gelek awayan wê di wêjê de were ser ziman. Hijkirin, evindarî, hêrsbûn, zaxalî û başî û ne başî û hwd, hê gelek nirx û nerînên din hene. Wêje wan, di xwe de weke xwe têne ser ziman.

Di roje me de, ev di pêşketinê de di pêşxistina meji de xwediyê pêşketineke mazin ye ku mirov nikarê wê bihasibêne, ku hingî mazin e. Pêşxistin, di vir de dikeve ser milê wêjê de. Wêje, di pêşketine mirov de, biqasî ku heveynekî mazin yê hebûne civakê ya, wilqasî girîng û bi wate ya. Her weha divêt ku vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Wêje roje me, bi felsefe û bi teybetî ji bi felsefe estetîzmê tê şiştin. Bi vê yekê wêje ku jê re tê gotin "wêje nûjen" an ji "wêje hemdem" tê ser ziman. Ev herdû bêje, di wêjê, divêt ku werine fahm kirin û naskiirn. Têgihiştin û felsefe wan çiya? Divêt ku ji gelek aliyan ve were ser ziman. Ji ber ku pêşketine deme bi wê tê ser ziman.

Pêşketine roje me, pir mazin bi wê tê ser ziman. Li wêjê roje me de an ji mirov ku bêje mirov çawa karê Şahmaran û an ji Zînê bêne ser ziman? ew ji vê re çi dibêjin. Hizre wan ji vê re çiya. Wêje li vê yekê di hizirê û hizre wê ji vê re heya. Divêt ku mirov wê bêne ser ziman. Wêje, cihane wê, her weha, weke cihana me di pêşketinê de ya. Bi vî awayî di pêşketinê de ya. Ev pêşketine di hundurê cihana wêjê de ya. Lê pêşketine ku li cihana ku mirov têde her weha di rastiyê de dijîn ji dikeve hundurê wê de. Bi vê yekê bi du aliyan di xwe de pêşketinê dide çêkirin. Bi vê yekê hizir û felsefe bi têgihiştin ji demê di buhurê demê. Lê cihana wêjê divêt ku mirov pir ser bisekinê û wê fahm bike. Ew divêt ku pir baş û qanc were fahm kirin. Cihanê wêjê, cihana hebûna pêşketinê ye civakê di xwe de dihildê ewlakariyê. Bi vê yekê, di pêşketinê de ya. Pêşketine wê ku newê fahm kirin wê pêşketin di cihana rast de ji nebe.

Mirov tenê, cihana wêje an ji hebûne wê ji nivîsandina çend pirtûk û an ji ji hinek şaxsiyetên ku têne hatina afirandin bi nivîsandinê bihasibêne, mirov wê hingî di xalatiyaka pir mazin de bê. Wê ev nêzîkatî, rêzekê ji ji mirov û ji pêşketinê civakê û berî hertiştî ji cihanê wêjê re nebe. Divêt ku mirov vê yekê her weha pir baş û qanc fahm bike. Cihana wêjê, divêt ku were fahm kirin. Deme ku em dibêjin Wêje demê berê, em hingî hinekî bahse wê pêşketine wan ye deme wan bi jiyana wan re ye ku buhurti dikin. Ev yek her weha girîng e. Di wêje berê de gelek pêşketin bûna. Em tenê bi kifşkirina huinek nirxna û an ji hinek destanna, em wê kifşnakin. Em kengî ketine wê de û me jiyana wê kifşkir û li gor rastiya wê hanî ser ziman û felsefe jê derxist û hanî ser ziman, hingî em karin bêjin ku me wêje wê demê kifşkiriya. Ew şaxsiyetên ku di wan demên berê de têne ser ziman bi axiftin û nirxên ku têne ser ziman ji, nirx û hizir û di asta herî bilind de felsefe wê tênine ser ziman. Di vê yekê de felsefe wan deman ji tê kifşkirn. Deme ku hate nivîşandin, li gor xwe nivîsandin, wê tenê weke nivîsanaka roje mebê. Lê wê ew deme ku têde dihate xwestin ku werênine ser ziman wê nebe. Ew dem, bi nirxên

xwe ve heya. Bi kevneşopî û dîroka xwe ve heya. Ev têde têne ser ziman. Ev yek her weha wêje dixwezê ku werêne ser ziman.

Wêje kurdan, ye demên berê kifşkirina wê hê wilo ne hatiya kirn. Bi vê yekê re em vê gotinê ji bêjin û bêjin ku jiyana wan demên berê hê bi tememiya xwe ne hatiya kifşkirin. Bi vê yekê re weke ku me di hevoke berî ve hanî ser ziman de, me wêje û jiyan weke dibêjeyan danî cem hevdû û pê hanî ser ziman. Bi yekê ye wêjê, me nirx û kevneşopî hanî ser ziman û bi ye jiyanê ji, her weha hebûna jiyanê ye ku hatî jîn kirin hanî ser ziman. Di asta bilind de ji, ev bêje dibine yek û di nivîsandina wêjê de dihanîna ser ziman tênine ser ziman. Bi vê yekê, wêje hebûna xwe bi jiyanê re dike yek.

.

## CÎHANA WÊJÊ

Gotina cihana wêjê, gotinaka ku mirov wê tenê di bin serekekê de bêne ser ziman a. Ji ber ku ev gotin pir giring e. Ev gotin hate ku newê fahm kirin, wê bi rastî ji di pêşketine wê de ketina riyaka baş de nebê. Ji bet vê yekê divêt ku mirov vê gotinê pir baş û qanc fahm bike. Wêje, cihanê wê heya. Ew cihanê wê, bi qasî ku cihana wan nirx û nirxdarên ku têde têne ser ziman, wilqasî ji cihana wêjevanên ku rast wêjewan in. Her weha divêt ku mirov vê yekê bêne ser ziman. Wêje, di cihana xwe de rastiya xwe têne ser ziman. Rastiya cihana wêje çawa tê afirandin? Ji aqil, xiyal û rastiya ku hati jînkirin bi hatin awê ye ser ziman diafirê. Her weha amûrên wê yên afirandinê ne. Lê hertiştê ku aqil di xwe de kifşkir ji têde tê ser ziman. Ev yek ji her weha heya.

Cihana wêje, divêt ku mirov wê çawa ku weke ku cihana xwe diadilêne û di ahangekê de têne ser ziman, divêt ku mirov wilo wê ji bi afirêne û bêne ser ziman. Di vir de, di vê xalê de dem bi dem li ser vê kirina di hundurê cihana wêjê de nîqaşên rastî û nerastiyê hatina kiirn. Lê hemû nîqaş ji hatina û li sînorê "divêt ku rast bê" û an ji " divêt ku ji rastiyê û hebûne wê ye jiyanê ne dûr bê" tê û disekinê. Ev yek ji ber çi wilo ya. Ji ber ku ya herî rast ew e. Ji ber ku rastî her timî di jiyanê de dijî. Deme ku tiştek ji wê tê ser ziman, êdî ew ji dibe hatina rastiyekê ya li ser ziman û êdî ew ji dibe rastiyaka ku hatî ser ziman. Her weha ev yek wilo dibêt. Divir de, rastî, di cihana wêjê de hertimî dixwe de û di mirov de di şer de ya. Divêt ku mirov vê ji bi teybet bêne ser ziman.

Rastî, ji nirxbûn û hebûna nirxbûnê ne dûr e. Di felsefê de nîqaşa rastiyê ku ka çiya û çawa ya û bi çi awayî ya, bi awayekî din xwe barî hundurê wê dike. Ji ber vê yekê, wêje cihanê wê pir girîng e. Jiyan bi xwe ya û hatina ser ziman ye jiyanê ya. Ji ber hatina ser ziman di wêjê de wilqasî girîng e û divêt ku girîng bêt ji? Ji ber ku ew rastî di nav civakê de di be perspektife bi rê ve birina jiyanê û pêre ji rastiyê.. Her weha divêt ku mirov divir de vê yekê bi di cihana wê de bike nîqaşê de û li ser bisekinê û wê fahm bike. Fahm kirin, di wêjê de bêjeyeke ku ji dev derdikeve ya. Lê bêjeyeke ku rastî ji têde têgihiştinek di wêjê de heya.

Hebûn û rastî, rastî û jiyan, jiyan û mirov, mirov û kirin, kirin û hizir, hizir û felsefe, felsefe û wêjê û hwd ku mirov karê vê her weha pir dûvdirêj bike, di cihana wêjê de hertimî wate xwe dixwezin.

Ez bixwe ji, cihanaka wê ye ku têde felsefe ne bizimana ne hiziir im. Ji ber ku cihanaka wêje yê bê felsefe, weke ardekî ku ji bêaviyê qalişiya.

Bi vê yekê, divêt ku mirov wêjê fahm bike û cihanê wê di wê de biadilêne. Cihana wêjê, kengî baş û qanc hate adilandin û rastkirin, hingî mirov karê bêje ku wê pêşketine baş û qanc û di cih de wê di nav civakê de di demê de wê bibe. Bê ku em vê bikin û

bahse pêşketinê bikin ji, ji hizrekê an ji nêhtekê pêve wirde naçê. Divêt ku mirov wê ji her weha bêne ser ziman. Rasti divir de divêt ku mirov wê kifş bike û bêne ser ziman. Rastî çiya? Rastî di vir de, hebûna ku heya. Hebûna hatiya afirandin a. Wêjê di vir de ji, di xwe de car bi car di şer de ya. Rastiya ya ku têde hatiya afirandin û hatiya ser ziman e, an ji ye ku li jiyanê heya. Rastî ya ku li jiyanê ya. Lê deme ku dikeve hundurê wêjê de û têde tê ser ziman ji, her weha êdî ew rastî dibe rastiyê ji wê rastiyê ji. Wêjê bi vê yekê hertimî di nîqaşaka bi rastiyê re ya. Ev nîqaş ji, ku civakak bixwezê bi pêşkeve, divêt ku wê nîqaşê fahm bike û derxe têgihiştinê. Ji ber ku wêjê bi wê têgihiştine di xwe de ew rastiya wê û ye ku haye derxistina têgihiştine. Wê hingî, werine asta hevdû. Asta civakê û ye wêjê ji di vir de mijara ku mirov di wêjê de bêne ser ziman a.

Rastî, di vir de ji ber ku rastiya civakê ya, li gor wê tê ser ziman Civak bi wê rastiya xwe di têgihiştineka mazin de ya. Lê belê ji ber ku hê bi tememê ew derxistiya têgihiştinê, li gor demê cerna, êdî wêjê bi hildana wê ye li nav xwe, êdî derdikeve pêşiya wê. Bi vê yekê re, civakê an ji mirovên nav civakê, çendî ku ew fahm kirin, êdî wê bigihine wê astê. Lê cihana wêjê ji ber ku hemû pêşketin û têgihiştinên civakê di hildê nava xwe, êdî mirov karê bêje ku yê ku xwe gihanda wê astê têgihiştine wêjê ye ku têde heya, ew mirov mirovê ku xwe ji xwe buhurandî ya. Wêjê ji, hingî wê yekê weke mirovekî biaqil erê dike. ...

Li ser wêjêye kurdî û hebûna wê û têgihiştine wê hê wê nivîsandina me wê berdewam bike. Divêt ku ji berdewam bike. Ji ber ev mijar î ro di roje me de pir girîng e. Kurd, ji her demê zêdetir divêt ku vê yekê her weha fahm bikin û li ser sekin in. Hebûna wêjê, ji bo pêşketin, têgihiştin û pêşveçûna civakê pir girîng e. Divêt ku mirov li ser bisekinê. Li ser cihana wêjê divêt ku mirov hê bêhtir bisekinê û wê fahm bike. Divêt ku mirov wê pir hesanî ne hildê dest. Ew pir girîng e û pir mazin e ji bo pêşketin û pêşveçûna civakê.

Rastîiya cihana wêjê her weha divêt ku mirov hinekî dî ji li ser bisekinê. Emê di hinekî nivîsên din yên di berdewam wê de bi teybetî li ser cihana wêjê ye hundurê wê bisekinin ku ka divêt ku çawa bêt. Zanistên weke Êlî Herîrî, memeyê Cizirî, Feqiyê Teyran û Bi teybetî ji Ahmedê Xanê, demeku di afirandin, her weha diketina wê cihanê de û li gor wê cihanê diafirandin. Ji ber vê yekê û sedeme wan mazin afirand. Ji ber vê yekê Ahmdê Xanê Mem û Zînê pir mazin di nivîsêne. Ji ber ku ew dikeve cihana wêjê de û di wê cihanê de têkiliyê ji cihana ku têde di rastiyê de dijî û ji deme xwe qûtnakê û têne ser ziman. Ev yek, pir girîng e ku mirov wê kifş bike û bêne ser ziman.

Rastiya wêjê û hanîna wê ye li ser ziman, bê ku mirov her weha cihana wê fahm bike, mirov wê nikaribe wê baş biafirêne. Mirov wê nikaribe wê mazin biafirêne. Divêt ku mrov vê yekê ji ber weba bi teybet bêne ser ziman.

Rastiya, hizir û têgihiştinê ji wê û hebûna wê ne dûr in. Bi vê yekê, em vê ji bênine ser ziman û bêjin, ku divêt ku mirov wêjê ji têgihiştina hanîna hinek vegotinna xilas bike. Bi vê yekê re divêt ku mirov bi zanebûn û têgihiştin û cidî nêzîkatiyê lê bike. Cihana wêjê kurd, kengî hate afirandin, wê hingî, kurd, di pêşketine xwe de sînor nas nekin. Ev ji dikeve ser milê wêjevanên kurd yên ku vî karî dihildina cidîyetê.

Wêje kurdî, her weha di rastiyê de deme ku mirov lê dimeyîzenê û lê dihizirê, mirov rastiyaka wê ye pir mazin ji dibîne. Ew rastiya wê ji her weha cihana wê ya pir mazin e. Ahmedê xanê pir mazin nivîsand. Ahmedê Xanê yê wê cihanê bû. Wê ew cihan pir baş û qanc fahm kiribû. Di wê cihanê wêjê de ji rastiyê wirdetir, wî hewl dide ku têgihiştine rastteqniyê ji bibîne û fahm bike. Ji ber vê yekê ev yek pir girîng e. Ev kirin û hizirkiirn

û pêşketin, piştî wî di sadsala me de hê ji nû ve hatiya kifşkirin. Wî hê di wê demê de di xwe de û di wêje kurdî de kifş kiribû. Bi vê yekê wî mazin hanî ser ziman. mem û Zîn, li jiyanê dû mirovna ku rast dijîn bûn. Lê wî deme ku ew dîtin û ew evina wan dît, êdî wê têgihiştine xwe û ye wê cihanê wê ew bi nivîsandina xwe mayînda kirin. Rastî, di vir de di hebûna wêje kurd de pir sîmset e. Rastiya di wêje kurd de bi vê yekê û awayê tê ser ziman, hê wilo baş û qanc ne hatiya fahm kirin. Ku hatiba, fahm kirin, wê û pir baş pêşketineka mazin bihate jîn kirin. Lê ne hatiya fahm kirin. Bi vê yekê, divêt ku zimanê xwe fahm bikin. Ji bo fahm kirinê ji, divêt ku têde perwerdejiyaka mazin hildin. Pê mazin bibin. Ev yek rastiya wan ye ku her weha bi wêjê tê ser ziman, wê wan pê bide naskirin û bike ku ew wê fahm bike. Bi vê yekê, êdî wê karibin wê cihanê fahm bikin û têde mazin bikin û pêşketinên mazin yên dîrokî jîn bikin. ..

.

**DI WÊJÊ DE HIZIRKIRINA XIYALÎ**

Li ser wê û bi teybetî ji li ser wêyeya kurdan, ku mirov hinekî kur dibê, mirov gelek aliyên wê yên ku mirov bêne ser ziman dibîne. Di serî de, ku mirov zêde dem neke û herê deme Ahmadê Xanê, mirov li wir ji berhêmên pişketineka mazin ye ku mirov wê bêne ser ziman dibîne. Di vê beşa nivîsê de, emê bi teyebtî li ser cihana wêje û pêşketine tê de bisekinîn. Ev yek pir girîng ku mirov fahm bike. Cihana wêjê, hundurê wê û rastiya wê û têgihiştina wê divêt ku were ser ziman. Wekeî din ji, deme ku ew were fahm kirin û têgihiştineke baş û qanc di derbarê wê de bibe, hingî, mirov karê bêje ku mirov wê pêşketinê bi çi awayî û rengî ku tê de pêşketiya ji bibîne. Pêşketine hundurê cihana wêjê, pêşketine têgihiştine civakê ya. Ji ber vê yekê, hewceyî pê heya ku were ser ziman. Deme ku ew were ser ziman, hingî têgihiştin û felsefe civakê bi hizre xwe û dîroka xwe re tê ser ziman. Ev yek her weha ji bo pêşketineke dîrokî ji, kifşkirina wê ji pir girîng e.

Bi vê yekê, li ser cihana wêjê li kurdistanê sekinandin ji, mirov wê bigihêne hinek têgihiştinên din yên ku di demên berê de bûna ji. Cihana wêjê, minaqa cihana cihanê bixwe ya. Her weha divêt ku mirov vê yekê biteybet bêne ser ziman. Civak di xwe de di nava xwe de çû pêşketinê dijî û jîn dike, ew pêşketin bi têgihiştine xwe re xwe di hebûna cihana wêjê de têne ser ziman. Bi vê yekê re, bêje ku hevokên ku têde tên ser ziman ji hinekî girîng dibin. Bi vê yekê, rastî fahm kirin û hanîna wê ya li ser ziman birastî ji di vir de girîngiya xwe radixe berçav. Rastî, di vir de, bi du awayan heya û tê ser ziman. Yek, wêje dixwezê ku li gor rastiya ku hatiya jîn kirin hatina wê ya li ser ziman a. Ya din ji, her weha di wê rastiyê de bi têgihiştineke rast kurbûn e. Ev herdû alî ji, di aliyekî ku mirov wê bi hebûna wêjê re bi navê cihana wê re bêne ser ziman re dibe yek. Ev yekbûn, hebûn û têgihiştine civakê ye ku pêşketî û ye ku hatî jîn kirin û ewe ku hatî jîn kirin ya ku hatî nivîsandin û hatî ser ziman de tê ser ziman. Bi vê yekê, hebûna pêşketinê bi hinek awayna di wêjê de xwe bi wate dike û têne ser ziman.

Wêje, cihana wê, rastiya ku di xwe de bicih dike û têne ser ziman, wê rastiyê di xwe de wilo bitenê nahêlê. Wê rastiyê de di hundurê xwe de bi tehereke têgihiştine ku hebûna astê û radê ji divêt ku mirov li berçav bigirê, pê, hebûna wê mazin dike. Her weha têgihiştin bi gelek aliyan di vir de mazin dibêt. Wêjê, bi vê yekê jiyana civakê ye demî ye ku hatiya jîn kirin, di xwe de bi nirx dike û dihildê demên pêşarojê yên ku wê bên. Her weha vê barî di dêne ser milê xwe di pêşketinê de.

Bi vê yekê re, di nav xalkê de hizir ji aliyê felsefe û dîrokê ve, û her weha hê ji gelek aliyên din ve bi awayê hatî ser ziman û hatî jînkirin hebûne wê tê parastin. Bi vê yekê, ew ji ji demên piştre dibe têgihiştinek ku jê fêr bêne derxistin. Bi vê yekê, wêjê, hebûne felsefeyekê ku têde bicih e û bi wê tê ser ziman ji di afirêne. Bi wê felsefê, ew di xwe de ji bidîrokê û nirx dibêt. Di şaxsiyet û keseyetên ku têde hatina ser ziman de, nirxek bi wan re tê ser ziman. Ew nirx bi gelek awayan tê ser ziman. Di nav civakê de aliyên civakê yên ku hene hempka bi hev re cûr bi cûr dihêne ser ziman. Wêjê, bi vê yekê, êdî xwe weke têgihiştine demî ji dihêne ser ziman.

Di wêjê de hizirkiirn û awayê hizirkiirnê heya. Ew hebûne ku heya têne berçav. Di wê yekê de mazin têne ser ziman. Wêjê, weke jiyanê, ku ka çi têde heya, jê gohn dixwe û pê xwe diafirêne.BI vê yekê wêjê, nirxeke felsefî bi hev re xwe re di nav cibvakê de ji di demên pêş de diafirêne.

Nahaka em di cihana wêjê de li ser hebûne têgihiştin., hizir û felsefe rawastihin. Ev di vir de pir girîng e ku mirov wê fahm bike û bêne ser ziman. Wê mirov di pêşketin û têgihiştine wêjê de bigihêne hinek rastiyên ku divêt ku mirov wan zanibe û li gor wan gav biavêje ji.

DI CIHANA WÊJÊ DE FELSEFE, HIZIR Û TÊGIHIŞTIN Û PÊŞKÊTINE WÊ YE DEM BI DEM ...

Rastî ku mirov di vir de dihizirê di cih de tê bîra mirov. Bi hatina bîra mirov ji, her weha mirov di nav hizrên ku mirov di nav herê ji bi hebûna xwe re dibêt. Berî ku em her weha herîn, em di vir de careka din bi gotinekê ji bê rastiyê bênine ser ziman. Rastî, di vir de ya ku hatiya jîn kirin û hatiya ser ziman û têde biwate bûya ya. Bi vê yekê re rastî, di wêjê de dibe xwediyê teybetmendiyekê ku mirov wê fahm bike. Ew teybetmendi ji, deme ku mirov li ser dihizirê, hizre ku di serê mirov de dibe ji, her weha ew e ku mirov bêje ku rasti di wêjê de bi serê xwe re bi hebûne ku têde dijî ji ya jiyanê hinekî çudatira. Bi vê yekê re, weke ku me di demên berê de hanî ser ziman, hinekî nîqaş bûna li ser rastiya ku di hebûne cihana wêjê de tê ser ziman de. Rastî, di vir de, deme ku di wêjê re lê hate lêgerîn, hingî, bi awayê ku hate ser ziman, mirov di jiyanê de bitêgihiştin dike. Lê deme ku di wêjê de tê ser ziman, bi wê awayê ku di jiyanê de hate ser ziman û mirov bitêgihiştin kir ji wê zêdetir ji bi awayê ku di cihana wê de hate ser ziman ji mirov bi têgihiştin dike. Têgihiştine wê ye di vir de ye di wêjê de bi xosletên wêjê tê ser ziman. Bi vê yekê, rastî, weke ku li jiyanê tê ser dîtin, di wêjê de tê dîtin û ser ziman ji. Her weha mirov wê dibîne.

Wêjê di rastiya xwe de bi hebûn û nirx e. Bi vê yekê, ew rastîya wê, di weke ku di jiyanê de hatiya ser dîtin û jîn kirin tê ser ziman. Lê dem ji ber ku di herikê diçê û nasekinê. êdî di vir de, di wê rastiya wêjê ya ku di cihana wê de heya, cudabûn derdikeve holê. Ew çûdabûn ji, bi hebûna demê re derdikeve holê. Dem di vir de, rastiyê xwe, weke ku hinek wêjevan ji tênine ser ziman, êdî vir de bi hebûneke ku ji metafîzîkê ne dûr têne ser ziman. Di vir de, çend ku ji demê qutbûn çêdibe, wilo ji bi demê re bibûna weke têgihiştineke felsefî re di jiyanê de di pêşketine jiyanê de têgihiştin dibê û tê ser ziman. Ji ber ku di demên ku di piştre tên de ji, di dem re di ahangekê de hebûne xwe di parezê û dide berdewam kirin, êdî di vir de di pêşketinê de bi bûna nerîn re pêşketinê dide çê kirin. Nerîn, di vir de, di wê awayê wê yê ku heya de, weke nerîne li jiyanê ya. Di wê nerîne de di wê ahange wê de li jiyanê nerîn ji, mirov bi jiyanê re dide hizirkiirn. Bi vê yekê re, têgihiştine ku dibê ji, êdî dibe têgihiştina têgihiştinê di demê

de. Nerîn, ji ber ku hatiya nivîsandin û bi wê nivîsandinê kalib standiya, êdî her weha bi vê yekê re ji vê yekê re dibê temên û û hîmê pêşketinê. Pêşketin, bi vê yekê re, deme ku mirov bi cihanaka weke cihana wêjê re lê dimeyîzenê û dihizirê, ji ya cihana ku mirov têde dijî û di ahangê xwe de bijiyana jiyandinê diharikê û diçê ne cuda ya.

Di vir de, nerîn, têgihiştin, dîtin û dîtina ji dîtinê, weke hinek gotinna ku mirov wan fahm bike ne. Di vir de, Bi têgihiştinê re, nerîne ku bi afirandinê re hatiya afirandin çendî ku xwediyê nerîne xwe ye, her weha ew nerîn, êdî di mirov de bi hebûneke ku mirov ji têgihiştineke weke têgihiştineka ku di ahangekê de diharikê û diçê jê dûr neyêne ser ziman xwe diafirêne û dihêne berçav. Wêje di vir de di cihana xwe de bi afirandina xwe re astaka têgihiştinê di wê nerînê de didêne holê.Ew ast, asta wê cihanê ya ku mirov wê bi felsefeyeke têgihiştinê fahm bike ya. Asta têgihiştinê di vir de çi ya? Ji aliyê vê cihana wêjê ku mirov bi pirsê, mirov bersive ku bidiyê de wê ji demê û hebûne demê ne dûr be. Divêt ku mrov demê li berçav bigirê. Dem, di vir de, bi hebûna xwe ye ku tê ser ziman re, bi vê yekê re bi wate ya. Dem, di wê demê de bi demên ku di civakê û di pêşketine wê de hatin jîn kirin re tê ser ziman. Çend, dem hatina jîn kirin? Divir de, êdî ev pirs weke pirseke tememkirnê tê pirsîn û li bersive tê lêgerîn. Bersive wê, wê mirov bi dîrokê û têgihiştine wê re mazin di derbarê wê cihanê de bi fahm bike. Lê ew cihan, her timî. weke mirovekê ku her timî, di demeke nûjen de ku li gor pêşketine ku dibêt, mala xwe hertimê dixwezê rayixe û radixe, her weha bi wê re tê berçav. Ew ji, her weha hertimî xwe li gor wê radixe. Lê wêêje û cihana wê, çendî kui xwediyê gotine deme ji bin, ji ber ku ne weke ye di jiyanê de bi herikandinekê ya, her whea êdî, her timî di xwe de hewldana herikandinê dide. Bi vê yekê, şerê di cihana wêjê, yê xwe afirandinê yê li gor demê ya. Bi vê yekê re, demên ku têne ber wê, ew dixwezê ku di xwe de bi her alî û awayê wê û nerîne ku tê dîtin bêne ser ziman.

Têgihiştin, di vir de, di wêjê de ciqasî ku xwe li ber bêje deme di wê sekinadinê de bigirê? Li ser vê prisê, bi têgihiştineke demê ku mirov wê fahm bike bi felsefê re mirov karê bersive bidiyê de. Rastî, têgihiştin û dem, her weha di wêjê de ji jiyanê cudatir xwediyê pêşketin û têgihiştinê ji. Her weha ev ji divêt ku werine ser ziman. Bi hatina wan re, cihana wê, xwe bi pêş dixe. çendî ku her weha bi wê hatina ser ziman xwe bi pêşxist ji, êdî pêşketineke dîrokî di nav xalkê de bi xwe re dide çê kirin.

Wêjê, li gor felsefe jiyanê, dixwezê ku di herikînê de be. Lê bi baxtê jiyanê yê herikîne wê re baxtê wê nabe yek. Bi têgihiştine wê ye demê re dibe yek. Lê deme ku piştre hat ji, wê bi pêşketine nû were re û ew pêşketine ku bû ji, ku weke xwe di wêjê de hanî ser ziman, êdî wê demeke nû bi xwe re bêne. Di wêjê de, ji demekê buhurîna demekê re têgihiştin ji, ji demekê buhurîne demkê dijî. Di wê jiyandinê de pêşketine ku bû ji, wê bê pêşketineke ku civakê pir mazin bi rê ve dibe û bi pêşketinên ku li şûn xwe hiştina ji, wê gihêne gelek nirx û kevneşopîyên mazin yên ku bûna. Statûqû ji ji vê yekê karê xwe biafirêne. Lê statûqû, ku diafirê, çendî bi vê yekê nikarê bê wê bijî ji wilqasî ji di hebûne xwe ye ku pê dijî de di demê de bi cihana wêjê re heya ku bikeve nav nakokîyên mazin de ji. Statûqû, bi têgihiştina xwe re bi wê re dikeve nakokiyê de. Ji ber ku wêje cihana wê bi renge, êdî ew ji ji ber ku li gor xwe dixwezê, êdî ketine berhevde dibêt. Cihana wêjê, peresendina wê ye ji demê hate demê, wê dike dij statûqûtiyê. Cihana wêje, divêt ku mirov wê fahm bike ku bi pêşketine di xwe de ye çê dike re, têgihiştina felsefê bi jîr di xwe de diafirêne. Felsefeyeke ku bi têgihiştina jîrî were ser ziman, hertimî di nav têgihiştina wêjê veşartiya. Bi qasî felsefe wêjê ye giştî felsefe

cihana wê ye hundurê wê ji, fahmkirina wê pir giring e. Wêje, bi qasî ku pêşketinên deme xwe ye ku têde dijî dixwêne û bi xwe re dihêne ser ziman, her weha yên demên xwe yên buhurti ji, ji xwe re dikê têgihiştinaka bingeh û bi wê ku bi kevneşopî bi rê ve dibê û bi wê re dibe xwediyê pêşketinekê xwe ye demî ku mirov bi navê demkirina wê têgihiştina xwe kevneşopîya wê ya.

Wêjê ji aqil diafirê. Aqil ji, ji jiyanê fêr digirê. Aqil, li gor xwe bi hinek rê û rêbaz e. Lê bi vê yekê ji diafirêne. Aqil, deme ku afirand, di deme ku afirand de di wê demê de li gor vaca xwe ye ku heya diafirêne. Lê di vir de, pirsgirêke demê weke sihekê xwe diberde ser wê vaca wê de. Di demên pirştre de, deme ku di herikîne di jiyanê de pêşketin bûn û li gor wê ne hate berdewam kirin, êdî weke goleke avê ku ne herikê û tim û dayim di cihê xwe de sekinî ya, ew ji dimêne sekinî. Ev yek ji, deme ku bû, êdî wêjê, heya ku bi nêzîkatiyaka ku weke car bi car di felsefê de tê ser ziman bi navê binavê deme ku têde mayî ji tê bi nav kirin. Bi vê yekê re, ye ku tê berçav ji, weke ku di demê de bê asêkirin ji tê berçav. Ev gotin, gotina di hundurê deme de êdî biwate dike. Ev ye li gor demê ya. Lê bi çi awayî afiriya ji, di vê yekê de dibe xwediyê gotinê.

Bi vê yekê, divêt ku mirov vê yekê ji bêne ser ziman. Dem bi dem, wêjê hatina xwe ye li ser ziman û afirandina xwe ji mirov ji bo pêşketinê dixwezê. Ev çend ku bû, êdî mirov karê bêje ku wê pê pêşketin bibe û derkeve holê. Pêşketine ku wê bibe ji, wê civakê bi xwe re bi pêşve bibe. Her weha ev yek di vir de girîng e ku mirov wê fahm bike. Dem û afirandin, di vir de bi hev re ji mirov ahangekê ji bo xwe dixwezin.Ew ahang, çendî ku bû ji, her weha êdî wê pêşketin li gor wê bibe û derkeve holê. PêşKetine cihanê wêjê bi vê yekê re bi cihana li jiyanê ye ku di herikandinê de dimeşê.Ev meşandin, êdî dem bi dem ku dibe, êdî pêşketineke mazin ye demî dibêt.Hizir, di vir de, bi vê yekê girêdayî divêt ku mirov wê bêne ser ziman. Hizir bi awayê xwe yê felsefê re di vir de afirandinê dixwezê. Wêjê di jiyanê de jê re dibe temen ji. Lê wêjê, çendî ku jê re bû temen, her weha ewçendî ji ew di pêşketine wê ye bi hizir re de weyn dileyizê.

Cihana wêjê, her weha divêt ku mirov wê hinekî ji aliyê wê yê hizir û têgihiştinê ve fahm bike. Ev yek ji bo pêşketineke mazin ye di wêjê de girîng e. Ji bo wêjê, hebûn û pêşketin û dîrokê civakê bi nirx û kevneşopî û gavavêtinên xwe re were fahm kirin pir girîng e. Ev fahm kirin, têgihiştine cihana wêjê diafirêne û bi awa dike. Her weha divêt ku mirov wê fahm bike. Wêjê, rengê civaka xwe têne ser ziman. Bi vê yekê û fahme ku wê bibe wê têne ser ziman. ..

DI WÊJÊ DE RASTÎ Û TÊGIHIŞTIN Û BERDEWAM BÛN ...

Di vir de, em hinekî divêt ku li ser demê û pêşketine demê bisekinîn. Ev yek, weke ku pêdivî pê heya. Di wêjê de, dem bi felsefê re dirabê û dirûnihê. Bi vê yekê re, dem, her weha di wêjê de ku afirandin bi hebûna afirandinê re weke ku bêdemiyekê ji têne ser ziman. Lê ew bêdemîye ku weke ku tê dîtin, di hundurê demekê de tê dîtin. Bi vê yekê re hebûneke helezonî ku tê berçav heya. Wêjê bi vê yekê re têgihiştinekê dide çê kirin. Ev têgihiştin hizir û demê bi hev re di felsefê wê de an ji ku mirov karê bêje ku têgihiştine wêjê de dihêne ser ziman. Wêjê, di vir de bi vê têgihiştine re demîyê û bêdemiyê bi hev re dijî. Ev ji, ku were dîtin û li gor wê were afirandin û ser ziman, hingî, wê pir mazin were afirandin û ser ziman.

Felsefe di vir de, di vê beşê pir mazin wê bi gotin bibe. Lê emê bi temenê bi têgihiştinê û navê wê bênine ser ziman. Hebûn di vir de, di wêjê de, çawa tê ser ziman? Ew di vir de girîng e: Lê çawa ku di deme ku hate ser ziman de hate nivîsandin pêde, ew

nivîsandin, weke nivîsandineke têne bi xwe dimêne. Ew nivîs, ku ye wêjêyî ye, êdî derdikeve dervî wê nivîse ku deme wê ye ku ew têde hatiya nivîsandin têne ser ziman. Wêjê, bi vê yekê re, hinekî gerdûntiya xwe ji di denezêne. Ev yek, her weha divir de divêt ku mirov bi teybetî balê bi kişênine ser wê û bênine ser ziman. Gerdûntiya wêjê, ev aliyekî wê ya. Aliye wê yê bihizir, di têgihiştinê de ji hinek xalên weha yên di vê xalê de diafirêne. Minaq; rastiya wê ya ku têde hatiya ser ziman. Wekî din ji, ew rastiya ku wê hanîya ser ziman. Ev herdû ji jev cuda ne. Lê di wêjê de dibine yek û digihine hevdû.

Hizir(têgihiştin, aste wê ye ku heya ..), divir de, deme ku wêjê tê ser ziman, di asta wê ye demê de tê ser ziman. Lê di asta têgihiştine wê de ji ber ku were ser ziman, pir baş û qanc têgihiştine wê ye di mirov de pêdivî pê heya.Ku evnakê nebê, wê di rastiyê de di hatin ser ziman de, wilo zêde ti mazinatî nebe. Bi vê yekê re, wê di pêşketine civakê de wilo zêde ti weyne newê leyistin.

Wêjê, bi cihana xwe ye ku di xwe de diafirêne re, hebûneke ku mirov divêt ku wê pir baş û qanc fahmbike ya. Ew cihan, her weha rastiya civakê ye demê ye ku hatiya jîn kiirn ku têde hatibe ser ziman heya. Ji ber vê yekê wêje deme wê girîng e. Di vir de ev bêje demê ye ku me hanî ser ziman, ji ye ku me li jor hanî ser ziman di wate û têgihiştine xwe de hinekî jev cuda ne. Ye li jor ku me hanî ser ziman. me pê, têgihiştine ku têde lev gihiştiya hevdû û xwe bidîyarî weke têgihiştinê bi hebûneke felsefî dide berçav hanî ser ziman. Lê di vir de, me, deme ku hatiya jîn kiirn û buhurtiya hanîya ser ziman. Di rastiyê de, ku ev herdû bêjeyên demê yên ku bi têgihiştineke jev cude têne ser ziman, ku werine têgihiştin, wê werê dîtin ku herdû di hinek aliyan de ji bi hev re di pêşketinekê de ne. Gotine demê ya ku li dawiyê hanî ser ziman, di hebûne herîkîne demê de di ahangekê de tê ser ziman. Lê ye din, ne di wê ahangê de ya. Ew, weke têgihiştineke serwer tê ser ziman. Serwerîye wê ya wêjê ya ji. Ev cudatiya wan heya. Lê ji cudatiyê zêdetir du astên têgihiştinê yên ku diafirin in ji. Ev ji, bi nerînê, wêjê hem gerdûn dike û hemê bi civakî ji civaka ku ji nav derketiya dide nîşandin. Ew ji ew têgihiştine ku wê civakê daya çêkirin û haniya ser ziman a.

Wêjê, di vir de cihana wê, hizre wê ye ku têde heya, ji civakê û pêşketine wê ne dûr e. Lê her dem, di pêşketine xwe ye cuda de ya ji ye deme ku buhurandî ya. Wêjê, vê yekê, ku fahm bike. Wêje, bi vê yekê ji demekê buhurîne demekê re, ew dem weke demeke ku wê têde were ser ziman dibîne û wê hemdemîya wê demê bijî.. Her weha dibêt. Çendî ku ev pêk tê ji, êdî ne tenê wêjê, pêre civak ji di pêşketineke dîrokî de ya.

.

**Di wêjeya kurdî de vegotin û rengê wê.**

Bo ku mirov, di wêjeya kurdî de rastî û rengê vegotinê fahmbikê em, di serî de çend mijarên weke ´şahmaran´ ku wê û´pêjnnene giring ên wêjeya kurdî na wan hildina li dest. Ev vegotinên ku ew pirr zêde dihên nasîn wê zêdetirî wê karibê rengê wêjeyê jî bi me bide nasîn.

.Şahmaran, hevgirtin(sentez)aka çandî, bawerî û kevneşopî a civate kurd ku ji nirxên pîroz ên êzdatiyê ku li jîyanê serdest û serwer bûna, hatîya afirandin a. Şahmaran weke nirxekê, vegotinaka ku çandî, bawerî û kevneşopî ya civate kurd a û ji nirxên pîroz ên êzdatîyê hatîya afirandin a. Tefsîra şahmaran, heta roja me pirr li ser hatîya gotin. Herkesekî li ser wê tiştek gotîya. Di tefsira şahmaran de ji rengên ku di çêkirina wêneya şahmaran de dihê bikarhanîn bigra û heta ku digihijê her xatên wê yên ku her yekê di

xwe de karekterekî civatî dihawênê, weke nirxên pîroz û civatî dihênin kifşkirin û bikarhanîn. Gelekan jî, li gor xwe hanîya ser ziman. Heta ku dema ku bahse herêma ku çanda şahmaran lê bûya jî, li ser wê pirr jî hizrên cûda hatina ser ziman. Lê dema ku em wêneya şahmaran dihizirin, em li ser koka çanda şahmaran bixwe jî dibîna xwediyê hizirna. Wêneya şahmaran, dema ku mirov lê dihizirê û lê dinerê, mirov dibîne ku bi hersê rengên keskûsorûzer hatî çêkirin û xamilandin. Ji aliyekî xwe ve jî, ´mar´ û ji aliyê xwe yê din ve jî jineka. Tenê, ev dîmenê hebûna wêneyê şahmaran bixwe jî, car bi car bûya sedema pêşxistina hin şîroveyna di derbarê şahmaran de. Mar bixwe jî, weke dagera ´xirabiyê´ hatîya şîrovekirin û bi wê êdî ku bi wê re bahse jinê hatîya kirin, weke ´dagera xirabî û neqanciyê´ jî ji wê êdî bahs hatîya kirin. Di nava xalkê de gotinên di derbarê jinê de ên weke ´jin weke mareka bi jahra´ jî, hinekî ji wê şîroveyê xirab hatîya derhanîn. Bi vî rengî, gelek gotinên jinê xirab didina nîşandin hatina gotin.

Di vê temenê de jina ku hatî pîrozkirin, weke dagera xirabiyê tê ditin. Mar jî, ji nû ve hat şîrovekirin û weke dagera xirabiyê hat ditin. Bi vê re, êdî li ser van şîroveyên bi vî rengî re êdî şîrovekirina şahmaran jî hatkirin. Şahmaran, ku ji hinek nirxên pîroz ku hatiya afirandin û çêkirin, wê piştre bi şîroveyên xirab û vajî wê were şîrovekirin.Bi tememî, di şîrovekirinan de beravajîkirinek dihê kirin. Li ser vê beravajîkirinê re hem şahmaran tê ser ziman û hem jî êdî bahse êzîdîyê jî dihê kirin. Lê li ser koka wê tefsîrê, bi wêneya şahmaran re, zêde kûr çûyin jî nebûya. Tenê li dîmen û ankû wêna hatîya nerîn û êdî nerîn û hizir hatina afirandin di derbarê wê de. Bi vê yekê û rengê êdî bahse şahmaran hatîya kirin. Lê ev jî, nebûna hin hizirna ku bi awayekî rast û pak ku wê tênina ser ziman in. Ji aliyê ´mîtolojikî´ ve jî lê hatîya nerîn. Bi vê yekê û rengê, hin şîrove jî li ser wê hatina pêşxistin. Lê ew jî, nebûna têr ku wê baş tênina ser ziman.

Şahmaran, berî hertiştî ew çanda wê û temenê ku ew bi aqil li ser wê hatî afirandin, yan ne hatîya zanîn û yan jî ne hatîya dîtin. Bo ku mirov wê temenê fahm bike, divê ku mirov li dîrokê binerê. Bi teybetî, divê ku mirov li dîroka olê û pêşketina wê binerê. Li vir, dema ku em li hersê rengên weke keskûsorûzer dinerîn, em dibînin ku di nava wê çanda yazdanîtîyê de pîroz in.

Ev rewş, çend ku weke rewşna ku ji hevdû cûda jî bin, rewşên ku hevdû temam dikin in. Şahmaran, weke hevgirtin(sentez)eka ku ji nirxên pîroz ên êzdatiyê ku hatîya afirandin a. Wêneyê şahmaran, dema ku tê çêkirin, sê rengên pîroz ên keskûsorûzer, marê reş ku pîrozîyek lê hatîya baxşkirin û jina ku ji her aliyê ve hatîya pîroz kirin, tên esas girtin. Şahmaran, bi serekeyî ji van hersê nirxan dihê çêkirin. Di dema çêkirina wêneya şahmaran a bi "naqş" de jî, hertimî ew hersê rengên kesk, sor û zer tên esas girtin û bi wan dihê çêkirin. Di nava kurdan de, di malên wan de ku weke "xalîçeyên ku bi hêtan ve dihên dalaqandin" hena, hertimî xalîçeyên naqşkirî na û ev xalîçe li ser wan nirxên pîroz ên weke şahmaran û hwd, dihên çêkirin. Di her malên kurdan de, ev xalîçe dalaqandî hena.

Di çêkirina "naqşaya şahmaran" de, tiştekî ku mirov li vir pirr bigiringî balê bikişêne li ser jî ew a ku "çavên şahmaran" hertimî pirr bi balkêş û xweşîk dihên çêkirin in. Dema ku naqşaya şahmaran were çêkirin jî, wê giringî lê wê were dayin ku çavên wê bi balkêşî werina çêkirin. Dema ku yek çû û li ber wêneya şahmaran sekinî, divê ku weke çavên şahmaran li ser wê bin dihê çêkirin. Ev, ji wate dayîna wê tê. Tê bawer kirin ku çavên şahmaran, hertimî li dunyê li ser mirov in. Di nava wan nerînên wê de, hemû demên buhurî û ên ku wê werin dibînê. Şahmaran, biqasî xwedîyê zanîna demên buhurî

ya, bi heman rengî xwediyê hizir û zanîna demên ku wê werin jî ya. Bo vê yekê, hertimî dihê bawerkirin ku şahmaran, ´biqasî ku dizanî ku di demên buhurî çi bûya û jîn bûya, bi heman rengê ku wê di demên ku werin de jî wê çi jîn bibe û werê jînkirin.

Dema ku em li rengê çêkirina wêne û ankû hevgirtina şahmaran dinerê, mirov fahm dike ku çandek pîroz a qadîm bi wê re heya. Di nava wê wêneyê de, ew çand bi hemû aliyên xwe ve dihê li berçav.

Li vir, mirov divê ku li ser vê rengê tefsîrkirina şahmaran jî bisekinê. Di demên berê ên gûtî, hûrî û mîtannîyan û hwd de, mirov dibînê ku bi vî rengî afirandin pirr zêde hena. Minaq, şêrê bi bask û ankû bi serê eyloyan û hwd hena. Ev jî, rengekî bi xosletkirinê ya. Ji aliyekî din ve jî, têgihiştina di derbarê xosletan û tevgeran de jî ku pêş dikeve jî radixe li berçavan. Mazin, bi qûdret û ankû pîroz dayîna nîşandin, di temenê wê tefsîrkirinê de heya. Bi heman rengî, weke rengê afirandina wêneya şahmaran, bi heman rengî dema ku melekê tawis jî dihê tefsîrkirin, bi tayrê tawis re dihê tefsîrkirin.

Çêkirina wêneyê Şahmaran, di nava kurdan de binaqşî, weke kevneşopîyekê ya. Di her malên kurdan de, hertimî xalîçeyeka şahmaran ku hatî çêkirin û dalaqandin heya. Ev bi serê xwe, weke kevneşopîyekê di nava kurdan de hebûna xwe parastîya.Kevneşopîya şahmaran, kevneşopîyeka dîrokî ku bi hezaran salan hebûna xwe heta roja me parastîya. Dema ku di roja me de jî, bahse vegotina şahmaran dihê kirin, dihê gotin ku "vegotina şahmaran, vegotinaka civatî a kurdan ku bi sed salan bi vegotina devkî heta roja me daye domandin." Vegotina Şahmaran, vegotinaka ku çandî, bawerî û kevneşopîya civate kurd a.

Vegotina gotina şahmaran, bi çandî û kevneşopî, bi demê re çandek mazin afirandîya. Dema ku naqşeya şahmaran bi destan jinên kurd çê dikir, her xat û qaytanaka wê ya ku çê dikirin, bi wateyekê çê dikirin. Wê bi kîjan rengan naqşeya şahraman were çêkirin û wê kîjan reng li kûderê di çêkirina naqşeya şahmaran de were bikarhanîn, ew jî dihat zanîn. Wek tê zanîn, di nava çanda êzdatîyê de rengên ´kesk û sor û zer´ pîroz in. Bi van rengên pîroz ew dihat çêkirin. Jin jî, di nava çanda êzdatiyê pîroz a. Ev pîrozîya di nava çanda êzdatiyê de heya bo jinê, bi hezaran salan di nava wê de heya. Êzdayetî, bi dîroka wê re, weke oleka yek-xwûdayî ya pêşî ku berî cihûtiyê, mesihîtîyê û misilmanteyê hebûya. Di vê temenê de, dema ku em lê dinerin, em dibînin ku di demên ên ku tên de, wê Mîtra li ser wê xatê were. Piştî wî re Zerdeşt jî li ser wê xatê wê were. Ev nirxên pîroz, bi tefsîrên cuda lê bi heman rengî wê di nava wan de hebin.

Ev rewş û kevneşopîya tefsîrkirinê, ku bi têgihiştinî hebûna xwe diparêzê, wê piştî Zerdeşt re bi Manî re jî xwe bide li der. Manî jî, wê di wê xate ´yazdanîtîyê´ de wê were. Piştî Manî re, Mezdek, hûrem û heta ku digihijê Babek û hwd jî, wê di wê xatê de werin. Em dikarin, bi Manî re, Mezdek jî, Hûrem jî û babek jî, weke demna teybet yên hemdem yên felsefikî di vê xate êzdatiyê de şîrove bikin.

Nirxên pîroz ên êzdatîyê, bandûra wan, li hemû rengên din ên bi bawerî ku dihên dibe. Her wusa, wê ev rewş heta roja me jî, hebûna xwe bide domandin. Di vê temenê de û di vê xatê de, nirxandina şahmaran û fahmkirina wê giring a. Şahmaran, weke hevgirtin(sentez)eka teybet ku ji nirxên pîroz ên di nava êzdatiyê de ku hena hatîya afirandin a. Dema ku em wêneya şahmaran dahûr(analiz) bikin jî, em vê rewşê bi awayekî vekirî dibîn in. Her sê rengên pîroz ên ku hena ên kesk û sor û zer, bi wan şahmaran dihê çêkirin. Her wusa bi wê re jin jî pîrozîyek li wê hatîya baxşkirin. Jin jî, weke nirxeka pîroz ku di wê çêkirina wê wêneya şahmaran de dihê ser ziman a. Her

wusa, mar jî, dihê bikarhanîn. Bi teybetî, ´marê reş´ jî, hinek wasif û baxşkirinên pîroz lê hatîna kirin. Î ro jî, dema ku mirov herê laleşê, mirov li aliyê devê dêrî ê dervê bibînê ku marekî reş hatîya çêkirin weke ku bi hêt ve bilind dibe. Ew jî, bi wê re di wêneya şahmaran de dihê bicihkirin û çêkirin.

Şahmaran, dema ku em wê hevgirtînîya wê fahm nekin, emê nikaribin, wê fahm bikin. Di hundurê wê hevgirtînîya wêneyê şahmaran de, çend nirxên pîroz hatina cem hevdû, mirov divê ku pêşî wan kifş bike. Ew nirxên pîroz ku di çêkirina wêneyê şahmaran de dihên cem hevdû, ku mirov wan dibînê, mirov êdî fahm dike ku şahmaran weke tefsîreka pîroz ya ku ji wan nirxên pîroz ku hatîya çêkirin a.

Ji vê aliyê ve, divê ku mirov vê yekê jî bi teybetî bibêje tefsîra şahmaran bi olî ji aliyê oldarên xate êzdatiyê ve di demên kevn de hatîya çêkirin. Di dema ku çêkirina de jî, bi wê bawerkirina ku wan ji nirxên xwe ên pîroz û mazin, nirxek çêkirîya. Rengê tefsîrkirin û çêkirina şahmaran, em bi teybetî, di dema Hûrî û mîtannîyan de rastî wê tên. Bi wê re jî, em divê ku vê jî bibêjin ku ne tenê bi Şahmaran re jî, gelek tefsîrên din ên bi vî rengî çêkirina. Minaq, "şêrê bi bask ku serê wî serê eylo ya" jî çêkirina. Bi vê re, xûy û tevgerên ku mazinatiyê dihên ser ziman, di wê de hanîna cem hevdû û ser ziman. Bi wê jî, hevgirtinek dane çêkirin. Ev rewş, di rastîya şahmaran de jî dihê ditin.

Şahmaran, ku xwediyê nerîneka jineka pirr xweşîk û sê rengên pirr delal in a, dihê berçav. Bi wê re jî, hertimî, dema ku ew tefsîra şahmaran dihê çêkirin û ku ew wêneyê şahmaran bi naqş dihê çêkirin, wê "tac"ek jî were danîn li ser serê wê. Ev jî, ji aliyekî din ve jî xwediyê wateyekê ya ku di vê ku mirov bi teybetî wê werêne ser ziman a.

Şahmaran, weke heyîn û hebûnaka ku li hemû jîyane serdest a dihê ser ziman. Di vê temenê de dihê gotin ku "şahmaran, temenê wê ser deh-hezar salan re ya." Bi wê re dihê gotin ku "şahmaran xwediyê hemû zanîna demên buhurî û demên ku wê werin a." "Nepenî(´sirra´)ya gerdûnê, wê şahmaran dizanê." Ev gotin, bi watekirina şahmaran û wasifkirina wê re dihênina ser ziman. Şahmaran, di temenekî wusa de dihê tefsîrkirin ku "şahmaran, dervî deman û dewranan dijî" ya. Di vê temenê de, bi navê şahmaran de, gelek vegotinên cur bi cur jî bi navê wê re hatina vegotin. Vegotinên bi rengê, "şahmaran, dem bi dem winda dibe ji jîyanê û piştre carek din derdikeve li holê di nava jîyanê de" jî, di vê temenê de dihên gotin.

Ev tefsîrên şahmaran, hemû jî, çend ku di rengê vegotinan de jî bin û weke vegotinên cur bi cur jî bin, lê yek jî ya din vala dernaxê. Di xatekê de, hevdû temem dikin. Di vê temenê de vegotinên Şahmaran, di derbarê şahmaran de divê ku mirov di çerçoveyekê de wan werêne ser ziman. Şahmaran, bi hezaran salan bi vegotinî bi devkî hatîya vegotin. Hertimî di civatên kurdan de, bi rengê ji devê dengbêjan û hwd, hatîya vegotin. Bi vê re jî, bi demê re di nava xalkê de bi çandî û kevneşopî, çandaka vegotinê ya şahmaran afirîya.

Di nava jîyane xalkê de wêne(naqşa)ya şahmaran, rengekî jîyanê bi xwe re afirandîya. Di jîyanê de, bi xweşîkatîya ku bi şahmaran re derketîya li holê, jîyane hatîya xamilandin. Lê bi wê re jî, li dora wê wêneya şahmaran jî, bi mejî re mirovan xwe girtinek jî li jîyane jîyan kirîya. Di vê temenê de, biqasî oleka yek-yazdanî weyn û roleka mazin ya şahmaran di jîyanê de bûya. Di nava kurdan de, dihê bawerkirin ku xalîçeya şahmaran ku çêkirî û di malê de dalaqandî, bereketê bi xwe re dihêne wê malê. Ev, weke bawerîyekê ya. Bi wê re, bi vî rengî gelek watekirinên din jî bi wêne(naqşa)ya

şahmaran re hatina kirin. Ev hemû jî, kevneşopî û çanda şahmaran a ku bi demê re afirîya û bi xwe re dihêna li holê û diafirin.

.. Dîroka Şahmaran, pir kevn e. Şahmaran, deme ku mirov li ser dîroke wê di hizirê, mirov pir dîrokeke kur e bi hizir di bîne. Di nava xalkê de Dîrok û çiroka Şahmaran ji heyemên berê ve berdewam dike. Di nava xalkê de weke wêne dagerîya rûmetê û xweşikbûn, hebûn û rastbûnê, jiyan û asilbûnê û hwd, tê ser ziman. Di nav xalkê de pir mazin bahsa Şahmaran mazin tê ser ziman. Ji demên berê ve bahsa wê tê kirin. Li ser wêne û dîroke Şahmaran, di nav kurdan de, ne tenê çîrokek tê ser ziman. Di demên berê de, li ser Şahmaran vegotin û çîrokên kud dihata vegotin, di wan de hinekî "bawerî" ji pir mazin tê ser ziman. Weke ku bahsa hizreke olî bê kirin, bahsa Şahmaran tê kirin. Deme ku bahsa wê tê kirin, bi rêz û hûrmet bahs tê kirin. Bi vê yekê, bi dîrok û çîroka Şahmaran ve, bi hizreke mazin ye civakî re gelek nirx û kevneşopîyên mazin hatina jînkirin û têne ser ziman. Deme ku bahsa Şahmaran tê kirin, bi rêz û hûrmet bahs tê kirin. Bi Zêdêyê li Herême botanê, di nav kurdan de, Şahmaran weke hizreke olî tê ser ziman. Weke ku berê lê bawerî dihata anîn tê ser ziman. Ev nêzîkatî, deme ku mirov diçê herêmên din yên Kurdistanê ji, mirov rastê wê têt. Lê divêt ku me bahsa hebûne şahmaran, me nêht kir, têne bi bêje û wateyên ku di nav xalkê de tê ser ziman û vegotin bênine ser ziman.

Şahmaran, hizreke civakî ye pir kevn e. Dîrokeke mazina vegotina Şahmaran di xwe de di afirêne. Deme ku bahsa Şahmaran hata kirin, pê re bahsa gelek nirx û hebûnên civakî yên di mên berê de jîn bûn, tê kirin. Di civateka kurd de, tê gotin ku deme ku bahsa Şahraman tê kirin û dîrok û çîroke wê tê vegotin, "heft şev û rojan bahs tê kirin û vegotin", lê nayê xilaskirin. Her weha Dirêj û mazin tê vegotin. Pir kur tê ve gotin. Deme ku bahs hata kirin û hata vegotin, jin û zarok, mêr û jin, malbatitî û hwd gelek nirx bi hev ve tê vegotin. Di nav xalkê de weke vegotinekê tê gotin ku " Şahmaran deh hezar sal jîn bû". Lê deme ku ev vegotin tê vegotin, pêre hinek vegotinên din ji têne ve gotin. Weha têne vegotin. Têne vegotin ku Şahmaran ji ber ku nêvî mar û nêvî mirov bû, karibû ku bi afsûna xwe xwe bi tememî weke mirov bide nîşandin û herê nava mirovan û bi wan re weke mirov bimêne û jîn bibe. Bi vê vegotinê re, dihata gotin ku Şahmaran pir qancî bi mirovan dikir. Her deme ku derdikete nava mirovan, ku mirovek di rewşeke zor de dîtiba, nêzîkî wî/wê dibû û çi ji destê wê bihatana jê re dikir. Bi vê yekê nave Şahmaran bi awayekî din ji derdikeve, bi aliyê wê yê mirov ve. Ji xaynî wê ji, ew hertimî weke Şahmaran, hertim hebûn dihata ser ziman. Li herême botanê deme ku bahsa wê dihata kirin, weke ku bahsa pîroziyekê bikin bahsa wê dihata kirin.

Şahmaran, nêvî mirov û nêvî mar bû. Bi vê yekê re, deme ku bahsa wê dihata kirin, dihata vegotin ku ew ji aliyê wê jin ve ku lê dihata meyzendin, dihata dîtin ku dinyê de, ti kesek weke wê ne xweşik bû. Ti kesek li ser wê re ne xwediyê xweşikatiyekê bû. Bi vî awayî bahs dihata kirin. Ji vî alî ve, deme ku bahs dihata kirin, ev vegotin; weke dageriyeke xweşkatiyê dihata vegotin. Deme ku ev vegotin dihata kirin, pê re, wêne şahmaran ye ku hatibû çêkriin li ber çavan dihata zîn kirin. Bi vê yekê bahsa Şahrama dihata kirin. Bi vê yekê re divêt ku mirov bêje ku Şahraman, ne tenê dageriya xweşkatiyê bû. Ew dageriya rûmet û hebûnê ji dihata dîtin. Ji ber vê yekê, di her malaka kurd de, wêne wê ye ku bidest bi naqş hatî çê kirin, hebû. Ew wêne, bi hêtan ve di hundurû de dihata dalaqandin. Mala ku wêne Şahraman têde bû, ew mal hinek ji xwe bi bawer bû. Hinekî li ser xwe bû. Di nav xalkê de bi rêz bû û bi tifre bû. Her weha mazin

bû. Her keçika dihata zewicandin, pê re dayika wê, "xalîçe"yeka ku wêne Şahmaran ku li ser hatî çêkirin didayê de û wê ji bi xwe re dibîr.Ev yek, weke kevnşopîyeka pir bi rêz û bi hûrmet bû. Pir rûmeteka mazin di vê kevneşopîyê de dihata ser ziman. Bi vê yekê girêdayî mirov divêt ku pîrozîyê ji bi Şahmaran re bi vê kevneşopîyê re bêne ser ziman. JI ber ku ev yek weha bi pîrozî hebû.

Li Şahmaran baweriyaka mazin heya. Deme ku bahsa wê tê kirin ji, ew bawerî tê ser ziman. Baweriye li Şahmaran, di xwe de xwediyê hinek xosletan bû. Ev xosletan ji, bi baweriye olî re pir çaran dihata navhevkirin. Di mala kurd, ku mirov bahsa wê bike, divêt ku mirov bêje ku pir xwediyê hebûneke mazin bû. Kevneşopîye wê ya mazin hebû. Li gor wê kevneşopîyê, nirxbûn hebû. Hizir û bawerî, kevneşopî û çand, mirov û civak bi hev ve girêdayî di wê kevneşoîyê de bi nirxne mazin dihata ser ziman. Şahmaran ev hemû, bi wê wêne xwe bi dager dikir. Ji ber vê yekê pir girîng bû. Wê Şahmaran di her malê de huzurek û rehetiyek dide çê kirin. Bi herkesekê di malê de baweriyek û ji bawerbûnek bi wan re dide çê kirin. Bi vê yekê mirov divêt ku bêje ku pir girîng bû. Wêne Şahmaran, nirxeke mazin dianî ser ziman.

Di civatan de ji, deme ku dihata vegotin, pir bi rêz dihata ser ziman. Di wê rêzê de ew bawerî û bawerkirin ji, pir mazin û bi nirx dihata ser ziman. Di civatan de, pir dihata vegotin. Deme ku dihata vegotin ji, pir bi bal lê dihata hisandin. Her mirovê kurd, yên ku zarok ji bana, demeke ji aliyê dê û bavê wan ve birine civatan û lê dihatina rûniştandin. Ji ber ku li Şahmaran bi hisênin. Divîya bû ku herkesekî zanî bana. Ev yek weke pêdivîyekê ji dihata dîtin. Di nava kurdan de, her demî, mirovên zane û biaqil, di civatan de lev digahana hevdû. Deme ku lê digahana hevdû ji, êdî ji hevdû re diaxiftin û bahsa Şahmaran û dîrok û çîrokê wilo yên di nav xalkê de dihatina kirin. Di nava kurdan de kevneşopîye civatê, bi vî awayî, ev nirxên xalkê û civakî li di parastin. Her timî kurdan zarokên xwe bi xwe re dibirine civatan û bi xwe re li civatan didana rûnandin, da qana hinek tiştne di daberê dîrok û zanebûnê de his bikin û pê mazin bibin.
.

Ola êzîdîtiyê, weke ola herî kevn a yek-yazdanî ya. Dîroka wê, pirr kevn û dirêj a. Bi teybetî, dîrokeka wilqasî dîrêj, dema ku em hewl bidin bi wê dîroka wê werênina ser ziman, wê di temenê pêşketina civatî de, wê gelek tişta rohnî bike. Li vir, divê ku ez di serî de bibêjin ku di temenê watekirinê jîyanê û pêşketinên wê ên ku bûna de dema ku em en dinerin, em dibînin ku xwediyê têgihiştineka bi demê re ya pirr pêşketî a bi demê re ya. Bi ´qawl´ û ´beytên´ wê hanîna li ser ziman, di temenê salixkirina jîyanê û bi wate kirina jîyanê de mirov divê ku fahm bike. Ji aliyê felsefekî û têgihiştinî ve, bi vê rengê em divê ku bi teybetî li ser bisekin in.

Dema ku mirov li rastîya dîroka êzîdîtiyê û pêşketina wê ya bicivatî dinerê, mirov dibînê ku gelek nirxên wê ji jîyanê hatîna dûrkirin. Di jîyanê de nayêna ser ziman. Her wusa, minaqe vê yekê ya herî zêde li berçav, ew a ku pergaleka perwerdekirinê ya pêşketî heya, lê heta nûha li ser wê serî ne hatîya wastandin. Dii vê demê de, herî zêde divê ku serî bi awayekî aqadamikî were wastandin. Nerîna êzîdîtiyê, nerîna mesopotamya ya pirr-rengî ya. Di wê nerînê de, jîyan bi hemû reng û pêşketinên wê re hatîya ser ziman. Bi teybetî, dema ku em di vê çerçoveyê de li hebûna jinê binerê, em dibînin ku di nava wê nerînê, têgihiştin û kevneşopîyê de jin ´pîroz´ a. Divê ku em vê di serî de kifş bikin.

Ev pîrozîya jinê a di nava çanda êzîdîtiyê de, piştre wê di nava çanda mitratiyê jî bicih bibe û piştre di nava zerdeştîtîyê de jî bicih bibe. Her wusa, di çanda Manîtiyê de jî ew heya. Lê koka vê pîrozîyê, em divê ku bi çanda êzîdîtiyê werênina ser ziman.

Civatek dema ku çanda xwe û dîroka xwe jibîrkir, wê hingî, hin bi hin têk herê û ji holê rabê. Bo vê yekê ya, ku kurdên me yê êzîdî bin û kurdên ne êzîdî jî bin, piştî ku ji warê xwe dûrketin, êdî ji wê çanda xwe jî dûrketina. Minaq, nîşanaka herî zêde ya vê dûrketina ji vê çanda binirx û kevneşopîyên wê, ew a ku dem bi dem tûndûtûjîya li ser jinê ku ketîya rojevê de. Di nava çandaka ku jin pîroz a û ku bi navê wê tûndûtûjî bi navê jinê werê ser ziman, wê çaxê em dikarin bi tememî vê bi ji wan nirxên wê çandê ê civatî dûrketinê werênina ser ziman. Ev alî hemû, aliyên ku em divê ku di temenê çanda dema şariştanîyê de ku werênina ser ziman in. Ev kevneşopîya ku koka wê li ser vê nirxa dîrokî û civatî ava ya, piştî ku misilmanetî derket jî ji nava kurdan ji holê ranebû. Her çend ku gelek zor û astangî derketina li pêşîya wê jî, lê dîsa wê kevneşopîya jinê a pîroz, weke ku çawa ku berî derketina îslamiyetê hebû, bi heman rengî hebûna xwe domand bi navê "kevneşopîya hemawîyê".

Kevneşoîya hemawîyê, çi ya? Kevneşopîya hemawîyê, çanda pîroz a jina kurd a. Bi wê çandê, jina kurd, di nava civate xwe de serdest bûya û heta ku dem bi dem wê civate xwe bi rê ve birîya. Dema ku du mêr bin û ankû du aşîr jî bin ku ketina berhevdû de ku bi hevdû re şer bikin û ku jinek çûna û li nava wan sekinî û ew hemawîya li serê xwe di nava wan de avêt ardê, wê hingî wî şerê ku bikin êdî wê nekin. Jin, di nava civatan de bi mêr re rûniştîya û hizrên xwe hanîya ser ziman. Ti farq di navberê de nebûya. Dem bi dem, di demên berê de ku mîrên ku kurd diçûna seferan û ne divegerîyan, heta ku vegerîyaban wê jina wan li şûna wan mîrîtî biikira. Minaqe vê yekê jî, minaqe dayika kurd a Ûrmîyeyî dayika Annezê ya ku di sadsale 9´min de jîya ya. Vê dayikê di bin mîrîtîya xwe de du dewletên kurdan ên weke ´dewleta kurdên kekoyîdîyan´ û ´dewleta kurdên eyerîdîyan di bin gotina xwe de kirîya yek û bi wê temenê dewleta kurd a ´dewleta şadadîyan´ avêtîya. Mihemedê kurê şadadî ku dema ku hat ser mîrîtîyê û desthilatdarîya şadadîyan pêşxist, di temenê wê pêşketina wî de û li pişta wî, ew dayika kurd û ev kevneşopîya wê hebû.

Pêşketina civatî a jina kurd, çend ku dem bi dem weke kevneşopîyeka li şûnmayî dihê hanîn li ser ziman jî, dema ku em li dîrokî û li rengê pêşketina wê dinerê, em nikarin vê yekê piştrast bikin. Her wusa, dem bi dem bi wê rengê dihê ser ziman û tê gotin ku "li cihê ku mêr bi gotin bû û axift, wê jin bêdeng bê", "jin, ji male xwe dernekeve", "jin, ji gotina mêrê xwe dernekeve" û hwd, gotinên ku piştre di dema derketina islamiyetê de ku hatina ser ziman in. Bi vî rengî çandek êdî pêşket û bi bandûra wê bawerîyê jî li civate serdest bû. ..
Civate kurd, piştî ku hin bi hin çandek bi vî rengî pêşket û di nava wê de jî hin bi hin serdest bû, êdî pirr pirsgirêkên mazin ên civatî jîyan kirin. Piştre, di nava civate kurd de, di civatan de nîqaşên bi wê rengê hatina destpêkirin ku wê çawa wê çanda ku di wê de jin pîroz a û vê rengê pêşketinê bi hevdû re fahm bikin. Bi rengekî, ew pîrozîya jinê a ku hebû û piştre bi kevneşopîya hemawîyê jî dihat ser ziman, li ser wê nîqaş bûn. Ev pîrozîya jinê a ku koka wê li ser hîmê êzîdîtiyê ya û pirr kevn a, bi bawerîyê jî dihê ser ziman. Her wusa, dema ku êdî ew gotinên weke "li cihê ku mêr bi gotin bû û axift, wê jin bêdeng bê", "jin, ji male xwe dernekeve", "jin, ji gotina mêrê xwe dernekeve" û hwd, ku dihatina ser ziman, êdî weke ku nakokî derdiket. Filosofê kurd ê misilman Ahmedê

Xanê jî ev nakokî dîtîya. Her wusa, ew pîrozîya jinê jî dîtîya. Bo vê yekê, dema ku berhema xwe ya bi navê ´Mem û Zînê´ nivîsand, li gorî wê nivîsand. Bi vê yekê û rengê, wî hizir kirîya ku hem wê pîrozîyê biparêzê û hem jî wê rewşa jinê ya bi wê werêne ser ziman.

Kevneşopîya jina kurd, di vê temenê de, dema ku em lê binerin, emê dîrokek pirr demdirêj û kevn bibînin. Ew gotin û rewşên ku bi navê civate kurd dihên ser ziman, ku "mafê gotinê ê jinê nîn a" jî, piştre derketîya li holê. Lê piştre jî, di nava civate kurd de, bicih jî bûya.
.. Dema ku em bahse perwerde bikin, divê ku em hinekî bi şûn herin û werênina ser ziman. Di nava kurdan de, kevneşopî weke nirxna li pêş ên ku li ser wan re xwe bizanebûn kirin bûn. Dema ku em bahse kevneşopîyan bikin, divê ku em kevneşopîya êzîdîtiyê biserekeyî li berçav bigrin û werênina ser ziman. Êzîdîti, xwediyê dîrokeka pirr demdirêj a. Dîroka wê, pêşketina wî ya bipergalî a civatî û hwd, hê bi tememî ne hatîya fahm kirin. Em pêşî ji vir destpê bikin. Rengê pêşketina civatê, hinekî jî rengê xwe perwerdekirinê û pêşketina jîr û aqilê civatî ê ku li ser wê re perwerdebûn dibê, bi wê dihê fahm kirin. Bo vê yekê, divê ku em bi teybetî li ser vê rewşa êzîdîtiyê bisekin in.

Î ro ku em li demên hûrî û Mîtannîyan dinerin, em çanda êzîdîtiyê serdest dibînin. Laleşî, pêşketîya û weke sazîyeka civatî ya di wê de xwe perwerdekirinê jî mirov dikarê werêne ser ziman. Rengê pêşketinê ê civatî ê di nava êzîdîtiyê de pêşketîya, bandûra wê, wê li pêşketinên olî ên piştre ên weke Mîtratiyê, Zerdeştîtîyê û her wusa piştre Manîtîyê û heta ku digihijê yersanîtîyê û hwd, dibê. Ev pêşketinên ku bûna, bi hemû pêşketinên olî ên di vê xatê de, di temenê wan de çand û kevneşopîya êzîdîtiyê heya. Bandûra êzîdîtiyê, li cihûtiyê jî bûya. Her wusa, bi çand û pêşketinên weke mîtratiyê û hwd re, li xiristiyanîyetê jî bûya. Em dibînin ku ser çand pêşketinên weke Zerdeştîtîyê û Manîtiyê re li Misilmanetiyê jî pirr bûya.

Di nava civate kurd de, kevneşopî pirr giring in. Bi kevneşopîyê, hemû rewş û hal û tevgerên jîyanî, jin û mêran hatina dîyarkirin. Bi wê yekê re, rewş û asta mirov di nava civate wî de hatîya dayîn kifşkirin. Keçikek dema ku bê dema zawacê, wê ´cehîzê´ xwe çê bike. Wê bi gotinaka din temenê male xwe hê di male bavê xwe de bi vî rengî çê bike. Jin, bi vîna xwe ya û ew bi vîna xwe diafirêne. Dema ku dema zwace wê hat jî, heta ku ew bixwe nebêje herê, ew bi ti kesekî re nayê zawicandin. Ev jî, weke xaleka giringa ku divê ku mirov binxat bike. Bi vir ve girêdayî, divê ku em bibêjin ku dema ku qelen dihat standin jî, ew qelen di temenê hin alikariyên di avakirina male wan ciwanên de dihat standin. Lê piştre ku ev jî bû weke kevneşopîyekê û bû sedema dayîn û ankû nedayîna keçikê, êdî bû temenê pirsgirêkê jî di nava civatê de.

Dîroka jina kurd a bi dîroka êzdatîyê pirr kevn diçêt. Di nava wê de jî, jina kurd bi vîna xwe hebûya di nava civate xwe de û di nava pêşketina wê de. Bi heman rengî, weyneka mazin jî di pêşketina civatê de leyistîya. Her wusa dîroka jina kurd, bi wê dîroka êzdatiyê re pirr kevn a û bi serdestî xwe jîya ya. Bi hevdû re bergkirina jin û mêran a di laleşê de, tenê aliyekî wê dihêne ser ziman. Dîsa, dema ku zaroyek bû, wê ji destê jineka pîr ku bi zerikê avê ji ´kehnîya sipî´ dihildê( ev av, ´ave kewserê´ ya.) û pêde dike ku dike êzîdî, dibê êzîdî. Lê ji aliyê felsefîkî jî, giring a ku divê ku mirov li ser bisekinê ya. Bi aliyê felsefeyê re û her wusa minaqên dîrokî ên di jîyanê de ku pêşketina divê ku em bi wê vê aliyê felsefeya êzdatiyê werênina ser ziman. Ev, biqasî wê geza nan ku ji destê dayika pîr ku hîç ne zewicîya û ku di laleşê de dihê xwarin pîroz

a. Biqasî, wê ave ku dayikek bi zerikê ji ´kehniya sipî´ dihilde û bi wê zarokan de dike û bi wê dike êzîdî pîroz a.

**Vegotina Şahmaran bisereke**

Vegotina tina Şahmaran, pir kevne û dîrêj e. Di nava kurdan de weke ku tê gotin, pir dîrêj e. Vegotina Şahmaran, wêneyekê mazin yê çanda kurd e. Li ser vê vegotinê, pir tê vegotin. Di nav xalkê de pir bahs tê kirin. De ne, bi vê yekê re, mirov dîvêt ku kevneşopîyeke kurdan ye pir girîng bêne ser ziman. Ew kevneşopî ji jin e. Jin di civaka kurd de pir mazina û bi kevneşopî ya. Li ser wê pir çandaka mazin heya. Di demên berê de ev yek weha ya. Pîroziyek di jinê de dihata ser ziman. Ev pîrozî ji pir mazin bû. Ni nirx û kevneşpî bû. Di malê de ye ku mal ava dikir jin bû. Di nav civakê de ye ku arami ji di parast ew bixwe bû. "Desmala serê jinê pir wate ya û pîroz e. Deme ku dû mêr an ji aşîr ji ku ketiban ber hevdû de bi berberîyê, hingî, ku di civatê de jinê çûban û li pêşîya wan sekinî bana û desmala serê xwe ji serê kiriba û avêtiba nava wan, hingî, wê wan ew berberiya di nava xwe de di cih de bi dawi kriiban. Ev yek her weha pir girîng e û pîroz e. Di nava kurdan de mîr çend ku mazin û bi nirx û bi bîryara, wî ji, bi wê mazinatiya xwe ji, nikaribû, li ber wê kevneşopîye di nava xalkê de bisekinîyana. Wî ji divîya bû ku rêze xwe jê re bidana nîşandin. Ev yek, ku nebûna, wê wî mîrî ji rêz di nava xalkê de ne girtibana. Bi vê yekê jin, bi nirx û çand hebû. Lê rêzeke hebû. Ev rêz bi mazinatiyekê dihata ser ziman. Di nava xalkê de di civatan de, jin di civatan de dirşnişt û hizre xwe dianî ser ziman. Di civatên bi jin de bahsa Şahmaran û nirxên wê û hebûne wê pir dihata kirin. Weke ku bahsa wê hebûne jinê ye li wir di wê heyemê de bikin, her weha bahsa wê dihata kirin. Ku bahsa Şahmaran dihata kirin, Hingî, bahsa wê pîrozîye jinê ji dihata kirin. Ew rewş û Şahmaran bi hev re di wê hebûnê de bi hev re dihatina ser ziman. Mîr ji li ber wê bi rêz bû.

Ku bahsa Şahmran hata kirin, hingî, êdî pêde, bahsa serpêhatiyên Şahmaran ji dihata kirin. De ne, pir serpêhatiyên Şahmaran hebûn. Pir tişt wê jîn kiribûn. Gelek Tişt û rewş hatibûbûna serê wê di jiyanê de. Ew serpêhatî û rewş hemû ji di civatên mîr de dihatina ser ziman. Civatîn mîr civatên ku bi nîrx bûn. Ku di wir dihata ser ziman ji, pir birêz û mayînda dihata ser ziman. De ne, Şahamran, deh hezar salî jîn bûbû li jiyanê. Ji ber vê yekê pir dîrêj bahsa pir serpêhatiyên wê dihata kirin. Her serpêhatiya wê ji, ku bahsa wê dihata kirin, pir biêş dawiya wê dihat. Ji ber ku Şahmaran di nava mirovan de pir rastî bêbaxtiyan hatibû. Bi bêbaxtî pir tişt hatibûbûna serê wê. Li kê bawer kiribû baweriya xwe anîbû, di dawiyê de bêbaxtiyak derketibû pêşiya wê, Ji ber vê yekê ji Şahmaran, êdî ji nava mirovan xwe dabû alikî û xwe veşartibû. êdî weke berê di nav mirovan de ne dima. Wê piştre jiyanaka xwe ya mazin û dirêj di bin ardê, li cihê ku wê cihana xwe têde avakiribû, di wir de bidest jiyana xwe kir. Weke mar êdî jiya bû. Ew ji xwe, şaha maran bû. mar hemû pêve girêdayî bûn. Wê li wir, di bin ardê de, jiyanaka weke ye li ser ardê ji xwe re bi jiyana marî ava kir û tê de jîn bû. Mar ji, hingî, bi ziman bûn weke mirovan diaxiftin. Bi ti kesekî ve ne didan. her weha jiyanaka wan hebû. Şahmaran, lê car bi car xwe bi tememî dikira awayê marakê de û derdiket û li jiyanê dimeyîzend. Ji ber ku ew nêvî mirov bû, êdî destê wê ji bi tememî ji mirovan ne dibû. Deme ku derdikete derve ji, diçû mala ku jineke ku kurekî xwe jin dibe û pir xizan bûn. Ew mal ji tenê çêlekeke wan hebû û pê dabare xwe dikriin. Şîrê ku jê dihildan dikirina mast û difirotin û pê dabara xwe dikirin. Şahmaran ku diçû wir, wê hinekî ji wê şîrê malê di

vexwart û ji dêla vexwartina xwe ji, her roj zêrek di cihê de dihişt û divegerehe. Jinek pir ye xizan ji, ew mar dîtibû, lê Wê hê nizanibû ku ew Şahmaran bixwe ya.Lê Şahmaran kiribû dilê xwe de ku qanciyekê bi wê jinê ji bike. Ev rewş weke demekê berdewam dike, û di demê de ji rewşe mala xizan pir xweş dibe. Piştre di dawiyê ji jin ji pê dihisêne ku ew Şahmaran e.Lê deme ku jin pê dihisêne, êdî xwe negirê û ji hinek mirovên din re ji rewşê têne ser ziman. PIştre ku ew dibêje, êdî Şahmaran ji pê dihisêhe ku wê jinê ji hineke din re ji ew gotiye û bahsa wê kiriya. Êdî Şahmaran nema diçê wir. Piştre bi qadarekê re, êdî ew di cihê xwe de bi tenê dimêne û bîryara xwe dide ku êdî dernekeve ser ruyê ardê.

Piştî ku ew weha bîryara xwe dide, êdî piştre, di cihê xwe de dimêne.Lê rojekê Du zarok ku bi hev re li ser ruyê ardê dileyizin, êdî yek ji wan dikeve çalaka avê ku av wilo zêde têde nemaya û weke ku ava têde çikahaya. Ku ew kurike ku dikeviyê de ji, navê wî Canşap e. Deme ku ew dikeve wir de, êdî ew xwe di nava maran de dibîne û pir ditirsêhe. Lê marakî mazin pêre dipeyivê û dibêjiye de "ne ji me ne tirsihe, emê ti zirerê ne dina te, lê tê êdî ji wir dernekeve, Ji ber ku te em dîtin û ti bi mere axiftî". Piştre mar wî bi xwe tênine ber Şahmaran. Deme ku wî tênine ber Şahmaran, êdî ew dibîne ku ew Şahmaran çend jineke bedew û xweşik e. Ew jê pir bi bandûr dibe. Dilê wî di cih de bidest avêtinê dike û laşê wî germ dibe û weke ku ji rihekî bikeve rihekî din de lê têt. Lê weke ku hinekî tirş ji pêre di dilê wî de çêdibe. Şahmaran fark dike ku hinekî tirş ketiye dilê wî de. Piştre Şahmaran pêre diaxivê û dbêjiye de "ne ne, ji me ne tirsiha, wê ti tiştek bi te newê kirin". Piştre ew ji, Şahmaran bidest axiftinê pêre dike. Lê di wê heyeme de, dilê Şahmaran de bidest zûavêtinê dike û Şahmaran ji piştre êdî dil dikeve wî de. Ew ji hij wî kurikî dike. Canşap, piştre weke qadarekê li wir pê re jî dibe, dibin ardê de. Piştre rojekê dilê kurik dixweze ku derkeve ser ruyê ardê. Ji ber ku pir bîre mala xwe û hevalên xwe kiriya. Piştre rojekê Şahmaran te ber wî û dibêne ku wa Canşap pir xamgîn e. Piştre jê di pirsê ku ji ber çi ew xamgîn e. Ew ji derde xwe jê re dibêje ku jê dixweze ku destûre bidiyê de ku herê ser rûyê ardê. Pêşî Şahmaran ve yekê naxweze, Lê piştre ku isrer dike, êdî wê naşikêne û destûre´ê didiyê de ku herê ser ruyê ardê. Lê berî ku derkeve, Şahmaran Jê re dibêjem "haya nahaka her mirovê ku min dît, bêbaxtî li mîn kir.Ti ji tê bê baxtiyê li min bike. Lê herê, bile bê".Ku ew wilo dibêje, êdî Canşap dibêje, "ne ezê li te bêbaxtiyê ne kim û jê re sund dixwe.Lê Şahmaran dibêje sund nexwe tê bike "me ne ti ji mirov î". Piştre Canşap ji wir derdikeve û tê derve. Piştre kurik ku derdikeve, êdî di nava xalkê bi merengozitiyê bidest kar dike û dedabre xwe dike.

Lê keyê ku heya ji, di wê demê de keça wî bi nexweşiyeka ku pir giren ketiye û tê gotin ku heya wê kêlîkê ti kesekî û ti hemimî nikariya ku wê rehet bike. Bi vê yekê, êdî ew ji li gelek mirovên hekim ku keça wî rehet bikin digerihê. Lê her hekimê ku dibêje ezê wê rehet bikim nikarê bike ji, serê wî tê jê kirin. Bi vê yekê, tê gotin ku serê gelek mirovên ku di wê heyeme de gotine key emê keça te rehe bikin û ne kirina jê bûya. Rojekê tê gotin ku mirovek tê wir û dibêje ku ezê rehet bikim, Te gotin ku çavên wî ji di wê de ya ku keçikê ji xwe re bêne. Berê ku ew mirov bidest rehetkirinê bike, pêşî dibêje key, "ezê keça te rehet bikim, lê ku min rehet kir, ezê pêre bi zewicim. Ji gotina tê gotin ku keçik pir xweşik bû. Li dinyeye li ser wê re ti yên xweşik ne bûn. Ew mirovê ku ji xwe re dibêje ez hekim im, ew ji çi dike û nake nikarê wê keça wilo xweşik rehet bike. BI vê yekê, ew ji, fahm dike ku wê serê wî jê bê kirin. Ew ji êdî li ser vê yekê bidest

hizirandinê dike. Lê kurnakê ku ji xwe re ji bo ku serê ji ji jê kirinê xilas bike ti carê nabîne. Di dawiyê re rojekê key dibakiyê de ku were cem wî, Wê rojê key ji bê kêf û tê gotin ku weke ku ew ji weke ku nexweş ketiya. Deme ku mirov tê wir, êdî ew wê yekê ji kifş dike. Deme ku ew wê kişf dikê, êdî berî ku key biaxivê, ew mafê axiftinê dixweze û digirê û ji key re diaxivê û ku diaxivê ji ji key dibêje, "min çara rehetkirina keça te dîtiya. Deme ku ew ji wilo dibêje, Êdî key ji di cih de di pirsê ku ka çara ciya. Ew dibêje, tenê yek karê keça rehet bike. Ew ji Şahmaran e. Deme ku wilo dibêje, êdî key di pirsê, lê emê çawa xwebigihênin şahmaran. Ew çara wê ji ji wire dibêje. Û her weha dibêje, Deme ku ez hatima vir, min li cem merengozekî rawasgheg da û ez li cem wî sekinim. Piştre dibêje, min dît ku wa bi laşê wî ve pirpirên ku bi maran ve hebûn, pêve min dît. hebe nebe ew wê karibê wê bibîne. Xwe gihnine wî. ew ji navê wî çanşap e. Lê bi navê "Lokman" ji navê kurik tê ser ziman.

PIştre, ku ew mirov weha dibêje, êdî piştre ew ji fermanê dide ku herin û xwe bigêhenine wî kurikê ku zilêm bahskiirye de. PIştre deme ku dikin ku xwe bigihêninê de wezirê key dibêje ku "wê çawa karibin ku wî nas bikin". Ew ji dibêje ku "li laşê wî meyîzênin. Laşê wî ji weke yê maran bi pulpula. Piştre Leşker bidest lê gerinê dikin, êdî piştre yên ku xwe digêhênine wan, li laşê wan ji dimeyîzênin. PIştre xwe digihênin Lokman. Ji ber ku ew li welatê maran "maristanê" maya, êdî ew ji weke wan bilaşpul bûya. Piştre, deme ku wî dibînin, êdî wî dibin û gelekî lê dixin, ji ber ku cihê Şahmaran ji wan re bêje.Lê ew li ber xwe dide û cihê Şahmaran ji wan re nabêje. Piştre wezîr dihizrê ku wê bi wî awayî nikaribe ku wî bide axiftin û jê tiştekî fêr bibe. Piştre ew di serê xwe de planakê çêdike û piştre diçê cem wî, li cem wî hinekî bi leskerên ku lêxistine de ji dixayide û piştre dide berdan. Wezîr hizir dike ku Lokman herê, wê rast û rast herê û xaberê bide Şahmaran. Deme ku kurik derdikeve, êdî ew ji wilo dike û lez dike ku herê û xaberê bide Şahmaran, da qana xwe xilas bike.Ji bo ku herê û bêjiye de, lê diherihin diçê deve cihê ku ew têde ya. Lê deme ku ew ji qasrê derketiya ku ketiya rê de ku herê û Şahmaran bibîne, wezir leşker ji dana pay wî. Wezîr bi xwe ji di pay Şahmaran de ya. Ew ne ji kulê key û keça wî ketiya. Ji ber ku wî bihistiya ku zanebûna dinya ye hemû bi Şahmaran re ya. Haçiyê xwe bigihinê de wê xwe bigihêne zanebûna dinyê hemû yî. Ew ji dixweze ku xwe bigihêne wê zanebûne wê. Deme ku ew te deve cihê ku ew têde ya, êdî di cih de leşker didine peşiya wî dikevine hundur û Şahmaran digihin û dibine qasrê. Piştre dibine qasrê êdî dikin ku wî bikujin û dii qazanên li ser êgir de wê bi kelenin. Qazanekê aliyê serê wê têde û qazana din ji aliyê ji xwere wê pêde têde bi kelenin. Lê berî ku bê kuştin, kurik tê cem wê û ew ji kurik re diaxivê, ew ji kurik re deme ku diaxivê, ji kurik re dibêje "ti ji aliyê serê min ti ji wir vexwa, ji ber ku ew bi jehra, ji ber ku te bêbaxtî li min kir".Kurik ji pir di rewşeke ne baş de ya. Ew ji dibêje bila. Wezire ji li wan dihisêne. Lê Şahmaran tiştekî din ji gotiya. Gotiyê ku aliyê min yê din, yê ji xwere pêde, haçiyê ku jê vexwe, wê gihê zanebûne dinyê û deman hemûkî. Piştre Şahmaran tê kuştin û di du qazanan de laşê wê tê kelendin û piştre ji, ku laşê wê dikelê, êdî kurik ji aliyê serê wê divexwe û wezîr ji aliyê xwere pêde. Piştre wezîr li cihê dimirê û kurik ji digihê zanebûne dinyê û deman hemûki.

Şahmaran, li ser cihê ku ew lê jîn bûya pir tişt têne vegotin. Lê Deme ku mirov li dîrok û vegotinên di nav xalkê de li wan dihisêne, mirov dibêne û têdigihê ku li Dore Cizîra Botan û Nisêbînê wanderan jîn bûya. Di deme Medan de pir mazin hatiya ser ziman û di wê demê de ji nirxeke bi anînine wê ye ser ziman re, hatiya afirandin. Lê vegotina

Şahmaran bi kevnbûna xwe ji diçê berî demên Mîtanîyan, Hûrîyan û Naîriyan wan. Di deme Mîtaniyan wan de, weke nirxeke pîroz hatiya vegotin. Mîtanî ji, li navênde wan Nêsîbîn û dore wê bû. Cihê wan haya bi Rihayê wan deran diçû. Li van herêman pir mazin hatiya vegotin. Piştî wan deman ji li van herêmen weke nirzeke pîroz hatiya vegotin. Li Dore Nisêbîne, haya iro ji, di wê demê demê de çawa bû, wilo ya. Bi heman nêzîkatiyê nêzîkati tê kirin.

Hinek kevir û hinek nivîsên ku haya sadsala 20 min ji ku li ser nivîs hebûn, li van herêman bi wêneyên Şahmaran de bûn. Piştre ew kevir ji ji van herêmen bi awayekê hatina windakirin. Lê li herême, ku bi kê re tê axiftin, li ser hebûn û Nirxe Şahmaran axiftin tê kirin. Şahmrana Çanda wê, li Nisêbîn, Cizîra Botan, û li dore bicih e. Li wanderan, heya i ro ji, hê vegotinên ku ji wan demên berê mana, bi Şahmaran li ser zimanan e. Di nav xalkê de Nisêbîn ku Cizîra Botan ji di nav herême wê de, di nav xalkê de heyemên berê, weke "Welatê Şahmaran" ji hatiya bi nav kirin. Li Nisêbînê û Cizîre botan û li dore wan, heya sadsala 19 û 20 ji, ti malên ku bê wêneyên Şahmaran ne bûn. Di her civatên xalkê de wêneyên Şahmaran dihatina dalaqandin.

Li van herêmên Kurdistanê, gelek kevneşopî bi hebûne vegotin û Şahmaran bixwe, hatina afirandin. Xalk, haya demên dawiyê bi wan jîn bûya. Deme ku li civatekê rûniştin bûbana, pêşî li ser Şahmaran axiftin dihata kirin. Ku bahs nehatina kirin, weke ku ne dibû. Lê bi vê yekê re, ku baweriyê ve girêdayî divêt ku mirov bêje ku baweriyeka mazin bi Şahmaran ve dihata ser ziman. Vegotina Şahmaran ji. li herême bi gelek dev û vegotinên jev cuda dihata vegotin. Pişt dirêj dihata vegotin. Ji ber ku ji aliyê hizrî ve, weke nêzîkatiyaka olî hatiya ser ziman û pir mazin û bi rêz hatiya ser ziman, Piştre ji, pir di nav xalkê de bicih bûya, Êdî ne tenê di nav kurdan de di nav xalkên herêmê yên din de ji bi cih bûya û weke hizreke baweriyê ew ji bi bandûr kiriya. Bi vê yekê mirov karê bêje ku piştî deme Mîtanî û Hûrîyan re, her xalkê ku derketiye û an ji têkiliyek bi herêmê re daniya, vê vegotinê bandûr li wan û hzir û baweriya wan kiriya. Bi vê yekê weke baweriyeka Mîtolojiye Mesobotamya li herêmê di nava xalkan de bi varsiyonên xwe yên cûr bi cûr û cuda bicih bûya. Weke destana Rûstemê Zal ku tenê di nav kurdan de dihata vegotin û piştre ku Firdewsî ew nivîsand û piştre di nava xalkê pers de ji bicih bû, her weha wilo ev vegotin û dîrok bi hizir û baweriya bi xwe re bicih bûya. Bi heman nêzîkatiyê mirov karê bêje ku mîtolojiya Yewnanî ji bi bandûr kiriya. Ve vegotina herêmî, hin varsiyonên xwe de di vê Mîtolojîyê de ji çêkiriya.

Li Kurdistanê, divêt ku mirov bêje ku kevneşopîyeka Şahmaran, ku ji gelek aliyan ve tê ser ziman heya. ne tenê weke mîtolojiyekê tê ser ziman. Ji wê zêdetir û maztir tê ser ziman. Di her malên kurdan de wêneyên Şahmaran, ku li ser Xaliçeyên Şahmaran ên hêtan hatina çêkirin û bi hêtan ve hatina dalaqandin hene. Ev alî, aliyekê vê kevneşopîyê têne ser ziman. Di jiyanê de, li gor her komên civakê Şahmaran binirx hatiya kirin. Ev yek ji dide nîşandin ku Şahmaran ne tenê bi nirxekê heya. Ne tenê weke kevneşopîyekê heya. Ev yek dide Nîşandin ku weke hizreke pîroz di nav xakê de heya. Bi vê yekê Şahmaran li ser lingan maya. Li Kurdistanê Naqşkirin bi çêkirine wêne Şahmaran re bi nirx dibe. Hinekî bihêja û pîroz tê berçavan û ser ziman.

Bi xalîçe û tiştên ku bi nav û wêneye Şahmaran têne naqşkirin û çêkirin, aliyekê nirx û kevneşopîya bi Şahmaran de tê ser ziman. Lê aliyê dî ji bi ve gotin û pîrozkirinê re tê ser ziman. Pir mazin tê ser ziman. Deme ku bahs Şahmaran tê kirin, pir li ser tê sekinadin û hêjabûnak tê dayîn jê ra. Li gor vê yekê pê re baweriyekê tê ser ziman. Ji

gelek aliyan ve vegotinên ku li ser hatina afirandin û vegotinên ku bi van vegotinan ve hatina zêdekirin û afirandin ji hene. Hemû ji yên demên berê ne. Di wan vegotinan de hinekan ji wan de ji aliyê Şahmaran yê ku weke jineke pir xweşik hatiya afirandin, weke zilem ji hatina nîşandin. Bi vê yekê zêdebûn hatina kirin. Vegotinên li ser Şahmaran yên li aliyê Rojhilatê Kurdistanê de gelekan ji wan, têde aliyê mirov "mêr" ji hatiya nîşandin. Lê ji wî aliyê ve her ku çend wêneyên ku aliyê mirov mêr in, hatina çêkirin ji, lê ew wêne wilo zêde derketina pêş di nav xalkê de. Ji ber ku li ser wêneyê Şahmaran, ku aliyê mirov jin e, pir pîroziyeka mazin hatiya çêkirin û ew pîrozî ji ji aliyê bandûriyê ve pir mazin û bi bandûr bûya. Ev alî ji, weke aliyekê din yê vegotina Şahmaran derkete pêş. Her afirandinên ku di nav xalkê de li gor çanda Şahmaran bi ve gotina Şahmaran ve hatina afirandin di nav xalkê de mazin dihatina vegotin û ser ziman. Navende Çanda Şahmaran û afirandinên bi wê ve ji, Nisêbîn û Cizîra Botan bû.

Ji aliyê hizrî ve, ku di vegotina Şahmaran de, ku bahsa deme ku ew jin bûya ku tê kirin, weke demeke di aramî û aştiyê de tê ser ziman. Di naqabîna mirov û ajalan de ji ew aramî û aştî heya. Mar bi ti mirovî ve nadin. Mirov ti marî ne kujin. Her weha herkesek li ber hevdû di başiyekê de ya. Di ve gotina Şahmaran de ev yek pir mazin derdikeve pêş. Lê bi vê yekê re du hizrên din ji derdikevine pêş. Ew ji her weha yek bêbaxtiya mirov e, û ya din ji her weha xamginiye dilê Şahmaran e. Di nav xalkê de ji, deme ku bahsa xamginiya dil Şahmaran dihata kirin, pêre xamginiya dilê mirov dihata ser ziman. kengî dilê yekî xamgin bû, hingî ew xamginî dihata ser ziman. Deme ku yekî li yekî dî bêbaxtî ji kiribana, di cih de hingî, ew bêbaxtiya ku hatiya serê Şahmaran dihata bîra mirov. Di wê heyemê de ji, pir bahsa wê dihata kirin. Bi ve yekê re Çanda Şahmaran afirî bû. di nava kurdan de jinên ku daq li ser li laşê xwe çêkirin, keçikên ku naqş dikirin, di naqşkirinên xwe de Şahmaran bi kar dianîn. Çi di Mîtolojiye Şahmaran de tê ser ziman, bihizir bê an ji bi wênegerî bê, di naqşan de dihata afirandin.

.Di dewama mijarê de li ser têgihiştina ahmedê xanê a bi wêjeya kurdistanî re em ji vir û pêde hinekî li ser wê bisekin in. Wê weke aliyekê tememker ê mijarê jî wê ev wê xwe bide dîyarkirin.

.Ji aliyê pêşketina civatî ve mirov di serî de aliyekî pirr pêşketî û bitêgihiştin bi vegotina Mem û Zînê re zant dikin. Ew aliyê ku em zant dikin jî, her weha bi aliyê pêşketina civatî û serê mirovên di civatê de dijîn re dihê li berçav. mem û Zînê, di mirovên ku li jîyanê jîyabûn. Jîyane wan, ne tenê xiyalkirin û hişkirineka. Ji wê zêdetir, jîyandinaka. Ev herdû mirov, di jîyanê de dijîn. Hij hevdû dikin û dilê wan dikeve hevdû de. Li gor kevneşopîyan dijîn. Ew pêşî, di wê çare pêşî ya ku ew hevdû dibînin de, di dilê hevdû de cih û war digirin. Piştre êdî ew hevdû di dilê hevdû de dijîn. Lê di vir de, emê ne li ser wê têgihiştina ku di hundurê vegotina Mem û Zînê de heya li ser wê bisekin in. Emê li ser wê wê têgihiştin û zanîna di serê mirovên di civatê de ku ew Mem û Zîn piştî wan re afirandina, emê li ser wê bisekin in.

Bi vê yekê re, em wan şert û mercên ku Mem û Zînê têde jîyîna û afirîna û bi vegotin bûna, wê fahm bikin. Ew têgihiştina ku Mem û Zînê afirandîya ya civatî, di vir de hate ku ew newê fahmkirin, em wilo karîn bêjin ku wê aliyekî fahmkirina Mem û Zînê û wê vegotina wan ya li ser wê kêm bimêne. Bi vê yekê re, divêt ku mirov wê aliyê jî fahm bike. Ew alî, qatek ji wê, wê di hundurê vegotinê de wê were fahmkirin û têgihiştin û qatek jî, wê di demê de û bi fahmkirina demê re wê were holê û wê bifahm bibe. Bi vê yekê re dem, fahmkirina wê giring a, ku mirov wê fahm bike. Şert û mercên ku têde

Mem û Zîn bi vegotin bûya, ew şert û merc û têgihiştina wan dem û şert û mercan fahmkirina wan, wê aliyekî dî yê civatî wê bi fahmkirina Mem û Zînê re wê were holê û mirov wê bibîne.

Mem û Zînê, Afirandina wê, di wê demê de bi têgihiştin dibê. Di wê demê de, ji wê awayê wê afirandina, wê mirov fahm dike, ku awayekî civatê yê pêşketî heya. Li gor fahm û xwesteka civatê afirîya û hatîya vegotin. Bi vê yekê re, dilê mirov yê bi hest, ji wê re bûya bersivek. Vegotina Mem û Zînê Ahmedê Zanî wê dihê ser ziman. Lê di aslê xwe de vegotina Mem û Zînê di berî wî de jî hebû. Divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Têgihiştina civatî, ji wê vegotinê mirov fahm dike ku hin pêvajoyên pêşketinê yên bi demê re bi ser xwe re buhurandina. Ew demên ku buhurîna, di vegotinê de awayê xwe bi heyînî di hestên ku têde dihêne li ser ziman, di wan de xwe didina li berçav. Mem û Zîn, piştî wan re pîrozîyak di nav kurdan de ji wan re hatîya baxşkirin. Bi wê pîrozîyê, qasîdeyên olî jî li ser wan hatîna çêkirin, weke ku çawa ku piştre Feqiyê Teyran li ser Dilberê afirandîya û çêkirîya. ´Dilbera´ Feqiyê Teyran jî û ´Mem û Zîne´ Ahmedê Xanî jî, ne xiyal û farazî na. Ew keseyete ku feqiyê Teyran têne ser ziman Dilberê jî û ye ku Ahmedê Xanî jî têne ser ziman Mem Û Zînê jî, di jîyanê de jîyana. Bi vir ve girêdayî, divê ku mirov bibêje ku qasîdakirin û di wê de jin bicihkirin û bi watekirin, rengekî jîyanî ê jîyane kurdî ya û berî misilmanetiyê jî bi êzîdîtiyê re hebûya. Minaq, di **mem û zînê**´ de ´Zîna Ahmedê Zanî, di "**ey dilberê**" de Dilbera Feqiyê teyran, di ´**zembîlfiroş**´a Mela Hisêne bateyî de rewşa jinê a ku tê ser ziman, û hwd, çend ji wan rewşên jinê na ku hatina ser ziman.

Di wê deme afirandinê de, rengên hestan weke ku dihate dîtin û fahmkiirn. Ev alî û yek, weke teybetmendîyekê xwe di vegotinê de dide der. Bi nirxkirin û dayina hestan jî, mirov di wê deme vegotinê de ku tê gotin de dibîne. Di deme ku bahse hestan dihê kirin de ew kirpkirin dihê kirin. Kirpandin, bi serê xwe, nîşanayaka têgihiştina ku bihestê re dihê holê û dihê dîtina. Hate ku hest newê kifş kirin û têgihiştinkirin û bi wê re rengê wê newê salixkirin, wê kirpandin jî di vegotinê de newê kirin. Têkiliya hest û kirpê ya bi hev re, di têgihiştinbûna bi wê re dihê dîtin. Bi helbest kirin jî, ne tenê wê bi hin awayna salixkirina hestan bi me bide têgihiştin, wê ji wê zêdetir hin têgihiştinna ku bi wê rewşê re diafirîn jî, wê bi me re bifahm bike. Di vê yekê û rewşê de, ku mirov li ser awayê vegotina Mem û Zînê lê dihizirê, mirov kifş dike ku têgihiştinaka mazin ya civatî ya demî afirîya û heya. Ne tenê di wê de, bi wê re jî têgihiştinaka civatî ji aliyekî dîn ve dihê holê û dîtin. Di wê aliyê de mirov ast û rada civatê ya ku heya kifş dike. Bi wê re, mirov civatê bi awayê pêşketina xwe ya demê re wê kifş dike.

Mem û Zinê, ji xaynî wê têgihiştina xwe ya ku di xwe de dihêne ser ziman ya civatê, ji wê zêdetir bi xwe re jî, têgihiştinaka civatî ya ku bi asta wê ya demê re heya dihêne ser ziman. Civat, di nirxên xwe yên deme yên ku diafirêne de zanîna xwe ya ku heya asta wê dide der. Rengên hestên bawerîyê û yên evindarîyê de di jîyanê de xwe jevcuda didina der. Lê di têgihiştina xwe ya ku ew pê hene de, bi awayê hestî, ew jevnedûr in. Rengîti, di vir de salixkirina wê, bi têgihiştinekê dibe. Ew têgihiştin, weke ku bi heste evîn û evîndarîyê re rengê wêjetîyê bi vanîya wê re xwe dider re, wê yê aliyê wê yê nirxdarîyê, wê ku weke ku di olê re bi pîrozîyê re xwe dide der re wê wê were li holê. Ev jevcudabûn, wê di jîyanê de, bi bûna têgihiştina têgihiştinê re wê bibê. Têgihiştina civatî ya demê ya ku Mem û Zîn afîrandîya, xwediyê wê têgihiştîna hestî ya bi xwe re

ya. Kirpdandin, bitêgihiştinekê bi têgihiştina têgihiştinekê re dibe.Bi wê re jî, hizirkirin û awadana hizirkirinê, awadan û têgihiştina awadanê, mirov bi xwe re dibe û digihêne têgihiştinaka ku mirov ji têgihiştina hiziratîyê û estetîkê dûr neyêne ser ziman.

**Wek** tê zanîn ku destana ´Mem û Zînê´, destanaka dîrokî ya kurd ku î ro weke destana netewî ya kurd tê zanîn û nasîn. Destana Mem û Zînê, di xwe de dîrokaka ku em wê kifş bikin di xwe de diveşêrê. Hate î ro, li ser wê deme wê û dîroka wê ya ku tê de tê ser ziman, bi zanî û kur lêkolînên mazin ne hatina kirin. Lê destanên ku di nav kurdan de dem bi dem û dev bi dev dihatina vegotin jî yên weke destanên ´Mem û Zînê´ û ´ Ferhad û Serînê´ û hwd, di wan de kevneşopîyaka mazin heya. Hate î ro, li ser wê destanê û li ser felsefe civatî û civakî ya ku têde tê ser ziman jî, divêt ku ew bi teybetî li ser were sekin in. Destana Mem û Zînê´, deme ku min hizir ku li ser vê nivîsê binivîsênim, ez pir hizirim. Pêşî ez li biçûkatîya xwe hizirim. Di deme ku ez hê zaro bûm de ku hê ku min ne dizanî ku bixwênim, ji dev min ji bavê xwe ev destan bihîst. Di deme ku min hiskir de, ji serî hate ku hate vegotin jî, bizimanekî wilo xweş û xweşik hate vegotin, ew awayê vegotinê yê ku min ji bavê xwe hizir kir, weke xwe di hîş û bîra min de ma. Min piştre jî ti carî ew ji bîr nekir. hertimî di aqilê min de ma. Piştî bi demekê ku ez mazin bûm, êdî pirtûka Ahmadê xanê ya Mem û Zînê jî, deme ku min xwand, min bi wê bîra xwe xwand.

Lê divêt ku ez vê jê bêjim. Ve gotina Mem û Zînê, di wê deme xwe de û piştre jî hertimî di nav kurdan di civatan de dihate vegotin. Lê ne tenê di civatên ku bi teybetî dihatina li darxistin de dihate vegotin, her weha di malan de jî, her şev, jin û mêre malê ku bi zaroyên xwe re di bin wê ronhîya çirayê de ku lev dirûniştin, êdî jev re divegotin. Di wê deme vegotinê de hingî ji bo zaroyekê hê hesanîtir dibû ku wê vegotinê gotin bi gotinê di serî xwe de bivejêne û bêne berçavên xwe. Di wê demê de, ez li xwe û rewşa xwe ya biçûkatya xwe dihizirim, ji wê deme xwe, ez digihijime vê têgihiştinê. Ji ber ku min wilo jîn û vejînkir di xwe de di serê xwe de. Di deme ku dihate vegotin, weke ku helbestek ji mirov re were xwandin, bi destanî ew dihate vegotin.

De ne, mirov ku di deme xwe ya zarotiyê de ku bihîst, êdî zû bi zû ji bîr nakê. Di hîş û bîrê de dimêne. Ez vê yekê karîm biteybetî bênime ser ziman. Di wê deme biçûkatîya xwe de ew awayê vegotinê û vegotina ku bi vegotinî min bihîst, weke xwe dihiş û bîre min de ya. Wêneye pêşî, ya di derbarê civate me kurdan de bi civakî, pêşî bi wê bihîstinê re di serê min de bû. Dilê min, di wê deme ku min li wê vegotina Mem û Zînê dihisand de, ku çawa diavêt û di deme hisandinê de ku çawa dikira kutakut, hê jî ew di bîre min de ya. Bi her gotina wê ye ku bi lêv dibû re dilê mirov jî carekê ji xwe re di ber wê gotin û vegotinê de diavêt. Bi wê yekê re, bi wê avêtina dil re, ew gotina wê jî di mejî de cih digirt û di hiş û bîrê de jî dima. Bi vê yekê re, di bîre min de ma. Bi vê yekê re, deme ku ez lê dihizirim ez bi bîr dikim. Mem û Zîn, bi awaye vegotinî, ku her şev dihate vegotin, di gelek şevan de min lê hisand. Di deme ku hate vegotin de pirr dirêj û mazin hate vegotin. Li dora Cizîre bota, mirovekî ku Mem û Zîn ne dizanî ne bû. Bi teybetî, di Medresayan de dihate vegotin. Ve gotina wê, pirr dirêj bû. Wan şevên zivistanan ku pirr dirêj bûn, hate demeka dereng, her şev dihate vegotin, lê bidawî nebû. Mem û Zîn, di deme ku dihate vegotin de, ew cihê ku dawiya wê ya di derbarê ´Beko´ de awayekî ne dihate vegotin. Di nav xalkê de awayekî wî yê din jî hebû. Ew jî weha bû. Dihate vegotin ku piştî ku Mem jî û Zîn jî gihiştina ber dilovanîya xwe, êdî piştre ku çend roj bi ser ve diçin, êdî piştre beko tê kuştin. Tê gotin ku Hate deme piştî çûna ber

dilovanîya xwe ya Mem û Zînê jî, Mîrê bota ku li her deverê kurdistanê nav û dengê wî hebû, wî nizanîbû ku Mem jî û Zîn jî rastî bêbaxtiyekê hatina. Lê piştî ku herdû(Mem û Zîn) jî ku diçina ber dilovanîya û ku ji ber ku dihate zanîn ku dilê wan ji ber ku ji bo hevdû bû, êdî tirba wan li berhevdû tê çêkirin. Lê Tê gotin ku Beko, ji wê yekê jê pirr nexweş a. Ew wê di berhevdû de bûna tirbên wan jê hezm nakê. Ji ber vê yekê, piştî çûna ber dilivanîya wan re, êdî ew hizir dike ku herê û tirbe herdûyan jî vekê û tirba wan ji hevdû dûr bike. Beko, wê hizirê dike serê xwe de û piştre êdî dike ku wê bike.

Tê gotin ku rojekê, Beko, kirîya serê xwe de ku ti kesek li dorê nema bê û ku herkesek li civatê li hevdû rûniştî bê, ew herê û tirba wan vekê û ji hevdû dûr bike. Di wê deme ku ew diçê ku tirban vekê û wan jevdûr bike, hingî, tê gotin ku her kesek bi mîrê bota re di civatê de rûniştîya. Hate demeka dreng li civatê li hevdû rûniştî dimênin. Lê k dem tê demeka dirêj, êdî piştre civate mîrê bota jî dike ku jev belav bibe. Piştre bi hev re dirabin û mîrê bota jîî bi mirovên li dora wî ku li civate wî na, bi wan re dirabê û derdikeve. Lê tê gotin ku di wê deme ku ew derdikevin û tê gotin ku dikin ku xatir ji hevdû bixwezin ku herkesek herê mala xwe û jev belav bibin, êdî bi mîrê bota re mirovên dora wî jî dengna ji nav tirba Mem û Zînê dike. Bi dengê re êdî bi mî re herkesekê ku di wê demê de li wir amedê ya, êdî bi hev re têne bi ber tirbê de. Deme ku ew têne tirbê, êdî ew bi mîrê bota dibînin ku wa Beko dike ku tirbê bikolê û jevdûr bike. Hingî, êdî mîr di wê heyemê de rastiyê fahm dike.

Di wê heyemê de êdî tê gotin ku mîr hingî şûrê xwe ji ber xwe derdixe û diavêje serê Beko û serê wî jê dike û jîyane wî ji dest dike. Bi wê re têgotin ku di deme ku mîrê bota şûrê xwe diavêje serê wî, êdî tê gotin ku dilopek ji xwûna wê di dilopê naqabîna Mem û Zînê. Êdî tê gotin ku ew dilope xwûnê di naqabîna wan de dibê ew dara ku di naqabîna wan de. Tê gotin ku wê ew dar, di naqabîna wan de bimêne, Lê wê hate û hate jî dil û evîna Mem û Zînê jî wê bibême.

Evîn û serpêhatîya Mem û Zînê, divêt ku mirov bêje ku bi awayekî pirr dirêj dihate vegotin. Bi zimanekê ku têde aqil pirr li pêş bû bi pê hate ser ziman. Divêt ku mirov bêje ku evina Mem û Zînê, Ahmedê Xanê nivîsandîya û hanîya ser ziman. Lê biqasî ku mirov fahm dike ku di demên berî wî de bûya. Mem û Zîn di deme Berî Ahmedê xwe de di jîyanê de bûya. Ev bûyar û serpêhatî, hemû jî di jîyanê de bûna. Em, biqasî ku fahm dikin ku ew serpêhatî diçê deme berî Meleyê Cizîrî jî. Ji devê Meleyê Cizîrî jî, mirov wê serpêhatîyê di helbestên wî yên ku mana hate roje me de dihê ser ziman. Navê ´Mem´ û ´Zînê' jî tê ser ziman. Ji vê yekê, mirov fahm dike ku destana Mem û Zînê, destanaka ku biaqilmendî hatîya hunandin a û di demên berî Ahmedê xanê de jî hatîya ser ziman. Nîşanaka vê yekê, ku di helbesteke Zanistê mazin Meleyê Cizîrî de jî tê ser ziman. Di helbestê de bi vî rengî tê ser ziman; ".. **Mûyekê ez ji te nadim bi duşed Zîn û Şirînan/Çi dibît ger tu hesêb kî mi bi Ferhad û Memê ..**" Weke tê zanîn Meleyê Cizîrî di deme Berî deme Ahemdê Xanê de dijî.

Ev herdû rêzên ji Zanistê mazin Meleyê Cizîrî, didina nîşandin ku Mem û Zîn, vegotina wê, di deme wî de jî heya. Lê ev herdû rêz û gotinên bi wê awayê vegotinê re hizrekê didine me ku hinekî di demên berî wî de jî diçêt. Mirov, vê yekê tê digihê. Bi vê yekê re, hinek nîşanak derdikevina li holê ku Mem û Zîn, di demên berî wî de jî jîyana. Lê bi vegotinê ji dev û li dev hatina hatina vegotin û hatina hate wê demê. Di wê demê de jî, êdî nivîsandina wê, wê êdî w bike nirxeke mazin ya bi kevneşopî. Weke nirxeke ku bi rûmete civatî dihê ser ziman û di nav kurdan hemûyan de hem di demên berî wê

de û di demên piştre de jî, ´kevneşopîya hamawîyî´ heya. Di deme ku Beko, dikeve bin aqilê Mîrê bota de û wî û Mem li berhevdû li ser santrancê dide rûnandin, êdî piştre bi dîtina Zînê ya ji alîyê mem ve û ku êdî heya Mem diçêt ser Zînê û piştre ku Mem û Mîr li ber hevdû dirabin, di wê heyemê de jineka ji malê dihê û hamawîya ser serê xwe ji ser serê xwe diavêjê naqabîna wan û piştre dawîyê li wê li berhevdûbûna wan dihêne. Çend ku î ro wek Zînê Bahse wê nayê kirin jî, Dilbere ku Navê wê bi Feqiyê Tayran re tê ser ziman jî, di heman awayê de di nav civatê û civakê de heya û bahs lê tê kirin. Lê Rewş û vegotina Dilberê bi jîyane Feqiyê Teyran re tê ser ziman û vegotin. Lê ya Mem û Zînê, bûya yeke Xalkê û ji dev li hev hatîya vegotin. ..

.Li vir, divê ku mirov di serî de werêne ser ziman ku divê ku mirov cihekî giring bide dengbêjîya kurdî. Ev weke mijaraka dîrok, civatî û çandî ya. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku dengbêjîya kurdî, hê wusa baş li ser wê lêkolînên bi zanistî û kûr ne hatina kirin. Lê ku hinekî jî lêkolîn li ser wê werênina kirin, wê bê dîtin ku dengbêjîya kurdî, dîroka wê diçêt ta serdemên destpêkê ên şariştanîyê ên demên sûmerîyan. Her wusa di nava civate kurd de weke ´zaneyna bênav´ jî bahse dengbêjên kurdî hatîya kirin. Di nava civatan de, hertimî ew rûniştîbûn. Di aslê xwe de em dema ku bi destpêka pêşketina civatê re dengbêjiya kurdî werênina ser ziman, divê ku em ji erkek dengbêjîtîyê zêdetir wê bi wate werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi dîrokê re werênina ser ziman ku dengbêjîya kurdî, weke ku karekî rewşenbîrî jî bi demê re di nava civate xwe de di demên buhurî de ku hildaya li ser milên xwe. Ti civat, bêî wan li hevdû ne dicivîya. Ev yek, weke destûreka civatîya ku nebê nabê bû.

Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku weyna dengbêjîya kurdî, ji ya dengbêjiyê zêdetir û wirdetir, di reng û çermê rewşenbîrîyeka civatî de di nava civatîya kurd de bi dîrokê re meşîya ya. Mejiyê civatê, wan pêşxistîya. Her wusa, di nava mejiyê civatê de, wê çi cih bigrê, heta deverekê jî, mirov divê ku werêne ser ziman ku wan daya kifşkirin. Her wusa, di her civatan de, bi levkirin, levhanîn û her wusa xweşikgotina bi zargotinî, wê weke awayekî wan yê ku mirov nedikarî li ser wê gotin jî bigota. Dengbêj, weke tişta ku ji wî bi keseyetî dihat xwestin ku xwediyê bîr û bîrkirineka xort ba, xwediyê dengekî xweş ba û karîba bi zarînîya xwe zargotina xwe bikira. Her wusa di vê çerçoveyê de weke tiştên ku ji wî dihatina xwestin ev bûn.

Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku bi deng û gotinê re têgîna ku wan diafirand, divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê. Her wusa, wê di hanîna ser ziman bi zarînî û zargotinî de, wê bikiran ku di mejiyan de cih bigirta. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku di vê çerçoveyê de têgîna zargotinîyê, wê ji aliyekî din ve jî giring ba. Ew destanên kurdî, wê ji destpêkê heta dawîyê bi zarînî û dengbêjî bigotan. Her wusa di vê çerçoveyê de, dema ku mirov li civatên wan dirûniştin, wê pirranîya destên civatî ên kurdî, ji wan bi dengbêjî jî bihisanda. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku her destan û hwd, ên civatî, çend ku bi rengekî asayî ê vegotina wê hebû, lê ji devê dengbêjan wê bi awayekî zarînî û zargotinî jî awayekî vegotinê ê ji wan heba. Di vê çerçoveyê de, wan bi dengekî xwest ku dengê xwe biwê re lev dikirin û bi dengekê adilandî, ew destan dihanîn li ser ziman.

Dema ku em bahse destanên civatî ên kurdî ên weke çîrokên keçelok, destanên weke desta rûstemê zal, şahmaran, şer û pevçûnên di nava civatê de ên di nava mîran û hwd de, wê bi awayekî pirr direj bi dengbêjî ji devê wan bihata bihîstin. Ji ber vê yekê bû, ku piştre jî, dema ku serdemên civatê pêşde diçûn û bi zanebûnê civatê xwe pêvajoyên xwe

yên pêşketinê di buhurandin û pê de, wê her mîrê kurd, wê li civate xwe herî hindik dengbêjekî ku bi dengê wî yê xweş re ku navê wî derketî wê bi hawanda û bikira mêhvan. Dema ku civata mîr, li dar diket jî, wê wan dengbêjan bi dengê xwe êdî ji civatê bi awayekî xweşik bihanîya li ser ziman. Piştî ku hanîn li ser ziman û pê de, êdî wê herkesekî bihey bal û heya xwe bide ser wan û li wan bihisanda. Dengê wan dengbêjan, mirov ji xwe mest dikir. Ji xwe dikir. Di mejiyê xwe de weke ku ew ji cihanekê dibir li cihaneka din. Her wusa li mirovan dikir.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ji ber vê yekê bû ku hertimî weke gotinaka xalkê di nava civatê de dihat gotin "ku tu bixwezê ji herêmekê û deverekê agahîyan hilde, here û li dîwana dengbêjan rûniha û hertiştî ji wan bi dengê wan ji wan bi bihîze." Di vê çerçoveyê de di nava xalkê de dihat gotin. Ev gotin, bi gelek rengên din jî, bi nav dengbêjan re dihat ser ziman. Her wusa, bi wê dihat gotin ku ′dengbêj, ji her tiştê ku di qawimê agahdar dibin." Ev rast bû. Ew li civatan dirûniştin. Vêca tiştekî ku dibû û diqawimî, hertimî di civatan de dihat ser ziman û mirovên ku li civatê rûniştîbûn jî, li ser wê bi hevdû re diaxiftin û gotina xwe digotin. Kê çi hizir dikir di derbarê wê rewşa ku bihîst de, dihanî ser ziman. Di wê çerçoveyê de rewşeka nîqaşkirinê di nava civatê de bi germî rûdida.

Dengbêj, di vê çerçoveyê de afrîneriyê wê rewşê bûn. Wan, civat, di nava xwe de agahdar dikir. Her wusa, bi wê re her civate ku lê dirûniştin, bi dengê xwe yê xweş re lev dihanîn ser ziman. Dengê wan pirr xweş bû. Ji ber ku dengê wan pirr xweş bû, ji wan re dengbêj dihat gotin. Gotina dengbêjiyê jî, di nava civate kurd de weke gotinaka navder, hîm û temenê xwe ji vê rewşê digirt.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku dengbêjî, weke rewşeka civatî ya rewşenbîrî bû. Her wusa, her dengbêj, bi xêva xwe û jiberkirina xwe re pirr navdar bû. Hêza wan ya ji berkirinê pirr zêde hebû. Di aslê xwe de, weke aliyekî din ê gotina dengbêjiyê ew bû ku dema ku dihat gotinn ku dengbêj, di vê çerçoveyê de mirovê ku pirr zêde ew destanên pirr zêde dirêj û mazin ku bi şev ûr rojan ku dikarî jiberbike û di hişê xwe de bigrê dihat bîra mirov. Di vê çerçoveyê de, ev jî, weke aliyekî din ê wan yê pirr teybet bû. JI ber vê yekê bû ku dema ku ew êi civatê dirûniştin, wê destanên civatî ji serî û heta dawî, wê bê navber bihanîyan ser ziman. Di wê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku dema ku dihanîn ser ziman, gotinekê weke ku şaş ne dikirin. Di wê çerçoveyê de, herkesekê ku li wan dihisand, ji xwe acêbmayî dihiştin.

Dengbêjî, di vê çerçoveyê de weke rewşeka rewşenbîrî ya civatî pêş diket. Di nava civatê de hebûna xwe didomand. Di serdemênn berê ên kevnera ên civate kurd de, weke zaneyên civatê ên bênav, divê ku mirov di serî de bahse wan dengbêjên civatî ên kurdistanî werêne ser ziman. Wan dîroka civatê, bi wê vegotinkirina xwe re dinivîsand. Mirovan, dema ku piştî wan re dihanî ser ziman, bi wan û bi wê ji wan hisandinê re bahse wan dikirin di civatê de. Her wusa, di vê çerçoveyê de bawerîya mirovan jî, li wan pirr zêde hebû. Mirovên ku li wan dihisand, wê bawerîyeka mazin biwan bihanîyana. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov binxat bike û werêne ser ziman ku dengbêjî, weke çandaka civatî ya pêşketî ku bîrewerî û rewşenîya civatê bi xwe re pêş dixist bû. Her wusa, di vê çerçoveyê de wan dengbêjan bîrewerî û rewşenîya wê zanebûna civatê dikirin.

Em dema ku bahse weyna dengbêjan di nava civatê de bikin, em ku çendî bahse wê bikin wê hindik bimêne. Karê ku wan bo civatê dikir, dibêt ku carna tenê ew di farqê de

bûn. Lê wan dikir. Bi wê bi bawerkirinê ew dikirin. Weke mirovna ku ti carî karê xwe li ardê ne dihiştin bûn. Di vê çerçoveyê de weke mirovna bi karê xwe ve girêdayî bûn. Bi sedsalan bi vî rengî wan domand. Lê di sedsalên dawîyê de dema ku tambûr di nava civate kurd de hat kifşkirin û ji aliyê wan ve hat lê xistin, êdî ew weke ´mitirbê´ civatê jî hatina bi navkirin. Ev gotin, wê piştre, di serdemên ku civate kurd, serdestîya xwe windakir de wê bihatan ser ziman. Yên ku dihanîn ser ziman jî, weke ku li ser navê desthilatdarîyên serdest ew gotin dihanîn ser ziman. Di çerçoveyeka piçûk xistinê de ew gotin dihat hanîn li ser ziman. Weke ku zihniyetek bixwezê pêşîya wê dengbêjiya wan bigrê ew dikir. Di vê çerçoveyê de heta astekê jî gihişt armanca xwe jî. Lê dîsa mirovên ku li ser dengbêjiyê re ew didomandin bûn. Heta salên me, mirov(dengbêj)ên weke ´miradê kinê´ û hwd wê di nava civate kurd de bi dengên xwe yên dengbêjî bi rêz û hûrmet derkevina li pêş.

Her wusa, ev rewş, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê. Wê weke aliyekî têgînî ê civatî jî bê. Her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku di hundurê dîroka dengbêjîya kurdî de wê dîrokeka civateka kurd ku hê ji destpêkê û heta dawiyê ne hatî dîtin û fahmkirin, vêşarî di bin perdeyekê de heya. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov di serî de bi serdemên civatê ên buhurî de bal û heyê bikişênina li ser wê dîroka civatî ya bi wê dengbêjiya kurdî re ku hê vêşarî û sernûxûmandî maya. Heta roja me, ew zêde ne hatîya ser ziman. Di aslê xwe de, rastîya civate kurd, evîn û rastîyên wê yên civatî, û hwd, hemû di wê de bicih in. Li vir, di serî de divê ku mirov wê dîrokê kifş bike û dahûr bike û ji wê hinekî dîroka civatîya kurdistanî werêne ser ziman. Ew zaneyên bênav, ew dîroka civatê ku bi zarîna xwe re nivîsandina, hê ne hatîya ser ziman, Di vê çerçoveyê de di serî de divê ku mirov wê jî bibêje ku ew dîroka ku wan hanîya ser ziman, wê dîroka wê heta serdemên sûmerîyan jî wê herê. Her wusa, ji destpêkê û heta roja me, dîrokeka civatî

.

**Mijare wêjeyê weke çandê ku mirov wê hilde li dest**

Zaroyekî kurd, di piçûkatîya xwe de, di demên berê de, pirr çîrok û çîvanok dihisand. ´Çîrokên keçelok´ bi sadan li dûv hevdû dihatina gotin, û hwd çend ji wan çîrokan bûn. Di demên berê de, weke roja me, tv´ nebûn. Rohnî nebû. Bi şevê, wê dayik û bavan, zarok li dora xwe bicivindan û ji wan re çîrok li ser çîrokê digotin. Min bixwe, çîroka ´mem û zînê´ care pêşî ji bavê xwe bihîst ku bi dahan şevan li ser hevdû li dûv hevdû got û bi dawî nedikir. Bi heman rengî, çîroka şahmaran jî û ya rûstemê zal jî. ..

Di gelek çîrokên kurdan ên civatî ên berê de, ´xezal´ tefsîreka wê ya teybet heya. Her zaroyekî ku bi kurdî mazin bûyî û li wan çîrokên kurdî ên bi afsûn ku dihisandibê, wê bizanibê. Di wan çîrokan de, cihanek bêkêmesî hebû. Ya ku di serê mirov de herî zêde cih digirt jî ew bû. Weke zarokan, mirov dema ku li wan çîrokan dihisand û ew cihana bêkêmesî didît, êdî ji bîr nedikir. Di cihane xwe ya rast de jî, li wê cihanê digerîya. Ji wê cihanê dixwest ku tiştekî û ankû nîşanayekê û an jî kû tiştekî û rewşeke weke ya di wê cihanê de ku bi gotinên çîrokê biwêne bûya dixwest ku bibîne biçav.

Ew lehengên wan çîrokan, dibûn lehengên mirov. Mirov jî, di serê xwe de, car bi car dikir cihê wan lehengan de. Bi wê hiş û hişmedîya zarokî, zarok xwe dikir cihê wan lehengan û ankû ew hişmendîya wan lehengan, di xwe de û di laş û keseyetîya xwwe de dikir yek û dihanî li berçavên xwe. Mejiyê zarok, di wê demê de xwediyê vaca xwe ya teybet a. Ew aferêndîya bêsînor û ya bi hişê wê re êdî bi wî re jî reng û awa distand. Di

wan çîrokan de, weke çend aferendêrên ku dihatina hatina afirandin û hena "rovîyê ku dayimî dikeve ´kûlîna mirîşkan´", "keçîka xweşîk ku ti xweşîkatî ne li ser ya wê re ya", "kalê pirr bizane ku dikarî şîroveyekê ji hertiştî re werêne", "lehengê ku hertimî biser diket", "Keça keyê ku hertimî dikeve male xizanekî de weke bûk", "xezale ku biafsûn bû û dibû keçikeka ku ti kesek bi xweşîkatîya xwe re ne li ser wê re ya û keçe ferîşte(perî)yekê ya," û hwd, çend ji wan gotinên bi dîmen û wêne ên ku ji wan çîrokan ku di serê mirov de cih û war digirtin bûn.

**Xezal, hertimî bi ´masûmîyet´a xwe re hebû. Weke dagera dil paqijî û safîyê bû. Hertimî, ´care pêşî li çoleka ku ti kesek di wê de tûna û ti deng jê nayê de miirov rastî wê dihat" bû. Piştre, hertimî bi mirov re dibû rêheval. Bi şertê ku ti kesek hebûna wê bi me re nizanibê, wê heta dawiya jîyanê bi mirov re ba. Lê ku hebûna wê hat zanîn, êdî wê ji berçavan winda bûba. Ji ber vê yekê, dihat gotin ku "ew biafsûn a." Ev, weke bawerîyekê jî bû.**

Xezal, li çolê, rastî şîvanekî ku li ber kerîyê xwe ya. Yan jî, yekî ku hertimî rêya wî di wê çolê ve diçû ve rastî wê dihat. Kê karîba, nepenîya xezalê bixwe re bigirta û bahse hebûna wê ji ti kesekî din re ne kiriba, wê xezalê, hertimî wê qancî bi wan bikira. Lê ku kengî, yekî tê derxist û ankû kifş kir, ku bi bêhamd jî ba, êdî wê xezalê xwe ji berçavan daba winda kirin. Ew xezale kurd bû. Ew xezale kurd, xezaleka biafsûn û pîroz bû. Diltenik bû. Zîz bû. Xweşik bû.    Rast bû. Hertimî, gotina rastiyê ji devê wê derdiket. Rastî, weke navê wê bû. ..

Ji ber ku xezal, wilqasî pak û paqij û xweşik bû, êdî di gelek çîrokan re di dema vegotinê de ew bi navê "xezale dilsipî" jî hatîya bi nav kirin. Ji ber ku dilê wê safî û zelal û paqij bû, navê wê bi vî rengê bi navê ´xezale dilsipî´ dihat bi nav kirin û gotin. Xweşikatî jî, dilsafîtî jî û dilpaqijî jî, bi navê wê re hebûn.

Xezal, hertimî, keça perîyekê bû. Ew perî jî cin bû. Cin jî biafsûn bû. Di jîyanê de, bi navê wê re nemir bû.

**Cin, di çîrokên kurdan de, hertimî hebû. Têkiliya di nava cin û mirovan re, hertimî li ser hatîya axiftin û bahse wê hatîya kirin. Ên ku bahse kirina, gotina ku "kurd ji cinan in." Keçikeka cin û kurekekî pirr levhatî û sipahî ku mirov, hertimî di jîyane dizewicîn. Ev jî, rastîyaka ku hertimî di çîrokan de bahse wê hatîya kirin. Ahmadê Xanî bixwe jî, dema ku bahse Mem û Zînê dike, dibêje ku ´pêşî sê keçikên şahê acînîyan çûna û ew birina mezela hevdû û ew bi hevdû re dane hevnasîn.´**

Lê weke têgihiştineka ku ji wan çîrokan jî dihat girtin û ku di bawerîyên olî ên xalkê kurd jî de hebû, dihat gotin ku "zaroyek, ku mir ew êdî ferîşteyek a." Dihat gotin ku "zarok, dibêt ku di piçûkatîya xwe de bi mirovan re nikarê biaxivê, lê ew hertimî ew bi çend ferîşteyên li dora wan re diaxivin û dikenin." Bi heman rengî dihat bawer kirin ku "zaroyek, ku mir, ew bi pir(bask) dibe û difirê." bi wê re jî dihat gotin ku "zarok, ti gunah li ser navê wan ne hatîna nivîsandin." Dihat gotin,"ew ´sabî´ na" Gotina ´sabî´, di wateya ´bêgunahbûna zarokan´ de dihat bikarhanîn. Zarok, sabîya herî sabî ya.

Xezalek û zarokek, ên ku bi dilsafîtî û paqijîya xwe re, ên herî nêzî hevdû bûn. Her xezalek zaroyeka û xwediyê dilê wê ya. Her zarokek jî, xezalek a û xwediyê dilê wê ya. Dema ku "yekî, tiştek bihanîya serê xezalekê jî, wê mûhakkak tiştek bihata serê wî jî," Bo vê yekê, dema ku êş biketa nava kerîyê malê de, û ankû dema ku êşekê li wan bixista û çend ji wan bi carekê miriban, ji wan dihat pirsîn ku ka "ma we xezalek kuştîya." Ji ber ku dihat bawer kirin ku ´ê ku xezalek bikuşta wê tiştekî pirr xirab bihata serê wî û

male wî jî´. Bo vê yekê, dihat gotin ku "´laneta kuştina xezale´ hebû û wê wan bigirta." Xezal, hertimî di rewşa xwe de dijî. Zirera wê ne digihişt ti kesekî. Lê yekî ku zirer gihandîyê de, wê zirerê bibîne di jîyane xwe de.

Weke van mijaran gelek mijarên ku em dikarin kifşbikin ş werênina li ser ziman em dikarin kifşbikin. Ev mijar hemû jî wê mijarna çandî bin. Wê xwediyê aqilekê wêjeyî û çandî ê civakî bin.

.Çand, weke mijaraka civatî û jîyanî, divê ku mirov wê werêne ser ziman. Her wusa, têgîna çandê, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov wê bi dîrokeka pêşketîya ya şariştanîyî re dibînê. Em dema ku bahse çandê bikin, li vir di serî de bi gotinekê mirov dikarê bahse wê bike. Her wusa li vir divê ku mirov werêne ser ziman ku ji destpêka afirandina mirov a bi aqilê xwe re di jîyanê de, divê ku mirov bi wê re dîroka civatê, bi dîroka civatê re dîroka şariştanîyê û bi wê re dîroka çand û hûnerî û hwd, bi aqil û pêşketina wê re bidina destpêkirin û werênina ser ziman. Li vir, çand, weke mijaraka ku di çerçoveya salixkirina wê de, hertimî, hizrên cuda ên cûr bi cûr derketina li holê. Bi wê re jî, her wusa dema ku mirov bahse wê dike, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman, têgîna çandê di vê çerçoveyê de weke hizreka ku mirov divê ku wê bi pêşketina aqil re hilde li dest. Her afirandin û çêkerîyên li ser aqil re ku di jîyanê de bi şenberî dihên dîtin, wê bi wê hebûna wan ya dihê dîtin û salixkirî re wê çandînîyeka wan hebê.

Her wusa li vir, divê ku mirov gotina ´çandê´ di serî de hinekî wê fahm bike. Gotina ´çandê´ gotinaka ku ji kurdî ya. Her wusa, koka wê li ser ´ça´ ya. ´Ça´ jî, bi têgînî, wateya kirdeyî ya bi rengê ´çêbûnê´, ´hebûnê´, ´zelalbûnê´ û hwd bi xwe re bi gelek wateyên din re dihêne ser ziman. 'çan´, di dewama wê de wateya çêbûnê´ ûû ankû bi çandinîyê çêkirinê dihêne ser ziman. Têgîna ´çandînîyê´ ku di wateya di nava axê de çandinîyê bi xwe re bi wate dike, wê bi wê re xwediyê temenekî û wateyekê bê. Bi wê re jî, di vê çerçoveyê de dema ku mirov li wê dihizirê, di vê çerçoveyê de ´çan´, mirov dibînê ku wateya hanîna li holê jî, bi xwe re dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de em dema ku li têgîna li ´çan´ê´ dihizirin, em vî jî, dibînin ku têgîna ´ji ardê, çêbûnê´ bi xwe re dihêne ser ziman. Her wusa gotina çandê´ a kurdî, di vê çerçoveyê de têgîna ´ji ardê çêbûnê´, weke têgîneka hîmî û bingîhînî bi xwe re dihêne ser ziman. Em dema ku li ser vê rengê têgînê dihizirin, em dibînin ku hê di serdemên sûmerîyan de têgîna ´ji axê bûnê´ mirov dibînê ku wê bi hebûna mirov ku bi bûna wî re jî dihêne ser ziman. Tê gotin ku ´mirov ji axê çêbûya´ Emê li jêr bi berfirehê li ser vê aliyê gotinê bisekinîn. Li vir, di çerçoveya fahmkirina têgîna gotinê ya navaroka wê de me av alî li vir hanî ser ziman.

Her wusa dema ku mirov li vir li ser têgîna ´çan´ê re di meşê, mirov di vê çerçoveyê de bi wê re ku weke têgîneka salixkirî´ ya bi rengê ´ji ardê çêbûnê´ û ankû ´ji axê bûnê´ bi xwe re dihêne ser ziman. Ev têgîn, wê hîmê têgîna gotina çandê jî di çerçoveya ji zimanê ku ji wê ya di kurdî de bi wê re xwe bide dîyarkirin. Li vir, li ser ´çan´ê wê re wê piştre ´hûnandin´ bi gotinî bibê. Her wusa weke ku mirov dibînê ku ´d´ li dawiyê bicihkirina wê û piştre bo tawandina wê li dawîya ´d´yê jî tîpa ´ê´ bi cihkirin û kirina weke ´çandê´ û hwd jî, wê di vê çerçoveyê de bi pêşketinên ziman û her wusa têgînîya wê re xwe bide dîyarkirin. Ev hemû, wê weke aliyna ku em divê ku li ser têgîna wateyê û pêşketina aqil re ku werênina ser ziman in. Di vê çerçoveyê de mirov dibînê ku gotina çandê, wê di çerçoveya têgîna xwe ya ku bi xwe re salix dike û dihêne ser ziman, wê bi

têgîna wateyê re xwediyê pêşketinekê bê. Li ser wê re hanîna wê ya li ser ziman, wê weke ku di serdemên bûhûrî de ku bûya, wê rengekî pêşketinê ê demên buhurî bi wê re werêne ser ziman. Li vir, em di dewama wê de vê yekê jî, werênina ser ziman ku wê têgîna çandê, di nava xwe de weke du wateyên têgînî ên weke kirdeyên vêşarî wê têgîna wateyê û ya aqil bi pêşketina aqil û zanînê re bi xwe re bigihêne li hevdû û li ser wê re xwe bide hanîna li ser ziman bike. Ji xwe, dema ku mirov di vê çerçoveyê de li wê dinerê, mirov vê yekê baş dibînê ku çand, xwe li ser aqil û wateyê û pêşketina wan ya dem bi dem bi jîyanê û aqilê mirov re xwe dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de her afirandin û pêşketinên ku dibin, wê bike nava xwe de. Ji vê aliyê ve, dema ku mirov ji aliyê aqil ve lê dinerê, mirov dibînê ku weke gotina giring, gotina çandê derdikeve ber me. Her wusa, weke gotinaka berfireh û sînorên wê yên navarokê pirr fireh derdikeve ber me. Em vê yekê, ji wê têgîna wê ya ku ew bi xwe re salix dike, ji wê fahm dikin. Bi wê re, divê ku mirov wê jî, werêne ser ziman ku têgîna çandê, di vê çerçoveyê de bi dîrokê re, dema ku em li ser pêşketinên aqil ên di jîyanê de re ku li wê dihizirin, em dibînin ku weke ku têgîna bi gotina çandê re weke têgînaka giring ya ku em divê ku bi rengê pêşketina aqil re ku wê fahm bikin û werênina ser ziman a. Her wusa, nirxandina pêşketina aqil û tiştan bi aqilî, wê di vê çerçoveyê de weke aliyekî têgînî ê vê gotinê jî bê. Di vê çerçoveyê de weke karekî ku em li ser qarakter û qabîlîyetê re werênina ser ziman hûner jî, wê di vê çerçoveyê de weke ku di çerçoveya tevgerna salixkirî ên têgînî û bi wateyî de xwe bidina dîyarkirin. Hûner, weke mijaraka giring ya têgînî û zanînî, di nava çandê de divê ku mirov di vê çerçoveyê e weke aliyekî nirxî ê çandî jî li wê bihizirê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîna çandê, di vê çerçoveyê de li ser kifşkirina bi rengê aqil û hwd re, weke çerçoveyeka jîyanî û têgînî mirov wê kifş dike.

Em li vir, di serî de werênina ser ziman ku di serdemên buhurî de kalên me kurdan, dema ku bahse têgînîya çandî li cem wan dihat kirin, wê weke bersivekê, bidan mirov û bigotina "tu bahse çi rengê jîyanê dike.!" Di vê çerçoveyê de bi gotina ´.. rengê jîyanê´ re bersivek ji vê gotinê re dihanîn. Em dema ku bahse têgînîya civatî dikin, her wusa di nava kurdan de wê di cih de têgîna ´kevneşopîyê´ were berbîra mirov. Weke navê jîyanê, wê gotina kevneşopîyê, wê di cih de di mejiyan de şaq bide û werê hanîn li ser ziman. BO vê yekê, di serî de divê ku mirov werêne ser ziman ku gotina ´kevneşopîyê´, wê weke gotinaka civatî ku bahse jîyanîya civatî ya ku kurd wê dijîn dikir, wê bihata ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku heta roja me jî, gotina kevneşopîyê, di vê çerçoveyê de wê were hanîn li ser ziman. Her wusa, gotina kevneşopîyê, weke ku di civatên kurdan de dihat ser ziman, divê ku em weke navê rengekî jîyanê ê jîyane biaqil werênina ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de gotinên weke ´çandê´, ´hûnerê´ û hwd, di vê çerçoveyê di nava wê de werênina ser ziman. Ji van gotinan re jî, hin şîroveyên civatî hebûn. Divê ku em pêşî wan jî li vir werênina ser ziman û piştre bi mijara xwe de pê de herin. Ev, wê hinekî me di mejiyê me de rohnî jî bikin.

Her wusa gotina ´çandê´, dihat ser ziman, bi wê re gotinên weke ´orf´ û ´ adet´an jî dihat ser ziman. Ev gotin, di nava jîyanê de ji rabûn û rûniştina mirov çi hebû û nebû, bi wan re dihat ser ziman. Her wusa, dema ku mirov di rahişt kevçîyekê ku ji nava xwarinê di bir berdevê xwe de jî, bi wê re wateyeka ku mirov dikarê bi wê têgîna çandê re bihanîya ser zimann hebû. Her wusa, di vê çerçoveyê de gotina ´çandê´, weke nava jîyanekê, ji

rabûn û rûniştina mirov û heta li xwekirin û jîyane mirov û rengê axiftina mirov jî di nav de wê bi xwe re bihanîya ser ziman. Mirov, di wê çerçoveyê de li axiftina xwe de heyîder bû. Weke ku kalên me kurdan digotin "mirov, li gotina xwe muqayet bû". Ev gotin, li gorî demê jî dihat ser ziman. Her wusa dihat gotin ku ´divê ku mirov li axiftina xwe jî, miqayet bê.´ Yanî, bi wateya ku dema ku çi got û hanî ser ziman, di zanîn, hiş û bîrewerîya wê de bê. Di vê çerçoveyê de gotina ´bîrewerîyê´ weke gotinaka ku pirr bi navdar bû di nava kurdan de ku ev rewş pirr zêde bi wê dihat ser ziman bû. Gelek wateyên ku li vê gotina bîrewerîyê´ ku hatina kirin hena. Ew jî, rengekî din ê têgînî ê vê gotina çandê, di wê rengê de dihanî ser ziman. Di vê çerçoveyê de weke ku dihat hanîn li ser ziman, bi rengekî jîyanê ku bi kirin li berçav ku dihatin kirin û tiştên ku li ser mirov weke cil û ku di male mirov de bo xamilandinê ku dihatina bicihkirin û dîtin, bi wan re dihat ser ziman. Li ser wan re rengê jîyanê dîtin.

Lê gotina ´hûnerê´, her wusa hinekî din cûdatir bû. Ew jî, bi teybetî, di nava kurdan de, bi rengê hal û tevgerên mirov re dihê hanîn li ser ziman. Gotina ´hûnerê´, gotinaka zimanê kurdî a pirr kevna ku em dikarin bi şûnpêya wê re heta serdemên Medîya, berî wan ya hûrî û mîtannîyan jî jî herin. Ev gotin, bi teybetî, vac û têgîna wê li ser tişta ku bi tevgerî dihê dîtin, dihê hanîn li ser ziman. Mirov, çawa dinerê, çawa dirûnihê û çawa xwediyê hal û tevgerna ya, wê bi wê re bihatan ser ziman. Li ser wê re jî, wê rengê hizirkirina mirov jî, wê biheta ser ziman. Di serdemên buhurî de, di nava olên civate kurd ên weke êzdatîyê de di çerçoveya têgînna bawerî de jî dihat hanîn li ser ziman. Lê di serdemên piştre de, weke ku were jibîrkirin li rewşa xwe dihê terikendin. Ti kesek bahse wê nakê. Lê di nava civatê de di civînên pîr û kalan de dihat ser ziman. Di wê çerçoveyê de, di aslê xwe de ya ku ew parast û hanî heta roja me jî ev rastî bûya. Bo vê yekê, ne tenê bo gotinên zimanî û rengê bikarhanîna wan û ku bi çi wateyê hatina bikarhanîn, bo rengê aqilîya wê jî, ku dihat ser ziman, em bo wê deyndarê wan kalên xwe yên bizane na.

Li ser têgîna çandê dema ku mirov dihizirê, her wusa mirov gelek aliyên ku jîyane civatî re ku bi navê ´kevneşopîyê´ re dihatina jîyîn dibînê. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku jîyan, li vir, her wusa di çerçoveya têgîna xwe ya civatî de pêş dikeve. Piştî ku civatîtî pêşket û pê de, her wusa têgîna kevneşopîtîyê weke rengê jîyane wê pêşket. Her wusa, weke ku kurd heta roja me dikin, di nava jîyane xwe de rêgezên jîyanî ên wan hena. Wan rêgezên jîyanî ku li gorî wan jîyane xwe dijîn û didina domandin, wê weke destûrna jîyanî ê binirx û heta ku pîroz bibînin û werênina ser ziman. Li ser wê re jî, wê bi wê re êdî jîyane xwe werênina ser ziman. Î ro, di nava civate kurd de, ji sadî pênc jî ji wê rengê jîyane demên buhurî tûna ya. Her wusa, çend ku em dibêjin ku em di serdemeka aqil de dijîn û li gorî wê pêşketinê divê ku jîyan hê zêdetir û bêhtir bi reng û awa bibe, lê vajî wê, pêşketîya.

Li jîyanê, di vê çerçoveyê de dema ku mirov di çerçoveya gotina ´çandê´ de dinerê, mirov dibînê ku di demên buhurî de çendî pêşketinên wan hebûn. Her wusa, ji roja bûyîna zaroyekê û heta mazinbûn û pîrbûn û piştre mirina wê jî, wê sal bi sal hin kevneşopîyna ku çandî ku em dikarin bi wê re werênina ser ziman, wê di jîyane wan de hebin. Her wusa li vir, dema ku em bahse wan dem û serdemên jîyane mirov bikin, em li vir, pêşî ji ser aliyê jinê ve pêde herin. Ji ber ku temenê malê weke têgînekê bi wê re dihat ser ziman. Di vê çerçoveyê de dema ku bahse jinê dihat kirin, weke ku bahse malîtîyê dihatkirin. BI heman rengî wateyek mazin dihat dayîn li wê. Di vê çerçoveyê

de em tenê salên jinê ên zawacê li kurdistanê di nava civate kurd de werênina ser ziman. Ev dem, weke demna giring bûn. Ez di wê baweriyê de me, dema ku bahse wan were kirin û ew werina fahmkirin, wê aliyekî civate kurd ê giring wê were fahm kirin. Keçik, dema ku hat dema keçkanîya xwe, wê bidest ´amedekarîya cihêzê xwe bike´. Di kurdî de ji wê re ´cihêz´ dihê gotin û ev gotin, di kurdî de pirr kevn a. Weke gotinaka dema civatîtîyê ya.

Her wusa ew dema keçkanîyê, wê di wê de keçik, cihêzê xwe çê bike. Wê di malekê de çi hebe, bi naqş û hwd, wê çê bike û di wê de bicih bike. Di mala bavê xwe de ku dayika wê çêkiriya û bi xwe re hanîya ku çi hebe, wê pêşî wan ji xwe re weke mînaq bigrê û ji xwe re weke pêşî çê bike. Piştî ku ew temem kir, wê piştre ku tişta ku hat aqilê wê, wê ew jî ji xwe re êdî çê bike û bi serve zêde bike. Piştî ku keçik zewicî û çi male xwe bixwe, êdî wê male xwe ji wê cihêzê xwe biadilêne. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê male xwe bi gotinaka din weke ku di nava xalkê de dihat ser ziman "wê male xwe ava bike." Di vê çerçoveyê de keçik, mal ava dikir. Lê mêr jî, tişta ku di hundurê malê de kêmbû, wê hewldaba ku dîtiba û hanîba. Wê di her karê xwe de bi hevdû re ban.

Ev, weke kevneşopîyekê bû. Ew naqşên ku keçikê bidestê xwe çê dikirin, weke çandaka pirr qadîm ya pirr kevn di nava wê de hebû. Her naqşa ku çê dikir, bi reng û pêjn(motif)ekê ew çê dikir û di nava cihêzê xwe de çê dikir. ´Xalîçeyên hetan ku bi hêtê hundur ve dihat dalaqandin bo xamilandinê, wê cûr bi cûr naqş li ser wê bihata çêkirin. Wê ew xalîçe, weke nîgaraka roja me ya pirr giranbûha ba. Wê qadrê wê pirr mazin ba. Her wusa, her pêjnê ku dihat naqşkirin, wê ji nava rengê jîyane civatê ba. Yanî, bi gotinaka din, ji nava rengê çanda civatî ba. Her wusa, ´naqşaya şahmaran´ yek ji wan nirx û naqşayên pirr qadîm û kevn ku dihat çêkirin bû. Her wusa, wê her naqş, hata ku ji dest dihat xweşik dihatina çêkirin. Ji xwe, dema ku em bahse kevneşopîyê wê keda bidest ya bi hûnandin û dirûtinê ku ji wê re ´naqş´ jî dihat gotin, wê bi wê re rengekî pirr xweşik biheta afirandin. Her rengên ku dihatina bikarhanîn jî, bi yên din re di nava ahengekê de bûn. Bi hevdû re di yekrêzî û yeknaşaqiyê de bûn.

Naqş, weke gotinaka ku em dema ku bahse gotina ´kevneşopîyê´ dikin di nava civate kurd de ku wê di cih de were berbîra mirov bê. Gotinaka ku pirr bi şenber bû di mejî de. Dema ku bahse ´naqş´ dihat kirin, wê bahse naqşkirinên li ser kevîyên doşek, balgih û perdeyên dalaqandinê ku dihatina çêkirin wê werê berbîra me. Ji xwe, bi teybetî, weke navê wan, di cih de ev dihat bîra mirov. Bi wê re jî, wê ew naqş, biheta kirin. Li hinekî jor, me di nivîsandina xwe de bahse dema keçkaniyê kir. Her wusa, dema ku bahse vê dema jîyane mirov dihat kirin, di cih de bi wê re gotina naqşê´ jî di mejiyê mirov de şaq dide û diket bîra mirov de. Sedema wê jî, ew bû ku hertimî keçikên ku ´balix bûn´,, wê hertimî weke karekî ´naqşkirin´ bikiran. Wê hertim, di naqşkirinê de bihatan ditin. Car bi car keçik li hevdû di civîyan û bi hevdû re navengek xweş diafirandin bi hevdû re û hem bi hevdû re ´bi dengbêjî ku diavêtin berhevdû´ û di ber re jî ´naqşên xwe dikirin.´ Wê hertimî di wê çerçoveyê de bi hetan cem hevdû. Hertimî di nava rojê de, di wan demên ku dunya germbû de di bin sihwanekê de dihatina cem hevdû û hem naqşên xwe dikirin û hem jî bi hevdû re bidengbêjî digotin jî. Carna, weke gotinekê ku di nava civatê de jî bûya û hatîya ser ziman ku dihat gotin ku "ciwanên mêr ên ku li hevdû kom dibûn, diçûn devereka nêzîk li cihê ku keçik lê bi hevdû re kom in disekin in û li dengê wan dihisandin.´ Her wusa, ev rewş, weke rewşeka ku di nava civatê de jî bûbû bû bi nav û deng.

Keçikan, dizanî ku ciwanên xort hinekî li dûrî wan li wan dihisênin. Ew, carna weke ku li xoşa wan jî diçû. Lê wan, rewşa xwe xira ne dikirin û weke ku heya wan ji wan tûneyî, ew rewşa xwe ya dinava xwe de didomandin. Bi wê re jî, wê bi hevdû re bigotan. Her wusa, vêca ku ji nava wan keçikên bi kom ku dilê hinekan ji wan di hinek ciwanên xort ên ji wan hinekî wirda heba û ku ew jî bi heta zanîn, wê ew di nava keçikan de bûba mijara kenkenoka, şememoka û henhenoka(hanakoka). Bi heman rengî, wê li aliyê din ê ciwanên xort jî bûba. Di wê çerçoveyê de rewşek civatî ya ciwanî ku ji wê re ´rewşa ciwanî´ dihat gotin, wê biafirîya. Ew rewşa ciwanî, weke rewşeka ku her mirovê ku dixwest ku di wê dema jîyane xwe de bijîya. Ew rewş, weke rewşeka ku piştre bîrhanîna wê jî, kelegermiyek û xweşiyek dikir dil de. Her wusa, rewşeka pirr xweş û xweşik bû. Ciwanan, di wê dema xwe de, cilên xwe yên herî xweşik li xwe dikirin. Wê "desmala xwe ya xortaniyê" bikira destê xwe de û biçûya nava hevalên xwe. Wê di nava wan de bisekinîya. Ew rewşa li xwekirina cilan û desmalê, weke rewşeka biqadr û qiymet ya ciwaniyê jî dihat bi navkirin. Li ser wê rewşê re di nava civatê de gelek vegotin, çîrok û çîvanok dihatina vegotin. Ev vegotin, çîrok û çîvanok, wê rewşeka hê xweşiktir ba di meji de. ..

Li aliyê keçikan jî, wê rewş bi heman rengî ba. Weke ku Ahmedê Xanê jî di berhema xwe ya ku navê wê "mem û zînê" ya de ku dihê ser ziman, weke desmalê, gûstilk jî, wê weke rastîya ciwaniyê ya mirov nikarê li ser wê re bi buhurê ya. Ev rewşa gûstilkê, em nikarin bibêjin ku Ahmedê Xanê ew ji xwe re di wir de bi wî rengî hanîya ser ziman. Ew rewşa gûstilkê, divê ku mirov binxat bike û werêne ser ziman ku rewşeka civatî ya civate kurd ya bi hezaran salan a. Her wusa, divê ku mirov vê yekê binxat bike û werêne ser ziman. Ji xwe, ew weke rewşeka xwe jî dihat ditin. Her wusa, mirov, ji wan nîşanakên weke desmalkê, gûstilkê, hamawîyê, û hwd, wê rewşa şariştanî ya ciwan ku keç ba û kûr ba wê fahm bikira û li gorî wê nêzîkatî lê bikira. Yanî, bêî ku mirov gotinek bigota bi devkî, wê rewşa mirov ya bi li xwe kirinê û tiştên weke desmalê û gûstilkê û hwd, wê rewşa mirov bi awayekî pirr zêde vekirî bida dîyarkirin. Her wusa, li vir, weke sê rewşên teybet ku di nava civate kurd de ji wan re pîrozî jî hatîya baxş kirin, rewşên weke ên ´rewşa desmalê´, ´rewşa gûstilkê´ û ´rewşa hamawîyê´ na. Ev her sê rewş, bi serê xwe yekê li ser wan bi sedan vegotin, çîrok û çîvanokên ku binirx dihatina vegotin hebûn di nava civatê de. Di aslê xwe de Ahmedê Xanê, ev hersê rewş jî, bi çend gotinan di berhema xwe ya bi navê ´mem û zînê´ de hanîna ser ziman. Her wusa, rewşa gûhartina gûstîlkê ya mem û zînê, wê her wusa bi wê rewşa ciwanîya wan re rewşa dilê wan ya ji hevdû re werêne ser ziman. Ev weke rewşeka pîroz dihat ditin. Ji ber vê yekê bû ku Ahmedê xanê, ev rewş bijartîya û bi wê re xwestîya ku mem û zînê werêne ser ziman. Li ser wê rewşê re xwestîya bi wê kevneşopîyê, kirasê pîrozîyê li hevdûyan jî bike. Her wusa ´rewşa hamawîyê´ rewşeka teybet ya civatî ya civate kurd a ku bihezaran salan heta roja me jî ma ya. Li gorî wê kevneşopîyê ku jineka kurd, çû nava du aşîr, û ankû mêrên ku bi hevdû re pevdiçin û ankû pevçûnê dikin bi hevdû re, ku ew hamawîya xwe di nava wan de avêt ardê, êdî ew hardû mirov û ankû aşîr jî, mecbûr in ku dawî li wê pevçûn û dijberîya xwe ya li hevdû bênin. Bo vê kevneşopîya hamawîyê jina kurd, bûya parastvanekî xweza ê aramî û aşîtîya navxweyî ya civate xwe. Temenê vê kevneşopîyê, di nava êzdatîyê de jî heya. MInaq, di nava çanda êzdayîyê ya pîroz de, jinek ji zaroktiya xwe ku hîç na zewicê jî li laleşê disekinê û her dirojên weke cejnan ên weke ´cemaya laleşê´ û hwd de ku mirovên ku herin û bibina hacî de, wê ´gezek ji nanê

şikeve´ ji destê wê bixwûn û wê pêvajoyaka bûna hacî ya xwe bênin li cih. Her wusa, ev kevneşopî, aliyekî vê kevneşopîyê ya. Bi vê kevneşopîyê ya ku weke ku di nava civate kurd de di demên buhurî de jin hatîya pîroz ditin. Her wusa, ev çanda pîroz dîtina jinê, wê ji dema melekê Tawis, û heta dema Mîtra û Zerdeşt û piştre Manî, û piştî wan re dema Siltan Şahaq û Şêx Adî û hwd, wê were. Ev kevneşopîyeka civatî ya civate kurd ya bi hezaran salan a.

Her wusa li vir divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku têgîna pîrozîyê, bi jina kurd re bi vê kevneşopîyê re dayimî ya. Her wusa, divê ku mirov vê kevneşopîyê, bi giringî û rêz û hûrmet werênina ser ziman. Em jî, rêz û hûrmeta xwe li ber wê didin nîşandin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ji ber vê yekê bû ku dema ku ´mem bi mîrê bota re bi lîstika ´kişikê(sedrencê) dileyizê ku li berhevdû dirabina ser xwe û jinek di cih de tê û li nava wan disekinê û hamawîya xwe ji serê xwe diavêjê nava wan li ardê. Ev kevneşopî, di vê çeçroveyê de, vê kevneşopîya civatî ya pîroz dihêne ser ziman.

Kevneşopîya destmalê, her wusa, weke dagera keçkaniyê û xortaniyê ya. Her wusa, bi wê re jî, ev serdem dihêna ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ev kevneşopî, wê weke çandaka civatî ya weke ya çanda hamawîyê bihezaran salan kevn bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku kevneşopîya hamawîyê, wê di vê çerçoveyê de were ser ziman. Di xate êzdayîyê de jin, weke xatekê bawerî jî bi pîrozî heya. Em divê ku vê yekê bi teybetî werêne ser ziman. Di serdema Qasîtan de çanda ´gûla´, di serdemên sûmeran de çanda lipît îştarê´, di serdemên hûrî mîtannîyan de çanda ´kûpapa´ û ankû weke ku li Anatolia dihê bi navkirin ´kîbêlê´ ya. Her wusa, ev çand, hemû di wê xatê de ji kevneşopîya wê dihên. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku çanda jinê, di vê çerçoveyê de weke aliyekî giring ê civatî ku bi bawerî jî hatîya salixkirin û ser ziman a. Di vê çerçoveyê de bi teybetî divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa weke çandakê ku di nava civate kurd de bi vê çandê ve girêdayî hebû, ku dema ku mêrêk mazin dibû û piştre ku di zewicî, bi nêzîkatîya wî ya li jinê û hewldana bûna layiqî wê re ew dihat pîvandin. Her wusa di vê çerçoveyê de weke asta wê tevgerîya mêr jî, jin di wê çerçoveyê de bi kevneşopî hebû.

Çanda civatî, di vê çerçoveyê de dihat pêşxistin. Her wusa di vê çerçoveyê de nêzîkatîyên li hevdû, wê çawa bi watekirinê werina ser ziman, di wê çerçoveyê de têgîneka civatî hebû. Hewldana fahmkirinê, hinekî jî, divê ku mirov bi vê çerçoveyê re werêne ser ziman. Hewldana fahmkirinê, weke têgîneka bi watekirin û salixkirinê ya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku çanda civatî ya bi li hevdû civînê û hwd, divê ku mirov di vê çerçoveyê de weke temenekî pêşxistinê jî werêne ser ziman. Di nava kurdan de gotinek hebû. Dihat gotin ku "tişta ku di civatan de hat ser ziman êdî nayê ji bîrkirin." Her wusa, ku di civatan de mirov çawa dihat ser ziman, wê ew di derbarê wî de hatina li ser ziman, weke navê wî, di nava civatê de bigerîya û heta ser ziman. Li ser wê re jî, wê êdî bahse wî bikiran. Wê ew biheta naskirin. Di vê çerçoveyê de biqancî û ne qancî, başî û ne başî, bi xirabî û ne xirabîyê re mirov dihat ditin û ser ziman. Di vê çerçoveyê de bi têgînî weke ku ´qarakterê mirov´ dihat ditin û ser ziman. Mirov xwediyê keseyetîyek çawa bû, pêşî dihat ser ziman. Piştre jî, divîyabû ku xwediyê keseyetîye çawa ba, wê biheta ser ziman. Ev jî, wê êdî di wê çerçoveyê de di

nava civatê de biawayekî gelek mirov ji hevdû re diaxifin û dihênin li ser ziman, wê biheta li ser ziman.

Têgîna civatî, ku em bi civate kurd re werênina ser ziman, di vê çerçoveyê de ev li hevdû kombûnên bi civatî ên ku her şev di nava xwe de dikirin, divê ku mirov weke çandaka civatî ya teybet binxat bike û werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ev çanda civatî, her wusa weke aliyekî giring ê civatê û xwe hanîna li ser ziman a wê bû. Her wusa, destanên civatî ên weke ´şahmaran´, ´rûstemê zal´, û hwd, wê bi şevan di wan de bihetan ser ziman. Çîrokên civatî, ên weke ´çîrokên keçelok´ ku hezar çîrok li dûv hevdû û bi hevdû re dihat vegotin, wê her şev ji zarokan re bihata vegotin. Zarokan, xwe di wan çîrokan de bi wan mejiyê xwe re xwe didîtin. Li ser wan re dihizirin. Her wusa, di demên buhurî de, kurdek û ankû zaroyekî kurd ku li çîrokên keçelok ne hisandî nebû.

Çîrokên keçelok, weke vegotinna çandî û civatî bûn. Her wusa, di nava wan çîrokan de ji jîyane biafsûn û heta her cûre lehengîya ku dihat nîşandin hebû. Her wusa, wê ew lehengî, bi têgînî di mejiyê zarokan de bicih bûba. Her wusa, di wan çîrokan de, her mirovê, weke ku rewşa xwe ya di nava civatê de didît. Di nava civatê de divîyabû ku çawa ba û xwediyê çi erkê û xwediyê jîyanaka çawa ba, di derbarê wê de dibû xwediyê têgîn û zanînê di mejiyê xwe de. Her wusa di vê çerçoveyê de ku mirov bibêje, xwe nas dikir, wê xelat nebê. Wê rast bê. Rewşeka bi vî rengî di nava civatî de her wusa dihat hanîn li ser ziman. Jîyane civatî, dema ku em bahse wê bikin, her wusa di vê çerçoveyê de bi aliyê wê vegotinî, çîrok û çîvanokî ve ku mirov wê dihêne ser ziman, mirov rastî rewşeka çandî ya jîyanî ya pêşketî tê. Her wusa li vir divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku jîyane civatê, bi wan vegotin weke ên ´şahmaran ´, ´rûstemê zal´, ´çîrokên keçelok´ û hwd dihat hûnandin. Ev, mejî û bîra civatê bûn. Her wusa, gelek mifteyên têgînî ên mejiyê civatîtîya civate kurd di van çîrokên ku me navê wan li jor da de heya. Bo vê yekê, bi teybetî, divê ku dûbare bi dûbare divê ku mirov li ser wan bihizirê û wan werêne ser ziman.

Mejiyê civatê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku çerçoveya wê diafirê. Her wusa, lê ji aliyê din ve jî, ev gotin, di mejiyê herkesekî de hena. Herkesek, di nava civate kurd di derbarê çîrokên keçelok de xwediyê zanînênê na. Wan dizanîn. Bihîstina. Bi heman rengî, mirov dikarê bo çîrokên din ên weke ya şahmaran û rûstemê zal û hwd jî bibêjin. Li vir, divê ku miirov vê yekê werêne ser ziman ku ev hevbeşîya di zanînê de weke aliyekî teybetî ê ku bi vegotinî û vebêjînî ku hatîya pêşxistina. Ev aliyê hevbeşî ê zanînî, wê temenê pêşketina têgîna civatî ya bi hevdû re bê. Her wusa di vê çerçoveyê de çîrokên keçelok ku dihatina ser ziman, wê ne tenê zaroyek û ankû mirovek li wan hisanda. Wê gelek mirovan li wan bihisanda. Her wusa, gelek mirovan bi gelek cûrayan dizanî. Wan jî, ji yên li dora xwe re dihanî ser ziman. Bi vî rengî rewş pê de diçû.

Rewşa çandê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov hinekî li ser vê aliyê hevbeşîyê de bbi têgînî weke aliyekî wê yê civatî divê ku mirov kifş bike. Bi wê re jî, divê ku mirov bi aliyê wê yê çîrokî bi serê xwe jî rewşa çandî ji aliyekî din ê duyem ve bi wê re kifş bikin. Ew çîrok, weke şîroveyna civatî, wê gelek mirov bi heman şêwayî bizanibê. Li ser wê re, wê bêne ser ziman. Ew çîroka ku dihê zanîn, dema ku em dibêjin ku gelek mirov wê dizanin, wê her mirov çîrokekê nizanibe. Wê heman çîrokê gelek mirov bizanibin. Ev rewş, wê çîrokê di vê çerçoveyê de ji vê aliyê zanîna wê ve jî bike rewşek

teybet ya çandî de. Her wusa dema ku mirov ji vê aliyê ve li wê dihizirê, mirov wê aliyê wê kifş dike.. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîna çandê, di vê çerçoveyê de weke têgînek civatî di pêvajoya pêşketinê de ya. Bi hevbeşî zanîn, wê rewşeka civatî bê. Her wusa, lê li vir, divê ku mirov vê yekê bizanibê ku mejiyê her mirovî ne weke hevdû ya. Bo vê yekê, fahmkirnên cûda, ji pêşketinên jîyane mirov û her wusa rengê mirov wê pêş bikevin. Mirov, ku di farqê de bê û ne di farqê de bê, wê rengê jîyane mirov ya ku mirov wê dijî, wê bandûra wê pirr zêde ji ya ku em dizanin zêdetir jî li ser pêşketina mejiyê mirov wê hebe. Mirov divê ku dema ku dijî, ku ew tişta ku jîya ku xweşîyek bê û ankû nexweşîyek bê û hwd, wê di vê çerçoveyê de di mejî de pirr zêde xwediyê heyîneka afrîner bê.

Dema ku em bahse heyîna jîyanê û pêşketina wê bikin, divê ku mirov di vê çerçoveyê de bahse jîyankirina mirov jî bike. Jîyankirin, bi hiş û hişmendî ya. Her wusa, dema ku em bahse aliyê têgînî ê bi çandî dikin, em divê çerçoveyê de dikin. Di nava kurdan de dema ku bahse kevneşopîyê dikin û bi teybetî ku gotina ´kevneşoîyê´ dihê hanîn li ser ziman, weke ku bi wê re têgîneka bi hizirkirinê ya vbi teybet were ser ziman, ew dihê hanîn li ser ziman. Bi wê re, weke ku bahse wê jîyane mirov a ku dihê û ew hişê mirov ê di derbarê wê de dihê kirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de bahse wê dihê kirin. Bi wê re jî, bahse têgînîya jîyanî ya bi aqil dihê kirin.. Li ser kevneşopîyan re, bahse têgîneka jîyanî ya bi aqil dihê kirin. Bahse jîyaneka ku bi hiş dihê kirin. Di serdemên buhurî ên civate kurd de, gotina ´kevneşopîyê´, ji ber vê yekê, dem bi dem, li şûna têgîna hişmendîyê ya di derbarê jîyanê de jî hatîya bikarhanîn. Bi wê hatîya xwestin ku were dayîn nîşandin ku jîyaneka bi aqil û ankû jîyaneka bi hişmend were hanîn li ser ziman.

Di vê çerçoveyê de bi têgîna çandê re dema ku mirov hewl dide ku çandê werêne ser ziman, têgîna kevneşopîkî pirr zêde xwe dide li der bi gotina kevneşopîyê re ku divê ku mirov wê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de em dema ku wê werênina ser ziman, bi aqil û aqilmendiyekê û her wusa bi têgîneka zanînî ew hatîya hanîn li ser ziman. Mirovekî ku bi kevneşopî, weke mirovekî bi zane hatîya hanîn li ser ziman. Yekî ku car bi car kêmesîyek dikir û ankû bizanebûnî bê û ankû ne bizanebûnî bê, ku tiştekî xelat bikira, wê ji wî re bihata gotin ku ´tu, ma bê kevneşopîyî yî´. Bi vê gotinê, têgînek dihat ser ziman. Dema ku em vê gotinê bi zanîna roja me werênina ser ziman, wê bê hanîna li ser ziman ku me tu ne bizanebûnnî, ma tu ne biaqil î, ma tu, qey aqilê te tûna ya û hwd. Di vê çerçoveyê de wê hinek gotinên din jî, werina li ser ziman. Ew gotin, ew in ku wê bi têgînên weke orf û adetan re na. Dîtinên mirov ên rabûn û rûniştinê na. Her wusa di vê çerçove têgîna dîtinên mirov, ku weke ´adetên mirov´ jî mirov dikarê werêne ser ziman, wê pirr zêde biheta ser ziman.

Dîtinên mirov, weke gotinaka ku mirov di nava civatên kurdistanîyan de pirr zêde dibihîst. Her wusa, wê jîyaneka çawa bi ditin bijî, bahse wê dikirin. Jîyane bidîtin, çi bû û çawa bû? Jîyane bi ditin, ew bû ku dema ku mirov di wê de her gava xwe bi zanebûn û bi aqil diavêt bû. Her wusa jîyane bi ditin, dema ku mirov heya mirov ji her gavavêtinên mirov hebû. Dema ku mirov çi gotin bigota, mirov di derbarê wê de xwediyê zanînê bû. Her wusa, wê gotina xwe bi pîva bigota. Yekî ku dema ku di derbarê gotinên ku digotin de ku bizane ba, wê hingî, dema ku çi got û wê bizanîba. Di nava civatê de jî, ev bi vê gotinê dihat ser ziman û dihat gotin ku "mirov ku zaniba ku çi bi gota, mirovê ku paşî û pêşîya gotina xwe dizanî bû. Yanî, dizanî ku temenê wê gotina

wî ji kû bû. Her wusa dema ku digot jî, dizanî ku wê gotina wî çi ancam bixwe re bihanîya. Ji vê rengê hanîna li ser ziman ev re ew gotin dihat gotin.

Gotin, dema ku hat gotin û piştre hat dûbare kirin, wê bê weke kevneşopîyekê. Lê dema ku ew bihiş bû weke tiştekî, ew çandaka. Lê ji wê jî, ku bû rewş û tevgerîyek, hingî ji wê mirov dikarê bahse têgîna hûnerî jî bike. Gotin, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku di jîyanê de dema ku hat ser ziman, wê çawa hevdû vebêjin û bi hevdû re ne di nava nakokîyê de bin, wê weke aliyekî têgîna kevneşopîkî bê. Ji ber vê yekê bû ku dema ku di civatan de vegotin, çîrok û hwd, dihatina vegotin, wê di wan de li aheng û hevdûgirtina wê were lêgerîn. Ev, dema ku hebû, wê weke gotinaka ´rast´ û ankû ´baş´ bi heta ditin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîna çandê, di vê çerçoveyê de dema ku dihê ser ziman, bi rengê wê kevneşopîyê ê dîmenkirî re dihê ser ziman. Bi kirin, çêkerî, rewşîya wê ya şenber û hwd re were ditin û ser ziman. Aliyekî çandê, li ser salixkirinîyê û ankû têgîna bûyî û ankû jîyane ku bûyî re, ku wê weke ku bûyî bidîmen bike û werêne ser ziman. Her wusa, dema ku mirov li kevneşopîyan jî dinerê, mirov vê yekê dibînê. Kirin, çêkerî û rewşên şenberê ên ku mirov wan bi başî şîrove dike û dihêne ser ziman, wê li ser wê re têgîna ´rastiyê´ wê were ser ziman. Bi heman rengî, berevajî wê, aliyê ne baş û ankû xirab re jî, wê kevneşopîyên ne rast werina ser ziman. Li vir, li ser tişta baş û rast re, divê ku mirov bihizirê. Têgîna tişta ´rast´ û ya ´ baş´, di wê bawerîyê de ya ku dikarê ya baş û ne baş ji hevdû vaqatêne. Kevneşopî, hinekî jî, bi zanebûna wê re weke salixkirinekê ev dihê kirin û dihê hanîn li ser ziman.

Têgîna kevneşopîkî, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku wê weke aliyekî çandî, dema ku miirov li wê dihizirê, wê bi rengê jîyanî, rewş û her wusa levkirina têgînî ya bi reng û hwd re wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, em vê yekê divê ku werênina ser ziman, her tişta ku salixkirî û şenber, weke ´tişt´ wê xwediyê têgîneka hizrî ya zanînî jî bê. Di vê çerçoveyê de çendî ku ew tişt, weke zanînê hebe jî, wê bi wateyên têgînî ku bi wê salixkirina wê re ku dihên ser ziman re wê werina ser ziman. Ji vê aliyê ve çand, her wusa ji wê rengê jîyanê, xwe bi salixkirî dihêne ser ziman. Kevneşopî, dema ku em di vê çerçoveyê de li wê dihizirin, weke têgîneka rêzikî û rêgezî û rêzkarî û hwd, xwe dide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de mirov, bi wê li jîyane xwe ya ku buhurandî, li wê dinerê û wê ya baş û ne baş ji hevdû vaqatêne. Têgîna ´rastîyê´, weke heyîneka ku bi rêgezên destûrkî ên kevneşopî ku weke ku hatibê ´şenberkirin´ mirov bi wan xalên wê re weke ku dibînê. Lê li vir, ji wê zêdetirî, têgîna rastiyê, xwe bi rengê jîyanê ê adilî re dihêne ser ziman. Kevneşopî, aliyekî wê yê têgînî, her wusa bi têgîna adilandina jîyanê re xwe dihêne ser ziman. Rêgezên kevneşopîkî, weke rastîyna ku hevdû bi hevdû di çerçoveyeka adilandinîyê de bi ahengî didin nîşandin in. Her wusa di vê çerçoveyê de, divê ku mirov werêne ser ziman, ku her xale kevneşopîkî, di vê çerçoveyê de weke aliyekî jîyanî a ku hatî salixkirin a jî. Her wusa li ser hinek rewşna salixkirî re mirov dikarê wê werêne ser ziman.

Salixkirina jîyanê, her wusa, bi rengê ku mirov wê çawa bijî, di nava jîyane civatî de li ser rêgezên kevneşopîkî re ya. Her wusa, dema ku mirov di jîyane xwe de tiştekî dijî, miirov wê êdî dûbare dijî, êdî di jîyankirina wê de serwaxt a, wê hingî ew bi mirov re bê çandek. Çand, hinekî jî, di nerîn û nêzîkatîyê de xwe dide dîyarkirin. Dema ku mirov di vê çerçoveyê de li wê dihizirê, her wusa mirov rastîya wê kifş dike. Nerîna mirov çi ya, wê çanda mirov li ser wê re bi serwaxtbûna mirov ya bi jîyane re wê biafirê. Jîyanek,

dema ku mirov di nava mirovan de bi şêwayê parvekirinê bê, wê di wê çerçoveyê de çanda mirov biafirê. Dema ku jîyanek li ser şêwaya qizinckirinê bê, mirov wê li gorî wê aqil pêş bixe. Li gorî wê aqilî ku mirov di jîyanê de bikarbêne û bijî, rê û rêbazan pêş bixe. Bi wê re wê rengekî jîyanê pêş bixe. Ev, wê bi demê re bi afirîna wê re kevneşopî û çanda wê aqilê bi xwe re biafirêne û werêne li holê. Her wusa di nava jîyane civatî de ji aqil û ber bi pêvajoya afirîna kevneşopî û piştre çand û hûnerê de, wê di vê çerçoveyê de teherek jîyanî ya bi jîyankirinê û hwd wê hebe. Pêvajoyên ji aqil û ber bi afirîna kevneşopîyên civatî û hwd ve, her wusa li ser pêşketina aqil û hanîna li ser ziman a aqil re mirov dikarê werêne ser ziman.

Li vir, hinekî jî di dewama mijara fahmkirina têgîna çandê de divê ku mirov li ser têkiliya çandê û aqil re ya li ser jîyanê re ku heya, bi wê re divê ku mirov bihizirê û wê werêne ser ziman. Ev alî, wê weke aliyekî giring ê fahmkirina mirov ya li ser têgîna çand û kevneşopîyên ku di nava jîyane civatî de ku weke destûrên hîmî dihên bikarhanîn jî, mirov wê êdî wan baştir fahm bike. Her wusa, li vir, hinekî jî, têkiliya aqil û kevneşopîyê, bi çand û hûnerê re, wê bi pêşketina aqil, nivîsandinê û hwd re pêş bikeve. Her aqilê ku hat nivîsandin, wê weke binetereka nivîskî wê bi şenberîya xwe ya bi nivîsandina wê re wê hebe. Ev, wê têgînekê bide mirov. Wê fahmkekê bi jîyan û jîyankirinê re bide me. Li ser wê re hanîna li ser ziman, wê her wusa, vê yekê bide nişandin ku nivîsandin, temenekî giring ê vê rengê afirandinê ya. Nivîsandin bixwe jî, dema ku bû û pê de, wê di jîyanê de weke çand û kevneşopîyeka di nava jîyanê de wê xwe bide dîyarkirin. Fêrbûna nivîsandinê û kirina wê, wê weke pêvajoyên pêşketina wê ya di jîyanê de bin. Fêrbûn, azmûn û ceribandin, wê her wusa têgînna li ser aqil û zanînê re bin.

.

**Weke mijarek çandî û civakî li kurdistanê newroz**

Divê ku mirov werêne ser ziman ku Newrozê, wê weke têgîneka dîrokî ya ku bi hezaran salan wê xwe dabê domandin bê. Dîroka newrozê, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, mirov ji gelek aliyan ve têgînên civatî ên wê kifş dike. Di serî de divê ku mirov vê rastiyê bi gotina newrozê re fahm bike û werêne ser ziman ku wê weke têgîneka serdema ku di wê de êdî ´civatîtî´ ku pêşketîya bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov di serî de werêne ser ziman. Her wusa, di çerçoveya têgînekî felsefîkî, estetîkî, hûnerî û çandî de jî, têkiliya di nava wê jîyan û jîyandina mirov û xwezayê bixwe de jî bi xwe re di ahangekê de dide dîyarkirin. Her wusa bi rengînîtîya wê bê û ankû bi pêşketin û awayê wê jîyanî bê, mirov wê çawa ku karibê bi xwezayê re bijî û ji wê sûd bigrê, hinekî jî newrozê weke têgîneka wê jî ya. Di vê çerçoveyê de weke têgîneke felsefîkî ya serdema aqil ku bi xwezayê û jîyanê b hevdû re ku pêş dikeve ya.

Newroz, di aslê xwe de di çerçoveyek têgînek pîroz a bi bawerî ku di xate bawerîyî ya yek-xwûdayî ya yazdanî de ku pêş dikeve divê ku mirov wê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov di serî de li rastiya wê bihizirê. Her wusa, ev kevneşopîya yazdanîyê, wê bi demê re bi dîroka xwe re bi hezaran salan wê dem bi dem pêşketinên nû bi xwe re bide çêkirin û bi xwe re werêne ser ziman. Dem bi dem, wê şîrove û rengên nû ên pêşketinê bi wê re werina pêşxistin. Ev jî, wê jîyane mirov bi reng û meng bike. Bi demê re dema ku mirov wê dibînê, her wusa, em dikarin bibêjin ku wê weke têgîneka bi bawerî ku bandûra wê li pirranîya pêşketinên dîrokî jî ku wê bibe ya. Newroz, weke destpêka salê ku di çerçoveyek stêrzanîyî de ku bi kifşkirina 12 komkên

stêran û bi wê re di çerçoveyek wekhevdûnî de piştre kifşkirina heyvan ku bi wê re weke têgîneka stêrzanî û hwd de, di nava salnamaya berê zayinê a kurdî de dihê ser ziman. Li gorî avêsta jî, ´xwûdê´ ku bi wê re bahse ´ahûra Mazda dike, dibêje ku dunya di 365´ roja de afirandîya û destpêka wê di 21 adarê de ya. Bo vê yekê, weke destpêka sersalê jî, di vê çerçoveyê de dihê ser ziman. Newroz, weke ku êzdayî (´êzîdî)yên roja me jî pîroz dikin, di serdemên sûmerîyan de jî, weke rojek pîroz ya xate yek-xwûdayî ya yazdanî dihat pîrozkirin. Weke rojek, "zindîbûna xwezayê" û ankû weke "roja destpêka afirandina xwezayê" jî dihê ser ziman. Xwedawenda jin Lipît Îştar, di wê rojê de weke ku afirandinê bike dijî. Di vê çerçoveyê de hinek tefsîrên ku bi lipît îştar re hatina kirin, mirov di vê çerçoveyê e dibînê. Her wusa, di vê çerçoveyê de Lipît îştar, mirov dibînê ku weke nirxeka vê yazdanî mirov wê kifş dike. Di aslê xwe de hebûna îştar, wê hinekî jî bide dîyarkirin ku ka çawa di xate yazdanî jî ´jin, hatîya kirin.´

Di vê çerçoveyê de bi demê re her wusa, wê pêşketin bi demê re bibe. Bi demê re wê li wê zêdekirin bibe. Di serdemên gûtî, hûrî û mîtannîyan de, di wê xatê de weke Îştar, ´dayika hebedê´ û hwd jî, divê ku ku weke xwedana dayîn, afirandin û bereketê jî tê ditin, mirov divê ku li vir wê bibîr bixe. Her wusa di vê çerçoveyê de wê weke rastîyeka newrozê were ser ziman. Di rojên bi vî rengî de wê di parastgehan de, weke ku Mîtrayî dikin, wê hertimî di parastgehan de agir were pêxistin. Her wusa, di wê heftaya ku di wê de newrozê wê were pîrozkirin de, wê bawermend, cih bi cih bigerihin û wê agirê pîroz pêbixin, heta roja newrozê, wê ev weke kar û erkeka pîroz werekirin û bicihhanîn. Piştre jî, wê di wê çerçovey de jîyan were geşkirin. Di nava wê geşkirinê de wê mirov di nava jîyane xwe de herin û werin. Wê ji heft cureyên zadên xwezayê, weke ´genim´, ´nahk´, ´nîsk´, û hwd, wê xwarin werina çêkirin û wê bi hevdû re bêxwarin û ankû li hevdû were parvekirin. Ev jî, weke kevneşopîyekê bê jîyankirin. Kevneşopîya newrozê, wê di vê çerçoveyê de ji serdemên gûtî, hûrî û mîtannîyan, di çerçoveyek bawerî ya yazdanî de pirr zêde di jîyanê de bi reng û meng pêş bikeve. Her wusa dema ku em li rengê jîyane wê ji vê demê ve jî binerin, emê di çerçoveya, rengên li hevkirî ên weke ´kesk´ , ´sor´ û ´zer´ de ku ew jî di vê xatê de pîroz in, wê were û pêş bikeve.

Her wusa, wê piştre li ser Xwedawenda jin lipît Îştar re di nava xalkan de weke cejnekê jî were pîrozkirin. Piştre, her wusa bi lipît îştar re dihê ditin "tammûz(dammûzî)" jî, wê di vê çerçoveyê de were biwate kirin. Heta ku wê ev bi watekirin, wusa û wilqasî pêş de herê, wê weke ´cejna tammûz´ jî, wê piştre bi sedsalan wê di 21´ê adarê de wê were pîroz kirin. Tammûz, weke ´şivanê´ lipît îştar a, ku bi wê re dihê ditin a û weke ku bi wê ve "girêdayî" ya jî dihê ditin û ser ziman. Bi watekirina bi wê çanda newrozê re wê pirr zêde bibe. Cejna newrozê, weke cejnaka ku li herêmê pirr zêde dihê pîroz kirin a. Hewldana salixkirin û fahmkirina destpêka wê, weke karekî pîroz û stêrzanî jî wê xwe bide dîyarkirin. Di nava olzanîya ku bi ´Nûh´ re dihê ser ziman de jî, weke ku Di ´tewratê´ de dihê ser ziman, wê bê gotin ku "piştî ku Nûh, kişta xwe çêkir û kir ku dêne li ser avê û êdî bi wê re herê, tê gotin ´ew roj, roja 21´ê adarê´ ya.´ Di vê çerçoveyê de şîroveyek jî bi newrozê re hatîya pêşxistin. Li ser wê re jî, bi watekirin, hewl hatîya dayîn ku were kirin. Tê gotin ku ´Pêşî, cejna newrozê hatîya pîroz kirin û piştre Nûh kişt berdaya avê.´

Her wusa, li vir divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku weke têgîneka bi newrozê re ku heta roja me di mejiyê kurdan de ya, ku têkiliya newrozê û şahmaran b hevdû re dihê zanîn a. Di vê çerçoveyê de ew dûîtîya jîyanî ku bi ´jin´ û ´mêr´ û hwd re

dihê ser ziman, di wê çerçoveyê de wê şîroveyên stêrzanî ku dihên pêşxistin, wê bi wê re were ser ziman. Di vê çerçoveyê de bahs û şîroveyek weke ya ejderhayekê bi newrozê re dihê kirin. Weke dema ku ejderha difirê û li ber rohniya rojê şer dike, bi gelek motifên wê re mirov di çanda hûrî û mîtannîyan de dibînê. Her wusa bi Zerdeştîyan re jî mirov dibînê. Di vê çerçoveyê de ku weke şerê di nava ´başî û ´ ne başîyê´ de ku pirr zêde bûya mijara çîrokên civatî ên di nava kurdan de jî, mirov bi wê re dikarê werêne ser ziman. Minaq, weke roja gihiştina li hevdû jî roja newrozê hatîya şîrovekirin. Îştar di wê rojê de bi tammûz re dihat cem hevdû li dunyê. Di vê çerçoveyê de gelek şîroveyên ku piştre bi Awa û cûreyna din dihatina vegotin, hê jî di nava civate kurd de dihêne vegotin. Me li jor, hinekî bahse gotina ´newrozê´ û navarok û têgînên bi wê re kiribû. Lê li vir, divê ku mirov cardin bibêje ku dihê wateya ´jîyane nû´ û ankû ya ´nava rojê´ û hwd, di kurdî de.

Çanda newrozê, wê bi demê re, ji van deman û piştre, dem bi dem xwe bide jîyandin. Her wusa, piştre, di dema Mîtannîyan û Medîya de wê pirr zêde pîrozbahiyên bi wê re werina ser ziman. Piştî vegotina kawayê hesinkar û pê de, di vê çerçoveyê de weke ku ji nû ve di çerçoveya têgînek berxwedanî û pîrozî de bi watekirina wê re wê were pîroz kirin. Ev roj, di vê çerçoveyê de jî, weke ´rojek destpêkê´ hatîya pêşwazkirin. Ev kevneşopîya newrozê ya jîyanî û civatî, wê piştî Medîya re, demên şariştanî û civatî ku di wê de xwe de dihên û pêş dikevin, heta ku dihê dema axamanîşan û Sasanîyan ûû hwd, ku Zerdeştîtîyê weke olek fermî ji xwe re pêş dixin, weke nirxeka wê, wê ev kevneşopî jî, di nava wan de pirr zêde were ditin. Di vê çerçoveyê de wê ev kevneşopî, bê rengekî jîyanî. Ji xwe, di nava têgîna xate yazdanî de û bi teybetî weke bi Zerdeştîya wê re wê bi jîyanê re ji nû ve rengekî pêşketinê bi xwe re bide jîyankirin. Lê bi aliyê wê bawerî û nirxî û hwd, hertimî wê kevneşopîya newrozê ku bi navê wê bê û ankû ne bi navê wê bê, wê xwe li ser êzdayîyan û komên ku ji wan diafirin û pêşketinên cuda bi xwe re di wê xate de didin çêkirin, wê bi wan re xwe bide dîyarkirin. Her wusa di vê çerçoveyê de, heka em rast bixwezin ku kevneşopîya newrozê li ser xate wê ya dîrokî ya rast fahm bikin, divê ku em li ser navê ´yazdan´ re bi melekê tawis û heta ku dihê piştî wî bi Mîtra û Zerdeşt re û piştî wan re jî bi Manî re divê ku mirov li vê binerê û hewl bide ku fahm bike. Ev xat, wê xate rast ya vê kevneşoopîyê bê ku wê dihêne ser ziman. Her wusa, wê di çerçoveya civatî de jî, bi Êzdayîyan û heta ku dihê yarsanî, şebekî û feylîyan û hwd re, wê di vê çerçoveyê de jîyaneka ku di çerçoveya vê kevneşopîyê de hatî hûnandin û bi nirx û têgîna wê re dihê jîyîn, mirov wê bi wê re bibînê.

Kevneşopîya Newrozê, wê piştre jî, weke kevneşopîyeka civatî ya dîrokî xwe bide domandin. Çend ku piştî hatina îslamê û îslam li dijî wê çandê bi rengê pêş dikeve jî, lê li kurdistanê di nava kurdan de wê rewş ne wusa bê. Her wusa, oldarên kurd ên misilman ên weke Ahmedê xanî, wê şîroveyeka pîroziyê di dema xwe de li ser vê çand û kevneşopîya newrozê bi vegotina xwe ya weke ya "Mem û zînê" bike. Zaneyên kurd ên ji rojhilatê kurdistanê ên weke bawê tahirê ûryanî û hwd jî, bi heman rengî wê weke bi vegotinên xwe yên bi "ferhed û şêrîn" û hwd bikin. Têgîn û rengê van şîroveyan, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman a. Dema ku em van rengên şîroveyê ên bi têkiliya dilî a di nava jin û mêr de ku baş fahm nekin, emê wê rastîya wê ya kevneşopîkî a bi pêşketina wê ya wê demê jî baş fahm nekin. Her wusa, divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ev rengên şîroveyî ku weke ´vegotinên evîndarî´ û hwd re ku dihê ditin, wê rengekî li jîyanê jî bixin. Ev, wê jîyanê bi reng bikê. Rengê jîyanê û

pêşketina wê, çawa di çerçoveya wê çand û kevneşopîyê de dihê pêşxistin û ditin, mirov bi awayekî vekirî di vê çerçoveyê de bi demê re dibînê. Her wusa çanda civatî, di vê çerçoveyê de li ser esasê civatîtîyê xwe li kurdistanê bi wê re daya domandin. Li vir, bi rengê vê kevneşopîyê re, ahengek di nava rengê pîroz û bawerîyê û hwd de jî bi wê re hatîya pêşxistin. Lê ne hatîya hiştin ku ne jîyan, di bin rengê hanîna ser ziman a bawerîyê de winda bibe û ne jî bawerî, ji wê dûr bikeve, di çerçoveyek bi vî rengî de hatîya ser ziman. Rengê bawerîyê, di vê çerçoveyê de bi vê kevneşopîyê re di rengê têgîneka ´rewîstî´ û hwd de, hertimî pêşketina xwe bi ahengekê daya jînkirin û domandin. Ya ku weke rengekî pêşketinê a vê kevneşopîyê ku mirov werêne ser ziman jî wê ev bê.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku bi demê re ev kevneşopî, wê pêş bikeve. Di vê kevneşopîyê de dem bi dem şîroveyên nû bi vegotinî hatina kirin û pêşxstin. Ev jî, bûna sedema dem bi dem ji nû ve şîrovekirina wê ya bi demê re. Di vê çerçoveyê de jîyan jî, weke ku were ji nû ve şîrovekirin lê hatîya. Di vê çerçoveyê de ev kevneşopî, bûya weke kevneşopîyeka ku wê jîyan ji nû ve şîrovekiriya. Di aslê xwe de ev kevneşopî, di temenê her pêşketinên kurdistanî û herêmî ên bi xalkên herêmê re de bûya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku jinûvebûnek, hertimî di vê çerçoveyê de bi demê re di nava jîyane mirovan de afirandiya û pêşxistîya. Hertimî, bûya temenê di çerçoveyek ji nûvebûnî de ku ji nû ve bê şîrovekirin û afirandin. Di vê çerçoveyê de ku mirov bibêje ku li kurdistanê newroz, jinûvebûneka jîyane û pêşketina jîyane civatî ya herdemê ya, wê rast û di cih de bê.

Em li vir, divê ku vê yekê, bi awayekî rast werênina ser ziman ku newroz, di vê çerçoveyê de weke ku xwediyê kevneşopîyeka dîrokî ya pirr kevn a. Lê vê kevneşopîyê, hertimî, bi têgîna jinûvebûnekê jîyan bixwe re ji nû ve afirandîya. Ev kevneşopî, di roja me de jî, biheman reng diafirêne. Di her rojên 21´ê adarê de li her bajar û herêmên kurdistanê ku kurdistanî qadan tişî dikin û pîrozbahiyê li dardixin, nîşanaka vê ya civatî ya. Di roja newrozê de dayîna peyamên dîrokî, weke ku namayên birêz Ocalan di roja newrozê de di newroza 2013´an û newroza 2015´an de hat xwandin û hwd, di vê çerçoveyê de ku li gorî gîyane newrozê ya, bi wê re têgînek bi têgîhiştînî ya demî dihê hanîn li ser ziman. Li vir, dema ku em di vê çerçoveyê de bi rengê hanîna li ser ziman di newrozê de di vê çerçoveyê de, mirov divê ku werêne ser ziman ku newroz, di vê çerçoveyê de ji ber ku bi têgîn û kevneşopîya xwe re xwediyê wê temenê wê ya ku dikarê wê biwate bike ya. Di çerçoveya jîyane civatî û nirx, maf û azadî û pêşketina wê de di vê çerçoveyê de, ji ber ku xwediyê wê wate û têgînê ya bi dîrokê re ya. Em li vir, divê ku di vê çerçoveyê de jî di rojên newrozê de xwandina namayên birêz Ocalan ên di newrozê de jî werênina ser ziman. Em nikarin, tenê bi sedema ku tenê li wir, bi milyonan kurdistanî ku li hevdû dicvin û pîroz dikin re werênina ser ziman. Bi vê aliyê re, divê ku mirov bi têgîn û wateya newrozê re şîroveyekê di vê çerçoveyê de pêş bixe û bi wê re werêne ser ziman. Divê çerçoveyêê de sal bi sal, ev salên ku em dibuhurênin, dikarin bi fahmkirina wan re jî, vê rewşê baştir fahm bikin. Her wusa rastîya kevneşopîya newrozê, di vê çerçoveyê de weke kevneşoîyeka biwateyî ya dîrokî, felsefîkî, bawerî û nirxîya bi civatî û pêşketina wê re ya.

.D çerçoveya dîroka kurdistanê ji dema Merwaniyan û pêde, weke destpêka dîroka hemdem a kurd û kurdistanê jî, mirov dikarê bi nav bike. Piştî vê demê û pêde, wê Zanyarên kurd ên weke Êlî Herîrî û hwd ku di roja me de weke "helbestvanna" tên dîtin

û binavkirin lê ku birastî ku mirov li wan dinerê, mirov nikarê bi tememî di vê rengê û temenê de bênina ser ziman Derdikevin. Minaq, Êlî Herîrî, felsefe ziman, vac werze(matamatik) û hwd, li ser kûr bûya. Hema bêja ku di vê demê de û di dema Êlî Herîrî de jîya ya Ebûlîzê Cizîrî heya. Ebûlîzê Cizirî, pirtûkên wî ên ku mana roja me jî, ji aliyê matamatik, geometrî, pêşxistina teknîk û teknolojiyê ve, hizirna mazin di xwe de dihawênin. Abûlîzê Cizîrî, Bi teknîkî dihizirê û metodên teknîkî pêşdixe. Wî, di dema xwe de "şamaya robot" derxistîya. Di pirtûka " Pirtûka li ser Zanîna **Hîleyên Endazyaranî**" de, naqşaya wê çêkiriya û bicih kiriya. Her wusa, hê gelek şamayên din ku em dikarin bahse wan bikin hena di wê pirtûka wî de. Ji xaynê vê pirtûka wî, gelek pirtûkên wî ên bi vî rengî ku wî nqaşkirina hena. Hemû, li ser metod, pêşxistin û pêşketina teknîkî na.

Mirovên weke Şêx Temiyeyê Harranî jî ku ji herêma Rehaya bûna û bi aslê xwe kurd bûna. Pirtûkên ku mirovên wî nivîsandina, piştî jî bi sadsalan di medreseyan de bûna pirtûkên perwerde. Wî mijarên olî hildan li dest. Minaq, gotina "cîhadê" û hwd, wî hildane li dest. Heta ku dem tê dema Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran vê bi vî rengî demna giring ên pêşketinê bijîn. Ji ber çi dema Meleyê Cizîrî û Feqiyê teyran wilqasî giring a. Ji ber ku wan demeka ´jinûvebûyînê´ da dest pê kirin. Meleyê Cizîrî, ku li ser mijarên weke felsefe, matamatik, aqil û zanîn, dîrok û hizra wê, û hwd ku di nav de, wê gelek mijaran hilde li dest û wê ser **43 berheman** re binivîsênê. Ev yên ku bahs dihên kirin û tên zanîn in. Bi gotinekê jî, tê gotin ku "feqiyê teyran, nekêmî wî nivîsandîya." Lê di derbarê herdûyan de jî, çendî wan zêde nivîsandibê jî, em bi tememî ne xwediyê zanînê na di derbarê hemû nivîsandinên wan de. "**maqamata**" Êlî herîrî ku wî nivîsandîya, zimanekî estetîkî û şentetîkî têde hebûya ku tê gotin ku di roja me de jî, bahse wê pirr mazin dihê kirin. Di nava civatên kurdan de, ku heta roja me jî, yekî ku xweşik û rast û bi hevdû re di ahangekê de axift û hanî ser ziman, jê re dihat gotin ku "êêêh, te bi axiftina xwe herîrîyek da nivîsandin." Ev gotina ".. te herîrîyek da nîşandin", di wate wê de dihat bikarhanîn ku wî çendî xweşik û di levhanînê de axiftya. Zimanê, Êlî Herîrî û xweşik axiftina wî, di medreseyan de pirr zêde jî bûya mijare fêr û dersên ku di wan de dihatina dîtin.

Her wusa, piştî Meleyê Cizîrî û Feqiyê teyran re ku hatîya Şêx Ahmedê Xanî jî, ji xaynî ´mem û zîn´, ´aqîda îmanê´ ´ Nûbahara piçûkan´ û hwd, tê gotin wî hê zêdetir û pirr nivîsandîya. Li ser dîrok û aqil tê gotin ku wî pirr nivîsandîya. Di medreseyan de jî bahse van aliyan bi wî re dihê kirin. Ev zaneyên kurd, dîrok bi xwe re nivîsandin. Piştî wan re, kî weke zanist pêşket û hat, wê ji xwe re mirovên weke êlî Herîrî, Meleyê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ahmadê Xanî û hwd ku refarans bigrê û bidest hizirkiirnê bike û bêne ser ziman. Bi teybetî, li ser xate aqil û pêşketina bi aqil re ku em ji dema Merwaniyan û pêde, hildina li dest, divê ku em bibêjin ku ev dem û û piştre ku wê hin bi hin bi hizrî û aqilî bibin, wê demên me ên li kurdistanê û heta ku li herêmê bigiştî jî bidina kifşkirin. Piştî Merwanîyan re, wê Eyûbî li herêmê serdest bin. Eyûbî, wê giringiyê bidina perwerde kirinê. Bo vê yekê, li dora heskîfê bê, li herêmên botanê û hwd bê, li rojavayê kurdistanê bigiştî û li gelek herêmên din û hwd, wê bi mizgeftan re wê gelek medreseyên xwandinê jî bidina çê kirin.

Li Cîzîra bota, ji dema Ebûlîzê Cizîrî û bi vir ve, li wir têgihiştinaka kûr bi werzê û ankû bi navê wê yê din matamatîkê pêşxistibû. Piştî wî re jî, heta ku dem hatibû dema Meleyê Cizîrî, wê li ser wê pêşketin û têgihiştina Ebûlîzê Cizîrî ya matamatik û

gaometrî yê re wê pêşketineka hemdemî wê hin bi hin li wir pêş bikeve. Dema ku em bahse matamatik(werze)ê û geometrî´yê ya hemdem bikin, divê ku em bi awayekî şenber, li Cîzîra bota, Ebûlîzê Cizîrî destpêkekê bidina dest pê kirin. Ebûlîzê Cizîrî, wê li ser werzê û gaometrîyê re, wê têgihiştineka şenber ya teknîkî bide afirandin û bêne ser ziman. Wî, di temenekî ku em dikarin di temenê hemdemîya dema aqil û bi aqilzaniyê ku em bênina ser ziman, wî bi werzê û gaometrîyê ew kir. Ji aliyê Werzê û gaometriyê ve, wî destpêkek bi aqilene û giring dabû dest pê kirin û piştî wî re li ser wê destpêka wî re gav bi gav, wê êdî hanîna li ser ziman û pêşxistin bi demê re bibe. Êdî em dikarin bibêjin ku heta ku dem tê dema Meleyê Cizîrî, wê êdî pergale têgihiştin û bi aqil û aqilzaniyê ya perwerdekirinê derkeve li holê.
..**Şêx Teymîyê Harranî**, ku di derbarê wî de pirr vegotin jî hene, hizrên wî yên ku wî di deme xwe de hanîna li ser ziman, bûna temen û hîm ji demekê û pêşketina wê re. Dihê gotin ku berî Hz. Muhammed herê ber dilovanîya, ji dora xwe dibêje ku "wê mirovek pişt min re were û wê biqasî pêxemberekî pêşketinê di deme xwe de di olê îslamê de bide çêkirin" . Ev gotin, deme ku tê ser ziman, di awayekî ku di demê de bi "xwenûkirinê" re tê ser ziman. Dihê gotin ku ew mirovê ku bi vî rengî Hz. Muhammed bahse wî kirîya jî, Şêx Teymîyê Harranî ya. Şêx Teymiyê Harranî, pirr pirtûk nivîsandin. Pirtûkên wî, wê piştî wî re jî di dergahan de bimen pirtûkên perwerdekirinê. Şêx Teymiyê Harranî, çend ku Î ro li kurdistanê zêde bahse wî jî jî nayê kirin, wî pergaleka perwerde afirandi û bi temenê wê re da rûniştandin û piştî wî re ew hate dayîn berdewam kirin. Hizrên wî, wê ne tenê li kurdistanê, wê derkevina dervî sînorê kurdistanê û wê li herêmê bigiştî wê werina ser ziman û naskirin. Di cihane Îslamê de wê bi naskirin û zanebûna xwe re derkeve asta herî bilind. Di deme ku ´aliyê hizirkirinê´ yên weke ´batinîtî´yê û hwd hene de, wê ew di nav wê hizrê de bidest pêsxistina hizrên xwe bike û wê bi awayekî bike ku derî ji wê cihanê re veke ku êdî derve dervî xwe di wê demê de. Bi vê yekê re, ew li ser ´aqil´ re dimeşê û diçê. Di deme ku weke ku tekoşînak di nav cihana batînîtîyê û ya li ber wê de heya de, ew dikeve cihana batînîtîyê de û dike ku wê ji wê rewşa wê derxe û bihizir re bide berdewam kirin. Bi vê yekê re hê ji gelek aliyên xwe yên têgihiştinî ve Şêx Teymîyê Harranî pirr baş û qanc ne hatîya fahmkirin. Di çerçova wê cihanê û têgihiştina wê ya batînîtîyê re mirov wê Şêx Teymîyê Harranî bi wê pergale wî ya perwerde re li ku derê dêne? Bi vê pirsê re divêt ku mirov bidest hizirkiirna li ser wê bike û hewl bide ku wî fahm bike.

Teymîyê harranî bixwe jî, ji kevneşopîya malbatitiyê şêxê dergahê ya. Li dergaha wî, pir mirovên ku perwerde dibin hene. Hizrên wî yên ku ew dihêne ser ziman, wê di wê perwerdebûnê de bibe xwedî weyn. Şêx Teymîyê Harranî, zanistekî kurd ê ku nav û dengê wî bi zanebûna wî re ji sînorê Kurdistanê buhurtîya ya. Di cihane Îslamê de, ew bûya xwedî nav û deng.Hate ku dem dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran wê li Kurdistanê bi vî awayî wê hê pir mirovên zane di nav civatê de derkevin. Pêşavanîya wan, wê di civatan de di perwerdekirina civakê de xwe bide nîşandin. Lê dem, hate ku dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê pêşketin û pêşveçûnna pir mazin bibin. Wê civak, ji gelek aliyên xwe ve li gor demê bi zanebûn bê. ..

Demên civaktiyê ên hate wê demê, wê bi astên têgihiştinê bi afirin. Heyîna astên têgihiştin, wê dem bi dem ye dem ye ku diafirê wê li ser ye demên buhurtî re bê.Lê wê yên deme buhurtî jî, bike temen û hîm ji xwe re. Li Kurdistanê, têgihiştin, bi kevneşopîyê aliyekî wê yê ku şênber dibû hebû. Ji ber vê yekê, di vir de, divêt ku mirov

pêşî çend gotinan bi têgihiştinî bi kevneşopîyê ve girêdayî bênina ser ziman. Li Kurdistanê, civatên ku hertimî di wan de levcivîn dibûn û di wan re bi hev re danûstandin dibû, wê di wan de hertimî hatineka bizane ye li ser ziman bûba. Ew hatina li ser ziman, wê ne hatiba ji bîr kirin. Piştre di civatên din yên ku dihatina li darxistin de, wê weke vegotinên dûvdirêj, wê bihatan vegotin ji mirovên li civatê re. Ev yek, weke kevneşopîyekê bû. Civatên mîr û yên di nav xalkê de, di wan de hatina li ser ziman, ku çi bihate ser ziman, wê ne hatiba ji bîr kirin. Kurd, bi vê yekê re, xwediyê bîrkirineka pir xurt in.Di hiş de hiştin, bi wan re pir xurt a.Ev jî, weke kevneşopîyeka civatan dihate ser ziman. Her hizra ku di civatan de dihate ser ziman, wê di nav girseyên gel de di demeka kin de bihatan bihîstin. Bi hatina bihîstinê re, wê ew hizra ku hatibû ser ziman, wê bûba malê girseyên civakî. Bi vê yekê re, wê gelemperbûn jî, bihizrî wê biafirîyana. Gelemperbûn, awayê civakê dihêne holê bi têgihiştinê re. Hate ku dem dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê bi vê yekê re li gor demê pir mazin gelemperbûnek biafirîyana. Di aslê xwe de, ew gelemperbûn, berî hingî li Kurdistanê bûya. Lê bi wê rengê demê re bûna wê, êdî dibe û pêş dikeve. Wê di vê demê de, bi vê yekê re ew bibe.

Hate ku dem dihê deme meleyê Cizîrî, wê piştî rêveberîya Merwerîyan, wê "rêveberîya Eyûbîyan" li Kurdistanê bibe desthildar û xwedî hukum.Bi wan re rêveberîya Eyûbîyan û xanadana wan re, wê demeke dirêj biafirê. Bi wan re, wê pêşketinna mazin li gelemperîya herême rojhilat bi hev re bi rê ve herin. Sahaladînê Eyûbî, di cihane Îslamê de yekbûnekê bi desthiladariyê diafirêne. Lê di wê demê de, derketin û pêşketin mezhebe şîîtiyê jî heya. Ew jî, weke alîyekî cihane Îslamê ê din dihê holê. Bi wê re wê du navendên xalifetiyê jî biafirin. Di deme Salahadîn de, ew diçê ser Baxdayê de û li wir rêveberîya ku heya dide ardê û yeke li gor cihane Îslame ye mazin ye ku heya dide avakirin. Bi vê yekê re, ew dixwezê ku ahangekê bi yekbûnî bide çêkirin di cihane Îslamê de. Hate derekê bi ser jî dikeve. Lê piştî wî re, rêveberîyên herêmê derdikevin pêş. Salahadînê Eyûbî, di aslê xwe de li gor demê hîmekî nû jî dide afirandin. Bi têgihiştina wî re, weke ku awayekî xwenûkirinê di deme wî de di cihane Îslamê de xwe dide der.Li Kurdistanê, ji wê demê hate ku dem dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê pêşketineka civatî ye pir mazin biafirê bi musulmanetiyê re. Lê wê, pergalên din ên olî ên weke yên Êzîdîyê jî wê ji holê ne rabin. Ew jî, wê heyîna xwe bidina berdewam kirin. Lê wê, bi hertimî bi çûndineka bi ser wan ve e ji aliyê rêveberîya ve wê heyîna wan xwe bidina berdewam kirin. Di vê demê de, derketina Osmanîyan û serwerbûna wan, wê demeke nû ye ku bi ber reşîyê ve dikişêne wê werêne holê. Ji vir pêde, divêt ku em êdî wê bênina ser ziman. ...

Bi vê yekê re, mirov bitêgihiştin karê li wê demê binerê. Deme Teymiyê Harranî, bi wî û zanebûna wî re hinekî bi pêş ve diçê. Ew di awayê hizir û pergalîya wê de, têgihiştinekê tevdigerihê. Lê di deme wî de, weke ku mirov ji hizrên Teymiyê Harranî ji fahm dike, felsefebûnekê hizrî heya. Ew jî, li gor wê dihêne ser ziman. Bitêgihiştin nêzîkî lê kirin heya. Bi vê yekê re çûn û hatinek heya. Di vê demê de, wê awayên têgihiştinê bi nêzîkatîya xwe ye bi xwe re wê derkevina li pêş. Bi bvê yekê re, batinîtî û nebatinî dihê û derdikeve holê. Awayê hizrên wan û hizirkirina wan, wê bi têgihiştina xwe ye ku ew têde kurbûna wê bêne berhevdû. Bi wê re, wê di serî de tekoşînek têgihiştinî wê derkeve holê. Di aslê xwe de musulmaneti bixwe jî, weke xaleka ku mirov vê çerçovê de wê bêne ser ziman a. Bi têgihiştina xwe re ye ku esas girtîya, ye deme xwe ye herî li pêş e. Bi vê yekê re, di demeka kin de pir zû pêş dikeve. Lê ew

awayên têgihiştinê wilqasî hesanî dernekevine holê û xwe neyênina ser ziman. Wê rêveberî, kevneşopîya wê û statûqûya wê ya ku afirîya, wê li ber wê li pêşîya wê bisekinê. Bi vê yekê re, bi bûna alî ye rêveberîyê re, wê ew tekoşîna di nav têgihiştinan de e hizrî jî, wê dijwartirbûnekê bi xwe re bêne holê di jîyanê de. Serîlêxistina Xalacê Mansûr, di vir de weke ancamaka ku di vê xalê de mirov wê bêne ser ziman a. Her weha hê pir minaqên weke wî hene. Îbnî Haldûn bixwe jî, li vê herême ku hizrên xwe dihêne ser ziman, ji ber ku piştre hatina li ser wî dibe, mafê jîyanê ji xwe re nabînê û diravê li Magrîbê. Ew bûyin, wê awayê hizre olî de dibê.

Hizir, wê bi têgihiştina xwe re, di vir de, wê bi bûn û derketina awayên têgihiştinan re wê pêşketineka wê hebe. Teymiyê Harranî, di vir de, mirov wê heyînê bi wî re dibîne. Ew, di hanîna ye li ser ziman de, di li berbûnekê de ya. Têgihiştina wî, mirov nikarê tenê bi batinîbûnê bêne ser ziman. Awayê pergalîya wî ya hizrî, hîç jî mirov nikarê bi wê bêne ser ziman. Ji wê zêdetir, têgihiştineka wê ye ku hê di roje me de jî ne hatîya kifşkirin û fahmkirin heya. Ew, bi dilê an jî bi batinîtiyê, dike ku têgihiştina olî bi felsefe bike û bi mirov bide fahmkirin.Bi vê yekê re, ew ji deme xwe hinekî di buhurê. Ew, ji ber çi wilqasî li ser "cîhadê" sekinîya û hanîya ser ziman? Bersiva wê pirsê, di wê de bi hizrên wî yên di serî de û bi têgihiştina wî re û bi pergale wî ye hizrî re, awayekî felsefê ku bi wê dihizirê û hinek hizrên ku di wan de aqil û jîra wê li pêş e ku ew dixwezê bêne ser ziman in hena. Ew awayê hizirkirinê û felsefîk, ê batinî, ew dixwezê demeka nû li wê vekê. Ew dixwezê, di wê de pêvajoyeka nû bide dest pê kirin. Wekî din jî, li biaqilîyekê lêgerîn biwî re heya. Ew dike, di wê de pêleka nû bide kirin û pêşketinekê têde bide kirin. Ew,ew cihane wê gotina batinitiyê ye di hundurê mirov de, ew dixwezê ku wê cihanê derxe derve. Bi vê yekê re, bi wê re awayek hizrî ê dana hizirkirinê û hewldanek heya. Ew riya rast jî, bi pêşveçûnan re di wê de dibîne. Batinîtî, di awayê hizirkirinê de buhurtîya. Lê bi serwerîya wê ye pergalî e ku rêveber bi pergalî lê xwedî derdikevin hê ne buhurtîya. Bi vê yekê re, di wê bixwe de jî, weke ku ji bo vê yekê şerbûnek heya. Teymiyê Harranî, di aslê xwe de di vê xalê de girîngîya wê ku derdikeve holê heya. Ew, bi hizirkirina xwe û awayê wê re û hizrên xwe re, di wê xalê de mirovê demeke buhurînê ya. Di naqabîna wê awayê felsefê ê ku têgihiştine wê bi gotinan re derketîya pêş û buhurtîya û pergalîya wê li rêveberîya aliqîya, weke zanistekî Îslamê bi çêtirdîtina xwe re li cem wê têgihiştina ku pêşketîya cihê xwe digirê. Bi vê yekê re, ew li pêşbûneka wî heya.

Di aslê xwe de, ew rê li bidawîbûna deme batinîtiyê divekê. Lê ew, pêşketina ku ew dike ku bêne ser ziman jî, çendî ku ew xurt e jî, ji statûya rêveberêyê na buhurê. Hizrên wî, tenê li Kurdistanê, bi li dergah û medreseyên herêmê xwandina re û li gor wan perwerdekirina zaro û mirovan re bisînor dimêne. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku pêşketinek bi hizrên wî re li Kurdistanê dihê jînkirin. Lê ew bi wê re bisînor dimênin. Lê hizrên wî, bi pirtûkî derdikevina dervî sînor. Hate herêmê Hindistanê jî, hizrên wî digihina wan deran. Ku mirov awayê pergalîya hizre wî fahm bike, divêt ku mirov wê pêşketina wî pirr baş û qanc fahm bike. Bi vê yekê re bi Teymiyê Harranî re mirov dibîne ku di awayê pêşketinê û civaktiyê de, demeka hizrî e ku têde kurbûn dibe, li holê heya.Asteka pêşveçûnê e ku bi hizir û têgihiştina wê re dihê holê û ser ziman, bi wî re heya. Wê ew awayê pêşketinê li Kurdistanê hate ku were deme Meleyê Cizîrî ûp Feqiyê Teyran,wê êdî rengê xwe yê pêşketinê wê li jîyanê pir mazin bide nîşandin. Deme van herdû zanistên piştre jî, wê bi awayekî zanebûnê û têgihiştinê e teybet, were holê û

pêşketinekê bi xwe re derxe holê. Hem Meleyê Cizîrî û hem jî Feqiyê Teyran, wê heya wan ji hizrên Teymîyê Harranî heya. Heya wan, ji wê pergalîya Teymiyê Harranî e bitêgihiştin heya. Di vê qadê de di warê têgihiştinê de bi awayekî teherî, awayekî pêşketinê wê ji deme Teymîyê Harranî û wî, wê were û were hate deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran û wan. Ev awayê wê yê bi pergal jî, fahmkirina wê, wê mirov bigihêne rastîyna pêşveçûnê ên dihizir de û bi teybetî ji di têgihiştinê de li herêmê.

Dem, ji wê demê hate ku dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê pêşveçûnna pir mazin ên li berçav wê bibin. Mirovên weke Teymiyê Harranî, li Kurdistanê bi dergah û medreseyan wê bi hêze xwe ya perwerdekirinê, wê pêşveçûnna mazin di warê civakî û civatî de bidina kirin. Ew pêşketinên ku bibin, heyîna wan ji wê deme hate ku di deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, mirov di qade têgihiştinê de bi awayekî teherî li dûvhevdû di berdewamîya hevdû de bêne ser ziman.Her demê,wê weke ku ji deme ku têde teymiyê harranî jîya ya, ku hate ku dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê biastî û radî wê xwediyê dem bi dem pêveçûnekê bê. Ji deme Teymiyê Harranî hate ku dem dihê wê demê Meleyê Cizîrî û feqiyê Teyran, wê dem bi dem biastbûn û radabûn bilindbûneka bi têgihiştinê wê bibe û wê were holê. Bi vê yekê re, di warê têgihiştinê de tehereka bi kevneşopî mirov dibîne. Bi vê yekê re, ev pirr zelal dihê berçav û mirov wê dibîne û kifş dike.

Dem, ku dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê di ast û rada pêşveçûnê de ast û radeyek were holê. Wê ew ast û rada jî, wê xwe bi wan re bide berçav. Meleyê Cizîrî, di deme ku dihê ser ziman de, bi hewldanaka pir mazin xeyretê dike ku bi aqil û jîreka pirr mazin bêne ser ziman. Mirov, vê yekê pêre baş baş û qanc kifş dike. Ew di serê xwe de pirr safî ya. Bi wê safîbûnê dihê ser ziman.Di deme ku dihê ser ziman de jî, bizanebûn dihêne ser ziman. Meleyê Cizîrî, di wê xate pêşveçûnêye li ber diclê de, wê ast û radeyeka nû bê. Bi wê re jî, bi teybetî, mirov divêt ku di vir de bêne ser ziman, ku ew wê demeka nû bê bi têgihiştina xwe re. Ew, wê di awayekî nûjen de bêne ser ziman. Ew gotinên wî, hemû jî, gotinên bi zane û yên felsefîk in. Ew, pêşavanîyê ji pêveçûneka mazin ye demê re dike. Bi vê yekê re, divêt ku mirov wê pir baş û qanc fahm bike. Meleyê Cizîrî, bi têgihiştina xwe re, di nav têgihiştina kurdan de ast û radeyeka nû ye bi demê re ku pêşketîya ya. Mirov divêt ku vê yekê baş fahm bike, hate ku mirov wî û pêşketina wî ye bi hizrên wî re bi têgihiştina wî re ku dihê ser ziman fahm bike.

Ji deme Şadadîyan hate ku dihê deme Merwenîyan, wê pêşveçûnna mazin bibin. Lê deme Merwenîyan, wê bi pergalî, demeka nû bê. Wê di demê de bi têgihiştin, deme nû ye ku afirîya bê. Bi vê yekê re, di hemdemîya demî de deme Merwenîyan xwediyê nûjenîyeka bi xwe re ya. Mirovên weke Êlî Herîrî û pişt wî re ên weke Teymiyê Harranî, wê hewl bidin ku wê bênina ser ziman. Bi vê yekê re, wê bi têgihiştin, ew nûjenîya demî ye bi hizrên Meleyê Cizîrî re weke demeka nû û têgihiştina nû ye ku pêşketîya, temenê wê diafirênin. Bi têgihiştinî, wê pêşveçûnna pir mazin bi mirovên weke Teymiyê Harranî re bibe. Mirovên weke Teymiyê Harranî, taqsîr nakin û dihênina ser ziman. Li ser her mijarê dihênina ser ziman. Lê di her hanînêyên li ser ziman de jî, bi aqil û jîrîya wê dihînina li ser ziman. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku li gor demê hanînîya wan ye li ser ziman heya. Dem, bi aqil hanîna li ser ziman ji mirov dixwezê. Bi wê re jî, di aqil re jîrê bi vac dixwezê. Vac, teybetmendiyeka hanînîya li ser ziman ye demê ye di hizir de ya. Ev yek jî, pir baş û zelal hatîya kifşkirin û di derbarê wê de zanebûnek heya. Mijarên olî jî, bi vê yekê, di çavderîya nêrîtî ye di hanîna li ser ziman

de di buhur in. Bi vê yekê re, ji nû ve weke ku afirandin biaqil di demê de dibê dihê holê û li berçav. Mirov wê yekê kifş dike. Bi teybetî jî, bi hizrên ku dihêne ser ziman, ku di çi ast û radeyê û her weha awayê de jî bin, di wan de mirov bi awayekî li gor xwe vacîyê dibîne. Li gor vacê hanîna li ser ziman dibîne. Ev vacîtîya ku bi wê û li gor wê dihê ser ziman jî, di aslê xwe de bi asteka demî mirov wê dibîne. Bi têgihiştineka demî ye felsefê mirov wê kifş dike. Di têgihiştinê de, bi li nûjenîyekê lêgerînê re dihê ser ziman. Ev yek, pirr baş dihê dîtin.

Deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, di ast û rada xwe ya ku bi wê dihînina li ser ziman de di vir de bi vê re girîngîyeka wan dihê holê li berçav. Ew di vir de, bi zanebûn bûna. Wan xwe bi aqil afirandîya.Bi vê yekê re, hizrên xwe di civatan de dihînina ser ziman û bi mirovan dihênina li ser ziman.Ew gotina ku hertimî di civatên kurdan de dihate ser ziman "bizanebûnekê û aqilekî bêne ser ziman", di vir de bi wan re bi hanîna wan ye li ser ziman re weke ku wate û rastîya xwe dibîne. Di vê demê de, aqilî pir mazin bi pêş dikeve. Bi aqilbûn tevgerîn û li nêzîkatiyên ku dihêne nîşandin di wan de li wateyeka felsefîk lêgerîn heya. Ev yek, derdikeve pêş. Bi teymiyê Harranî re jî ev yek heya. Bi vê yekê, ew biaqil dihêne ser ziman. Aqilê di serê wî de, wî xwestîya bi wê bêne ser ziman û bi wî aqilê xwe re awayekî nerînê û têgihiştinê bide afirandin di serê mirov de. Li ser vê yekê, pirr jî sekinî ya. Hizrên wî yên ku hate roje me mana, ku mirovlêkolîneka baş û kur li wan bike, mirov wê bihesanî vê yekê di wan de kifş bike.

..Divê ku mirov bi teybetî û biêminî bibêje ku Feqiyê Teyran, zanist, alim û fîlosofê dema aqil a. Wî, weke ku çawa ku Manî, xwest ku di xate wî ya pêşketinê de Zerdeşt bêhtirî fahm bike û bide fahm kirin, her wusa, bi heman rengî piştî Meleyê Cizîrî re jî Feqiyê Teyran bûya xwediyê heman weynê. Weyna Feqiyê Teyran, heta roja me jî, weke ya Meleyê Cizîrî jî û Ahmedê Xanê jî baş û li gorî mazinatî û asta xwe ya pirr bilind ne hatîya fahm kirin. Ev zaneyê civatî û aqil û pirr pêşketî, di ciwanîya xwe de piştî li medreseya Werezûzê û çend medreseyên din ên li herêmê ku xwe mazin ji aliyê aqil û têgihiştinê ve, piştre hat Cizra bota. Li wir, wî, ku di sal û ankû salên wî yên dawiyê de jî bê, Meleyê Cizîrî dîtîya û ji wî bixwe re hizirên wî bihîstîya. Lê Meleyê Cizîrî, car bi car, divê ku em bahse wî bikin ku pergale civatê ji nû ve li gorî demê bi aqil şişt û xwest ku pêş bixe. Di dema xwe de Meleyê Cizîrî, 43´ê berhemên mazin û dirêj ên hizirî û felsefekî nivîsand û li şûn xwe hişt. Bandûra wan hizrên Meleyê Cizîrî, weke ku çawa ku li ser hemû zane, alim û fîlosofên kurd ên piştî re ku tên dibê, wê bi heman rengê li Feqiyê Teyran jî bibe. Ya rastî, divê ku mirov bibêje ku Meleyê Cizîrî pergale civatê ji nû ve afirand li gorî demê. Bi wê jî, xwest ku êdî wê berhema xwe pirr baş bide fahm biirin. Ew piştre li Medreseya Sor bicih bû û êdî xwe nivîsandin û afirandina aqil ku bi wê civate xwe pêş bixe. Wî, rastteqîniyek divê temenê dît û xwe da wê rastteqiniyê. Mirovekî ku li Cizîra bota û ankû li wir mayî û ankû li wir xwandî, vê gotinê ji bo Feqiyê Teyran jî ji dev pirr bihîzê ku "Feqiyê Teyran jî, ne kêmî Meleyê Cizîrî bû û ne kêmî wî nivîsand û hanî ser ziman." Piştî vê gotinê, wê êdî rehmeyek li wî jî bo wanqaskirinên wî yên bi rûmet û pîroz wê lê were kirin.

Piştî Meleyê Cizîrî re, êdî bi hizrên wî re demek dest pê bû bû. Di wê demê de û di wê rêyê de û li ser wê ast û rada wê tgihiştinê, mirovên zane ên weke Feqiyê Teyran û Ahmedê Xanê û hwd tên û diçin. Meleyê Cizîrî, divê ku ez bibêjim ku bavetîyeka wî ya ji hemû zane, alim û hwd re ku wî kirîya heya. Bi vê yekê, divê ku em dîsa bi rêz û hûrmet bahse wê mazinatîya wî ya bi aqilê wî bikin.

Feqiyê Teyran, ew dema nû ku bi aqil êdî hin bi hin pêş dikeve û ji aliyê hizrî û zanînî ve u meleyê Cizîrî pirr mazin temenê wê afirandîya û hanîya ser ziman, wê zanistvanî û zanetîya wê bike. Girêdane Feqiyê Teyran ya bi Meleyê Cizîrî ve, hinekî di vê temenê de di xwe de rastteqîniyekê jî dihawêne. Feqiyê Teyran, dema xwe baş fahm kir. Meleyê Cizîrî baş xwand û fahm kir. Bi wê re jî, dît ku çawa pêwîstî pê heya ku mirov bêne ser ziman. Li ser wê rastteqîniyê, êdî ew dihizirê û dihêne ser ziman. Lê li vir, divê ku ez dubare bibêjim ku divê ku em Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran li dûv hevdû hilde li dest û wan bêne ser ziman û fahm bike. Herdû, ji aliyê fahmkirinê ve jî hevdû temem dikin. Çend ku em meleyê Cizîrî fahm dikin, em ji gelek aliyan ve wî bingehê ku Feqiyê Teyran li ser meşî ê têgihiştinî fahm bike û bibînê. Lê bi heman rengî, çendî ku em Feqiyê Teyran fahm dikin jî bi hizir û têgihiştina wî, em bi wê re hem bi başî Feqiyê Teyran fahm dikin û hem jî Meleyê Cizîrî jî, hinekî dîn jî fahm dikin. ..

.. Feqiyê Teyran, bi nerîneka ji Cizîre bota û têgihiştine wê re dinerê. Bi wê re, xwediyê pêşketinekê ya. Feqiyê Teyran, wate wî, wê ew bi pergalî, têgihiştina wê deme nû, wê pêşî ew bi xwe re bicih bike û piştre di nav xalkê de bêne ser ziman ku ew wê bi wan bide fahmkirin. Bi vê yekê re, ew wê xwediyê hewldanekê bê. Li Kurdistanê li gelek der û deverên wê ew gerîya ya. Her der û devera ku ew çûyê de jî, wî li wir ew têgihiştina xwe ye ku wê di xwe de çêkirîya, ew dihêne ser ziman. Bi vê yekê re dike ku fahmkirinekê bide çêkirin. Feqiyê Teyran jî, weke Êlî Herîrî, meleyê Cizîrî, mele Hisêne Batê û hwd, van zanistên kurd ên mazin hertimî weke "helbestvanna" hatîna ser ziman. Ev awayê hanînên li ser ziman, du sedemên wê hene. Yek, çend ku ev mirovên zane û yên weke wan ku di wê zanebûna xwe de kur diçin bêhtirî serwerîyekê bi xwe re di serê xwe de bi zimên re didina çêkirin. Bi vê yekê re, êdî di levhanînê de, ew pir dibina xwediyê huner û tevgereka mazin. Bi vê yekê re, mirov karê gotinek ji bê, li ser zimên bêne ser ziman. Zimanê kurdî, bi pêvajoyên pêşketin û dem bi dem ên peresendinê ên ku di xwe de buhurandina, hê di deme Medîya de bûya zimanekî helbestî. Gotina bûna zimanê helbestî, têgihiştineka ku bi hestîtîyê re bi mirov re diafirê û wê mirov dihêne ser ziman bi xwe re dihêne ser ziman. Bi vê yekê re, ev demên pêşketinê di wê de bûna. Di aslê xwe de, ku mirov rastûrast bi lêkolînî li ser dihizirê û dinerê, mirov dibîne ku hê di deme Gûtîyan de û di demên berî wan de jî ev yek bi zimanê kurdî re bûya. Dem hate ku dihê deme Mirovên weke Êlî Herîrî,êdî bi awayekî ku mirov ji têgihiştina Estetîkê dûr neyêne ser ziman, zanebûn bi zimên re bi mirov re afirandina û bi wê re hanîna ser ziman. Êlî Herîrî, ji ber vê yekê, weke destpêkeka mazin ye di zimên de ya. Hem di warê levhanîna gotinan de û hem jî di warê di ahangekê de levkirin û hanîna li ser ziman ye wateyê de pêşketineka mazin bûya. Êlî Herîrî, weke ku di têgihiştine vê têgihiştina ku me bi gotina Estetîkê re hanî ser ziman de bû. Ev yek, me di deme ku li ser wî lêkolîn kir de, me pir bi zelalî kifş kir û wê kifşkirinê jî, têgihiştineka mazin bi vê yekê di vî warî de bi me re çêkir.

Dem, hate ku dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran û hwd, wê ev pêşketina di zimên kurdî di kurmancî de pir mazin bi awayekî pêş bikeve. Ziman, bi vê yekê re, mirov karê bêje ku deme ku bi têgihiştine wê re fahmbûnek bi mirov re bû di derbarê wê de, wê hingî bi wê serwerrîya mirov ya bi zimên re wê hêzeke bi gotinan re û bi levhanîna gotinan re wê bi mirov re çê bibe. Ev yek, ji serwerîya mirov ya bi zimên ye bi têgihiştin dihê holê. Bi teybetî, bi Êlî Herîrî re jî, bi Meleyê Cizîrî re jî û bi Feqiyê Teyran re jî û hwd, mirov yekê pir bi zelalî dibîne. Di deme ku li civatan li hevdû

rûniştin dibê jî, wê "bigotinî" lê bênin ji hevdû re. Ew levhanîna ji hevdû re jî, wê piştre newê ji bîr kirin û di wê hişan de bimêne. Bi vê yekê re, êdî ji dev bê gotin. Wê piştre, ev yek, bi hiskirinê re wê bê berdewam kirin. bI vê yekê re, wê têgihiştinek bi afirê. Lê bi wê re jî, weke Feqiyê Teyran, Meleyê Cizîrî jî, ku di ketina nava hizran de, wê di wê deme hizirkirina xwe de hizrên xwe bixwe jî bi rijênina ser rûpel. Bi vê yekê re, biqasî ku dihê hate deme me bi vegotinî ye di derbarê wan de ku mirov jê fahm dike, wan nivîsandinna pirr dirêj jî nivîsandina û li şûn xwe hiştina. Lê hate nivîsandina me ye vê mijarê û nivîsê jî, me xwe negihanda wan nivîsên wan yên ku wan bi destê xwe re nivsandina. Ew zanistna mazin bûn. Ku diaxiftin, bi zanebûn, pir xweşik zanîbûn ku lev bênin. Bi vê yekê re, ew aliyê wan yê heslbestî jî dihê holê. Ev alî, weke aliyekî xweza ê ku bi wan re di civatan de derdikeve holê em dibînin.

Ji vê yekê gavavêtin û wan tenê weke hin mirovna ku tenê helbestvan in, hanîna wan ye li ser ziman, ne rastiyekê diafirêne. Bi teybetî, mirov karê ji bo wê deme hemdem ku mirov Êlî Herîrî ji bi wan re bihasibêne, mirov karê Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, weke du fîlozofna mazin ên deme civakê bêne ser ziman. Wan bi hizra xwe re pergalîyek hanî ser ziman. Nêzîkatîya wan ye ji civakê û civakitiyê re û her weha ji civaknasîyê re çibû, divêt ku mirov wê jî bi zane kifş bike. Wê ev yek, hingî, wê deme wan bi têgihiştin bi me re li ser lingên wê dênê û rûnêne. Felsefe meleyê Cizîrî, felsefeyekê bizane e deme civakê bû. Wî felsefe xwe bi nêzîkatî û hizrên xwe yên hanîn ser ziman re li ser hîmê pergalîya civakî e civatê afirand û ava kir. Bi vê yekê re, mirov karê wî i teybet bêne ser ziman.

Di derbarê têgihiştina wî û nêzîkatîya wî ye bi hizir e civakî û civatî de me li jor bisereke hanî ser ziman. Di vir de, weke pêşketineke wê hizre wî, deme Feqiyê Teyran jî, mirov karê li ser bisekinê. Mirov karê wê bêne ser ziman. Deme Feqiyê Teyran, wê bi wê re bi têgihiştinê re şênberîyek wê biafirê. Bi wê şênberîyê re, wê afirandin û awadan wê bê holê. Di wê demê de, her gotinên ku dihêne ser ziman, bi zanebûnekê û têgihştineka ku bi wan re bi wê dihêne ser ziman. Bi vê re jî, di deme hatina li ser ziman de i têgihiştin bin û pêşketinan di nav jîyane mirov de di serê mirov de bi xwe re dihênin. Bi vê re jî, wê êdî bi zanebûn afirandinak bi afirê. Hizre ku Piştre Ahmedê Xanê sevkî nivîsandina vegotina ´Mem û Zînê´ dike bi wê awayê ku ew di nivîsêne, di temenê wê de ew zanebûna bi vî rengî ye ku diafirê ya. Li ser têgihiştinê re şênberîyek bi nêzîkatîyan û gotinan re di civatên kurdan de bi zelalî xwe di vê demê de dide der. Di wê têgihiştinê û şênberbûna wê de, di hîmê wê de demên pêşketinê ên ku bi zanebûna bi mirovan re heya. Dem, bi awayê xwe yê ku pêş dikeve jî, hate wê demê di xatekê de dihê û tê. Bi wê re, hate ku dihê wê demê jî, wê bi vê yekê re, bi têgihiştin pêşketineka mazin bi afirê. Jîr, di vê demê de wê ji wê têgihiştinê bi wê awayê ku em bi şênberîyê re dihînina ser ziman wê bi afirê û were holê.Wê bi wê re, jîr, bê naskirin. Naskirina jîrê, di aslê xwe de têgihiştina mazin ye di derbarê têgihiştinê de ya. Mirov karê jê re bêje têgihiştina têgihiştinê jî. Bi vê yekê re jîr heya. Afirîna jîrê, wê di wê demê de bi vê yekê re mazin bibe. Bi vê yekê re, di awayê pergale civakîyê ye demê de jî, wê pêşveçûneka mazin li ser têgihiştine re bi wê re bibe. Weke ku hate roje me jî di nav kurdan de dihê ser ziman "wê naskirina jîrê bibe". Bûna naskirina jîrê, pêşketina asteka pêvajoyî e bi têgihiştinê re ya. Bi vê yekê re, di awayê pêşketinê û bi gelemperî jî di asta civakê de wê nûbûnekê bi xwe re bêne holê. Ew nûbûn, wê bi awayê wê yê pergalî re

xwe bide der. Lê di deme xwe de wê ye ku ew wilo zêde newê fahmkirin jî ev yek bi xwe bê.

Feqiyê Teyran, bi vê yekê re, ew bi têgihiştineka mazin ye bi xwe re heya. Di derbarê deme xwe de û têgihiştine wê re ew bi têgihiştin a. Ew, deme ku li pêşîya xwe dinerê çi pêşketin û pêşveçûn bi astî û radî heya, ew dibîne. Bi wê re jî, ew weke asteka nû ye demê derdikeve holê. Feqiyê Teyran, weke rojeka di nava fezeyê de, di deme xwe de di naqabîna me û demên berî xwe de ya. Di wê xale wî de, têgihiştina demên berî ku bi wî re bi têgihiştin bi wî re heya, di wê de dike ku şekl bide demê. Ew deme ku bi meleyê Cizîrî re Destpêkê, di aslê xwe de, ew têgihiştina wê bi pergal bi xwe re dide rûnandin. Bi wê re, li gor wê, wê êdî çawa were jîn kirin, wê jê bi xwe re dide nîşandin. Di deme wî de, wê ew bike ku êdî hertişt bi zanebûnê û têgihiştine wê re werina ser ziman.Bi vê yekêr re bi Feqiyê Teyran re wê aqil bizanebûna xwe re derkeve pêş. Ew, êdî bi vê yekê re, deme nû ye bi asta wê re bi aqil dike. Aqil, ew derdixe pêş. Di bawerî û têgihiştina Feqiyê Teyran de, mirov karê bi aqil xwe bigihêne fahmkirina jîyanê. Bi vê yekê re bi zanebûnê re ew awayê jîyane deme nû dide nîşandin. Feqiyê Teyran, ji hinek aliyan ve, weke ku Meleyê Cizîrî jî temem dike.Di warê bitêgihiştin bicihkirinê de ew weke ku wî temem dike.Ji wê pêşketina bi Meleyê Cizîrî re dibe hîmê û wê dide berdewam kirin bi xwe re. Bi vê yekê re, mirov karê bêne ser ziman û bêje, ku Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, bi demên xwe re di berdewame hevdû de fahmkirina wan e bi tehereka pêşketin û pêşveçûnê e bi demê re, wê rastîya pêşketina wan ye civatî e di berdewame hevdû de e bi hev re wê raxe li berçav.

Di vir de, mirov karê hê jê kur herê û bêne ser ziman. Bi Feqiyê Teyran re, mirov karê bi têgihiştinê kur herê û bêne ser ziman. Ew li ser têgihiştinê bi awayekî şênber di rê de dimeşî. Bi vê yekê re mirov karê bêne ser ziman û bêje, ku ew pir mazin di têgihiştinê kur bû. Feqiyê Teyran, bi têgihiştinkirina wî, di vir de di hanîna wî ye li ser ziman de wê ji me re li gor demê bi zanebûn wêneyê bide me. Ku mirov lê bihizirê û li têgihiştina wî bi hizirê, mirov wê wî wêneyî bi zanebûn bigirê. Ew wêne, li gor wê demê, çawa hizirkiririn heya û têgihiştina û bi wê re asta demê çiya û çawa ya, wê dihê holê bi xwe re. Feqiyê Teyran, bi vê yekê re zanistekî civatî ya. Bi vê yekê re, mirov karê wî bêne ser ziman. Zanîna Feqiyê Teyran, wê bi têgihiştina wê re, wê demekê bi xwe re doi jîyanê de bide vekirin.

Ji aliyê kevneşopîyê ve jî, mirov divêt ku mafê wî bidiyê de. Ew di wî warî de jî pir xurt û li pêş bû. BI zanebûneka civatî li pêş bû. Ew di wê zanebûnê de kur bûbû. Û di kirinê de, wî têgihiştina xwe ya civatî li ser wê dabû avakirin. B vê yekê re, ew zanebûna xwe re bi kevneşopîya xwe re dimeşî. Ya ku wê di nav xalkê de pir mazin dide herêkirin û rêz û hûrmetekê jî dihêne, ev yek bixwe ya. Kurd, pir bi kevneşopî û nirxên xwe ve girêdayî na. Deme ku nirx û kevneşopîyên wan bûna mijar di gotinê de, cihê gotinê ji ti kesekî re nahêlin. Bi vê yekê re, di nav kevneşopîya xwe de jî, pêşxistin û mazinkirina zanebûnê jî, bi wan re hertimî bi hewldanekê re li pêş bû. Mirov wê yekê di dît. Di vir de civat, divêt ku carek din bahse wan bê kirin. Civat, ew cihên levrûniştinê, cihna ku mirov wan di vir de bi awayekî pir mazin şîrove bike û bêne ser ziman. Civat, temenê pêşketina civatî ye kurd bûn. Têgihiştineka civatan e teybet hebû. Di civatan de kurdan, xwe û nirxên xwe dihanîn ser ziman. Çi bi wan re di serê wan de ba, wê di civatan de bihanîyan ser ziman.Bi vê yekê re,wê daban mayîndakirin. Civat, di aslê xwe de, komcivînên civakî ên ku civate giştî bi rê ve di birin bûn.Feqiyê Teyran,

wê bi vê yekê re xwe bigihêne têgihiştina mazin. Bi wê re jî, zanebûnaka xwe ya bi pergalî e civatî biafirêne û piştre bi pergalî jî, wê di nav xalkê de bêne ser ziman. Di hanîna wî ye li ser ziman, nirxbûn bi naskirina bizanebûnî re li pêş bû. Bi têgihiştin naskirin, pir mazin li pêş bû. Feqiyê Teyran, wê di deme xwe de, bi vê yekê re ji wê deme nû ye ye ku bû re, wê bê temen. Bi têgihiştina xwe re wê bê têmen. Bi kevneşopîyê jî xwe afirandin, wê bê temenê nirxbûn û rêzeka mazin ye ji wî re. Hê jî, hate nahaka jî, ku mirov diçê herême botanê, ew vegotinên di derbarê jîyane wî de mirov wan ji xalkê lê dihisêne. Dihêne vegotin. Di her vegotin û awayê wê de, pirr rêz û hûrmetek dihê nîşandin.

Di vir de, bi kevneşopîyê re em divêt ku nêzîkatîyeka kurdan bênina ser ziman.Li gor me, wê ev yek pirr girîng e. Kurdan, di zanebûnê kurbûn, weke gihiştina pîrozîyekê jî di dît. Çendî ku bizanebûn dibû û bi wê zanebûna xwe re li gor norxên xwe û kevneşopîya tevdigerîya jî, hingî, êdî bi rêz bahs jê dihate kirin. Di deme ku me li herême botane ji mirovên ku bahse Feqiyê Teyran bi vegotinî dikirin ku me li wan dihisand, gotinekê pir bala me kişand. Hema bêja di serê her vegotina ku hate vegotin de ev gotin hate gotin. Ew gotin jî, ev bû; "ew bizanebûna xwe firî bû". Bi vê gotinê re, nirxek ku têde pîrozî dihate nîşandin dihate vegotin. Di deme ku bahse Feqiyê Teyran hate kirin de, ew bi zanebûna wî re pir mazin dihate ser ziman. Di vegotineka li ser wî de, dihê vegotin ku "ew dihê ber çemê diclê û bi wê ava ku di wê çemê de diharikê, bi wê re dipeyivê." Di vê vegotinê de, deme ku me lê hisand me kifşkir ku weke ku bi hin zanistên bawermend re dihê ser ziman ku ji batinîbûnekê çûna bi ber êqil ve bi wî re hebû. Di wan vegotinan de me ev kifş kir. Me kifşkir ku ew ji zanebûnê û bi têreçûnekê re bi ber wê ve çûyin heya. Di çûna di hundurê zanebûnê ye ku bi wî re ye ku me kifşkir, her weha ev bû, ku "çûyîneka sermedî" hebû. Çendî ku di zanebûnê de bi pêde çûyin bibe, wê bibe. Me ev bi wî re kifş kir. Bi vê yekê re, me kifşkir ku ew sînorekî ji wê çûyinê di zanebûnê de ya bi pêde ji wê re nabîne. Ew bêsînorîyeka sermedî dibîne. Bi vê yekê re, ew di zanebûna xwe de xwediyê awayekî zanî bû. Mirovên ku di deme wî de lê hisandibûn, ku çawa jê hisandibûn û piştre weke ku wan lê hisandibû û hanîbû ser ziman, wilo hatibû vegotin û hatibû ser ziman. Di awa û şekilê wê vegotinîyê de xirakirin nebûbû. Weke qalibekî ew awayê vegotinê bi têgihiştin di serî de hatibû girtin û dihate vegotin. Me, ev yek di wê heyeme hisandinê re pir zelal û baş kifş kir. Her weha bi heman awayê di deme ku bahse Êlî Herîrî, meleyê Cizîrî, Mele Hisêne Batê, Ahmedê xanê û hwd, dihate kirin jî, dihate vegotin. Ew qalibgirtina di vegotina li ser wan de jî, me di deme lê hisandinê de kifş kir. Di vegotinekê de, ku çend caran li ser hevdû ji mirovên cuda were lê hisandin, wê hingî, ev yek pir zelal û baş û qanc were dîtin û kifşkirin.

Feqiyê Teyran, weke Meleyê Cizîrî wateyeka wî ye demî ye pir mazin ye girîng hebû. Ji du aliyan ve ev watebûn bi wî re hebû. Ji aliyê têgihiştina wî ve û her weha ji aliyê hanînîya wî ya li ser ziman ve hebû. Ew zanebûna wî, di deme ku dihate ser ziman, pirr bi balî lê dihate hisandin. Her gotina ku li ser wî dihê ser ziman û dihate ser ziman, bi balî lê dihate hisandin û di serîyan de dihate girtin. B zanebûna wî re, deme ku bahse wî dihate kirin, ew vegotina ku bahs dihate kirin û dihate vegotin ku "ew çûya ber çemê diclê û pêre peyivîya", di çerçova pîrozdayinekê de dihate ser ziman. Piştî ku ev vegotin dihate ser ziman, dihate gotin ku "binerîn ku ew çiqasî di zanebûna xwe de kur çûya û gihiştîya batinîyekî."Ev gotina batinitiyê ne li pêşîya zanebûn, di zanebûnê de li cihê ku bi çûna têra ku dihate gihiştin lê, li wir dihate bicihkirin. Lê ew ciha ku i çûnê re lê

dihate gihiştin jî, li wir seknek û an jî dawîyek di vegotinê de ne dihate ser ziman. Di awayê têgihiştin û têgihiştinkirinê de, zanînak di vir de mirov pir baş fahmdike ku bi wî re hebûya. Ev yek, bi zanî dihê dîtin. Bi vê yekê re, mirov kifş dike ku wî pir girîngî daya awayê hizirkirin û heyîna têgihiştinê. Bi vê yekê re, mirov kifş dike ku wî di çerçova awayekî têgihiştinê ê ku ew di derbarê wê de pirr mazin xwediyê têgihiştineka di serê xwe de ya. Mirov wê yekê her weha di cih de bi wan vegotinên di derbarî de ji wan fahm dike û kifş dike.

Bi vê yekê re, di nav xalkê de hanîna ser ziman û di nav xalkê de bicihkirina wê awayê têgihiştinê, mirov wê fahm dike ku dem gihiştiya çi astê û pêşketinê. Bi vê yekê re, ew awayê têgihiştinê, di nav xalkê de bicihbûna wê, wê civateka felsefîk bêne holê. Bi vê yekê re, hewldaneka afirandinê heya bi wî re.Ew bi vê yekê re, mirov dibîne ku bizanebûnê têgihiştina xwe ye ku heya re pêşavanîyê ji xalkê re dike. Civat, bi vê yekê û awayê pêşketinê re awayê wê yê ku diafirê di demê de dihê berçav. Mirov wê bi wê re kifş dike. Felsefebûneka bi jîrî heya. Naskirineka bi têgihiştin diafirê. Bawerî û nirxên olî, bizanebûneka têgihiştinî dihêne ser ziman. Bi vê yekê re di temenê xwe afirandina civatiyê de ji nû ve awadana civatê û nav xalkê dihê dîtin. Civate zane û têgihiştinê, di aslê xwe de li Kurdistanê di wê deme wan de pêşketina wê dest pê kirîya. Meleyê Cizîrî, destpêka hanîna têgihiştina wê ye demî bi pergalîya civatî ye xwe afirandinê re kirîya. Bi wê re, wî xal û zagonên awayê pêşketina demê, weke ku dana têgihiştin. Bi vê yekê re, pêşî ew di xwe de bitêgihiştin kirin û piştî wî û wê re li gor wan tevgerîn dihê holê. Ya ku mirov di serî de bi vê yekê re kifş dike ev yek bixwe ya. Feqiyê Teyran, zanistvanîya wê demê û wê têgihiştinê dike. Ew, bi wî re pîrozîyek li têgihiştinê dihê baxşkirin. Bi vê yekê re, zanebûn jî kurbûna wê bi wê re weke nirxeke dihê dîtin. Qadrek jî, jê re dihê ser ziman.Nirxbûn û kevnşopîya wê jî dihê holê. Ew kevneşopîbûn, ew civatîtîya ku heya, wê civatitiyê dihildê û di nav xalkê de bi têgihiştin dide rûnandin. Bi vê yekê re giştbûnek bi civatîyê re di nav xalkê de bi civatî bi wê re diafirê.

Zanistên weke Feqiyê Teyran û ku berî wî jînbûna Meleyê Cizîrî, di têgihiştina wê de bi zanebûna xwe re dibina xwediyê weyneke dîrokê ji pêşketina wê re. Ji vî aliyî ve jî, qadr û qiymetê Feqiyê Teyran û Meleyê Cizîrî û hwd, dihê berçav. Miorvên zane, mirovna ku divêt ku di zanebûna xwe de bi kurbûna xwe ye di têgihiştinê de re, divêt ku xwediyê kurbûneka bitêgihiştinî bin. Her gotinên ku ji devê wan derketin, divêt ku ew xwediyê zanebûn û têgihiştina wê bin. Bi vê yekê re, wê hingî, wê navê zanetîya ku di nav civatan de ji bo wan dihate ser ziman, wê bi maf bikin. Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, ew bi mafkiribûn ku ji bo wan ew dihate ser ziman. Di nav civatan de, her gotina ku ji devê mirov derdiket ji gele alîyan ve dihate lê nerîn û wezinandin. Bi wê re, dihate xwestin ku were fahmkirin, ku çendî bi zanebûn ew gotina bi zane wî mirovê ku ew hanîya ser ziman ew di deme axiftina xwe de hanîya ser ziman û çendî û çiqasî jî di têgihiştina wê de ya. Bi wê re jî, mirovên zane ên din ên civatê, wê lê bigihina hevdû û wê ji wê têgihiştina ku wî hanîya ser ziman, wê pirsan biafirandan û jê bikiran. Ew, yê ku ew gotinên bi zane hanîbûbûna ser ziman, divîya ku ew pirsên ku jê hatina pirsîn, bi zanebûneka tam ew pirs bi bersiv bikiran. Bi vê re, ew ast û rada civatê jî, dihate mazin kirin û ser ziman. Her mirovê zane, di civatan de hertimî weke ku di azmûnna de bin bûn. Feqiyê Teyran jî, wilo bû. Wî, hertimî bi serwextî ew azmûnên xwe buhurandin û ji wan buhurt. Bi vê yekê re, ew di nav xalkê de bi zanebûna xwe re êdî bicih bû. Êdî navê wî bi zanebûna wî re derket. Bi wî re êdî bi awayekî teherî, ji zanistîya wî hate û

gihişta civatê û ji civatê hate û gihişta nava xalkê û hwd, bizaneyî afirandinek bû. Bi hev re, di ahangekê de bi pêş ve çûyin bi vê yekê re bi wî û xalkê re bi hev re bû. ..

.. Bi bilindbûn û bihêzbûna Osmanîyan re wê´ Kurd, wê ji vê demê pêde, wê windabûneka mazin bijîn. Wê di wê demê de jî, ew pêşketina wan ye di serê wan de jî qût nebe. Lê wê derfete serdestbûneka xwe ye mazin jî nebînê. Ew pêşketina, di wê demê de ku bi hizrên Meleyê Cizîrî re dihêne holê li ser ziman û bi Feqiyê Teyran re bi pêşketineka civatî heyîna xwe di domênin, wê dibin siheka ku pêşketina wan di cemidêne de bin. Piştî wan re, wê ew navê wan tenê jî, bê sedeme bi bîrkirina nirxekî civatî û civakî ku li Kurdistanê. Lê di bin wê cemidandinê de wê pir hizrên wan an ji holê rabin û an jî wê bêne ji bîrkirin. Lê ew awayê têgihiştinê ê ku wan daya afirandin jî, wê weke gîyanekê li Kurdistanê heyîna xwe biparezê û bi pêşve herê. Ew gîyane têgihiştina Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, piştre di her firsandê de jî, wê xwe bi bîr bike. Wê hizirna di serê mirov de bi bîr bike. Bi vê yekê re, wê pêşketina bi wan re ku bûya, wê xwe ji demê bi buhurêne demê û bi parezê. Lê divêt ku mirov bêje ku ew çendî ku kurd, êdî dikevina demeka zor de jî, wê gîyane MeleyêCizîrî û Feqiyê Teyran û yê têgihiştina wan, wê hebe. Her ku mirov serê rakir û li ser xwe re li azmana meyîzend, wê ew bi bîra wan bikevin. Weke ku ew gîyane wan bi têgihiştinaka ku di serê wan de dibe re xwe dihêne berçavên wan. Hate roje me jî, ku mirov hê lê dinerê, mirov hîs dike ku gîyane Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran li jîyanê ya. Piştî wan re, çend zanistên kurd û mirovên bi zane hatina û çûna jî, bandûra wê gîyane têgihiştina Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran li ser wan bûya. Van mirovên ku dîrok nîvîsandin bi xwe û têgihiştina xwe re, xwe di kurdistanê û kevneşopîya wê de bi zanebûna xwe re xwe kirina rastteqînîyeka dîrokî û hiştin. Bi vê yekê re, em wan bi rêz û hûrmet bi bîr dihînin, carek din.

.

**Ji dema hûrî û mîtannîyan heta roja me, pêşketina civake kurd û rengê jîyane wê bi wêjeyî û çandî**

**Rewşa jîyane bisazûmanî û civaknasîya wê ya dema hûrî û mîtannîyan û dewama wê**.

Em dema ku hewl bidin ku rewşa sazûmana civakî û civaknasîya civatê fahm bikin, bi wê re em divê ku wê rastîya pêşketina civakê jî bi wê re fahm bikin. Di aslê xwe de em dema ku wê rewşa pêşketina civakê hewl bidin ku wê fahm bikin, em bi wê re rengê pêşketina civakê jî bi wê re fahm bikin. Î ro, em dema ku wê rewşa pêşketina dema hûrî û mîtannîyan ku em dikin ku wê fahm bikin, bi wê re em çendî ku wê fahm bikin jî wê bi wê re rewşa pêşketina civatî a berî wê ya dema sûmer û gûtîyan jî wê bi wê re hin bi hin wê hinekî were fahm bikin. Em li vir, divê ku vê yekê jî fahm bikin û werênina ser ziman ku wê dema hûrîyan wê weke serdemeka ku wê dîroka wî li gorî zankirinê wê bi pêşketina civaketîya wê re wê herê heta li dora du-hezar û pncsad salî berî zayîna îsa. Ev jî, dihê wê wateyê ku civake hûrîyan, weke civakek bi sazûmanî û pêşketî wê xwediyê dîrokek civakî a pirr kevn bê. heta roja me jî, bineterên nivîskî ên ku ji bajarên hûrîyan ên weke Nûzî, Arrapha, Marî, Alalakh û ji hinek deverên din derdikevin, hin bi hin dîroka şariştanîya civakî a li ber diclê û firatê zdetir kevntir dibê.Hin bi hi bi lêkolînên kolanî derdikeve li holê ku ew çolên komê ên ku ew li hin herêmên nîvgirava araba û hwd derketina li holê, wê piştre di ancama gûharînên bi **birehe** (atmosfer)ê de ku ew dibê re wê bibê.

Rewşa jîyane civatî a herêmê, em dikarin bibêjin ku wê ji serdemên sûmerîyan ve wê were dîtin. Di hundurê destana gilgamêş de rengê tefsîrkirinên ku wê jîyane destpêkê dihênina ser ziman, wê hinek nîşanakên rengê pêşketina civaketîya demê jî bi xwe re wê werênê ser ziman. Bi wê re divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku civaketîya herêmê, wê bi demê re wê pêvajoyên pêşketinê wê bi xwe re wê derbas bike. Li ber diclê û firatê, ew ardên wê yên ku ew bi şînahîya xwe re pirr dewlemend in û her wusa avîya wê, wê temenê jîyanê pirr zêde wê bixwe re wê biafirênin. Di vê çerçoveyê de em dema ku wê jîyane demên berê lêkolîn dikin, em dikarin vê yekê jî bi wê re werênina ser ziman ku wê, weke ku wê heta roja me jî wê di nava jîyane civake kurd de wê were roja me, wê pergale jîyane koçerîyê wê xwe bi awayekî vekirî û pêşketî wê bide pêşxistin. Li vir, em dema ku vê rastîya jîyane civakî bi sazûmanî û civaknasîya wê re bikin ku wê hildina li dest û fahm bikin, bi wê re em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku jîyane civakê, wê weke ku bi pergalek jîyane koçerîyê re dihê dîtin wê bi lingekî wê bi ´jîyane deştê´ re bê ku ev w taqabûlî jîyane çohtkarîyê, çandiniyê û hwd bike. Lingê din ê jîyane koçerîyê wê lingê ´jîyane zozana´ bê ku ew jî wê taqabûlî jîyane şivaniyê û hwd bikê bê.

Em dema jîyane dema gûtî, hûrî û mîtannîyan bi hevdû re û di dewama hevdû de wê dihildina li dest, em dibînin ku wê bi rengekî bi vî rengî wê weke bi du lingên weke ´jîyane deştê´ û jîyane zozana´ wê pêşbikeve. Sazûmana civakî, wê ya dema hûrî û mîtannîyan, weke ya dema dema gûtîyan wê temenê wê yê civakî wê li ser temenê şivaniyê û çandinîyê bê. Di vê demê de mirov vê jî kifş dike ku wê malbatên mazin ên ku ew çandiniyê û hem jî şivaniyê bi hevdû re dikin wê derkevina li holê. Minaq, her malbatek ku wê xwediyê gelek kerîyên sawalan bê. Bi wê re jî wê xwediyê gelek ardê ku ew ji xwe re dişênê bê. Di malê de wê, karê çandiniyê û yê şivaniyê bi hevdû re wê bimeşê. Bi teybetî di dema hûrî û piştre ya mîtannîyan de mirov, kifş dike ku ev pirr zêde pêşketîya. Wê malbat, çi berhevdû bike, wê bêşa xwe ya welêt jî wê bide. Lê bi wê re wê qasra welêt ya key ew bixwe jî wê xwediyê gelek ardên ku ew dide çandin û kerîyên sawalan ên mazin bê. Ev jî, wê weke kevneşopîyekê bê. Her wusa, hem ardê çandiniyê û hem jî hijmara kerîyên sawalan ên malbatên mazin û piçûk, ku hena, wê yên key wê ser yê wan re bê.

Bi wê re jî divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê gelek malbatên ku ew li rex ya key dijîn û wê kar û xabate çandiniyê û şivaniyê ya key û qasra wî bikin jî wê hebin. Teybetîya van malbatan, wê weke malbatên li dora key wê werina dîtin û wê di nava xalkê de jî wê navekî wan yê derketî wê hebe. Mirov, nikarê wan tenê weke mirovna ku ew kar û xabatê tenê dikin, wan werênê ser ziman. Ji wê zêdetirî wê, xwediyê wateyekê bin. Dema ku key, bihizirê li rewşekê, divê ku ew weke ku çawa ku ew rewşa xwe û malabte xwe hasabê wê dike, wê bi heman rengî hasabê ya malbata wan mabatan jî bike. Ev jî, wê hema bêja weke çîneka xalkî ku ew li rex ya serdest û key û qasrê mazin dibê bê. Wê, gelek derfet di destê wan de wê hebin. Wê derfetên di destê wan de wê hertimî ji ya mirovên dnava xalkê wê hinekî zêdetir bin. Ew, wê bi awayekî wê weke ku di bin ´parastvanîya´ key de bin.

Ev rewş, wê di nava jîyane de wê derkeve li pêş. Dema ku wê şerek derkeve, ev dordorên ku ew li dora key û qasrê na, wê li rex key di refên pêş de wê cihê wan hebe. Lê dema ku ew di şer û pevçûnan de ew mirin û ankû hatina kuştin, wê malbate wan, wê bi heman rengî wê her tiştê wan wê key berpirsîyarîyên wan bide hanîn li cih. Zaroyên

wan ên li şûn wan mana, wê weke zaroyên xwe wê wan mazin bike, bide xwandin û wê wan bizewicênê. Dema ku ew zaro gihan û balixbûn û hatina dema zewavê wê ew key ´wê weke bavê wan´ wê wan bizewicênê. Dem bi dem wê key, zaroyan weke zaroyên wê hild nava malbate xwe. Wê navê wan û mohra wan, wê hilde ser navê xwe. Her wusa, di vê rewşa zarokan de wê di nava xalkê de jî wê hertimî li zimtîya asta yekemin were lêgerîn. Ku ew nebê, wê li yên asta duyemin were lê gerîn. Ku ew jî nebê, wê li yên asta sêyemin werê lêgerîn, Ku ew kûtûka zaroyê hilde ser xwe.

L li vir, em divê ku vê yekê werênina ser ziman ku wê rewşa malbatan, wê weke malbatên mazin wê hertimî wê hebûna xwe bide domandin. Di vê de jî wê di nava malbatê de wê ji ji piçûkatîyê û heta yê herî mazin ê li ser serê malbatê, wê di hîyererşîyekê de wê rêz û hûrmet bêî ku ew li ser were nîqaşkirin wê bê dayîn nîşandin. Ev rewşa malbatên mazin, em dema ku wan bineterên nivîskî ên li ser keviran ji bajarê **Nûzî, marî û arrapha** ên li dora sedsale 16 û 15´an û hwd, ku em li wan dinerin, em vê rewşê dibînin ku wê werina hanîn li ser ziman. Di dema mîtannîyan de em, dibînin ku wan di qasrê de wê mûşawîrên aborîyê ku ew rewşên aborîyê bi nivîskî qayd dikin wê hebin. Bi teybetî, bineterên nivîskî ên ji bajarê arrapha ku ew di dema mîtannîyan de ya, wê di derbarê rewşa aborîya demê ya malbatî û qasrê de wê gelek rastîyan di vê çeçoveyê de wê werênê ser ziman û raxê li berçav. Di vê çerçoveyê de afirandina sazûmanek civakî û her wusa li ser wê re pêşxistina sazîyên ramyarîyê, rêzanîyê, aborî û rewşenberîyê û hwd, bi gelek sazîyên din ên şariştanî re em dibînin ku wê hûrîyî li herêmê xwediyê pêşengîyek dîrokî bin. Di hinek bineterên nivîskî ên ku ew ji bajarên hûrîyan ên weke Nûzî ku ew derketina, wê di derbarê rengê jîyane hûrîyan de wê têgihna bidina me. Her wusa, key û ew dordora wî ya ku me li jor bahse wê kir û her wusa ku ew jî ji van mirov û malbatên li dora key ku wê ji wan werina naqandin şêwirmendên rêveberî ên bajarî ku wê taqabûlî şaradarîyên roja me bikin, wê ji wan derkevina li pêş. Ew wê, weke nimînêrê key ên di nava xalkê de jî bin. Her wusa wê mirov weke yên rêvebirinê ên weke ´Halzuhlu´ wê yên ku ew sehêt dikin û rê nîşan didin wê hebin. Bi wê re jî wê ´daianu' jî hebin ku ew jî wê ´dadger´ bin. Wê li dadger, wê nivîsar û ankû ´katîb´ wê hebin.

Key, wê ewlehîya xwe û ya qasrê, wê ji mirovên xwe yên ku ew pirr zêde bi wan bawer a û wan bi malbatî li rex digirê re wê bide kirin. Ev jî, wê weke mirovna ku wê ji nava wan malbatên ku ew beşek civakê di afirênin û li dora key civîyane, wê ji nava wan wê werina naqandin. Li dora key, wê bi wê re jî wê mirovên biaqil wê zêdetirî wê li civate wî bicivin. Ev wê weke kevneşopîyekê bê. Bi wê re jî wê ev ji nava xalkê wê bi awayekî weke çînekê´ wê werin û derkevina li holê. Ev, wê weke mirovna ku wê zêdetirî karibin derfet û azadiyê ji qasrê bidest bixin û di jîyanê de û di nava xalkê de wê serdest bin. W li gotina wan zêdetirî wê werê hisandin.

Em vê jî dibînin ku wê di nava jîyane hûrîyan de wê jîyane gûndîyan wê bi awayekî wê li ser esasê afirandina wan ya bi çandiniyê û şivaniya wan re wê derkeve li pêş. Ev, wê weke beşna civatî ên pirr zêde xwedî derfet in. Di afirênin. Malê wan zêdetir weke ku wê hebe.

Di vê çerçoveyê de wê ev jî wê bi jîyane wan re wê rengekî pêşketinê ê teybet ê bi jîyane civatî a dema hûrîyan re bê. Her wusa, gûndîtî, wê piştre wê dem bi dem wê zêdetirî wê pêşbikeve. Her wusa wê her mal, wê kerîyên sawalan wê ji xwe re peyda bikin û wê kedî bikin û wê wan weke sawalên malê wê xwedî bikin û ji wan wê tiştên

wê dabara xwe bi wê bikin wê ji wan hilênin. Bi demê re wê çavçe ku ew ne biqasî bajaran mazin û ne jî biqasî gundan piçûk in wê derkevina li holê. Ew jî wê key, wê yekî ji malbate xwe re wê dênê ser serê wan û wê bide bi rêvebirin. Lê em weke ku em di dema mîtannîyan de dibînin wê civatên giştî n mazinan wê hebin ku ew wê hertimî dema ku pirsgirêkek rûda wê ew li hevdû bicivin û wê dest biavêjina wê pirsgirêkê ku wê çareser bikin. Bi vê rengê, wê jîyaneka wan ya hevbeş a bi hevdû re ku em dikarin di rengê jîyanek komînal´ de werênina ser ziman wê hebe.

Rengê jîyane civatî a mîtannîyan, wê bi awayekî pêşketî bê. W xwediyê civaknasîyek pirr zêde xort û pêşketî bê. Ardên çandiniyê, baxçeyên malbatî ku ew ji xwe re tiştan diçênin û hwd wê hebin. Wê warzên wan ên ku ew di wan tiştên weke tirî û hwd diçênin wê hebe. Tirî, wê weke tiştekî ku ew zêde tê çandin bê. Piştre şebeş, patîx, gundir, tirozî, şimamok, nîsk, nahk, genim û hwd, wê çend ji wan tiştên ku ew diçênin bê. Her wusa bi wê re jî wê gelek tiştên wê biçênin ên weke bacanên sor û reş, îsot, pîvaz, tivr û hwd wê bi gelek tiştên din re wê werina çandin. Di dema mîtannîyan de wê, ji tişta ku her malbatê şandin wê bêşek piçûk jî wê weke bahre qasrê wê were vaqatandin û wê bê şandin ji wê re. `Marî-annû´ ku wê weke çîneke serdest a ji mêrxas, leheng û gernasan wê biafirê, wê hebe. Ev jî, wê ji aliyekî ve wê bi qasrê ve wê girêdayî bê. Lê ji aliyê din ve jî wê di nava xalkê de wê jîyane xwe weke ya xalkê wê bidomênin. Hinek ji van mirovên wê çîna civakê, wê ardan hevbeş bi malbatên din re wê bidina çandin û wê bi vê rengê wê dabara xwe bikin. Lê em li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê ji nava xalkê wê mirov bi xwendin û zanebûna xwe re wê karibê derkeve li astaka civak a li jor û ew were herê kirin. Minaq, wê weke oldar, şêwirmend, rewşenbîr û hwd wê derkeve li pêş. Di vê astê de jî wê pîr, wê hertimî wê weke beşeka civakê ya serdest wê hebin. Ji xwe, di nava bawerîya hûrîyan de jî û ya mîtannîyan de jî wê di ola wan a yazdaniyê de wê weke meneka sazîyî ya pîroz wê ´civate pîran´ û ankû ´civate kalan´ wê li pêş bê. Wê mirovekî bi navê ´şekîn bîttî´ wê hertimî ew wê bi karûbarê qasrê ve wê alaqadar bûba. Ew ji hemû ardên ku wê weke ´ardên key´ in û ew tên çandin wê berpirsîyar ba. Heta ku wê hza vî mirovî wê heba ku wî ji ardên key, ard daba ba malên ku ew bêardin ku ew ji xwe re biçênin. An jî, malbatên ku wan zadê wan nemaya û ankû tûna ya, wê serî li wî bida û wî jî wê bi navê key wê zad û ankû tişta wan xwestiba wê bide wan.

Li vir, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku ev malbat û mirovên li dora key ku wê hertimî li ard û qasrê kar bikin, em nikarin wan weke mirovna ne azad û ankû mirov ´kole´ wan werênina ser ziman. Vajî wê, wê ev rewşa li rex key, wê ji wan re rewşek zêdetir azad û serbixwe wê ji wan re wê biafiranda. Ev malbat û ankû keseyet, wê karîban ardên key û ankû qasrê jî bi şertê ku ew nikaribin wê bifiroşin wê ji xwe re karîban her demê biçandan û ji wê ji xwe re zad hildan. Ev ard, wê weke ardên qasrê û ankû ên welêt ban. Wê bi vê rengê wê ew di rewşek serbixwe û xweş de ban. Gelek ji van malbatan, wê di mala wan de wê ji zaroyên wan zêdetir jî carna zarok wê weke zaroyên wan wê bijîyan. Dema ku wê ahlekî wan ku ew di şer de mir û pê de û zarokên wî ti kesekî wan nema, wê wek ezaroyê ew hildaba, mazin kiriba û piştre ku ew balix bû wê bi zewicanda. Wê ji zaroyên xwe wê ew cuda nekiriba. Ji xwe, ev rewşa cudakirinê di nava xalkê de wê weke rewşeka ayîb jî wê bi heta dîtin û wê biheta mahkûm kirin.

Lê em dikarin vê jî bibêjin ku wê her malbat, karîba ji xwe re xwedanê(mulkîyet) çêkira. Wê ji xwe re gelek ardên çandiniyê çê bikira. Wê bi dehan kerîyên sawalan wê

cuda bi cuda wê çê bikira. Wî dikarî gelek mirovên ku ew di ardên wî de kar bikin û û ankû herina ber sawalên wî û ji wî re ´şivaniyê´ bikin, wan bibînê. Lê ew jî ew mirovên bi vî rengî wê ew mirovê xwedî xwedan û ankû mulkîyet, wê ji wî mirovê ku ew li cem wî kar dike û malbata wî jî wê weke ew berpirsîyar bê ku ew her tiştê wan ji wan re bide ku ew karibin dabara jîyane xwe bikin. Wê ti kêmesîyên wan nebin. Dema ku ew mirov, dibin mesûlîyeta wî de ew mir û ankû hat kuştin, wê ew mirovê dewlemend ê xwedan mal, wê ji wê malbata wî mirovê mirî wê weke malbate xwe wê xwediyê berpirsîyarîyê bê. Wê zaroyên wan bide xwandin. Wê ne hêlê ku ew ti kêmesîyên wan hebe. Ev, wê weke berpirsîyarîyek ´pîroz´ jî wê bi heta dîtin. Mirovê ku wî ddê û ankû bavê xwe winda kir, wê weke mirovê ´sêwî´ wê bi heta bii navkirin û ev mirov, wê bi bawerî id nava xalkê de wê bi heta gotin mafê wî yê xwedanê ji yê dewlemend wê hebe. Wê ew bixwe jî ji aliyê ferîşteyên yazdanan ve wê were parastin.

Di dema hûrîyan de wê mirovên xwedî ard û dewlemend, wê ew jî berpirsîyarên wan li hemberî welêt wê heba. Minaq, weke ji bineterên ji Nûzî derketina li holê, mirov ji wan dixwênê ku wê mirovên xwedî ard û dewlemend ê sûxravanîya xwe ya ´îlkû´ wê bikiran. Ev jî ew bû ku wê dema ku wê yek xwediyê ardekî jî ba û wî ardê xwe tewr jî bikira, wê ew berpirsîyarîya li hemberî welêt wê biheta domandin. Li herêmên weke navçe yên welêt, wê bi malbatî wê malbatên mazin wê bijîyan ku ew jî ji wan re ´bitû´ dihat gotin. ´Bitû´ dihat wateya ´mal´ê û bi wê re ya di hîyararşîyekê de bi hevdû re jîyankirinê jî. Ev herêmên ku wê li wan bijîyan ji wê re «dîmtû» dihat gotin. `Dîmtû´ wateya wê ew ´ardê dordorê ê li ser dijîn´ bû. Li vir, divê ku mirov vê yekê werênê ser ziman ku ev navçeyên jîyanê, wê di dema hûrîyan de wê teybetîyek wan ya teybet wê hebûya. Wê civate wan ya weke ji wê hertimî di wê de mirovên mazin ên navserî xwe li wê rûniştiban û wan bîryar di derbarê her tiştî de bide û çareserî ji pirsgirêkan re wê bidîtan. Wê mirovên ku pirsgirêkên wan heba, wê serî li wan bida. Lê wê ev navçe, wê malbatên ku wê li wan bijîyan, bi teybetî wê hevdû nasbikiran û wê bi xizmî wê bihevdû re bijîyan. Mirov dikarê, gotina ´malbate mazin´ jî ji wan re bikarbênê. Bo vê yekê, wê ew civatên wan ew mirovên kal ên mazin ên ku wê li wan rûniştiban, wê mirovên mazin ên wê navçeyê hemûyî ban. Wê di awayekî hîyarerşîkî de wê bi van ve girêdayî ban. Wê bi hevdû re wê wê bi şêwayekî komînalî wê bi hevdû re bijîyan. Wê ev jî ji wan re weke kevneşopîyekê bê. Ew mirovên kal ên li ser hemûyan re bû, ew ku wê gotîna wî ji her kesekî re wê derbasbûba û w bûhûrîba, wê ”ewrî” ba. Ew weke xwedîyê hemû ard û niştecihê wê herêmê jî dihat zanîn. Bi vê re ku wê bi heta wateya serok û ankû yê ´xwedî´ wê jê re bihata gotin ”ewro.” Cihê vn mirovên mazin, wê li rex yazdanên wan wê bi heta çêkirin. Ew, hertimî bi wê re berpirsîyar bûn ku ew bergê ji yazdan re bikin û bidina kirin jî. Bi vê rengê, wê berpirsîyarîyeka wî ya olî jî wê heba. Rewşa mirovê ´ewro´ wê di şêwayekî ´babe şêx´ ê di ola êzdayîyê de ku ew heta roja me jî heya de bê. Mirov dikarê di reng û awayê wî de jî werênê ser ziman. Di roja me de ´babe şêx´ weke alikarê mîr jî di êzdayîyê de wê bahs jê were kirin. Di dema mîtannîyan de wê bi olî jî wê mirovên weke ´babe gavan´ ku ew li gundan digerîyan û şîret dikirin û rêzikên olî digotin, wê bi şêwayekê wê heban.

Dema ku wê andamekî malbatê wê ardê xwe bifirota û hwd, wê destûra serekê malbatê ´ewrî´ wê bigirta. Bêî wî, wê ti kesekî ti tiştê xwe ne firota. Bi demê re wê malbatên nû wê li wê malbata mazin ku ew ji gelek malbatan pêk tê wê li wê zêde bibê. Cihê ku ew li wê dijîn jî wê, bi wê re wê hin bi hin mazin bibê. Dema hûrîyan de wê,

karê çandiniyê wê pirr zêde wê pêşbikeve. Heta ku em dikarin vê jî bibêjin ku wê ev karê çandiniyê wê, weke karekî giring ku wê ji qasra key wê li ser wê bisekinin û wê were bi rêve biriin bê. Ardê qasrê ku wê key xwediyê wê bê, wê ew hertimî wê baş were çandin bi malbatên li dora wî ku ew bi tememî wê ji her aliyê ve bi malbate key û qasra wî ve girêdayî bin. Her sal, wî çendî zadê genim û hwd wê bi çandinê wê bi dest bixin, wê alb bi alb wê bipîvin û wê piştre wê bikina kûwar û ambaran de. Wê çi ji ardê qasrê were bidestxistin, wê weke malê key bê. Wê ew bêqûsûr wê were bicihkirin di kûwarên qasrê de. Her ard, wê çiqasî genim, nîsk, nahk û ankû zadn din ên ku ew hatina çandin ji wê hatina girtin di dawîya salê de wê ew penûs bi pênûs wê were nivîsandin û qaydkirin û wê bê danîn li pêşîya key. Key jî wê, bi wê re wê zanibê ku wê di wê demê de wê qasrê çendî zad bidest xistîya.

Ev rewş, wê weke rewşek dayîmî a ku wê were pêşxistin bê. Wê her wusa, ne tenê bi çandiniyê re wê bi sawalgerîyê û hwd re jî wê heman rewş hebe. Weke kerîyên sawalên qasrê, wê bi dehan kerî wê hebin ku wê bi dehan malbatên şivan ên qasrê ku ew bi van ve girêdayî bûn û alaadar dibûn wê heban. Bi wê re jî ev malbatên şivan, wê ji her aliyê ve wê bi kerîyên sawalan ve wê alaqadar bûban. Bi wê re wê ji sawalan şîrê wan bidohtan, wê di demsala wan de ew derxistan şêwînê û wê xwê daban. Wê hîrîya wan ji wan qûsandiban û ew çêkiriban. Wê ji wî şîrî cêr bi cêr wê tiştî panîr, mast, rûnê nivîşkî û hwd, wê ji sawalan bigirtan. Jîyane malbatên şivan, wê di şêwayekî koçerî de wê xwe bide domandin. Wê weke kevneşopîyekê wê ji bav derbasî kûr bûba. Ev rewşa jîyane şivaniyê a bi rengê koçerîyê, wê di bineterên nivîskî ên Nûzî de jî wê were ser ziman. Wê ew malbatên şivan, wê ji gelek karên welatî ên weke ´leşkerîyê´ hwd wê bi hetan muaf kirin. Ev jî, wê di bineterên nivîskî ên Nûzî de wê derbas bibê. Lê ew berpisîyarî ji wan re hatîya pêşxistin ku wê dema ku li welêt hêrîşek bibê, wê ew jî wê tevlî artişê wê bibin. Wê bi wê re hinek berpirsîyarên ku ew wê hildina ser milê xwe wê hebin. Lê wekî din, ew wê xwedî mal ban. Wê di demsalên çûyîna zozana de wê bi kerîyên sawalan re wê çûban zozana û wê zozanî wê bikiran. Di nava jîyane wan malbatên şivan de wê ew jî xwediyê jîyaneka bi hîyarerşîkî ba. Wê di rengê malbatek mazin de wê bijîyan û wê li ser serê malbatê wê ´ewrî´ wê heba ku wê herkesekî bi gotina wî bikira. Wê bi wê rengê, wê kê çi bikira û çawa bikira, wê wî ev bide kifşkirin.

Wê jîyane wan di vê çerçoveyê de wê xwedîyê şêwayekê ba. Her wusa, bi jîyane şivanîyê re wê jîyaneka bi xwezayê re wê bijîyan. Bi wê re jî wê, herdû lingên jîyane wê bijîyan. Bi lingê ”jîyane zozana” re wê lingê ”jîyane deştê” jî wê bijîyan. Wê bi lingê jîyane zozana re wê ´jîyane çolê´ wê bijîyan. Bi wê re jî wê bi lingê jîyane deştê re wê ´jîyane torê´ wê bijîyan. Di vê çerçoveyê de wê ev malbat, wê xwediy zanînaka pirr zêde pêşketî a di derbarê xwezayê de bûban. Wê çawa di nava wê de wê bijîyan, wê gelek teher, rêbaz û teknîkên wê bi xwe re wê bi aqilê xwe re wê pêşxistiban. Ev rewşa bi jîyane zozana a bi xwezayê re û jîyane deştê a li bajêr û ankû li gund re wê bandûra wê li zimanê wan jî wê xwe bide dîyarkirin. Devokê zimanê malbatên şivan, wê bi wê re wê awayekî bi xwe re wê bide pêşxistin. Her rengê jîyanê wê bi xwe re wê xwediyê şêwayê xwe yê jîyanê bê. Mirov çawa dijî, wê bi wê rengê wê bi gotin bike û salix bike. Bi heman rengî wê jîyane mirovên li bajêr û hwd jî wê bi heman rengî wê gotinkirinên xwe yên zimanî re wê xwediyê heman rengên ji hevdû cuda bê. Mirov dikarê ji zimanê malbatên şivan re gotina ´zimanê çolî´ jî bikarbênê. Bi heman rengê, wê di zimanê wan de wê gotinên çolî wê zêdetir bin. Gotinên ku wê weke ji xwezayê, jîyane xwezayê û

navên tiştên wê bin, wê zêdetir bin. Bi heman rengê wê zimanê jîyane deştê jî wê bi gotinên xwe re wê zêdetirî li gorî wê jîyane bajarîyî a bi komî bê. Wê xosletên wê, zêdetirî wê bi xwe re wê bide dîyarkirin. Ew rewşa ku wê ji aliyekî ve wê zimanê wan weke **zimanê çolî** bê û ji aliyekî ve weke **zimanê torî** bê, wê zimanê kurdî wê di xwe de van xosletan wê heta roja me jî wê karibê hinekî jî bê biparêzê.

Serdema hûrîyan, wê di warê bajarvaniyê de wê gavna mazin wê bi avêjê. Ev rengê weke sê dîmenî ên weke bajar, navçe û gund, wê di dema hûrîyan de wê zêdetirî derkevina li pêş. Bajarên mazin ku ew weke welatek dihên bi rê ve birin, wê li wan li dora qasrê wê jîyanek wê were ava kirin. Minaq rewşa qasrên bajarê alalakh nîkpapa û li Marî Zimrîlîm û hwd, wê minaqe vê bin. Qasrên wan, wê bi hêtên stûr ku wê li ser stûnên bilind bibê û wê li ser hêtên wê tefsîr û nîgarkirin wê werê çêkirin wê hebe. Wê qasr beş bi beş wê bi stûnan wê ji hevdû were beşkirin. Wê di deriyê ketinê de wê korîdorên dirêj yên rayîxistî wê hebin. Minaq li Nûzî di qasra ´Yarîmlîm´ de wê gelek beş bihevdû ve girêdayî ku wê pirrqatî bê, wê hebe. Ev şêwayê awadanîya hûrîyan, wê piştre wê di nava girêkîyan û herêmên din de jî wê belav bibê. Key Zimrîlîm li bajarê Marî, wê di dema li dora dema hemûrabî de wê bijî. Ew wê, qasrek mazin ku wê weke ku wê ji ´hezar û yek beşî´ wê pêk were wê hatibê çêkirin. Ew dixwezê ku wê qûdreta xwe bi wê qasra mazin re wê bide nîşandin. Bandûra awadanîya hûrîyan, wê li ser hemû pêşveçûnên şariştanî ên piştre wê hebe. Her wusa, li girêkê bê, li herêmên din ên Asya bê û ankû li herêmê bê, wê çanda awadanîyê a hûrîyan wê li pêş bê. Çanda qasrê a hûrîyan, wê bi awayekî kûr wê pêş bikeve. Ev çand, wê her wusa, li dora wê, wê pêvajoyên desthilatdarîyê ê hûrîyan wê li dûv hevdû di serdema wan de wê pêşbikeve. Her wusa, li herêmên rojavayê kurdistanê ên weke li dora qamişlo, Afrînê, amûdê, rimêlan, şadadê û hwd, li gelek deverên wê bermehîyên hûrîyan û pêvajoyên wan ên şariştanîyê wê heta roja me li wanderan wê hebin û werina jîyan kirin. Ji wan bermehîyan mirov fahm dike ku wê hûrîyî, wê di dema xwe de wê çandaka awadanîyê a pirr zêde pêşketî wê bi wan re wê hebe. Her wusa, li van herêmên rojavayê kurdistanê û hinek herêmên din, wê hinek cihên ´anfî´ ên ku mirov li wan bigirseyî li hevdû di civîyan wê hebin. Hinek bermehîyên bi vî rengî wê ji wan deman mana heta roja me. Di wan ´anfî´yan de wê li hevdû bicivin, wê axiftina ji hevdû re bikin, wê leyistikan wê bi hevdû re ji hevdû re bikin û wê bi hevdû re li wan deveran bicivin û wê bergan bihevdû re ji yazdanên xwe re wê bikin. Ev deverên ku wê bo civînên girseyî wê werina çêkirin, wê deverna ku wê pêşî bo bergkirinê bin. Lê piştre wê li wan gelek karîgerî û ankû ´aktivîteyên´ civakî wê li wan bikin.

Li bakûrê kurdistanê li dora Cizîra bota, nisêbîn, hezex, silopî û şirnaxê, bi wan re li hinek deverên din jî wê gelek bermehî wê ji dema hûrîyan wê bimênina heta roja me. Her wusa, wê li gelek dever û gundên li dora van herêman, wê bermehîyên bi kirmanî û hwd, wê werina heta roja me. Her wusa, wê gelek qasr jî wê ji dema wan bimênin. Çend ku wê ew qasr bi demê re wê heta ku ew werina roja me, wê di gelek jinûve çêkirinê de wê derbas bibin jî wê karibin heta roja me werina. Li Cizîra bota, kirmana ´birca belek´ û qasra ku weke qasra mîrê bota jî mirov dikarê di nava wê de şîrove bike û werênê ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de wê xwediyê wateyekê bê. Li Nisêbînê û li gelek herêmên li dora wê jî, wê pirr zêde wê bermehîyên ji dema hûrîyan wê hebin. Gundên weke gundên ku ew girêdayî herma ´stawrê´ na ên weke ´keleha pozreşê´ û hwd, wê li wan avahîyên weke kirmanî û hwd wê li wan hebe û wê ew bi dîroka xwe re wê heta

van deman wê herin. Li doran herêmên weke van herêman wê geleke herêmên weke wê ku ew weke herêmên niştecih in, wê li wan ew rewşên awadanî wê hebin. Her wusa, wê hinek malên weke kirman ku ew ji wê demê mana heta roja me, wê hebûna xwe biparêzên. Bi wê re jî mirov divê ku bi teybetî bahse wê bike ku li Amede roja me ´kirmana sûrê´ ku wê di dema hûrîyan de wê di hundurê wê de bajarek were avakirin û wê li tihêla wê gûlîstanên hewserê wê hebin, wê were avakirin. Ev kirmana sûrê, wê weke berhemeka dîrokî a ji dema **hûrîyan bê**. Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî binxat bike û werêne ser ziman ku çendî ku mirov nikarê bêî baxçeyên hewserê sûrên amedê fahm bike, bi heman rengî jî, mirov nikarê bêî sûrê amedê û baxçeyên hewserê li heskîfê jî bihizirê. Heskîf jî wê di dema hûrîyan de û piştre di dema mîtannîyan de jî wê navendek dîrokî a herêmê bê. Wê gelek rêyên bazirganiyê wê werina wir. Mirov, dikarê Heskîfê, weke navendek hûrîyan a dîrokî a şariştanî jî werênê ser ziman. Kirmanên dîrokî ku wê di demê de li kevîya avê çê bikin û wê pirên mazin wê li ser wê ave wê ya firatê ku ew diharikê wê werina çêkirin, wê li herêmê wê pirr zêde wê binav û deng bê. Di vê çerçoveyê de ew herêm, wê bi hevdû re di çerçoveyê de li herêmê temenê jîyanê biafirênin. Her wusa, sûrê amedê di demên hûrîyan de demekê weke kirmana hûrîyan jî hatîya binavkirin. Nîşanaka vê jî, ku heta roja me jî, ji deriyê Reha re ku wê ´**derîyê hûrî**´ jî bê gotin a. Her wusa, bi wê re ji ´**derîyê çîyê**´ re jî ´**derîyê xarpûtê**´ hatîya gotin. Ev bi navkirin, wê têgînna bidina di vê çerçoveyê de. Ji vê şêwayê ku wê her derîyekê wê yê ku wê ji aliyekî ve vebê ku wê were bi navkirin, mirov fahm dike ku wê ev herêmek weke navendek şariştanî a hûrîyan a dîrokî bê. Her wusa, xarpût, î ro, navê çem û herêmekê jî ya li kurdistanê. Her derîyek ji aliyekî ve divebê û wateya xwe ji hatin û pêşveçûnên ji vî derîyî ve dibin ve dihêne ser ziman. Minaq, teybetîya derîyê hûrî, ew a ku li rojava divebê û li rojava herêmên weke Reha(**Uršu**) û hwd hena û ev weke herêmna navend ên hûrîyan in. Bi wê re jî, rojavaya ku di keve vê aliyê de wê weke herêmek navendî bê ji pêşketina jîyane şariştanîya hûrîyan re. Ev binavkirin jî, wê ji dema hûrîyan ve li herêmê were bikarhanîn. Bi teybetî wê bi heman wate û têgînê wê were bikarhanîn. Awadanîya kirmana sûra amedê, wê di derbarê têgîna **awadanîya dema hûrîyan** de wê têgîneka pirr zêde vekirî û pêşketî wê di roja me de wê bide me. Bi heman rengî wê bermehîyên **”zaogma”** wê di derbarê rengê awadanîya dema mîtanîyan de wê têgîhiştineka baş wê bide me. Bi demê re wê weke ku wê bi naqşkirinê û hwd, wê li wan zêdekirin jî wê werina kirin. Lê em divê ku van bermehîyan bi vê rengê baş şîrove bikin bo fahmkirina van serdemên kevn ên hûrî û mîtannîyan.

Serdema mîtannîyan, wê di gelek waran de wê ji aliyê avakirina qasran û şêwayê avakirina wan û awadanîya wan, wê bi têgîna hûrîyan re wê têgîneka baş bidina me. Her wusa, dema ku mirov serdema mîtannîyan lêkolîn dike, her wusa, mirov dibînê ku ew xwediyê qasrên bilind ên bistûnan in. Di hundurê qasran de wê gelek beş bi hevdû ve girêdayî wê werina çêkirin. Hêt û tawanên hundûr ve wê naqşan çê bikin. Di serdema mîtannîyan de em dibînin ku wê di bawergehên Mîtra û hwd de wê li ser hêtan wê tefsîrên jîyane wî wê werina çêkirin. Wê bi vê rengê, wê bi naqşan wê serborîya wî vebêjin. Ev rewş, wê bi heman rengî wê hin bi hin pêşbikeve û weke çandekê wê di dema wan de derkeve li pêş. Naqşkirin, wê bi vê rengê, wê ji du aliyan ve wê were kirin. Aliyek weke ku em di bawergehan de dibînin bo tefsîrkirinên pîrozî û nirxn xwe bi serborîya keseyetîyên wan ên pîroz re ya. Aliyê din ê duyemin jî wê di çerçoveya têgîna xweşikbûn û xweşkirinê de bê. Bi vê rengê wê bi wê naqşkirinê re wê hûnerên

xwe raxina li berçav. Ji aliyê desthilatdarîyê ve wusa xweşik û mazin bi naqşkirinên ku wê serborîya wan bi rastîya wan re wê werênina ser ziman re wê bixwezin ku ew bi wê qûdreta xwe û mazinahîya xwe werênina berçav û bidina nîşandin.

Ji aliyekî din ve jî wê weke ku mirov bi rewşa qasrên mîtannîyan re dibînê, wê li devê derîyê wan a aliyê derve wê peykelê yazdan û ankû keyên xwe bi heybet wê bikin ku wê çê bikin. Her wusa wê bi heman rengî şêr jî wê peykelê wê, pirr zêde wê were çêkirin. Di gelek tefsîran de wê weke ku em bi şêwayê bi laşê şêr ve ku serê key hatîya pêvekirin li ser serê wê, wê were çêkirin. Bi vê rengê, wê di hinekan de jî wê weke ku laşê şêr, pirrên baz û ankû eylo û serê key wê bihevdû ve wê werina çê kirin. Ev rewş, wê awayekî din jî wê weke ku bi laşê key ve wê li şûna serê wî, wê serl hinek sawalên din ên weke şêr û ankû afirandinên mejiyê xwe ê mîtolojikî ku wan afirandina wê ji wan tefsîran derxin û wê li şûna wê bicih bikin.

Em di nava tefsîrên ji dema hûrîyan n bawergehên wan de tefsîrên yazdanên wan û nirxên wan n pîroz dibînin. Her wusa, bi heman rengî bi wê re wê **´sevîl´, ´cêr´, ´kedûn´ û ´den´**, wê ji axê wê werênina çêkirin ku ew di wan de tiştên xwe yên xwarin û vexwarinê bicih bikin. Sevîl û ankû sevîlk, wê bo av vexwestinê bê. Wê zêde ne mazin bê. Cêr, wê li malê bê û wê mazin bê û wê bo avê û dew bê. kedûn, wê bo tişîkirina panîr, mast û hwd bê. Bo hilandina panîr di binêardê de jî bê. ´Den´ jî wê bo nîvişk bê. Bo ku malbat karibin nîvişkên xwe di wê de bikina ser hevdû de û bo demek dirêj hilênin wê bikarbênin. Den, wê weke cêr mazin bê. Lê wê devê denê ne weke ya cêr piçûk bê. Den, wê devê wê pirr zêde vekirî bê. Lê wê weke cêr bi destik bê û wê kevîyên devê wê bi aliyê wê yê derve ku ew hatina stûrkirin û şikandin bê. Lê dema ku w sevîl, cêr, kedûn û den wê werina çêkirin, wê li ser wan wê naqşkirinan jî wê çê bikin. Li herêmên botanê, rojavayê kurdistanê û herêmên zagrosan û hwd, sevîl, zerik, kevçî, qatên cêran û hwd ku ew ji van serdemên hûrî mîtannîyan hatina dîtin, wê li ser wan naqşkirinên pirr xweşik ku ew dihêna li berçav wê hebin. Ji wan naqşkirinan, mirov fahm dike ku wê di di wan deman de wê naqşkirinên bi vî rengî û afirandinên weke ji axê ên weke sevîl, cêr, kedûn û denan wê pirr zêde wê hebe.

Bi wê re mirov dibînê ku wê di wan de wê weke ku wê heta roja me di nava civake kurd de wê hebe, wê **´destar´, ´tanûr´, ´teşî´, ´tifik´** û hwd wê hebin. Ev jî, wê bidina nîşandin ku wê di wan deman de wê bi van şêwayê afirandinê wê pirr zêde wê hebe.

Wê di demên piştî mîtannîyan de jî wê ev rewş wê zêdetirî wê werina pêşxistin. Minaq, em di di dema medîya de dibînin ku wê biheman rengê wê qasrên bi stûnî ên bilind û ku hêtêna wan hem ji hûndûr ve û hem jî ji derve ku ew hatina naqşkirin wê çê bikin û wê li devê wê, wê peykelên keyên xwe ên mazin bi heybet wê çê bikin, weke parastvan. Bi heman rengî, wê peykelê şêr jî wê pirr zêde wê wê were bikarhanîn. Di vê çerçoveyê de wê bi wan çêkirina qasran wê bikin ku ew heybeta xwe bi wê bidina dîyarkirin û werênina berçav. Medîya, wê di vê demê de wê ji van aliyan ve wê xwe zêde pêşbixe. Her wusa, wê pirranîya naqşên wê ji dîrok û mejîya wê ya bawerîyî û civakî bê.

Qasrên ku wê di van deman wê werênina çêkirin, wê piştre jî wê hebûna xwe wê bidina domandin. Wê hingî xweşik werina berçav, wê herkesek wê bixwezê ku ew herê hundurê wan û di wan de bijî. Di vê çerçoveyê de wê bi naqşkirinê re wê bi têgîna xweşikatîyê û afirandinê bi hevdû re wê zorê bidina sînorê aqilê mirov. Piştî serdema

medîya jî wê ew qasr, kirman û hwd, wê bidom in. Dem bi dem, desthilatdarîyên herêmî ku wê werin, wê li wan zêdekirinan wê bikin. Li herêm wê pêşxistinên nû wê çê bikin.

Piştî serdemma Medîya re jî wê ew kirman,qasr û hwd wê xwe bidina domandin.Şêwa, reng û awayê naqşkirina qasr û kirmanan wê piştre jî wê bê mînaq ji pêşketinên piştre re jî. Wê keyanî û desthilatdarîyên nû wê derkevina li holê,wê şêwayên nû ên pêşketinê jî wê derkevina li holê. Wê ew jî xwe li ser wê wan pêşketin û afirandinan re wê bigihênina têgîneka awadanîyê û jîyanê û hwd. Bi wê re jî wê xwe bidina dîyarkirin.

Bi teybetî li kurdistanê, wê di vê çerçoveyê de jî wê heta sedsalên 8, 9 ´û 10´an jî wê pêşveçûnên mazin wê bibin. Minaq, di dema desthilatdarîyên kurd ên weke kekoyîdîyan eyerîdîyan, şadadîyan, merwanî û eyûbûîyan û hwd wê, pêşveçûnên bi vî rengî wê li gorî ast û pîvanan demê bi têgîna wê re wê bibê. Piştre jî wê li herêmê desthilatdarîyên ku wê biafirin ên weke ya osmanîyan û hwd, tenê li ser wan re wê bijîn. Desthilatdarîyên bi vî rengî ên weke ya osmanîyan û hwd, mirov nikarê bahse ti têgînên wan ên bi vî rengî ên ku ew diafirênin bikin. Berî wê, bi derketina îslamê re weke ku mirov bi abasîyan re dibînê wê abasî bikin ku ew biawayekî qasrên xwe bi wê re çê bikin û bi wê re ku ew karibin li gorî zewk û sefaya dilê xwe bijîn. Bi wê re wê piştre hinekî bi desthilatdarîyên îslamî re wê biafirê. Lê ew jî wê zêde pêşnekeve. Gelek deverên wan ên bergkirinê wê yên berê bin ku ew hatina çêkirin bin. Wê bi vê rengê wê xwe di wê de bijîn. Têgîna awadanîya bi kirmanî, wê weke têgîneka hûrîyan û piştre ya mîtannîyan bê. Wê hîttîtî jî wê ji wan bigirin. Piştre jî wê li herêmê ev belav bikin. Şêwayên kirmanî ên ku em bi birca belek, sûra amedê, kirmana nisêbînê, kirman û xanîyên kirmanî ên li heskîfê û hwd, mirov dikarê weke çend minaqên ji van serdemên hûrî û mîtannîyan werênê ser ziman bê. Wê piştre, wê heta serdema Eyûbîyan, wê dem bi dem desthilatdarîyên ku wê werin, wê li wan zêde bikin. Ankû wê li gorî ku ew dixwezin, wê hin ji nû ve rastkirinê û ankû bi naqşkirinê jî bê wê di wan de gûharînan bikin. Ya ku wê piştre li wan pêşveçûnên kirmanî ên dema hûrî û mîtannîyan wê were zêde kirin wê ev bê. Lê wê bi demê re wê pirranîya wan jî wê werina xira kirin û xûrixandin. Minaq, weke ya birca belek, qasra cizira bota, kirmana nisêbînê, sûra amedê, heskîfê û hwd ku ji aliyê rejima tirk a roja me ve ku ew hatina xirakirin û hwd. Bi wan xirakirin û rûxandinan, dixwezin ku wê aslê wan ê pêşî ê dîrokî tûna bikin. Hem herêmê û hem jî civake ku ew di wê de dijî ji rastîya wê ya bi dîrokê re ku ew heya dûr bikin.

Di dema şadadîyan de em dibînin ku wê şahên şadadî ên weke Fadl û hwd, wê pirr zêde wê giraniyê bidina çêkirina qasran, kirman, pirên kêvanî û hwd. Piştre jî wê, bi heman rengî wê pişrre di dema şadadîyan û merwanîyan de wê xwe bide domandin. Desthilatdarîya eyûbîyan, wê di dema xwe de wê gelek malgeh, kirman û bawergehên bi vê rengê wê çê bikin. Ev çanda afirandinê wê bi awayekî wê heta dema wan wê xwe bide domandin. Piştre jî wê, weke ku wê bi dema osmanîyan û piştre bi rejima tirk re wê were dîtin, wê hemû bermehîyên dîrokî ên herêmê wê bên xistin bin hêrîşan de. Her wusa, herêma ´zaogma´ di ava bendavan de hiştina, wê hewldana bi heman rengî di bin avê de hiştina heskîfê û hwd, mirov dikarê bi heman rewş û zihniyetê werênê ser ziman. Bi wê re wê bi teybetî, herêmên dîrokî û ên pîroz ên bo civakê ku ew xwediyê rewşeka xêvî a dîrokî na, ew li ser wan bendav hatina çêkirin. Mirov dikarê, vê rewşê weke rewşeka hêrîşkirinê a li nirxên civakî ên dîrokî ên ku wê ji serdema sûmer, gûtî, hûrî,

mîtannîyan û piştre medîya û heta roja me ku ew bi civakê re afirîna jî werênê ser ziman. Bi armanca tûnakirina civak û nirxên van serdeman jî ew bendav û xûrixandinên wan kirmanan li herêmê hatina çêkirin.

Civake kurd, weke civakek dîrokî wê bi dîroka xwe re wê di van pêvajoyên dîrokî ên destpêkê û heta roja me, wê pêvajoyên xwe yên pêşketinê ên civatî wê bijî. Mirov dikarê wê weke civake dîrokî a herî kevn jî bi dîrok û mejûya wê re û bi nirxên wê re wê werênina ser ziman. Dîroka wê, her serdemên wê bi hezaran pirtûkên ku wê di derbarê wan de wê werina nivîsandin jî wê, têrê nekin ku ew wê dîrok û mejûya wê ya dîrokî a kevn werênê ser ziman. Ev dîroka wê ya civakî ku wê heta roja me, gelek nirx, pêşketin û pêşveçûnên dîrokî ên şariştanî dana mirovatiyê û kirina temenê wê de î ro, dibin hêrîşên xadar ên bêwijdan de ya. Em î ro, vê dema ku em wê dijîn, em şahîdîyê ji vê re dikin.

Em di serdemên gûtî, hûrî û mîtannîyan de rastî awayekî civaknasî a pirr zêde pêşketî di nava civakên gûtî, hûrî û mîtannîyan. Bi teybetî, rewşa hûrî û mîtannîyan wê piştî a sûmer-gûtî-qasîtîyan re wê bi awayekî teybetî were dîtin. Teybetmendîya dema civakî a hûrî û mîtannîyan ew a ku wê heta vê demê, wê ji dema sûmerîyan û hwd wê serdema gûtî û qasîtîyan û bi wan re loloyan wê pêşveçûnna dîrokî wê bi xwe re wê bidina jîn kirin. Heta ku wê dem were dawîya serdema gûtî, qasît û loloyan wê bi civatî û pêşketina wê re wê pêşveçûnek dîrokî wê xwe bide dîyarkirin. Wê temenekî pirr zêde pêşketî ê bi çerçoveya civatî re wê bi afirê. Bi wê re wê ev temen, piştre dema ku wê dem were serdema hûrîyan û pê de wê ev serdem pirr baş were xwandin, têgihiştinkirin û wê bi wê re were derxistin li têgihiştinê bi hemû zanîn û pêşketin û pêşveçûnên wê yên civatî, aqilî û hwd re. Li ser wê re wê serdema hûrîyan wê weke serdemek bi ast û pîvan a civakî wê li ser wan deman re wê pêşbikeve. Serdema hûrîyan, di vê çerçoveyê de wê xwediyê serdemek biaqil a pêşketî bê. Di wê serdemê de wê aqilê felsefeyê wê pêşbikeve û wê bi zanebûna wê re wê civatîtî wê pêş bikeve. Di aqilê xwe de wê serdema gûtîyan wê di wê de wê hin bi hin filosofên civatî û xwezayî wê derkevin. Minaq, Ûrûkagîna ku wê di wê demê de wê li Lageşê wê derkeve, mirov dikarê wî weke fîlosofekî civatî jî wî werênê ser ziman. Ûrûkagîna wê bi aqilê xwe re wê ne kemî filosofekî dema aqilê zanistê wê bi zanebûn bê û wê bi çerçoveyek civatî re wê hizrên xwe bi nivîskî wê werênê ser ziman. Her wusa î ro tenê ew destûrên wî yên ku wî nivîsandina, wê di vê warê de wê aqilekî baş bidina me. Piştî Ûrûkagîna re wê Gûade-ensî wê were ku ev jî wê di şêwayekî ku ew xwenûkirinê li ser hizrên Ûrûkagîna re wê bide çêkirin bi hizrên xwe yên ku ew weke wî dihênê ser ziman de re. Hizrên Gûade-ensî, wê di vê çerçoveyê de wê pvajoyek nû a civatî wê di dema gûtîyan û qasîtîyan re wê bi xwe re wê wê bide destpê kirin.

Bi vê rengê derketina Ûrûkagîna, gûeda-ensî û hwd, wê di wê dema gûtî û qasîtîyan re wê gelek mirovên bizane wê derkevin. Nûh bixwe jî ku ew di nava kurdan de weke ´nebî nûh´ dihê bi navkirin û navê wî di kurdî de dihê wateya ´nûbûnekê´ jî wê di vê demê de wê ew derkeve. Wê hizrên wî di vê demê de wê bandûra wê re wê di nava civatê de wê deng vedin. Li gorî gelek dîrokzanan nûh, wê ew keseyetê di destana gilgamêş de ê bi navê ´utnapîştim´ bê. Ûtnapîştim û berî ´ûbar-tûtû´ û serborîya wî ya li ber çemê diclê ku ew dijî, wêdi nava xalkê de wê were ser ziman. Di aslê xwe de wê serborîya Ûbar-tûtû, wê bi xwe re wê gelek tiştan vebêjê ji me re. Ew wê rêwîtîyekê li ser ava çemê diclê re li ber cizîra bota û ankû ´mezra bota´ a roja me û heta şirnax´a roja

me, wê herê. Di vê qadê de wê di nava darîstanên pirr gûrr û geş re wê herê. Navê ´şirnaxê´ bixwe jî ew li gorî hinek vegotinên ji nava civake kurd a roja me ku ew dihênin ser ziman, diibêjin ku ew tê wateya ´bajarê nû´ wê ´şirnah´ û ankû ´şirnûh´ wê bibêjin.

Di dema gûtîyan de wê herêm, di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek pirr teybet a pêşketî a civaknasî bê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê piştî gûtîyan re wê li ser wê pêşketina dema wan re wê dema hûrîyan wê were birêxistin kirin. Wê bajarên mazin wê were avakirin. Wê di wan de wê qasrên mazin wê werina çêkirin. Wê bawergehên mazin wê ji yazdanên xwe re wê çê bikin. Wê li dora wan bawergehan wê xalk bigihijê hevdû. Wê civakatîya wan wê biwê re wê hin bi hin wê biafirê. Hûrîyan bawerîya xwe di vê çerçoveyê de ew di farqê de na ku ew bi wê re pêşveçûnek mazin ya civatî û jîyanî bi wê re dijîn. Bi vê yekê, em dema ku li navaroka bawerîya wan dinerin, em dibînin ku wê hewirdora li dora wan a xwezayî û her wusa ew jîyane ku ew wê dijîn, wê bikin ku wê bi tefsîran salix bikin û wê werênina ser ziman. Wê cejnên xwezayî wê pêşbixin. Ew dema ku minaq, piştî demsala palayîyê ku wan zadê xwe ji adrdê hilda, wê cejna wê li dar bixin. Wê xwarinên weke danûkê ku wê tenê dan were kelandin û ankû wê mast bêxistin li navê wê weke xwarineka ku ew ji van cejn û pîrozbahîyan ku maya roja me ya. Her wûsa xwarinên weke meyîrê, danûkê û hwd, wê weke xwarinna civake kurd ên pirr zêde kevn ên ku ew bi pîrozî dihatina çêkirin. Xwarinên weke çêkirina pîraxan, ew wê bi teybetî dawîya demsala tirî ku wê ew bi pelên mêwên tirî wê bi heta çêkirin bû.

Ev rewş, wê di dema hûrîyan re wê bi bawerîyî wê zêdetir wê werina pêşxistin. Her wusa mirov kifş dike ku wê di her cejn û pîrozbahîyan de wê bi girseyî wê li hevdû bicivin û wê pîroz bkin. Wê xwarinan bi hevdû re bixwûn.. Û wê bi hevdû re danûstandinê wê bikin. Bi wê re wê dema xwe derbas bikin û bi bûhûrênin. Dema hûrîyan, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê civaknasîyek girseyî a pêşketî bê. Wê ev civaknasî wê piştre wê xwe bi derûnîya xwe re wê bide rûniştandin. Wê têgîna aîdîyet û ankû yawêtîyê wê bi wan re wê xorttir bike. Hûrîyî, di vê çerçoveyê de wê bi bawerîya xwe re wê weke gûtîyan wê ew di xate bawerîya yazdanî ya yek-xwûdayî de wê pêşketina xwe wê bijîn. Bi bawerîya xwe re wê ew xwe weke ´yên herê baş´ û ´yên ku ew ji aliyê yazdan ve hatina bijartî´ wê xwe werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê ew xwe li hevdû wê bidina hevdû. Wê têkiliyek wan ya teybet wê bi wan re wê hebe. Ew li ser yazdanîyê re wê xwe weke ku wê li ser hewirdora xwe re wê weke yên ´naqandî´ û ankû ´bijartî´ wê bibînin. Di vê çerçoveyê de wê xwe bi çêtirîyekê wê werênina ser ziman. Yek-xwûdayî ya yazdanî, wê di wê dema gûtîyan de wê heta dema hûrîyan jî wê bi awayekî du dîmenî wê bijî. Wê pirr-yazdanî û yek-yazdanî wê di zikhevdû de wê bijî. Wê bi wê re wê dem bi dem wê yekbûn ew di nava xwe de li ser têgîna yazdanîya xwe re wê çê bikin û wê pêvajoyên bib ber yek-yazdaniyê re wê bi demê re wê bi xortayî û zanebûna xwe re wê bijîn. Her wusa, di dema hûrîyan de wê di vê çerçoveyê de wê bi têgînek yazdanî a bilind wê di dema hûrîyan de wê bawerîya xwe wê bijîn. Lê dema ku wê dem were dema mîtannîyan, wê di wê demê wê bi zêdeyî wê yek-xwûdayî ya yazdanî ku ew pêşketî wê bibê. Wê mîtannî wê ew wê bijîn. Wê teybetmendîya dema mîtannîyan, wê ew bê ku wê yazdan bi navê wî re wê weke ku em bi Mîtra re dibînin, wê bi têgîna yazdanî wê bjîn û wê bi wê re hizrên xwe bi felsefîkî wê werênina ser ziman. Wê di vê demê de wê têgîna yazdanî bi têgîna yek-xwûdayîyê

w serdest bibê û wê bi wê re wê peyamnêr û ankû ´pêxemberên´ wê wê peymana yazdan fahm bikin û wê werênina ser ziman wê werin. Dema ku yazdan derdikeve li jor, wê êdî li jêr, wê pêxember û bawermend wê li dewsa wî wî bijîn. Mîtra wê, weke pêxemberekî û filosofekî jî ku ew di xate bawerîya bi yazdanîyê re wê tê ya. Di vê çerçoveyê de wê teybetmendîya dema mîtannîyan, bawerîyan wan û civak û civaknasîya wan wê xwe bide nîşandin. Mîtannî, wê nûjenîyeka hemdemîya xwe wê bi awayekî vekirî wê bi vê rengê wê bijîn. Heta roja me jî wê herkesek, piştî hûrîyan re wê rengê pêşketina mîtannîyan ku wan pêşxistîya û wan jîya ya,wê bi ancamên wê yên ku ew pêşdixin re û ku bi wê dijîn re wê bijîn.

Serdema mîtannîyan, wê weke serdemeka ku wê bi pêşveçûnn wê re wê pirr zêde wê kifşkar bê. Civaketîya dema mîtannîyan mirov dikarê weke civaketîyek hemdem werênê ser ziman. Civaknasîya civaketîya vê demê wê pirr zêde pêşketî bê.Wê bi aqil, wê werê hanîn li ser ziman. Piştî serdema hûrîyan re wê serdema mîtannîyan, weke serdemek dîrokî a giring û pêşketî bê. Wê hemû fêr û ezmûn û cerbên civaketîya dema hûrîyan, wê di temenê pêşketinên dema mîtannîyan de bin. Wê bi vê rengê, wê xwediyê pêşketinekê bê. Serdema mîtannîyan, wê ji her aliyê ve bipêşketina wê ya civakî ve wê kifşkar bê. Wê civaknasîyek civatî a giştî wê bi afirê. Her wusa bi wê re jî wê li gorî wê, wê pêşveçûnên civatî wê bibin. Em dema ku li civaknasîya dema mîtannîyan dihizirin, em bi wê re ji gelek aliyan ve wê bi hemdemîya wê ya piştî dema hûrîyan re wê kifş dikin. Wê her wusa, serdema mîtannîyan, çendî ku wê weke serdemek teybet bê, bi heman rengê wê ev serdem weke serdemeka ku ew di dewama ya hûrîyan de jî bê. Bi vê rengê jî wê ew xwediyê wateyekê bê.

Di vê demê de wê zane û filosof wê derkevin. Her wusa, wê aqil û felsefekirin wê derkeve li pêş. Mirov, wê xwe, hewirdora xwe û tiştên ku ew di jîyanê de dibînê, wê bike ku ew ji wan re şîroveyekê werênê. Ol, di aslê xwe de wê ji aliyekî ve jî wê ev bê. Aliyê mirov ê nezan, wê bike ku ew şîroveyekê ji wê re werênê û xwe bi wê bide jîyankirin. Di vê çerçoveyê de wê ol, xwediyê pêşketinekê bê. Hemû pirsên temen ê ku mirov di derbarê wan de ne xwediyê bersivekê ya, wê bike ku ew ji wan re bersivekê werênê. Minaq, dema ku mirov mir, wê çi jê bê? Wê bike ku wê ji vê re bersivekê werênê. Armanca hebûna jîyanê çi ya? Wê bike, wê bide fahm kirin. Rast û ankû rastteqînî çî ya? Wê bike ku wê werênê ser ziman. Fahmkirin, wê di vê demê de wê pirr zêde wê derkeve li pêş. Hewldanên fahmkirinê wê derkevina li pêş. Zaneyên weke Mîtra derketina wan a li pêş, wê di van waran de wê nîşanaka fahmkirinek giring a demî bê. Mîtra, wê weke filosofekî û bawermendekî bê. Ew wê xwe weke bawermendê yazdan wê binav bike û wê werênê ser ziman. Bawermendên wî, wê weke bawermendên yazdan bin. Di vê çerçoveyê de wê mîtra xwediyê wateyekê bê. Mîtra, wê di gelek waran de wê xwediyê bersivna bi aqil bê. Wê di vê çerçoveyê de wê ew derkeve li pêş. Di vê serdemê de wê, nîqaşkirin bi aqil wê bibin. Ev jî, wê di nava civakê de wê rengekî pêşketinê wê bi xwe re wê biafirênin. Mîtannî, wê di vê çerçoveyê de wê li pêş bin biaqil.

Di serdema mîtannîyan de ew pêşveçûnên wan ên ku ew dibin, em dema ku li ser wan û şêwayê wan dihizirin, her wusa mirov bi wê re kifş dike ku wê ew pêşketina wan, wê weke pêşketinaka ku wê di wê de wê êdî aqilê civakî wê êdî serdest bûbê bê. Her wusa mirov dikarê bi vê rengê w bi teybetî wê werênê ser ziman. Li ser wê re wê pêşketin bibê. Piştî Mîtannîyan re wê pêşketina Medîya û hwd, wê weke pêşketineka

biaqil a li ser wê re bê. Miirov dikarê li dûv pêşketina mîtannîyan pêşketina dema Medîya di vê çerçoveyê de wê bi giringî wê werênê ser ziman. Di dema medîya de wê bi civakî wê êdî wê aqil civakî wê serdestîya xwe wê weke wê denezênê. Her wusa, zane û filosofên weke Zerdeşt derketina wan û hanîna hizrên xwe bi avêsta û hwd re wê, wê nîşanaka vê rastiyê bê. Civaknasîya dema Medîya, wê civaknasîyeka civakî a bi aqil û pêşketî bê. Wê bi aqil wê pêşve herê. Wê serdema wê, wê bi pêşveçûnên bi aqil bê. Wê ew rengê wê aqilê wê jî wê di rengekî aqil pirr zêde pêşketî de bê. Her wusa wê aqil wan, wê aqilê felsefeyê bê. Medîya, serdemeka pêşketî a li pêşîya dema xwe wê bijîn. Piştî wan re wê dema wan wê were fahm bikirin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê werênê ser ziman ku wê Medîya, wê serdemek aqil a teybet bê.

Piştî Medîya re wê li ser wê rengê pêşketina wê re wê pêşveçûnên civakî û civaknasî wê bibin. Wê pêşveçûnên biaqil wê derkevina li pêş. Civaketî, wê pirr zêde wê derkeve li pêş. Di aslê xwe de mirov dikarê avêsta, wele binetereka hemdem a ku ew li gorî aqilê demê û felsefeyê ku ew hatî nivîsandin a ku ew rê nîşanî serdemên civakî ên piştre ku wê bide bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê rastîya wê werênê ser ziman. Piştî wê re pêşveçûnên ku wê bi civake Medîya û civakên din ên li herêmê re wê bibin, wê vê rastiyê wê piştrast bikin.

Her wusa, piştî Serdema Medîya û Zerdeşt re hatina dema Manî û Abgarîyan û bi wê re di rex wê de dema Sasanîyan jî bi hemû kêmesîyên wê re mirov dikarê bibîr bike. Wê di vê çerçoveyê de wê serdemek nû wê bibê. Serdemên piştî Medîya û Zerdeşt re ku ew dibin, heta wê dema derketina Manî û dema wî, wê di vê çerçoveyê de wê pirr zêde watedar û vegotinbar bin. Wê ev serdem, wê weke serdemna biaqil ên felsefîkî bin. Manî, di dewama hizrn Zerdeşt de ew hizrên xwe yên ku wî hanîna ser ziman, wê di nava civakên avêstayî de wê pêvajoyek nû a olî û felsefîkî wê bide destpêkirin û wê pêşavanîyê ji wê re bike. Rastîya Manî, di dewama ya Zerdeşt û avêsteya wî de wê, pirr zêde wê bi vê rengê wê watedar bê. Wê fahmker bê. Mirov, divê ku Manî di dewama Zerdeşt û Avêstaya wî de werênê ser ziman û fahm bike.

Di dema Manî de wê rengekî civakî ê teybet wê hebe. Di vê demê de wê civake ku ew bi sazî û sazûmana xwe ya civakî pêşketîya û bi wê re li gorî wê dihizirê û bawerîya xwe pêşdixe wê derkeve li pêş û hin bi hin jî wê pêşbikeve. Ola Manî, wê di vê çerçoveyê de wê wateyê ji xwe re wê bibînê. Ew, wê di çerçoveya civake hemdem de wê oldarîyekê bi felsefeyê bike. Ola Manî ku wî pêşxistîya, ku mirov ji aliyê felsefeyê û aqilê wê ve li wê dinerê, wê bi awayekî vekirî weke pergelek felsefeyî wê derkeve ber me. Her wusa ji aliyê têgîn û olzanîyê ve jî ku mirov li wê dinerê, wê dîsa bi heman rengî wê weke olek û bawerîyekê wê derkeve li ber me. Di vê çerçoveyê de wî bi felsefeyê û aqilê wê, ol û bawerîya xwe pêşxistîya û jîya ya. Ev teybetmendî, wê berî wî wê bi Zerdeşt re jî wê hebe. Heta ku wê berî Zerdeşt wê bi Mîtra re jî wê hebe. Di vê çerçoveyê de wan, hizrên xwe bi felsefeyî hanîna ser ziman. Manî, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê kevneşopîyeka hizirkirinê bê. Em dema ku li wê rengê pêşketina ola wî û pergale wê û sazûmana ku wî bi wê ew hanîya ser ziman ku em li wê dinerin, em dibînin ku wê sazûmanaka civakî a hemdem a hîyararşîkî bê. Wê di wê çerçoveyê de ew bike ku ew li gorî xwe û bawerîya xwe û pîvanên dema xwe wê bawerîya xwe bisazûmanî werênê ser ziman.

Pêşveçûnên vê demê ên civakî wê xwediyê şêwayekê civaknasî ê pêşketî bin. Her wusa, civaketîya vê demê wê civaknasîyek biaqil a pêşketî wê bi xate pêşketina civakê

re wê bide danîn li berçav. Pêşketina Manî û hizrên wî wê di vê çerçoveyê de wê fahmker bê. Wê vegotinbar bê. Piştî Manî re wê, wê heta sedsala 6´an jî wê bi vê rengê wê li herêmê wê li ser rengê pêşketina wî û bigiştî ya yazdanîyê re wê pêşketin wê bibin. Wê civak wê pêşketina xwe wê bijî. Piştî wê re wê îslam wê were. Îslam, wê çendî ku wê ji van pêşketinan wê sûdwergirê jî lê wê, piştî ku xwe bisazûman kir û serdest kir û pê de wê, bidest hêrîşkirina li wê temenê ku wê bixwe jî ji wê xwe pêşxistiya bike. Her wusa, herêmên Zerdeştîtîyê, Manîyan û hwd, wê rastî seferên îslamîstan wê werin. Bajarên Zerdeştî û Manîyan ên ên weke şahrêzor û kirmanaşan û hwd, wê bi gelek bajarên din ên wan re ê werina kevil kirin. Rewşa kevilkirina wan, mirov dikarê weke van kevilkirinên ku wê bi hêrîşên rejima tirk ên roja me ku wê ew li bajarên kurdan ên weke Cizîr bota, Nisêbîn, gever, Silopî, Şirnax, Sûr û hwd re wê weke hevdû bê. Ev kevilkirinên ku wê di sedsale 21´ê de di sale 2016´an de wê li berçavê hemû cihanê wê rejima tirk wê li ser serê kurdan û civake kurd wê bike, wê weke hêrîşna xadar û hov ên vê serdema mirovatiyê ku wê hemû nirxên mirovatiyê wê binpê bikin bin. Wê wijdanê mirovatiyê bidina girîyandin. Her wusa bi heman rengî wê hêrîşên hov wê piştî derketina îslamê wê li herêmên zerdeştîyan û Manîyan wê bibin. Piştre jî wê ev hêrîş, bi hêrîşên li ser beşên civake kurd ên weke ya yarsanî, êzdayî û hwd, wê hebûna xwe wê bidina domandin. Serdemên piştî hatina îslamê, wê civake kurd li kurdistanê wê gelek tengezerîyên dîrokî wê bi hêrîşên ku wê li wê bibin re wê bijî. Her wusa, wê di vê demê de wê civake kurd, wê li kurdistanê wê pêvajoyek nû wê bijî. Wê di vê demê de wê demên wê yên bilindbûnê jî wê bibiin. Minaq, serdema desthilatdarîyên kurd ên weke serdema kekoyîdîyan eyerîdîyan, şadadîyan, merwanîyan, eyûbîyan û hwd. Serdem, her yekê wê di dewama ya din de wê were. Wê di vê demê de wê civaknasîya civake kurd wê, xwediyê rengekî pêşketinê ê ku ew di nava xwe de serdest bê. Wê bi wê re wê hertimî wê bijî.Ev serdem, weke serdemeka ku em divê ku wê bi başî lê bikolîn û wê fahm bikin bê.

Ev serdemên civake kurd ên piştî hatina îslamê wê weke serdemna ku wê civaka kurd wê xwe ji nû ve jî wê li gorî demê wê dûbare wê xwe bisazûman bike bê.Herwusa wê pêşveçûnên nû wê di vê demê de wê bibin. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê civak, wê bi nirxên xwe yên kevneşopîkî re wê bijî.Pêşveçûnên dema kekoyîdîyan eyerîdîyan, şadadî û merwanîyan, wê di pêşketinên van deman de wê weke pêşketinna hîmî bin. Di van deman de wê zane û filosofên kurd ên weke bavê henîf dinwerî, bavê tahirê Uryanî, Qaranî, Êlî Herîrî, Ebûlîzê Cizîrî, û hwd wê derkevina li holê. Di vê demê de wê Di nava civake kurd a yarsanî de wê pêşeng, zane, filosof û bawermendên weke Sultan Sahaq û bavê Serheng Dewdanî wê derkevin. Ew wê, vê beşa civake kurd wê bi hizrên xwe re wê ji nû ve sazûmana wê ya civakî a li gorî demê wê temenê wê biavêjin û pêşbixin. Bi wê re wê di heman demê de wê beşa civake kurd a civake êzîdî wê keseyet, zane, filosof, pêşeng û bawermendên weke Şêx Adî û piştî wî re ku wê di dewama wî de wê werina şêx Faxrê Adîyanî wê werin û derkevin. Ev jî, wê vê beşa civake kurd wê ji nû ve li gorî demê wê bihizrên xwe yên yên ku ew dihênina ser ziman wê bi rêxistin bikin. Wê temenê wê yê xwe jîyankirin û parastina wê ya bi hizrî wê pêşbixin. Her wusa, beşa civake kurd a ku ew bûya misilman jî wê zane û pêşengên weke Êlî herîrî, elîyê Êsir, Seydayê Cizîrî, Feqiyê teyran, Ahmedê Xanî û hwd, wê di dema zaneyên weke bavê henîfê dinwerî, bavê tahirê Uryanî, Qaranî, Êlî Herîrî, Ebûlîzê Cizîrî, û hwd de wê werin û derkevin. Piştî wan re wê gelek zaneyên din

jî ê civatî wê derkevin. Wê mijarên felsefîkî û civatî wê bihizrên xwe re wê hildina li dest. Zaneyên weke Eliyê Êsir û bavê fida û hwd, wê dîrokzanna civate kurd ên demê bin. Her wusa, wê piştî wan re Seydayê Cizîrî û Feqiyê teyran, wê zaneyna ku ew pirsgirêkên civakî bi aqilê felsefeyê û wêjeyî şîrove dikin bin. Wê ev zaneyên kurd, wê bi demê re wê temenekî mazin ji wêjeya civake kurd re wê biafirênin. Bi wê re wê temenekî civakî ê demê wê bi hizrên xwe re wê hin bi hin wê biafirênin. Wêjeya kurd a hemdem wê pêvajoyek pirr zêde pêşketî wê di vê demê de wê ji aliyê van zaneyên civakî ve wê were dayîn destpê kirin.

Di vê demê de wê pêşveçûnên wêjeyî û yên olî û hwd wê bihevdû re wê di zikhevdû de wê bibin. Her wusa, gelek qasîdeyên ku wê zaneyên kurd wê pêşbixin, wê bo civakê wê wateyek wan ya wêjeyî jî wê hebe. Wê bi wê re wê temenekî civatî ê demî jî wê were pêşxistin. Civak, wê ji nû ve wê bi van şîroveyan re wê weke ku wê xwe û mejûya xwe re bidest nasînê wê bike. Wê dîrok, felsefe, aqil û felsefe û hwd, wê bi gelek mijarên din ên aqilî re wê werina hanîn li ser ziman. Zaneyên civake kurd ên weke Şemsedînê şahrezorî wê bi aqilê felsefeyê wê li ser vacê, metafîzîkê, stêrzanîyê û hwd, wê bihzirê wê gelek pirtûkan wê li ser van mijaran wê binivîsênê. Ev mijarên aqilî û felsefîkî wê di vê demê de wê di nava civakê de jî wê pirr zêde wê li ser wan were axiftin. Wê gelek zane, wê li ser hizrên hevdû wê hizrên xwe werênina ser ziman. Wê hevdû rast bikin. Wê hevdû pêşbixin. Ev jî, wê bi demê re wê di nava civakê de wê bibê. Civake kurd, wê di vê demê de wê weke ku wê di nava xwe de wê pêvajoyna jinûvebûnê wê bi xwe re wê bijî. Lê tevî ku wê gelek hêrîş û mudahele bi wan hêrîşan wê li hebûna wê bibê jî, wê van pêşveçûnan wê bi xwe re û wê bi demê re wê bijî. Civake kurd, wê di vê demê de wê xwe ji nûve wê saz bike. Di vê demê de wê xate bawerî a yek-xwûdayî ya yazdanî a ku ew di nava civake kurd de ew pêşketibû û serdest bû, wê di vê demê de wê ne weke berê wê serdest bê. Wê serdestîya xwe ya giştî wê ji dest bidê. Di vê demê de wê yek-xwûdayîya semewî wê hin bi hin wê êdî wê serdest bibin. Wê di nava wê de jî wê yazdanîtî, wê were bişavtin kirin. Lê wê di vê pêvajoyê û serdemê de jî wê civake kurd wê heta serdema eyûbîyan wê di nava wê de jî wê weke hêzek civatî a kifşkar wê hebe. Nîşanaka wê jî wê ev desthilatdarîyên civake kurd ên weke desthilatdarîyên kekoyîdîyan, eyerîdîyan, şadadîyan, merwanîyan, eyûbîyan û hwd bin bi gelek desthilatdarîyên din ên herêmkî re. Bi wê re wê rewşa van zane, filosof û zaneyên civake kurd jî wê weke nîşanaka wê bê. Mirov, ji van herdû aliyan ve ku mirov demê û dîrokê lêkolîn dike, mirov rastîya civakê pirr zêde bi serdestîya wê ya demî re fahm bike.

Civake kurd, wê hebûna wê piştî serdemên eyûbîyan û pê de wê ji aliyê osmanîyan û piştre bermehîya wê komare tirk ve wê were xistin bin hêrîş û pêvajoyên tune kirinê de. Ev pêvajoyên hêrîşên li hebûna civake kurd, wê di nava civake kurd bixwe de jî wê pêvajoyek din wê bide destpêkirin. Bi bandûra hêrîşan re wê pêşîya xwe li gorî demê afirandinê a civakê wê were asteng kirin. Her wusa, wê hêrîş li kevneşopîyên wê werina kirin. Ji van deman û pê de wê civake kurd di nava xwe de wê, bikeve rewşek xwe parastinê de. Bo vê yekê wê zêde têkiliyên wê yên bi der ve wê nemênin. Her wusa ev pêvajoya xwe di rewşek parastinê de hiştina civake kurd wê, heta sedsale 20 û 21´ê jî wê bidomê. Di dawîya çeyreka pêşî a sedsale 21´ê de wê ev rewşa civake kurd wê bigûharê. Wê civake kurd, wê di çeyreka dawîya sedsale 20´ê de wê rewşa civake kurd wê bidest gûharînê wê bike. Ev dem, wê ji du aliyan ve pêş bikeve. Ji aliyekî ve wê pirr

zêde hêrîşên xadar ên weke ku wê li îraqe wê demê wê saddam û piştre li tirkiya wê demê wê Ardogan bike. Pêvajoya hêrîş û komkujiyan a ku wê saddam bi komkujiyên weke yên Helebçê re ku wê li hemberî civake krud wê bide destpêkirin, wê Ardogan li tirkiya li bakûrê kurdistanê wê bide domandin. Di aslê xwe de wê T. Ardogan, wê ji saddam zêde û xadartir wê pêvajoyên hêrîşê wê li hebûna civake kurd wê bide destpêkirin. Çendî ku wê saddam di sedsale 20´an de wê van komkujiyan bike, wê Ardogan bê Saddamê sedsale 21´ê û wê di destpêka sedsalê û pê de wê bidest hanîna komkujiyan li ser serê civake kurd. Li ser navê civake kurd çi li jîyanê heya, wê ji xwe re bike armanc û wê hêrîşî wan bike.

Ev rewş, wê piştre wê bi hêrîşên li bajarên bakûrê kurdistanê ên weke Cizîra bota, silopî, sûr, gever, Nisêbîn, hezex û hwd re wê bajaran kevil bike. Wê ji naqşayê bibê. Bi wê re jî wê, komên çete ên weke Cebetil-nasr´ û DAÎŞ´ê û hwd wê bi rêxistin bikin û wê biajona bi ser hebûna civake kurd a rojavayê kurdistanê de.

Beşa civake kurd a rojava, wê di sale 2014´an de wê bi berxwedanên weke li Kobanê û hwd re wê dîrokê binivîsênin. Her wusa, wê ev pêvajo, wê bina malê dîrokê. Wê serkevtinna mazin li hemberî van pêvajoyên hêrîşê ên ku wê rejima tirk bi alikarîya rejimên din ên ku ew pirsgirêka wan ya kurd heya wê birêxistin wê bidest bixin. Piştî vê pêvajoyê re wê hebûna kurd, wê li cuhanê wê cardin wê were nasîn. Her wusa, wê piştî vê rewşê re wê li rojavayê kurdistanê wê kurdistanî wê pergalek xwe ya civakî a desthilatdarî wê ava bikin. Wê xwe ji nû ve wê birêxistin bikin. Lê wê rayadarên tirk û rejima wê, wê di her pêvajoyên wê pêşketina kurdan de wê hêrîşan wê li wê pêşbixin. Wê di qada navnetewî de wê her cûre dîplomasîyê wê pêş bixin bo ku ew pêşîya wê pêşketina civake kurd bigirin. Bo ku kurd bi statûya wan re ew newina herê kirin û hebûna wan newê nasîn, wê her cûre dîplomasî û tehdîdan wê pêşbixin. Di destpêka şerê navxweyî ê sûrî de wê rayadarên bi milyonan mirovan bidina goçberkirin û wê bo ku ew wan weke ´kozekê´ li hemberî welatên rojava û cihanê wan bikarbênin. Di berdêla wê ew karibin alikariyê bistênin û bi wê pêşîya pêşketin û herêkirina statûya civake kurd bigrin. Tevî van rewşan hemûyan û astangîyan hemûyan jî wê kurd, wê karibin, rewşa xwe wê biparêzên. Her wusa, wê karibin desthilatdarîya xwe ava bikin. Komên hêrîşka ên ku rayadarên tirk wan bi rêxistin dikin, wê pêşî hêrîşî du herêmên kurdistanê bikin. Li başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê rêveberîyên kurd hatibûbûna avakirin. Wê bi teybetî ev herdû herêm wê bên xistin bin pêlên hêrîşan de. Piştre jî rewşa civake kurd a bakûrê kurdistanê ku ew pêşketî û ku kurd li ser wê re doza statûya xwe dikin, wê rejima tirk bi tank û topên xwe bidest hêrîşî bajarên bakûrê kurdistanê bike bo ku wê temenê xwestina statûya wan ya civakî tûna bike. Bo vê yekê, wê bi dehan bajarên bakûrê kurdistanê bi hêrîşan wê tarûmar bikin û wê kavilbikin. Raaydarên tirk, bo ku wan hêrîşan manipûla bikin, wê ji aliyekî ve hêrîşan bikin û civake kurd di pêvajoyên jenosîdê de derbas bikin û wê bi wê re jî bo ku ew têgiheka din di mejiyê mirovan de çê bikin wê gotina ´biratiyê´ bi xwe û kurdan bikarbênin.

Bêgûman mirov dikarê van hêrîşan bi dîroka wan re ji demên osmanîyan û hwd bidina destpêkirin û dem bi dem û pêvajo bi pêvajo werênina ser ziman heta vê dema komare tirk. Li vir, di çerçoveya mijara me de fahmkirina hebûna civake kurd û rastîya civakenasîya wê ya civatî wê li vir giringtir bê ku mirov wê fahm bike. Dema ku em wê fahm bikin, emê hingî baştirîn fahm bikin, di van hêrîşan de çi rastî hatîya xistinbin hêrîşan de.

Civake kurd, wê li hemberî van hêrîşan, wê bêparastin wê bê hiştin. Wê ti makanizmayên wê ên xwe parastinê di destê wê de newina hiştin. Rêxistin, komel û saziyên ku li ser navê civake kurd derdikevin û tekoşîna maf û azadîya wê dikin jî wê, bi gotina ´terorê´ wê were tohmetbar kirin bo ku ew ji wê tekoşîna xwe ya mafdar a maf û azadîya civake kurd bi şûn ve gavê biavêjin. Lê di aslê xwe de di roja me de fahmkirina van rastîyan, wê ji aliyekî ve wê bê fahmkirinek di derbarê rewşa civake kurd a vê demê de jî. Her wusa, di vê demê de wê civake kurd di çi rewşê de bê û wê di çi rewşê de wê bijî, wê vê raxê li berçav. Ez bixwe jî, van rêzan bi zimanê kurdî dinivîsênim. Lê ev zimanê ku ez bi wê van rêzan dinivîsênin, ew li civake kurd bixwe jî hatîya qadaxa kirin. Kurd, nikarin bi zimanê xwe ew xwe perwerde bikin û xwe werênina ser ziman. Bi vê yekê, mirovên ku wê bi vî zimanî wê binivîsênin ya wê werina kuştin û qatilkirin û yan jî wê bi deh salan wê werina girtin û bên avêtin li zindanan û di zindanan de wê êşkenceyan wê li wan bikin. Ez bixwe jî, weke kurdekî ku di van pêvajoyên girtin û êşkencekirinê de derbas bûma, dikarim bêjim ku mirov dema ku di vê demê de ew bi kurdî dinivîsênê ew jîyane xwe dide berçavê xwe ku ew were kuştin û hertişt ku ew rastî wê were jî. Rewşa civake kurd a di destpêka sedsale 21´ê de wê bi vê rengê bê.

Civakek bi hemû rastîyên xwe re ew heya. Civak, xwediyê dîrokekê, zimanekî û jîyaneka ku ew wê dijî ya. Di vê çerçoveyê de wê ramanên xwe jî wê bi wê re wê werênê ser ziman. Ev rastîyên ramanî, zimanî û dîrokî û hwd, wê weke rastiyna ku mirov dikarê weke stûnên hebûna civakê jî werênê ser ziman in. Dema ku civakek ji van rastîyên wê hat dûrkirin, wê ew civak ji rastîya xwe dûrkeve. Wê tûna bibê. Ya ku î ro, civake kurd bi wê re rû bi rû jî ya wê ev rastî bê.

Civake kurd weke civakek dîrokî, wê dîroka wê heta destpêka pêvajoyên şariştanî wê herê. Em dema ku dîroka civake kurd hildina li dest, wê dîroka wê bi pêvajoyên wê yên civakî re wê bi pêvajoyên wê yên şariştanî re wê ji serdema sûmerîyan û gûtîyan û heta serdemên hûrî-mîtannîyan û piştre dema medîya wê were û wê xwe bide domandin. Piştî serdema medîya re wê civake kurd, wê pêvajoyên xwe yên jîyanî wê bide jîyankirin û domandin. Piştre jî wê, serdemên kekoyîdî, eyerîdî, şadadî, merwanî, eyûbî û hwd, wê bi gelek pêvajoyên din ên herêmkî ên rêveberî û desthilatdarî re wê bide jîyankirin û domandin. Wê bi wê re wê heta roja me wê xwe bide jîyankirin û domandin. Di roja me de hebûn û pêşaroja civake kurd dibin hêrîşan de ya. Di çerçoveya van hêrîşên li her hebûn û pêşaroja wê ku ew bi armanca ji dîrokê birina wê na, mirov dikarê qadaxaya ser zimanê wê kurdî jî fahm bike û wê werênê ser ziman. Tevî wê jî ew dike ku wê hebûna xwe bi pêşaroja xwe re ji wan hêrîşan xilas bike û bide domandin.

Weke ku çawa ku civake kurd heta roja me tevî hemû pêvajoyên hêrîşan ên li ser hebûna wê jî, wê karîya ku hebûna xwe bide domandin li roja me. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku werênê ser ziman ku wê civake kurd, wê weke civakek dîrokî wê heta roja me, wê karibê hebûna xwe bide domandin. Di dema hûrî û mîtannîyan de wê tevî hemû hêrîşên xadar ên hîttîtan wê karibê hebûna xwe bide domandin. Piştre di dema medîya de wê hêrîşên desthilatdarîya asûr û komên ku ji derve tên herêmê wê li hemberî wan wê li berxwe bide. Piştî dema medîya ne bi gelekî re hêrîşên hatina îskenderê zûrqerneyn a li kurdistanê û hêrîşên wî yên li hebûna civake kurd û civakên din ên li herêmê wê bê malê dîrokê. Piştre jî wê di dema sasanîyan de wê hêrîşên desthilatdarîya

sasanîyan wê dem bi dem li herêmên kurdan wê bibin. Lê ew ji ber ku wê ji heman nirxên wê civake kurd wê sûdwergirin û wê xwe bi rêxistin û bîrdozî bikin, wê ev li pêşîya wan asteng bê ku ew zêde hêrîşên xwe bi xadarî bikin û bidomênin. Ev rewşa wan, wê piştre wê piştre di dema desthilatdarîya sefewîyan de wê hinekî din zêdetir bibin. Lê wê dîsa sînorekî wê hebe. Lê piştî ku osmanî li herêmê tevî ku ew alikarîya civakên herêmê ên weke civake kurd dihildin û dibina desthilatdar jî, ew piştî ku bûna desthilatdar, wê berê şûre xwe wê bidina hebûna civake kurd û civakên ên li herêmê. Wê komkujiyên mazin ên xadar wê werênina ser ziman. Di dawîya xwe de wê osmanî, gelek komkujiyên mazin weke ku wê li koçgirî, sasonê, botanê û hwd bê wê werina serê civake kurd û bi wê re wê civate ermenî li herêmê bi komkujiyan wê werênina ber ji dîrokê birinê. Piştî wê re wê bermehîya wê komare tirk, wê heman kevneşopîyên wê yên bi komkujiyan ên li ser serê hebûna civaken bo hebûna desthilatdarîya xwe wê bidê domandin. Weke wan wê li dehan deverên din ên kurdistanê wê komkujiyan werênin serê civakê. Wê komkujiyên komare tirk ên li ser serê civake kurd wê heta salên 2016´an ên sedsale 21´ê wê bidomê û wê ji wê jî wê bipêşdetir wê herê. Wê temenê komkujiyên nû wê li hebûna civake kurd bi pêvajo û konseptên şer û hêrîşan re wê bi rêxistin bikin. Civake kurd, bi berxwedan, dîrok, çand, ziman û felsefeya xwe ya li hemberî van pêvajo û konseptên şer û hêrîşan ên li hebûna wê re ew hebûna xwe diparêzê û dike ku ew barî pêşarojê bike. Bi vê re bi awayekî vekirî hatîya dîtin ku bi berxwedanê pêşaroj ya civake kurd a. Wê dîroka xwe bi wê bwerxwedanê re wê bi ber pêşaroja xwe re wê bide nivîsandin. Tevî hemû pêvajo û konseptên şer û hêrîşan ên li hebûna civake kurd, ez dikarim bêjim ku wê pşaroj ya wê bê. Ber ku ew di vê demê de wê weke demên bûhûrî, ew di derbarê xwe û hebûn û dîrok û civaketîya xwe de bûya xwediyê têgihiştinê. Ya ku di demên bûhûrî de ew biserxist, wê ev bê. Di vê demê de jî wê ev bê. Bo vê yekê, gotina wê pêşaroj ya civake kurd bê, wê ne gotinaka vala bê. Wê gotinaka ku wê bi dîrok û hebûn û zanebûna wê ya demê re ku wê bi temen û hîm bê bê.

.

**Wêja û çanda kurd û hebûna wê ya di bin hêrîşê de**

Kurd di vê demê de hatina xistin bin pêvajoyeka jenosîdê a çandî û fîzîkî. Ji her aliyê ve dihê çûyin li ser wan. Ji destpêka komare tirk ve wê, xate hêrîşkarîya wê ya li çand û hebûna civake kurd wê, dawî li wê newê. Zimanê kurdî wê, were qadaxakirin. Mirovên ku ew bi zimanê kurdî biaxifin wê, rastî hêrîş, êşkence û kûştinê werin. Ev kirin û rewşên ku rejima tirk li hemberê kurdan pêşxistin wê, heta roja me wê, bidomê. heta roja me wê, bi dehan rojnema, kovar û hwd ên kurdî wê werina girtin. Kesên ku bi kurdî dinivîsênin ên weke Musa Anter û hwd wê, werina qatilkirin. Di dewama wê de wê, bi hezaran kesên ku ew li ziman û çanda xwe xwedî derdikevin wê rastî muameleyên cûr bi cûr wê werin.

Ev kirin wê, bi demê re wê, ti tişt wê newê gûharîn. Di dewama wê de wê, zane û fîlosofên kurd wê, çawa wê, ji rastîya wan dûr wê werênina li ser ziman wê, bikevina nava hewldanê de. Wê çawa wê yan li ser rastîya olî re wê, ji rastîya wan civakî dûr wê werênina li ser ziman û yan jî wê, bi deverna din ve wê girêbidin wê, bikevina nava hewldanê de. Hêrîşên li çanda kurdî wê, di vê çerçoveyê de wê, hertimî wê bidomê. Kes û sembolên kurdî ku ew kesên weke Ahmedê Xanî jî bin wê, hertimî wê di bin hêrşên bi vî rengî de bin. Di dewama wê de wê, çawa wê, ji rastîya wan ya civakî wê dûrbikin wê, bikevina nava hewldanê de.

MInaq kes û fîlosofên kurd ên weke Êî herîrî, seydayê cizîrî, îsmaîlê cizîrî, mele hisênê batêyî û hwd wê, ji rastîya wan ya civakî wê dûr bikin ketina nava w hewldenê de. Lê di wê hewldanê de biserneketina. Gelek fîlosofên kurd î ro jî ku ew di nava pirtûkên ku hatina nivîsandin de wê, çawa ji rastîya wan dûr wê werênina hanîn li ser ziman wê, bi zimanekê ´dewşîrme´ wê bê xwestin ku ew ji wan bahs bikin.

Di vê çerçoveyê de pirranîya kesên ku ew xwe weke ´aqadamisyen´ bi nav dikin û li zaningehan xwedî dîplomên ´profesorîyê´ na wê, çawa wê, ji rastiya wan dûr wê werênina li ser ziman wê bi dehan pirtûkan wê binivîsênin. Di vê çerçoveyê de wê, di aslê xwe de wê, li tirkiya û welatên din ku kurd û Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin wê, ´zanist´ û ´zanîn´ wê, wê bê xistin xizmeta tûnakirina hebûna civakî de wê, di vê çerçoveyê de wê, şêwayekê hizirkirinê û rengê wê were pêşxistin. Ev jî wê, di bin navê ´zanistîtîyê´ û ´aqadamîsyenîtîyê´ de wê were kirin û pêşxistin.

Di vê çerçoveyê de ku mirov hinekî demên bûhûrî wan lêkolîn bikê û berhemên wan deman lêkolîn bikê mirov wê, vê yekê wê, bi awayekê vekirî mirov wê, ew wê kifşbikê. Bi hezaran kesên ku ew weke ´aqadamîsyen´ derketina li holê wê, çawa wê rastîyê berevajî bikin û wê werênina li ser ziman wê, bikevina nava wê hewldana wê de. Ev jî wê, bi qadaxayên danîna li ser zimanê kurdî û hêrîşên li hebûna civakê û çanda wê re wê, di ahengekê de wê were kirin. Her wusa wê, bi awayekî wê, rejim wê hêrîşî hebûna civakî bikê. Bi wê re jî wê kesên ku ew xwe weke ´aqadamîsyen´ bi navbikin wê, çawa wê rastîyê ji mejiyan jêbibin wê bikevina nava wê hewldana wê de.

Di vê çerçoveyê de wê, hemû hêrîşên li çand û dîroka hizir a xalkên herêmê wê, di vê çerçoveyê de bê. Minaq li Bazîdê ji aliyê ´kayyumê rejima tirk ê AKP´yî ve rûxandina peykelê Ahmedê Xanî wê, di vê çerçoveyê de were kirin. Her wusa di vê çerçoveyê de rûxandina peykelê Ahmedê Xanî mirov, dikarê bişibihênê dema destpêka hêrîşên DAÎŞê de ku wê, çawa wê keleha Salahadînê Eyûbî wê were rûxandin. Di vê çerçoveyê de wê, bi awayekî mirov dikarê wê werênê li ser ziman.

Di vê çerçoveyê de nirxên civakî ên ku ew di temenê çand, wêje û fahmkirina civakî de ya wê, ji xwe re wê bikina armanc. Ber ku ev sembolên civakî weke astengîyekê na li pêşîya bernemeyên bişavtinê û ankû asîmilasyonê ên rejimê ku ew li ser serê civakê ku ew pêşdixê ku ew herina li sêrî. Di vê çerçoveyê de wê ev sembolên civakî ên civakî, wêjeyî û hwd wê, weke sembolna ku ew bişavtin û ankû asimlasyona rejimê vala derdixin bin. Ber vê yekê ew wan ji xwe re dikê armanc. Di vê çerçoveyê de deverên pîroz ê
n sûryanîyan ên li dora mêrdinê û hwd ku ew hena jî destavêtina li wan û destêserkirina wan jî wê, di vê çerçoveyê de wê bi armancekê bê.

Van kirinan mirov divê ku di çerçoveya mantiqê ku ew rejimê bi wan rojnema û kovar û hwd ên kurdî girtina re wan hilde li dest. Di vê çerçoveyê de wê, çawa wê, rastîya herêmê a civakê wê ji kokên wê yên dîrokî wê dûrbikê û wê bişavtinê û ankû asîmilasyonê li ser serê wê bibê sêrî wê, di vê çerçoveyê de wê, ev kirin wê werina kirin. Rejima kayyuman wê, weke rejimeka ku wê di vê çerçoveyê de wê, çanda civakî a herêmê wê bikê bin hêrîşan û tûna bikê û bi wê re wê pêvajoyên bişavtinê û ankû asîmilasyonê wê li ser serê civake herêmê wê pêşbixê û bibê sêrî bê. Wê weke lingekê wê yê rejimê ê li herêmê bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê, rastîya wê fahmbikê.

Di vê çerçoveyê de qadaxa li ser zimanê kurdî, hêrîşên li hebûna civake kurd û çanda wê, bi wê re girtina rojnemeyên kurd û hêrîşên li çanda fîlosofên kurd ên weke Ahmedê

Xanî û hwd jî wê, di vê çerçoveyê de wê, xwediyê wateyekê bê. Di vê çerçoveyê de wê, di aslê xwe de ku mirov rewşa hêrîşên li çanda fîlosofên kurd ên ji aliyê rejima tirk û hwd ve wê hildina li dest wê berê jî wê hebê. Berê wê, çawa wê ji rastiya civakê wê dûrbikin û wê tenê "bi gotina olî re bi sînor wê werênina li ser ziman" wê, li ser wê bisekin in. Di aslê xwe de ev hêrîşên weke li peykelê Ahmedê Xanî wê, nîşanaka wê bê ku ev hewldanên rejimê û rayadarên wê, bi serneketina. Wê hinekî jî wê, nîşanaka wê bin.

Di vê çerçoveyê de wê, dema ku ew rastîya heyî ku wê nikaribin bikevina vajî wê û berevajî bikin wê, çawa wê bikina bin pêvajoyên hêrîşê de wê, di vê çerçoveyê de wê, hêrîşî wê bikin. Di vê çerçoveyê de mantiqê ku peykelê Ahmedê Xanî rûxand wê, bi heman rengê wê bikê ku Sûrê jî bi rûxênê. Sûr wê, weke devereka kirmanî a dîrokî a ji dema hûrî û mîtannîyan ve maya bê. Ji gelek şariştanîyan re wê, malavanî kirîya. Ev rewşa hêrîşê wê, li Cizîra bota wê li hemberê gelek kirman, medreseya sor û hwd jî wê pêşkevin. Ev deverên ew weke xêv û ankû hafizayeka çandî û dîrokî a civakî li ser lingan mana wê, di wê çerçoveyê de wê, ev pêvajoya hêrîşan wê were pêşxistin. Di dewama wê de mirov dikarê bi gotinekê jî wê, werênê li ser ziman ku dema k urayadarên tirk biryara hêrîşên li bajarên kurd ên weke Nisêbînê,, cizîrabota, gever, farqîn, sûr, silopî û hwd kirin wê, bi teybetî deverên ku ew di wan de çanda civakî a herêmê xorta wê werina bijartin û wê ew wê hêrîşê pêşbixin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê jî werênê li wer ziman ku wê, aliyê van hêrîşan ê çandî û mejûya civakî a dîrokî wê zêdetirî wê li pêş bê. Di aslê xwe de mantiqê ku ew peykelê Ahmedê Xanê şikand û rûxand û dixwezê Sûrê bi dîroka wê re wê, tûnabikê wê, baştir wê, mantiqê wê rûxandina bajarên kurd jî wê, raxê li berçav.

Li vir di dewama wê de mirov divê ku wê jî wê, werênê li ser ziman ku Ahmedê Xanê wê tenê zane û fîlosofekê kurd bê. Lê ew bi hebûna xwe û bi berhemên xwe yên bi kurdî ku wî nivîsandina re bûya weke xêv û hafizayeka civakî. Her wusa di vê çerçoveyê de wê, bandûra vî fîlosofê kurd wê, heta roja me wê li ser çanda civake kurd wê hebê. Ya ku di aslê xwe de bûya temenê hêrîşa li wî jî wê, ev rastî bê. Di vê çerçoveyê de wê, çawa wê xêv, bîrhanîn û temenê pêşketina civakî wê tûnabikin û wê li ser wê re wê pêvajoyeka bişavtinê wê bibina li sêrî wê, di vê çerçoveyê de wê ev hêrîş wê werina pêşxistin.

Li vir divê ku mirov vê yekê wê werênina li ser ziman ku wê, ev rûxandin hemû weke bi şikandina peykelê Ahmedê xanê, rûxandina Sûrê û hwd re wê, di çerçoveya zihniyeta jenosîda çandî a li ser serê civakê de wê, werina pêşxistin û kirin. Di vê çerçoveyê de wê, ew werê kirin. Van kirinan divê ku mirov bi perspektifa qadaxaya ku rejima tirk danîya li ser zimanê kurdî re wan hilde li dest û fahmbikê. Wê, di wê çerçoveyê de wê, baştir wê, rastiyê bidina fahmkirin.
.

LI SER ASTA TÊGIHIŞTINA ´MEM Û ZÎNE´ AHMEDÊ XANÊ

Ji aliyê pêşketina civatî ve mirov di serî de aliyekî pirr pêşketî û bitêgihiştin bi vegotina Mem û Zînê re zant dikin. Ew aliyê ku em zant dikin jî, her weha bi aliyê pêşketina civatî û serê mirovên di civatê de dijîn re dihê li berçav. mem û Zînê, di mirovên ku li jîyanê jîyabûn. Jîyane wan, ne tenê xiyalkirin û hişkirineka. Ji wê zêdetir, jîyandinaka. Ev herdû mirov, di jîyanê de dijîn. Hij hevdû dikin û dilê wan dikeve hevdû de. Li gor kevneşopîyan dijîn. Ew pêşî, di wê çare pêşî ya ku ew hevdû dibînin

de, di dilê hevdû de cih û war digirin. Piştre êdî ew hevdû di dilê hevdû de dijîn. Lê di vir de, emê ne li ser wê têgihiştina ku di hundurê vegotina Mem û Zînê de heya li ser wê bisekin in. Emê li ser wê wê têgihiştin û zanîna di serê mirovên di civatê de ku ew Mem û Zîn piştî wan re afirandina, emê li ser wê bisekin in.
Bi vê yekê re, em wan şert û mercên ku Mem û Zînê têde jîyîna û afirîna û bi vegotin bûna, wê fahm bikin. Ew têgihiştina ku Mem û Zînê afirandîya ya civatî, di vir de hate ku ew newê fahmkirin, em wilo karîn bêjin ku wê aliyekî fahmkirina Mem û Zînê û wê vegotina wan ya li ser wê kêm bimêne. Bi vê yekê re, divêt ku mirov wê aliyê jî fahm bike. Ew alî, qatek ji wê, wê di hundurê vegotinê de wê were fahmkirin û têgihiştin û qatek jî, wê di demê de û bi fahmkirina demê re wê were holê û wê bifahm bibe. Bi vê yekê re dem, fahmkirina wê giring a, ku mirov wê fahm bike. Şert û mercên ku têde Mem û Zîn bi vegotin bûya, ew şert û merc û têgihiştina wan dem û şert û mercan fahmkirina wan, wê aliyekî dî yê civatî wê bi fahmkirina Mem û Zînê re wê were holê û mirov wê bibîne.

Mem û Zînê, Afirandina wê, di wê demê de bi têgihiştin dibê. Di wê demê de, ji wê awayê wê afirandina, wê mirov fahm dike, ku awayekî civatê yê pêşketî heya. Li gor fahm û xwesteka civatê afirîya û hatîya vegotin. Bi vê yekê re, dilê mirov yê bi hest, ji wê re bûya bersivek. Vegotina Mem û Zînê Ahmedê Zanî wê dihê ser ziman. Lê di aslê xwe de vegotina Mem û Zînê di berî wî de jî hebû. Divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Têgihiştina civatî, ji wê vegotinê mirov fahm dike ku hin pêvajoyên pêşketinê yên bi demê re bi ser xwe re buhurandina. Ew demên ku buhurîna, di vegotinê de awayê xwe bi heyînî di hestên ku têde dihêne li ser ziman, di wan de xwe didina li berçav. Mem û Zîn, piştî wan re pîrozîyak di nav kurdan de ji wan re hatîya baxşkirin. Bi wê pîrozîyê, qasîdeyên olî jî li ser wan hatîna çêkirin, weke ku çawa ku piştre Feqiyê Teyran li ser Dilberê afirandîya û çêkirîya. ´Dilbera´ Feqiyê Teyran jî û ´Mem û Zîne´ Ahmedê Xanî jî, ne xiyal û farazî na. Ew keseyete ku feqiyê Teyran têne ser ziman Dilberê jî û ye ku Ahmedê Xanî jî têne ser ziman Mem Û Zînê jî, di jîyanê de jîyana. Bi vir ve girêdayî, divê ku mirov bibêje ku qasîdakirin û di wê de jin bicihkirin û bi watekirin, rengekî jîyanî ê jîyane kurdî ya û berî misilmanetiyê jî bi êzîdîtiyê re hebûya. Minaq, di mem û zînê´ de ´Zîna Ahmedê Zanî, di "ey dilberê" de Dilbera Feqiyê teyran, di ´zembîlfiroş´a Mela Hisêne bateyî de rewşa jinê a ku tê ser ziman, û hwd, çend ji wan rewşên jinê na ku hatina ser ziman.

Di wê deme afirandinê de, rengên hestan weke ku dihate dîtin û fahmkiirn. Ev alî û yek, weke teybetmendîyekê xwe di vegotinê de dide der. Bi nirxkirin û dayina hestan jî, mirov di wê deme vegotinê de ku tê gotin de dibîne. Di deme ku bahse hestan dihê kirin de ew kirpkirin dihê kirin. Kirpandin, bi serê xwe, nîşanayaka têgihiştina ku bihestê re dihê holê û dihê dîtina. Hate ku hest newê kifş kirin û têgihiştinkirin û bi wê re rengê wê newê salixkirin, wê kirpandin jî di vegotinê de newê kirin. Têkiliya hest û kirpê ya bi hev re, di têgihiştinbûna bi wê re dihê dîtin. Bi helbest kirin jî, ne tenê wê bi hin awayna salixkirina hestan bi me bide têgihiştin, wê ji wê zêdetir hin têgihiştinna ku bi wê rewşê re diafirîn jî, wê bi me re bifahm bike. Di vê yekê û rewşê de, ku mirov li ser awayê vegotina Mem û Zînê lê dihizirê, mirov kifş dike ku têgihiştinaka mazin ya civatî ya demî afirîya û heya. Ne tenê di wê de, bi wê re jî têgihiştinaka civatî ji aliyekî dîn ve dihê holê û dîtin. Di wê aliyê de mirov ast û rada civatê ya ku heya kifş dike. Bi wê re,

mirov civatê bi awayê pêşketina xwe ya demê re wê kifş dike. Mem û Zinê, ji xaynî wê têgihiştina xwe ya ku di xwe de dihêne ser ziman ya civatê, ji wê zêdetir bi xwe re jî, têgihiştinaka civatî ya ku bi asta wê ya demê re heya dihêne ser ziman. Civat, di nirxên xwe yên deme yên ku diafirêne de zanîna xwe ya ku heya asta wê dide der. Rengên hestên bawerîyê û yên evindarîyê de di jîyanê de xwe jevcuda didina der. Lê di têgihiştina xwe ya ku ew pê hene de, bi awayê hestî, ew jevnedûr in. Rengîti, di vir de salixkirina wê, bi têgihiştinekê dibe. Ew têgihiştin, weke ku bi heste evîn û evîndarîyê re rengê wêjetîyê bi vanîya wê re xwe dider re, wê yê aliyê wê yê nirxdarîyê, wê ku weke ku di olê re bi pîrozîyê re xwe dide der re wê wê were li holê. Ev jevcudabûn, wê di jîyanê de, bi bûna têgihiştina têgihiştinê re wê bibê. Têgihiştina civatî ya demê ya ku Mem û Zîn afîrandîya, xwediyê wê têgihiştîna hestî ya bi xwe re ya. Kirpdandin, bitêgihiştinekê bi têgihiştina têgihiştinekê re dibe.Bi wê re jî, hizirkirin û awadana hizirkirinê, awadan û têgihiştina awadanê, mirov bi xwe re dibe û digihêne têgihiştinaka ku mirov ji têgihiştina hiziratîyê û estetîkê dûr neyêne ser ziman. . Wek tê zanîn ku destana ´Mem û Zînê´, destanaka dîrokî ya kurd ku î ro weke destana netewî ya kurd tê zanîn û nasîn. Destana Mem û Zînê, di xwe de dîrokaka ku em wê kifş bikin di xwe de diveşêrê. Hate î ro, li ser wê deme wê û dîroka wê ya ku tê de tê ser ziman, bi zanî û kur lêkolînên mazin ne hatina kirin. Lê destanên ku di nav kurdan de dem bi dem û dev bi dev dihatina vegotin jî yên weke destanên ´Mem û Zînê´ û ´ Ferhad û Serînê´ û hwd, di wan de kevneşopîyaka mazin heya. Hate î ro, li ser wê destanê û li ser felsefe civatî û civakî ya ku têde tê ser ziman jî, divêt ku ew bi teybetî li ser were sekin in. Destana Mem û Zînê´, deme ku min hizir ku li ser vê nivîsê binivîsênim, ez pir hizirim. Pêşî ez li biçûkatîya xwe hizirim. Di deme ku ez hê zaro bûm de ku hê ku min ne dizanî ku bixwênim, ji dev min ji bavê xwe ev destan bihîst. Di deme ku min hiskir de, ji serî hate ku hate vegotin jî, bizimanekî wilo xweş û xweşik hate vegotin, ew awayê vegotinê yê ku min ji bavê xwe hizir kir, weke xwe di hîş û bîra min de ma. Min piştre jî ti carî ew ji bîr nekir. hertimî di aqilê min de ma. Piştî bi demekê ku ez mazin bûm, êdî pirtûka Ahmadê xanê ya Mem û Zînê jî, deme ku min xwand, min bi wê bîra xwe xwand.

Lê divêt ku ez vê jê bêjim. Ve gotina Mem û Zînê, di wê deme xwe de û piştre jî hertimî di nav kurdan di civatan de dihate vegotin. Lê ne tenê di civatên ku bi teybetî dihatina li darxistin de dihate vegotin, her weha di malan de jî, her şev, jin û mêre malê ku bi zaroyên xwe re di bin wê ronhîya çirayê de ku lev dirûniştin, êdî jev re divegotin. Di wê deme vegotinê de hingî ji bo zaroyekê hê hesanîtir dibû ku wê vegotinê gotin bi gotinê di serî xwe de bivejêne û bêne berçavên xwe. Di wê demê de, ez li xwe û rewşa xwe ya biçûkatya xwe dihizirim, ji wê deme xwe, ez digihijime vê têgihiştinê. Ji ber ku min wilo jîn û vejînkir di xwe de di serê xwe de. Di deme ku dihate vegotin, weke ku helbestek ji mirov re were xwandin, bi destanî ew dihate vegotin.

De ne, mirov ku di deme xwe ya zarotiyê de ku bihîst, êdî zû bi zû ji bîr nakê. Di hîş û bîrê de dimêne. Ez vê yekê karîm biteybetî bênime ser ziman. Di wê deme biçûkatîya xwe de ew awayê vegotinê û vegotina ku bi vegotinî min bihîst, weke xwe dihiş û bîre min de ya. Wêneye pêşî, ya di derbarê civate me kurdan de bi civakî, pêşî bi wê bihîstinê re di serê min de bû. Dilê min, di wê deme ku min li wê vegotina Mem û Zînê dihisand de, ku çawa diavêt û di deme hisandinê de ku çawa dikira kutakut, hê jî ew di bîre min de ya. Bi her gotina wê ye ku bi lêv dibû re dilê mirov jî carekê ji xwe re di ber

wê gotin û vegotinê de diavêt. Bi wê yekê re, bi wê avêtina dil re, ew gotina wê jî di mejî de cih digirt û di hiş û bîrê de jî dima. Bi vê yekê re, di bîre min de ma. Bi vê yekê re, deme ku ez lê dihizirim ez bi bîr dikim. Mem û Zîn, bi awaye vegotinî, ku her şev dihate vegotin, di gelek şevan de min lê hisand. Di deme ku hate vegotin de pirr dirêj û mazin hate vegotin. Li dora Cizîre bota, mirovekî ku Mem û Zîn ne dizanî ne bû. Bi teybetî, di Medresayan de dihate vegotin. Ve gotina wê, pirr dirêj bû. Wan şevên zivistanan ku pirr dirêj bûn, hate demeka dereng, her şev dihate vegotin, lê bidawî nebû. Mem û Zîn, di deme ku dihate vegotin de, ew cihê ku dawiya wê ya di derbarê ´Beko´ de awayekî ne dihate vegotin. Di nav xalkê de awayekî wî yê din jî hebû. Ew jî weha bû. Dihate vegotin ku piştî ku Mem jî û Zîn jî gihiştina ber dilovanîya xwe, êdî piştre ku çend roj bi ser ve diçin, êdî piştre beko tê kuştin. Tê gotin ku Hate deme piştî çûna ber dilovanîya xwe ya Mem û Zînê jî, Mîrê bota ku li her deverê kurdistanê nav û dengê wî hebû, wî nizanîbû ku Mem jî û Zîn jî rastî bêbaxtiyekê hatina. Lê piştî ku herdû(Mem û Zîn) jî ku diçina ber dilovanîya û ku ji ber ku dihate zanîn ku dilê wan ji ber ku ji bo hevdû bû, êdî tirba wan li berhevdû tê çêkirin. Lê Tê gotin ku Beko, ji wê yekê jê pirr nexweş a. Ew wê di berhevdû de bûna tirbên wan jê hezm nakê. Ji ber vê yekê, piştî çûna ber dilivanîya wan re, êdî ew hizir dike ku herê û tirbe herdûyan jî vekê û tirba wan ji hevdû dûr bike. Beko, wê hizirê dike serê xwe de û piştre êdî dike ku wê bike.

Tê gotin ku rojekê, Beko, kirîya serê xwe de ku ti kesek li dorê nema bê û ku herkesek li civatê li hevdû rûniştî bê, ew herê û tirba wan vekê û ji hevdû dûr bike. Di wê deme ku ew diçê ku tirban vekê û wan jevdûr bike, hingî, tê gotin ku her kesek bi mîrê bota re di civatê de rûniştîya. Hate demeka dreng li civatê li hevdû rûniştî dimênin. Lê k dem tê demeka dirêj, êdî piştre civate mîrê bota jî dike ku jev belav bibe. Piştre bi hev re dirabin û mîrê bota jîî bi mirovên li dora wî ku li civate wî na, bi wan re dirabê û derdikeve. Lê tê gotin ku di wê deme ku ew derdikevin û tê gotin ku dikin ku xatir ji hevdû bixwezin ku herkesek herê mala xwe û jev belav bibin, êdî bi mîrê bota re mirovên dora wî jî dengna ji nav tirba Mem û Zînê dike. Bi dengê re êdî bi mî re herkesekê ku di wê demê de li wir amedê ya, êdî bi hev re têne bi ber tirbê de. Deme ku ew têne tirbê, êdî ew bi mîrê bota dibînin ku wa Beko dike ku tirbê bikolê û jevdûr bike. Hingî, êdî mîr di wê heyemê de rastiyê fahm dike.

Di wê heyemê de êdî tê gotin ku mîr hingî şûrê xwe ji ber xwe derdixe û diavêje serê Beko û serê wî jê dike û jîyane wî ji dest dike. Bi wê re têgotin ku di deme ku mîrê bota şûrê xwe diavêje serê wî, êdî tê gotin ku dilopek ji xwûna wê di dilopê naqabîna Mem û Zînê. Êdî tê gotin ku ew dilope xwûnê di naqabîna wan de dibê ew dara ku di naqabîna wan de. Tê gotin ku wê ew dar, di naqabîna wan de bimêne, Lê wê hate û hate jî dil û evîna Mem û Zînê jî wê bibême.

Evîn û serpêhatîya Mem û Zînê, divêt ku mirov bêje ku bi awayekî pirr dirêj dihate vegotin. Bi zimanekê ku têde aqil pirr li pêş bû bi pê hate ser ziman. Divêt ku mirov bêje ku evina Mem û Zînê, Ahmedê Xanê nivîsandîya û hanîya ser ziman. Lê biqasî ku mirov fahm dike ku di demên berî wî de bûya. Mem û Zîn di deme Berî Ahmedê xwe de di jîyanê de bûya. Ev bûyar û serpêhatî, hemû jî di jîyanê de bûna. Em, biqasî ku fahm dikin ku ew serpêhatî diçê deme berî Meleyê Cizîrî jî. Ji devê Meleyê Cizîrî jî, mirov wê serpêhatîyê di helbestên wî yên ku mana hate roje me de dihê ser ziman. Navê ´Mem´ û ´Zînê' jî tê ser ziman. Ji vê yekê, mirov fahm dike ku destana Mem û Zînê, destanaka ku biaqilmendî hatîya hunandin a û di demên berî Ahmedê xanê de jî hatîya

ser ziman. Nîşanaka vê yekê, ku di helbesteke Zanistê mazin Meleyê Cizîrî de jî tê ser ziman. Di helbestê de bi vî rengî tê ser ziman; ".. Mûyekê ez ji te nadim bi duşed Zîn û Şirînan/Çi dibît ger tu hesêb kî mi bi Ferhad û Memê .." Weke tê zanîn Meleyê Cizîrî di deme Berî deme Ahemdê Xanê de dijî.

Ev herdû rêzên ji Zanistê mazin Meleyê Cizîrî, didina nîşandin ku Mem û Zîn, vegotina wê, di deme wî de jî heya. Lê ev herdû rêz û gotinên bi wê awayê vegotinê re hizrekê didine me ku hinekî di demên berî wî de jî diçêt. Mirov, vê yekê tê digihê. Bi vê yekê re, hinek nîşanak derdikevina li holê ku Mem û Zîn, di demên berî wî de jî jîyana. Lê bi vegotinê ji dev û li dev hatina hatina vegotin û hatina hate wê demê. Di wê demê de jî, êdî nivîsandina wê, wê êdî w bike nirxeke mazin ya bi kevneşopî. Weke nirxeke ku bi rûmete civatî dihê ser ziman û di nav kurdan hemûyan de hem di demên berî wê de û di demên piştre de jî, ´kevneşopîya hamawîyî´ heya. Di deme ku Beko, dikeve bin aqilê Mîrê bota de û wî û Mem li berhevdû li ser santrancê dide rûnandin, êdî piştre bi dîtina Zînê ya ji alîyê mem ve û ku êdî heya Mem diçêt ser Zînê û piştre ku Mem û Mîr li ber hevdû dirabin, di wê heyemê de jineka ji malê dihê û hamawîya ser serê xwe ji ser serê xwe diavêjê naqabîna wan û piştre dawîyê li wê li berhevdûbûna wan dihêne. Çend ku î ro wek Zînê Bahse wê nayê kirin jî, Dilbere ku Navê wê bi Feqiyê Tayran re tê ser ziman jî, di heman awayê de di nav civatê û civakê de heya û bahs lê tê kirin. Lê Rewş û vegotina Dilberê bi jîyane Feqiyê Teyran re tê ser ziman û vegotin. Lê ya Mem û Zînê, bûya yeke Xalkê û ji dev li hev hatîya vegotin. ..
.

JI SADSALÊN 15. MIN Û VIR VE ÊDî WÊJE KURDÎ: AHMEDÊ XANÎ Û BERHEMÊN WÎ ..

Ji sadsala 15. min û bi vir ve, ku mirov li dîroka kurdan ye pêşketinê dimeyîzenê, mirov pêşketineka mazin ye bitêgihiştin ji dibîne. Mirov, demeke nû ye pêşketinê dibîne. Ji sadsala 15. min û bi vir ve, pêşketinên ku dibin, di temenê wê de, destêpêka demê ye ku bi meleye Cizîrî re destpê kiriya û bi Feqiyê teyran re hebûna xwe daya berdewam kirin û bi Ahmadê Xanê û Mele Hisêne Bate re têgihiştine xwe mazin kiriya dibîne. Bi zanist û yên weke wan re, ku mirov li wan dimeyîzenê, mirov rastiyekê dibîne. Ew rastî ji, ji zimanê wan û afirandina wan ye hizrî xwe dide dîyar bi me. Ew ji her weha zimanê wan ya ku bi helbestgerî ya. Ew zimanê wan, dibe temenê wê wêjevanîya wan ye dîrokî ji. Bi vê yekê re divêt ku mirov bahsê bike. Ziman, divir de, divêt ku mirov careka din bahsê bike. Ziman, di pêşketine têgihiştine û felsefe û wêje kurdî de weke fîlozofekî her demê ya. Divêt ku mirov vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Ziman, di mirov de û di xwezabûna jiyanê de xwe dîyar dide berçavan. Di pêşketinê têgihiştine kurdî de, awayê wêjevanî xwediyê weyneke mazin e. Minaq, bi vê yekê, divêt ku mirov qasîdetiyê, destantiya ku ji wê ne kêmtir bi awayekî helbestgerî dihata ser ziman û hwd bêne berçavan û ser ziman. Meleyê Cizirî ji û Feqiyê Teyran ji, zanistvanê mazin bûn. Lê deme ku li civatekî di rûniştin, bi zimanê xwe yê xweş di cihê de karibûn bi awayê qasîdetiyê biafirandinan. Her weha divêt ku mirov vêyekê bi teybet bêne ser ziman. Ev awayê afirandinê, ne tenê weke karekî divêt ku mirov hilde dest, divêt ku mirov weke xoslet û teybetmediyekê ji hilde dest û bêne ser ziman.

Meleyê cizirî bi têgihiştine xwe re pir mazin li pêş bû. Pêşavan bû. Divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Wî, hizreke bi pergal afirand û anî ser ziman. Felsefe Meleyê Cizirî, divêt ku li gor xwe û rastiya were têgihiştine. Wî, nêzîkati li civakî û

civaknasî çawa kir? Wî hizir çawa û bi nêzîkatiya anî ser ziman û çi jê xwest? Wî, weyne hizir û bi gelemperî felsefe weyne wê di pêşketinê de çawa dît û anî ser ziman? Her weha divêt ku mirov wî fahm bike û bêne ser ziman. Têgihiştine wî ye ku me fahm kir, ji dixwest ku em tenê bi awayê wêje nêzîkatiyê lê nekin. Ji ber vê yekê, di vir de, me hewcetî dît ku her weha bi pirsin û bênine ser ziman. meleyê Cizirî bixwe ji, ku mirov li mirovên ku alim yên kal ku mirov ji wan wî lê dihisêne, mirov bi awayekî pir baş tê digihê ku wî di deme xwe de hinek nivîsên mazin ku em weke pirtûkan bi nav bikin nivîsandina. Lê mixabin, haya ku me ev nivîs nivîsand ji me xwe ne gihanda wan nivîs an ji pirtûkên wî. Mirov her weha karê ji bo Feqiyê teyran ji bêne ser ziman. Feqiyê Teyran, bixwe ji, di hinek axiftinên ku weke helbestekê kirina û di roje me de weke helbesteke wî ji têne ser ziman vê yekê bi bal ji dîyar dike. Di helbesteke xwe de her weha têne ser ziman, "Agirê pêta di dil de/Me´niya daxan ku hilda/Ev kîtab maçin du cilda/Hafizê Medhan im ez/Min û hê wasfê xwe hilda/Xweşmîsal in çûn dû cilda/Çerx û kovan çûn di dilda/Ay dil min ay dilo ../". Feqiyê teyran, di van rêzên xwe de, bahsa hinek pirtûkên ku nivîsandî ne û ji hinek cildan pêk tên dike. her weha têne ser ziman. Wekî din ji, bahsa bi dawibûna wan dike. Di rêzeke xwe de dibêje ku ji bidawikirina cildê yekê buhurîne cildê dûyan dike. her weha têne ser ziman. Bi hinek vegotin û hiskirinên ku hatina guhên me ji, em digihine wê qanaate ku Meleyê Cizirî ji û Feqiyê Teyran ji, hinek pirtûk û an ji hinek nivîsên pir dirêj nivîsandina û li şûn xwe hiştina.

Ku mirov li gotin û vegotinên di derbarê de lê dihisêne, mirov bi êmin digihê hin qanaatne wilo di cih de. Deme ku bahsa Mele Hisêne bate ji tê kirin, her weha di hinek vegotin û gotinne bahs tê kirin. Di navxalkê de, li ser wan her weha pir vegotin hene. Lê ew vegotinên ku têne gotin ji, tenê di gotinê de dimênin. Ji bo Mele Hisêne bate, deme ku tê ser ziman, hingî, ku di deme wî ji jîn bûya, bahsa "Mîr Hisên" tê kirin û tê gotin ku di naqabîna wan ji pir xweş bûya. Her sal ew diçû serdana wî. Mîr Hisên ji, weke ku tê gotin, mirovekî ku alim û zane bûya, Di qasre wî de, pirtûkxaneyaka mazin ji hebû ya. Mele hisêne Bate ji, di deme ku diçû wir, li wir ji dima û weke tê gotin, "wî ji tiştek ji xwe li wê pirtûkxaneya wî hiştiya". Ji vê gotinê mirov fahm bike, ku wî ji hinekî nivîsandiya. Biqasî ku tê gotin, li ser felsefe û hizir û dîrokê hinek nivîsandinên wî yên pir dirêj hene. Her weha ji tê vegotin. Mirovên weke van mirovên zanist û ku navê xwe bi zanebûna xwe ji deme xwe buhurandina demên pişt xwe re ji, ne mumkun e ku mazin ne nivîsênin. Mirovên weke meleyê Cizîrî, feqiyê teyran, Mele Hisêne Bate û Ahmadê Xanê, bandûraka wan ye pir mazin li ser dore wan û têgihiştinê heya. Vê yekê, xwe pir mazin û bi dîyarî daya der. Bi vê yekê ji, mirov karê bêje ku wan pir mazin anîya ser ziman. Piştre wan ji, di demên pişt wan re de, êdî pêşketinên ku dibin û zanistên ku derdikevin ji bandûra van zanistên mazin yên bi rêz li ser wan heya. Pişt wan re demeke nû ye bi têgihiştin dibêt. Zanistên ku derdikevin û wêjeye kurdî ji ye ku diaifirê ji, bandûra wan li ser wê heya. Lê divêt ku weke ku me li jor ji anî ser ziman, wan têne her weha bi aliyê wêjeyî ve fahm neke. aliyê wan yê zanistî û felsefî pir mazin ji li pêşiye vê ya. Divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Ew bitêgihiştinî tênine ser ziman û tevdigerihin.
Ji sadsala 15. min, hata ku dem tê sadsalên 16. min û 17. min ji, êdî kurbûnaka ku mirov bi çav dibîne dibêt. Ew kurbûn, li gor şert û mercên kurdistanê li derfete xwe digerihê ku xwe werêne ser ziman. Her weha mirovê yekê dibîne. Lê hin astangên ku ji

rêveberên serdest dibin li pêşiye vê yekê ji astang in. Lê dise, di nav xalkê de hatina ser ziman dibêt. Nivîsandin û anîna ser ziman de, ew astangî piştre ku dem tê sadsalên 18. min û 19. min ji, êdî bi dîyarî xwe dide der. Mirov wê yekê li berçav dibîne. Li sadsala 18. min wilqas raperînên ku dibin, hemû ji bo wê yekê ne. Mirov nikarê wan raperînan ji vê yekê ûr bêne ser ziman. destanên kurdan yên weke "adulê" ji di van deman de diafir in. Destana "Hemê Zerê" ji ya demên piştî berî van deman e. Di nav xalkê de, ev destan, destanên ku pir ji wan tê axiftin in. Li ser wan tê sekinandin. Di civatan de têne ser ziman. Lê bi devkî ne. Lê divêt ku mirov bêje, ku çend ku bi devkî ji bin, ji yeke nivîskî ne kêmtir û tememtir têne ser ziman û hebûna diparezên. Her weha mirov karê ji bo "binavşa narîn û cembelîyê mîrê hakariya" ji wilo bêne ser ziman. Ev destan û vegotin, yên ku di nav xalkê de deng vedana. Navê wan heya. Hê weke van destan û vegotinan bidehan yên ku mirov navên wan hilde û bêne ser ziman hene. hemû ji, di ahengekê civakî de hevdû temem dikin. Ev destan û vegotin, hemû ji pir girîng in. Ji ber ku di xwe de têgihiştin, xêv û bîr û baweriya civakê di xwe de dihawênin û diparezên. Şaxsiyata hemê Zerê, ji şaxsiyata mîrîtiyê wirde, yeke kevneşopî ji ya. Şaxsiyetaka ku di deme xwe de car bi car li gor deme xwe dijî û car bi car ji bi têgihiştine xwe ji deme wirde dijî. Bi vê yekê, têgihiştinek ji pêre heya. Bi vê yekê ji dixwezê ku were têgihiştin ji aliyê dore xwe ve. Her weha şaxsiyata Mîr Xalid axa ji, mirov karê bêne ser ziman.Bizanebûn, qancitî, têgihiştin û pêşketi tê ber mirov.Şerê di naqabîna hemê Zerê û Mîr Xalid de, ku mirov lê dimeyîzenê, xoslet û teybetmediyênku didine berçavên mirov netenê weke yên aşriyê ne. Ji wê ji hinek wirdetir, weke ku hinek yên ku têgihiştine demê ji di xwe de diparezên, têne ber çavên mirov. Di civat ku jiyana rojena de ya kurdan de, ew ji têne ser ziman. Ew destanne devkî ne. Lê di ser û dilan de pir mazin cih û war girtina.

Li kurdistanê, her weha mirov dimeyîzenê, mirov çandaka mazin ye pêşketî dibîne. Kurdî, ji bo pêşketine xwe, pê hewcene ku wê li gor xwe kifş bikin û bênine ser ziman. Ji ber ku ew rastiya wan e. Ku rastiya xwe fahm kirin û naskirin, wê çêkirin, di pêşketin û têgoihiştine xwe di bi pêşveçûna wê de xwedi weyn bin. Wêje û çand, hinekî hewl dide ku bide naskirin. Armancaka wê ji her weha ev yeka bixwe ya. Bi vê yekê, divêt ku mirov bi teybet bêne ser ziman. Di cewherê çand û wêje de hebûne têgihiştine û pêşketinê ji, ku mirov j ianîna ser ziman dûr nekê divêt ku mirov bi perwerde bêne ser ziman. Çand û wêje, bi serê xwe, dibistanên civakî yên hiş in. bi vê yekê, hewceyî pê heya ku nêzîkatiyaka rast lê bê kirin û nîşandin. Wêje ku çanda, şaxsiyeta mirov diafirêne. hertimî li gor demê ji, afirandin têde pêre çêdibe. Weke ku piştî sadsala 15. min re, di deme sadsala 15. min de, çawa ku bi weke minaq şaxsiyetên weke Dilbere Feqiyê teyran, Zîne Ahmedê Zanê afir in. Her weha piştre ji, bi destan vegotina Binavşa narîn û cembelîyê mîrê hakariya re şaxsiyata "Binavşê" bi şaxsiyetan civakî û di destan û vegotina hemê Zerê û Mîr Xalid axa de ji şaxsiyata "Xanimê" yên jin derdikevin pêş. Binavşê, bi evîn û dilsoziya xwe re bi têgihiştinekê dibe. Û Xaninmê ji, bi zanebûn, bîrewerbûn, serwerbûn û her weha bi şaxsiyeta xwe ye kifşkar ye xurt û bihêz derdiekve pêş. Her weha di heman vegotinê de Şaxsiyate "Bijînê" ji heya û derdikeve pêş. Ew ji ne kêmî ye xannimê derdikeve pêş. Di van şaxsiyetan tenê de ji, mirov bersive ku şaxsiyetan demî çawaye û divêt ku çawa bê dihilde. Her weha ji bo mêr ji û mîr ji, şaxsiyeta Mîr Xalid axa weke minaqake ku hertimî di civatan de dihata li ser axiftin û ser ziman bû. Bi vê yekê, çand û wêje kurdî, çend ku li pêşiye wê gelek astang ji bo

pêşketine wê hebin, kêm ji bê, weyneke xwe ye dîrokî dileyîzê.Di awayê pêşketina çandê û wêje û têgihiştine wê de, mixabin, roje me ne li pêşiye demên xw eyên buhurandiya di têgihiştine xwe de. Bi vê yekê, ku di roje me de, em demên xwe yên berê yên ku hatina buhurandin em fahm bikin, em digihine têgihiştine wê. Divêt ku vê yekê bibe. Şûnpê me, çawa bû, divêt ku em bibînin û fahm bikin û têgihiştin û felsefe wê di xwe de ku bicihkirî bênine ser ziman. Ji bo vê ji, her weha xala herî girîng û sereke ji ziman bixwe ya. Berî hertiştî divêt ku li ser zimên bê rawastandin û pê xwe perwerde kirin mazin pêş bikeve.
.

BI TÊGIHIŞTINA AHMEDÊ XANÊ RE RENGÊ PÊŞKETINA AQIL

Bi demê re, dem bi dem pêşketin dibin. Lê herdem bi xwe re awa û amûrên wê ên pêşketinên jî ji nû ve pêş dikevin. Li ser wan re gotin, wate, kirde û hwd ji nû ve salixkirin û afirandin jî dibê. Lê yên dema berê, bi wê re dem bi sînor dimênin. Gotin û ankû kirdeya gotinê ya ku li gorî awa û pêşketina demê ku lihêtekê û levhatinakê bi xwe re bide nîşandin, ewê di wê demê de were kifş kirin. Lê bi ziman re, di demên berê de gelek gotin û kirde jî, wê lihêtê û levhatinê nadin nîşandin. Ev jî, dikê ku ew di demê de bi mênin û ne buhurina li dema nû. Bi vê re jî, dema ku dema nû pêşketina xwe da çê kirin, wê hin bi hin bi ziman, têgihiştin, civatî û hwd, pergale xwe biafirêne û bixwezê ku tekûz û temem bike. Li ser wê re, dema buhurî jî, wê gelek pêşketinên wê, dervî wê bimênin. Di demên pêşketinê de, hin bi hin çendî ku ew pêşketina civatî bidîrokê re têkiliya wê bi wê demê û pêşketina wê ya ku bûyî re hebû, wê ji wan sûd bigirê û ankû wan pêşketin ku bi wan re têkilî danî wê barî dema xwe ya nû jî bke. Ev jî, rastîyaka. Lê bi demê re, qûtbûna bi wê têkiliyê re ku afirî, ew jî dike k pirr tişt li şûn bimênin. Î ro, minaq, ji dema Hûrî û mîtannîyan, em dikarin bahse pirr pêşketina bi zanebûn û ku ne bi zanebûn bikin. Lê yên ku bi hiş em bi bîr bikin jî kêm in. Li vir, minaq, gotiên weke gotinên "aşîtî", "laleş", "zanîn", "hiş", "ziman", û hwd, gotinên ku di dema hûrî û mîtannîyan de weke gotinên bingihîn in. Bi teybetî, gotina "laleş"ê, gotinaka olî ya pîroz a û navê cihê bergkirinê û sazîya wê ya pîroz a. Her wusa bi wê re li ser xate olê re sazûmanaka bi pergalî dihê ser ziman.

Ziman, li vir, dema ku em bahse wê dikin, em li vir, tenê ku em gotinên ku me ji dema hûrîyan hanîn ser ziman di paragrafa li ser vê de, mirov dibîne ku ziman û kevneşopî û ziman û çand û hwd bi hev re pêşketina wan heya. Ya rastî ew a ku kevneşopî û çand li ser ziman re, xwe bi nirx dikin. Têgihiştina xwe ya bi hişkirina bi gotin dikin. Her gotin jî, bi wê re weke dagerekê û ankû ´sembolekê´ dihê dîtin û derkeve li holê. Li ser têgihiştinê re gotin û ankû bêjeya ziman û dagerîtî, bi hev re di jîyanê de dimeş in. Hevdû diafirênin. Mirov nikarê ziman, weke ku afrînerîyeka dagerî ku li ser kevneşopî û çandê re bi têgihiştinê re ku diafirnê nebîne. Divê ku mirov ziman, wusa bibîne ku wê dagerîtîyê diafirêne. Kevneşopî, destûrên civatî ên pêşketinê û şariştanî dihêne li holê. Ew jî, em dikarin bêjin ku kevneşopî hişê zelal ê ku afirî ya. Yanî hişê saf a. Her kevneşopî, têgihiştin a.

Li kurdistanê, hertimî kevneşopî, weke nirxeke ku li ser nayê nîqaş kirin hatîya dîtin. Heta ku mirov dikarê bibêje ku "pîroz" jî hatîya dîtin. Di nava kurdan de, gotina "mirovê ku bo kevneşopîya xwe çû mirinê", gotinaka ku pirr hatîya ser ziman a. Di jîyanê de jî, temenê vê heya. Bi dehan mirov, di her demê de bo kevneşopî û nirxên xwe çûna mirinê. Yanê, rastî, dûrûstîtî, nirxbûn, civatîtî û rastîya xwe ya bi wê re û hwd, wê

bi re dîtina. Ev jî, ji xwe re weke sedemeke pîroz ya ku bo wê herina mirinê dîtina. Kurd, dema ku gotina ´kevneşopîyê´ bilêv dikin, hertimî ku di serê xwe de bi hişekî teybet wê bilêv dikin. Ziman jî, di wê temenê de bi cih kirina. Di dema ku axiftina, bahse "xweşîk axiftin", "gotina xweşik", "bizanebûn gotina xwe gotin", "jîr" û hwd, bi teybetî di temenekî de hanîna ser ziman. Dema ku gotinên xwe digotin, hertimî li wê dinerîn ku gotinan wan bi hevdû re di levkirinekê de bin. Ev, weke nirxekî jî hatîya dîtin. Li ser vê re, ziman, bi nirxîtî hatîya ser ziman. Ew nirxîtîya çandî û kevneşopî, ku di ziman de xwe bicih dike û ziman ji xwe re dike hêlîn, ew kifşkirina. Li ser wê re bahse têgihiştinê hatîya kirin.

Ji kîjan aliyê ve ku mirov li ziman dinerê bi jîyane civatê ve girêdayî mirov wê kifş dike. Dahûrkirina li ser ziman re, mirov bi jîyane civatê re dihêne û digihêne têgihiştin û hişê wê û bi w re jî civaknasîya civatê ya ku pêşketî. Her wusa, bi vir ve girêdayî, divê ku mirov bibêje ku ziman, çand û kevneşopîyê bi teybetî bi jîyane civatê re li ser gotin û hevokên ku hatina bikarhanîn re diafirîne û biwê re di temenê têgihîna civaknasîyê de bi têgihiştin dike di serê mirov de. Li vir, dema ku em ziman, bahse wê bikin, li vir, car din, divê ku em biteybetî ji hin aliyna din ve bi pêşketina mirov a fîzyolojikî ve hilde li dest û fahm bike.

Li jor, ji aliyê fîzîkîtîyê û fîzyolojikîyê ve bi çend gotinan jî bê, me li jor hinekî di temenê rastkirina bi pêşketina bi demê re ku bi mirov re diafirê re me hinekî bi têgihiştina peresendinê hanî ser ziman. Di temenê têgihiştina gotina peresendinê de, pêşketina fîzyolojikî, divê ku mirov wê fahm bike. Li vir, jîyane civatî, ji vir ve girîngîya wê bi civaknasî û zimanê wê re heya. Dema ku em zimanê w hildina li dest, li vir, divê ku em hinekî jî bi gotinên civaknasiyê wê bênina ser ziman. Jîyane civatê, her wusa di temen hîyererşîya xwe de, pêvajoyên xwe ên pêşketinê dide domandin. Weke ku me li ser ziman re hanî ser ziman heta vir, dide nîşandin ku di jîyane civatê a rêxistinî kirî û pêşketî de, ku mirov herê bike jî û neke jî, wê zaravatî û deviktî hebê û pêş bikeve. Ev yek, weke teher, awa û dîyalketîka pêşketina ziman dihêne ser ziman. Ji ber vê yekê, divê ku mirov bi teybetî, hinekî li ser vê bisekinê.

Têgihiştina li ser zaravatiyê û deviktîya ziman de, di roja me de, bi teybetî li kurdistanê, hê bi başî ne hatîya fahm kirin. Devikek û ankû zaravayak biserê xwe dihê hildan li dest û şîroveya wê dihê kirin. Xaletîya serî ya ku di destpêkê de dihê kirin jî, ev a. Li vir, dema ku em ziman hildina li dest, divê ku mirov bi teybetî bi pergalî rêxistiniya civatê hilde li dest. Bi wê re jî, bahse ziman bike. Ziman, pêvajo bi pêvajo, zaravatî û deviktîya xwe diafirêne û bi wê pergale civatî re wan di nava xwe de bi demê re dimihêne û dihalêne û piştre di dema xwe ya nû ya ku hatîyê de, ew piştî wê mihandinê, wê devikên nû derkevina li holê. Ziman wê wan jî pêş bixe bi pêşketina civatê civatî re. Ev, weke metodeka pêşketinê, ku têgihiştina civatî a serdest û rêxistinkirî ku bi kardihêne ya bo pêşketina xwe ya bi demê re ku wê bijî û bide domandin.

Dema ku em li vir, vê rastiyê bi awayekî vekirî fahm bikin, divê ku em bi teybetî lis er vê rewşê bisekin in. Ziman, li vir, ew pergale civatî ya ku bi rêxistinkirî, ziman weke stûnekî wê yê ku wê li ser lingan digirê ya. Lê ev stûn, stûnekî pirr giring û bi wate ya. Di wê stûnê de, peresendin û pêşketina ku dibê jî, bi jîyane civatê û demê re di ahangê de dibêt.

Ziman, di nava wê rêxistiniya civatî de, pêşketina xwe bi temenê xwe yê ku ser re bi demê re û bitêgihiştinê re pêş dikeve re pêşdixe. Li vir, pêşî, ziman bi jîyane civatê re, kevneşiopîyê diafirêne. Weke destûrna ku zêde nayêne dîtin ên kevneşopî gotinên di nava xalkê û ankû ên pêşîyên me ku bi navê "gotinên bav û kalan" dihê ser ziman. Ev gotin, weke rengna pêşketina civatê di xwe de diafirênin. Her gotin, di xwe de têgihiştinekê dihêne ser ziman. Ji sê aliyan ve têgihiştina di hundurê wan gotinên pêşîyên me de dihê kifşkirin di nava jîyane civatê de. Yek, bi kifşkirinaka rast rengêpêşketina civatê ya. Ya din jî, dîtina kêmesîyan û bi wan gotinan re û wate ku di wan de dihê ser ziman re ku rexne xwe dikê ya. Aliyê sêyemin jî, ew gotin rêgez û ankû destûrîyeka wan ya teybet di temenê jîyane civatî de heya. Ew jî, her wusa, rêya têre çûyinê ya bi ber pêşarojê di kirdeya wate xwe de dike armanc ji xwe re. Bi vê yekê re, pêşketina civatî, bi wê re dihê ser ziman. Gotinên nava gel, rêzkarîyeka wan ya teybet di temenê jîyane civatê ya demê de heya. Bi vê rengê, divê ku mirov bibêje ku têgihiştineka bi gotinî ku weke şîret bi xwe re dihêne ser ziman. Ew şîret, di nava jîyane civatê de, weke weke destûrekê kar dike û dibîne. Minaq, "malxwe malê!", "zaroyê malê!", "jin jina çi şêre çi mêr a.", Çavî li derîya xwelî li serî ya", " Karkerê male xwe ba, mahbûbê dilê xalkê ba!", "Bûka ku hê li haspê sûwar a, kes nizanê ku nesibê kê ya", "kevirê giran, di cihê xwe de giran a.", "ê zane , ji zanetîya xwe dibêje", û hwd, ku em dikarin weke van hê bi sadan gotinên ji nava gel ku pirr di demên berê de dihatina zanîn ku weke gotinên ku ji wan şîret dihatina girtin bûn, hena.Bo ku hişkirinê û bîrkirinê jî bênina ser ziman, gelek gotinên di nava xalkê de hena. Yek ji wan gotin ev a ku tê gotin ku "mirî dimirê jî, heta ku serê wî li heft hejan nekevê bimirina xwe nehisihê!" Bi vê gotina xalkê a kurd re, qast ´hişkirin´ û ´bîrkirin´ê dihê kirin. Gotin, bi rêzkariyekê karekî destûrî bi kevneşopîyê re di jîyane civatê de dikir. Bi vê rengê, hinekî jî, gotinên hiş in. Bi wan re, mirovan zanebûna xwe jî dane li der.

Li kurdistanê, ji ber ku jîyane civatê, dîroka wê demdirêj heya, em dikarin bi hezaran gotinên bi vî rengî tenê ji herêmekê kifş bikin. Ev gotinên di nava gel de, ji herêmekê heta ku dihat herêmekê, hebû ku bi reng û awayê xwe yê ku pê dihat ser ziman, guhartin jî di wê de hatiba kirin. Lê cewher, hertimî bi têgihiştin û hişmendîya wê re dihat parastin.

Li kurdistanê, ziman, dema ku em bahse wê bikin, divê ku em ji pirr aliyan ve li ser bisekin in. Ziman, hem demên wê yên berê ên pêşketinê divê ku mirov bi teybetî di teherekê û têgihiştineka dîyelaktîkekê de mirov divê ku nêzîkatiyê lê bike. Demên berê, minaq demên pêşketî ên weke demên hûrî û mîtannîyan û pişt wan re demên Medîya û hwd, demna ku divê ku mirov bi serê xwe hildina li dest in. Gelek gotinên van deman, di wan deman de mana û ne buhurîna li demên piştre. Ji wan deman heta ku hatîya roja me, ziman, dem bi dem di xwe de bi gotinî û kirdeyetî û hwd, pêşketinên nû dane çê kirin. Dema ku em di vê temenê de hildina li dest, emê pêşketina wê ya bi demê re a bi jîyane civatê re bi pergalî dem bi dem kifş bikin.

Dîroka ziman, li ser wê re bi têgihiştinê dihê nivîsandin. Her wusa, divê ku mirov ziman, hinekî jî, di temenê têgihiştinê û weke karekî têgihiştinî hilde li dest. Bi vê re jî, mirov divê ku wê bi teybetî fahm bike.

Zimanê dayikê, her wusa qadrê wê pirr giring a. Ziman, karekî têgihiştinî û jîyanî ya. Serdestîya li lê jî, tenê bi perwerdekirina bi zimanê dayikê dikarê were kirin û çê kirin. Ji ber ku ziman, li vir, bi teybetî, aliyên wê ên bîolojikî û fîzyolojikî û hwd hena. Ev,

aliyê zimên ê bi gotina "zimanê dayikê" giringtir û bi watetir dike. Ku em bi têgihiştina zimên bibêjin, divê ku em bibêjin ku mirovê ku bi zimanê xwe yê dayikê perwerde nedîtî ew mirov mirîya. Divê ku mirov ji aliyê têgihiştina ziman ve mirî bihasibêne.

Têgihiştina ziman, bi teybetî li ser zimanê dayikê re, her wusa divê ku mirov herê bike ku temen a. Gotina bingihîn a pêşketina bo mirov ku em bikar bênin divê ku em li ser zimanê dayikê re bênina ser ziman. wekî din jî, çendî ku ji temen ve mirov bizimanekî dervî zimanê dayika xwe perwerde dît û xwe pêş bixe jî, ew pêşketin û ankû xwe pêşxistin wê hertimî bêling û bêtemen bê.

Mirovê ku bi zimanê xweyê dayikê perwerde nedîtî, weke mirovê kor, lê ku tenê bi rohniyeka ku ew bi tememî nikarê wê jev safî bike lê ku xwe bi wê daye bawer kirin ku safî dike dijî. Her wusa bi awayekî ku mirov dikevê zorê de ku wê fahm bike, dijî. Jîyane civatê, weke ku çawa ku li ser wê zimanê dayikê pêvajoyên xwe yên pêşketina dijî, her wusa, heman tiştî bo mirov jî mirov dikarê bilêv bike û bêne ser ziman. Li vir, jîyane civatê, zimanê dayikê weke stûnê xwe yê bingihîn dibîne û bikardihêne. Li ser wê re têgihiştina civatê a giştî dijî û xwe pêşdixe bi mirov re û bijîyane mirov re. Mirov, çawa ku dikarê tenê li ser zimanê dayikê re bi kûrahîya têgihiştina civatê re hevnasiyê bike, her wusa ku em keseyetîyê hildina li dest, bo wê jî, em dikarin bêjin ku tenê bi zimanê dayikê dikarê têkiliyê bi xêva xwe re rast dêne û bi wê re pêşketina xwe ya têgihiştinî, cîvatî, û hwd bide çê kirin û pêve bibe. Weke ku me li jor hanî ser ziman, mirovê ku bi zimanê xwe yê dayikê mazin nebûyî, wê nikaribê zimanê xwe yê dayikê bi tememî bikarbêne. Lê wê nikaribê wî zimanê ku bi wê hatîya perwerdekirin jî bi tememî bikarbêne. Di wê de, ku bibe rewşenbîr jî, wê ew rewşenbîrîya wî, tenê û tenê kopîya bê. Ji xwe, wê di jîyane xwe de hemû tiştî weke kopya bijî. Weke yekî ku hatî ´hîpnotîze´ kirin, wê weke ku lingan weke ku di xewê de bigerihê, û hwd ku bi rewşekê re hatî hoyandin û lêhatî kirin û ku bi wê re dijî wê bibe. Hîpnozetî, di temenê wê de, darêjka xêvê heya. Her wusa, dîmenîtîya wê ya ku bi wê darêjkîtiyê re afirîya jî heya. Bi wê dîmenîtîyê, weke du rûyên vajî hevdû ên mirovekî ya. Lê darêjka ku di temenê hîpnozê de heya, di wê çerçovê de, li gorî dîtin û qaydên ku di xêvê de hena diafirê. Ji ber vê yekê, dernekeve dervî wê. Mirovê ku bi wê têkilîya wî ji dervî wî qûtbibê jî, wê çerçovê de bimêne û bersivên ku bide jî, wê di çerçova wê darêjk û dîtinên wî de bê. Mirovê hîpnotîze kirî, weke ku şîyar lê dirazihê bê ya. He wusa, vê minaqê, mirov dikarê ji vî aliyê ve bi şavtinê re bênê ser ziman. Çend ku hîpnotîze, dikarê bibe alîkarî bo fêrbûn û pêşketina ziman, bi heman rengî, di hundurê zimanekî de ku rêbazên wê ên nû bên kifşkirin li gorî wê rewşê û zimanê, dikarê bibe temenê dûrkirin û bişavtinê jî. Bi rêbazên wê, hoyandina li xêvê bi afirandina navendên dervî mejî ku weke navêndên xêvî bên hoyandin bo mejî û hwd, wê têkilîya mirov ji wê temenê wî were birrîn. ..

Di vê rewşê de, yekî ku zimanê xwe piştre fêr bibe jî, wê bi hîssî û hizrî wê nikaribê bikeve têkiliyê bi xêva xwe ya bingîhîn a xwemal de. Li ser gotinan re wê weke ku zimanekî nû fêr dibe, wê fêr bibe û pêş bixe. Di aslê xwe de, mejî bi xêvê re, mirovekî ku bi zimanê xwe yê dayikê re pêşketîya, wê rewşê bi wî re diafirêne. Li vir, di serî de, cihan û jîyane derve ew bîyên me ên weke dîtin, hiskirin, destlêdan li çerm û hwd, ji rewşekê di buhur in dû dikevina rewşeka din de. Di dema ku hîpnotîzekirî de, ku çawa ku dema ku mirov tiştna ku mirov kirî ku mirov ne dihişê wê de, di wê rewşê de jî di dema ku ji derve tiştek dît û hiskir û hwd, wê piştre weke ku hisnekir û nedîtî wê lê were. Li vir, weke ji aliyê hiş diçê aliyê din û li wî alî çi dijî, wê tenê li wir bihiş bike.

Lê ku hat alî û ankû rûyên din, wê hişekî din bi darejkî bikeve dewrê de. Herdû alî jî, di aslê xwe de, di xêvê de bi têkilî na. Lê hişna ne di hişên hevdû de na. Têkilîyên hoyandî ên xêvê, li vir ji pirr alîyan ve hena. Alîyên têkilî ên ku bi hîpnotîzê re tên li holê, yek û ankû çend ji wan tenê ên ku di temenê binhishariya li hevdû de ku li hevdû hoyandî na. Ev yek û rewş, weke rêgez û destûraka ku di jîyane mirovê ku bi zimanê xwe yê dayikê xwe pêşnexîstîya ya. Bi vê yekê û temenê re, divê ku mirov fahm bike ku mirovê ku î ro di roja me de tê gotin ku ´hatîya asîmle kirin´, ew mirov mirovekî ku ji rastîya civate xwe ya ku bi kok ji wê re hatîya dûrkirin a. Lê wê ti carî negihijê wê rastî û temenê civate ku li gorî wê hatîya mazin kirin jî. Weke mirove ku li valahîya fezeyê hatîya berdan û heta ku sax a wê hertimê bikeve xwerê de ya. Mirovê hatî bişavtin, mirovê ku ji aliyê keseyet, civat û têgihiştina civaknasî ku mirîya ya. Çend ku ew bizimanekî din jî hatîya mazin kirin jî ev wusa ya.

Mirov, çawa ku bi xêv a di serê xwe de, her wusa, bi heman rewşê mirov dikarê bahse civatê jî bike. Civat jî, li ser awayna deng re bê, li ser gotinan ziman re bê û hwd, xwediyê xêveka xwe ya ku heta ku ew li ser pîya ya newê ji bîr kirin a.

Dîroka pêşketina zimanê mirov, bi dîroka civatê re dihê ser ziman. Her wusa, destpêka ziman, weke destpêkeka civatî jî ya. Li vir dema ku em bahse ziman dikin, bi teybetî, em bahse civatê dikin. Î ro, dema ku em bahse zimanê kurdî bikin, em kifş dikin ku zimanê kurdî demên wê ên pêşketinê bi jîyane civatî re ji dema qasîtî û lolo re heta ku tê dema gûtîyan û ji wir heta ku digihijê dema hûrî û mtannîyan. Ev dem, dem bi dem heta ku dihê dem û roja me, hertimî bi astekê heyîn û pêşketina xwe jîyan kirîya. Minaq, dema ku em zimanê dema Medîya kifş dikin, pêşketinên ku bi Zerdeşt û Manî re ku li ser Avesta re jîya na, bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku temenê dema me ya ku em dijîn jî dide avêtin. Lê ev dem, dem bi dem hem di dema xwe û hem jî piştre de, qûtbûna ketîya nava wê berdewamîya wê ya bênavber ya heta roja me de ku hatiba jîn kirin.

Zimanê avestan, em li ser hinek minaqên wê re herin. Di naqabîna zimanê avesta û kurmancîya me ya herême botanê de mirov zêde ti farqê î ro jî nabîne. Çend ku gelek rewşên wê kurmancîya botanê î ro winda jî bûna, em dikarin kifş bikin ku di aliyê watê de wekhevîyên wê hena. Avesta, bi teybetî, dema ku em lê dinerin, mîna zaravayekî roja me ê kurdî, weke soranî û ankû zazakî û hwd dihê berçavê me. Pêşketina wê, her wusa, pêşketina pirr mazin a. Lê zimanê avesta, ne zimanekî ku tenê weke zimanê herêmekê ya. Her wusa giştîbûnek pêre heya. Lê piştre, herêm bi herêm, bi pêşketina nû a bi demê re a civatî re, civatê xwe ji nû ve afirand. Avesta, divê ku em bibêjin ku di dema ku Îskenderê Mekedonî bi seferî hat kurdistanê, wî şawitand. Piştre ji ber wê yekê û xadarîyên wî ên ku wî kirina, kurdan jê re gotin "îskenderê zûrqarneyn". Bi vê navê, hizir kirin ku her dema ku ew bi bîr kirin, wê ew kirinên wî ên xadarî jî bibîr bikin. Di vê temenê de, hertimî, êdî bi vî navê ew di nava kurdan de hat nasîn. Her dema ku navê wî hat nasin û bi vî rengî hat gotin, yên ku di derbarê kirinên wî de ne xwediyê zanînê ba, wê ji navê wî bipirsîyan ji mazin û ankû zaneyên li dora xwe. Ji xwe gotina "zûrqarnayn"tiyê, di temenê "qarnê ku jê îbret were girtin" de wate w heya. Bi vî rengî, li ser ziman re, gotin hatina afirandin. Di vê temenê de heta roja me jî, bi nav kirin û nav li mirovan kirin li gorî kirinên wan ên baş û ên ne baş û an jî li gorî zîrekbûn û zanebûna wan û hwd, heya. Ew rewş, weke rewşeka civatî ya. Her wusa, navê Feqiyê Teyran bixwe jî, di vê temenê de, hê di dema faqatîya wî de lê hatiya kirin. Hingî, wî gotiya ji

dora xwe ku "zimanê teyrikan jî heya.", "ku xwûdê bêje herê, mirov dikarê bi wan re biaxivê û ew jî bi me re biaxiv in". BI van gotinên bi vî rengî, navê wî derdikeve. Minaq, navê Ahmedê Xanê, bixwe jî, navê herême ku ew jê ya. Li gorî hinekan jî, digotin ku "ji dayika wî re jî xanê hatîya gotin." lê ji bo ku mirov vê piştrast bike, î ro, ti zêde birhan di destê me de tûna na. Navê dê û ankû ê bav, weke paşnav li dawîya navê mirov û ankû li pêşîya wê hatîya bicih kirin. Ev kevneşopîya li ser nav re, piştre jî, bi xwe hatîya domandin. Mirov, dema ku navê wî dihat hildan, hem navê wî û hem jî yan navê êla wî û yan jî navê bavê wî û ankû dayika wî dizanî û fêr dibû. Kevneşopîya nav, hinekî li kurdistanê kûrahîya wê mazin heya. Minaq, navên bav, kalk, bavkal û hwd ku heta çend bavan dirêj dibe, dihê hijmartin. Ev yek, di van demên dawiyê de weke ku hinekî binket û zêde bahse wê nayê kirin. Lê ev kevneşopîya nav, pirr alî hebûya. Hemû, weke"lakab" nav li mirovan kirin di nava xalkê de, her wusa weke bi navê mirov re navê dê û bav kalkên wî li dûv hevdû hanîna li ser ziman û hwd, kevneşopîyên kevn ên ku bi hezar salan jîya na.

Li vir, ziman, hinekî jî, li ser nav re jî, ku bi gotinekî em bahse wê bikin, hertimî li gorî wasif û teybetmendiyên mirov ên ku dihatina li berçav ew dihatina bi nav kirin. An jî, bi navê herêmên wan re nav li wan hatîya kirin. Minaq, navê Meleyê Cîzîr, mele Hisêne bateyî û hwd, ku em li navê wan jî binerin emê fahm bikin ku ew ji kuderê na. Ev rewş, weke rewşna teybet in. Bi teybetî jî, dihatina jîyandin. Li ser navan re têgihiştina herêmkî di ziman de hatîya bicih kirin. Her wusa, navê herêman û hwd, bivî rengî, dinava civatê de jî hatina kifş kirin li ser navê mirovan re.

Ziman, dema ku em bu awayekî hesanî lê dinerê, gotinên wê ên weke nav û hwd, rengê bi vî rengî dihênin ser ziman. Her ziman, di dema xwe de xwediyê wteyna giring in. Î ro, çend ku em di derbarê gelek navên ku em bo herêmê di kurdî de bikar dihênin, ne xwediyê dîroka wan in. Lê em dizanin ku di dema xwe de bi wateyekê ew hatin kirin. Nav, hinekî jî, rengekî zimane ê teybet radixina li berçav. Ji ber vê yekê, divê ku mirov bi teybetî li navan binerê. Nav, wê rengê ziman bi xwe re bi parêzên û rengê civatê û awayê wê ê pêşketî bi xwe re bidina li berçav. Ev rewş, bi navan re heya. Nav, di nava civatê û jîyane wê de, weke dager jî dijîn. Lê berî hertiştî nav, bi rastiyekê re biziman re û bi civatê re xwediyê têgihiştineka bingihîn in. Ew jî, her wusa, bi demê re bi pêşketina civatê re dihê dîtin.

Nav, di aslê xwe de, divê ku em bi teybetî bibêjin ku dîrokê jî, dem bi dem bi nav dikin. Dema ku mirovek, navek li xwe kir û ew jîya, li ser navê wî re, ew dem jî dikarê were dîtin. Her wusa, bûna navê dema xwe jî. Ankû kirina ku dem bi navê wan re bê ser ziman. Minaq, "dema Lipît Îstar", dema hemûrabî", "dema Salahadinê eyûbî" û hwd, dihê dîtin û kifş kirin. Nav, bi vî rengî dema xwe jî bi xwe re bi nav dike.

Ziman, van rewşan hemûyan bi jîyane civatê re dijî. Ya ku van bi awayekî rêk û pêk, birêgez dike û digihêne rêzkariyekê pêşketina civatî bixwe ya. Her wusa, weke ku çawa ku jîyane civatê, bi ziman re, bi demê re zarava û devikan di temenê xwe de bi pêşketina xwe re dihêne û digihêne rayagiştî ay civatê, her wusa nav jî bi wê jîyanê re pêşketinê dager dikin. Nav û dager, her wusa, bi demê re du gotinên ku ku hevdû afirandina na. Jîyane civatê, pêşketinê, biwê rengê, bi ziman re di aslê xwe de, pirr xort dijî. Di nava kurdan de, gotinek heya. Tê gotin ku ku´"kurdan, bi kevneşopîyên xwe dîroka xwe nivîsandin a."Ev gotin, wateyeka wê ya teybet heya. Bi wê re jî, bahse jiberîya mirovê kurd dihê kirin. kevneşopî, dem bi dem weke rûpelê qaxizê hatina bi karhanîn di temenê

jîyane civatî de. Jîyane civatê, kevneşopî, bûna temenê bibîrkirineka pir xort, Her wusa, weke temenekî li ser rewş û têgihiştin bi hizirî û nivsandîya wê re ku hatina jiberkirin.

Bi vê rengê, hê gelek wateyên ku li kevneşopîyê hatina kirin hena. Ev jî, rewşna teybet in ku divê ku mirov wan biteybetî bêne ser ziman in. Civat, ku mirov wê bitijbihêne mirovekî, weke mirovekî bi pêşketina xwe re xwediyê xêva xwe ya bi dîroka xwe re ya. Mirov, xêva wî heya. Dihizirê. Bi wê hizirandinê re, çerçoveyên têgihiştinî diafirêne. Bi vê re, aqil çê dike. Çêkerîya bi aqil re, jê re di kurdî re "jîr" hatîya gotin di demên berê de. Jîr, aqilê zelal a. Ew aqilê ku bi hiş a û ku mirov wê di afirêne ya. Destûr û ankû kevneşopî, her wusa mirov dikarê di wê çerçoveyê de bêne ser ziman.

Bi vê rengê, li ser xêvê re, mirov kifş dike ku ziman û aqil, bi hev ve girêdayî na. Ziman û aqil, bi jîyane civatê re bi hevdû re zewicî na. Mirov nikarê aqil bêî ziman fahm bike. Li ser ziman û gotinên wê ên ku mirov lihevdû dihêne, mirov çerçova xwe ya aqil diafirêne. Di vê çerçovê de di roja me de, ziman, bûya weke amûrekî bi serê xwe ku dikarê aqil bide afirandin bi jîyandinên civatî re. Li vir, bi aqil re, pêşketina ziman dihê kifşkirin. Lê ziman, bi gotinên xwe re reng û çerçova aqil û têgihiştina wê re dîyar dike. Aqil, teybetmendiya wê ya sereke civatîtîya wê ya. Her aqil, bi civatîtî û têgihiştina civatî heya.

.Ku mirov ji kîjan aliyê binerê, mirov divê ku werênê ser ziman ku jîyane civatî a li kurdistanê, wê xwediyê pêvajoyna giring û pirr demdirêj bi dîrokê re bê. Dîroka civatê, li kurdistanê, em dema ku li ser hebûna civate kurd re wê bikin ku werênina ser ziman, em dikarin li ser nîşanakên wê yên ku di nava jîyane civatê de hena, heta serdemên kevn ên berî demên şariştanîyê ên weke yên neolîtîkê û yên destpêka şariştaniyê em bibin. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî bi wê re pirr baş fahm bike ku wê jîyane civatî a li kurdistanê, wê destpêka wê li ser esas û temenê şivaniyê bê. Her wusa jîyane şivaniyê wê xwe bi rêxistin bike û bide domandin. Di vê çerçoveyê de em dema ku bahse jîyane şivaniyê û xwe bi rêxistinkirina wê ya li kurdistanê dikin jî, em di cih de jîyane zozana a koçerîyê bibîr dikin. Jîyane koçerîyê, wê rengê jîyane civatî a ku ew li gorî hebûna xwezayê pêşdikeve bê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê jîyane civatî a bi destpêka kombûna mirovan re ku wê bibê, wê her wusa, li kurdistanê weke ku em bi xosletên wê re bi jîyane zozana û ankû jyane koçerîyê re dibînin, wê heta dema neolîtîkê wê herê.

Jîyane koçerîyê, wê weke jîyane civatî a ku ew êdî hin bi hin dihê birêxistin bê. Wê mirov cih ji xwe re kifş bike û wê li wê cihê bidest jîyankirinê bike. Wê ji xwe re xwedanê bidest afirandinê bike. Xwedan(´milkîyet´), wê mirov bide bicih kirin. Bi wê re jî wê mirov ji xwe malan çê bike. Mal, wê pêşî li kurdistanê bi jîyankirina di şikeftan de bê. Her wusa, şikeftên ku weke malan hatina bikarhanîn, wê li dora rehayê, meletî, elezîz, erzûrûm, erzingan, elbaq û hin herêmên din ên herêma botanê û rojavayê kurdistanê wê xwe bidina dîyarkirin. Bi wê re jî mirov divê ku werênê ser ziman ku wê gelek deverên bi vî rengî wê li başûr û rojhilatê kurdistanê wê hebin. Herêmên li dora çîyayên zagrosan û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê gelek nîşanakan bi xwe re wê bide nîşandin kirin.

Li kurdistanê jîyane şivanî, her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî bi wê re werênê ser ziman ku wê hin bi hin li gorî xosletên bi cihbûnê, wê xwe bidest pêşxistinê bike. Mirov, dema ku ew bicih dibê, wê bidest girtina di destê xwe de sawalan bike. Wê ji wan sawalan sûdbigirê. Pêşî, sawalên ku ew dihêna nêçîrkirin, wê werina xwarin di

nava malbatê de. Andamên malbatê, wê bi wê re wê debara xwe bikin. Li kurdistanê, nêçîrvanî, wê piştî bicihbûnê jî wê xwe demek zêde dirêj weke temenekî rengekî jîyanê ê xwe dabarakirinê wê bide domandin. Lê bicihbûna jîyanê re û bi pêşketina wê re wê mirov, fêrî hevnasîna xwezayê bin. Her wusa, wê bi demê re wê bidest ahlkirina sawalan bikin. Ahlkirin û kedîkirina sawalan, wê hin bi hin jîyane mirov a ew xwe bi nêçîrkirinê re li ser lingan digirê, wê reng bigûharênê. Wê nêçîrvanî dawî li wê newê, lê wê nêçîrwanî, weke berê wê newê kirin. Piştî ku mirov, bidest girtina sawalan bizindî bikin bo ku wan ahl û kedî bikin. Her wusa, wê ahlkirina sawalên malê û xwedî kirina wan, wê bi jîyane cohtkarîyê û çandinîyê re ku ew pêş dikeve re wê zêdetir derkeve li pêş. Cohtkarî û çandinî, wê li vir, teybetmendî û xosletên jîyanê û jîyankirinê jî wê bi xwe re wê bide gûharandin. Wê mirov, bidest pêşxistina derfetên jîyanê di cihê ku ew li wê di dijî de bike. Çendî ku wê dike jî, wê gerîna mirovan bi komî wê kêm bibê. Her wusa, wê mirov dem û jîyane xwe wê bi cohtkarî û çandiniyê re wê pêşbixe. Bi wê re jî wê sawalan sax bigirê û wê wan di hundurû de bigirê. Ev jî wê bi xwe re hin bi hin kedîkirinê wê werênê. Bi kedîkirinê re kurdan, rêbazên ´xasandinê´û hwd, wê pêşbixin. Her wusa, sawalên weke hasp û hwd, wê di dema ahlkirin û kedîkirina wan de wê werina xasandin jî. Xasandin, wê weke rêbazakî ahlkirinê wê di destpêka jîyane de wê were pêşxistin. Sawala ne kedî û ahl, weke sawal bejî û kûvî di nava civate kurd de dihê bi navkirin û ser ziman. Sawalên bejî û kûvî, wê piştî ku re hatina girtin, wê werina kedî kirin. Sawalên bejî û kûvî, wê hov bin. Wê pirr zêde hêrîşkar bin. Minaq, hasp, dema ku ew ne hatîya ahlkirin, wê bi gez û pehînan wê xwe bike ku ew biparêzê. Di nava kurdan de wê ji sawalên mazin ên weke haspan û hwd re ku ew bejî na û ne kedî na, ku ew hatina girtin wê bihetina ´ahlkirin.´ Ahlkirin, wê ji kedîkirina sawalên bi vê rengê ên weke haspan ên mazin re wê biheta gotin. Lê sawalên weke kew, kevok, û hwd ku ew dihatina kedîkirin, wê ji wan re zêdetirî gotina ´kedîkirinê´ wê biheta bikarhanîn.

Li kurdistanê, weke çandaka kedîkirinê, hê di destpêka jîyane şariştaniyê û pêşketina wê de wê kedîkirin wê bibê. Piştî ku jîyane bicihbûyî a civatî destpêkir û pê de wê êdî kedîkirin li dora wê êdî wê pêşbikeve. Sawalên weke kuçik, meh, bizin, hasp û hwd, wê weke sawalên ku wê pêşî wê werina kedîkirin bin. Bi jîyane nêçîrkirinê re wê kêdîkirin jî wê bi wê re wê di ahengekê de wê pêş bikeve.

Sawalên ku ew dihên ahlkirin û kedîkirin, wê êdî wê li dora wê male ku ew li wê hatina kedîkirin bin. Wê fêrî wê bibin. Kedîkirin û ankû ahlkirin, w ji aliyekî ve jî fêrkirin û alimandin bê. Sawal û ajal, wê li ser tevger û alimandinan re wê ahl bibê. Di kurdî de sawal ku ew hatî ahlkirin û ankû kedîkirin, ew sawal êdî weke ´sawala hir´ dihê bi navkirin. Sawala hir, weke sawala di rewş û halê xwe de ya hatî kedîkirin jî ya. Zêde ne bi tevger a. Wê hêrîşê nekê. Sawalên weke sa û ankû kuçik ên ku ew ne hatina kedîkirin, wê sawalên ku wê hêrîşan dikin bin. Bi wê re jî, sawalên weke bizin, gisk û hwd ên bejî û ne kedî, weke sawalên kûvî na. Ev sawal, wê li çîyê bijîn. Herî zêde ew, weke sawalên pirr bazek in.

Sawala ahlkirî û ankû kedî kirî wê weke sawala ku ew di xizmeta xwediyê xwe de bê. Ew sawal wê êdî ne xwdiyê xosletên sawalên bejî û nekedî bê. Alimandina sawalan, wê ahlkirin wan jî bê. Di aslê xwe de ahlkirin û ankû kedî kirina sawalan, nîşanaka wê ya jî ku ew dikarin fêr bibin û fêr dibin jî. Her wusa, sawal li ser fêrbûn û alimana tevgeran û naskirina cihê re wê kedî bibê.

Rewşa kedîkirinê wê li ser hin rewşên mêylî ên bi mejî re bibê. Ev rewş, wê di temenê

fêrbûnê de bê. Mirov dikarê wa rewşan weke rewşna fizyolojikî jî werênê ser ziman. Sawala kedî û ahlkirî, wê bi demê re weke sawala malê bijî. Dema ku ew ji mal derkeve û herê jî, wê piştre ew rêya xwe bibînê û were malê. Her wusa, wê li vir, wê bijî. Sawal, dema ku ew li wir nêzîkatîyê ji xwediyê dibînê, xwarinê digirê û hwd, wê ev rewşna ku wê sawalê bikişênin bin.

Li kurdistanê, çanda kedîkirina sawalan, wê bi jîyane şivaniyê re wê xwediyê dîrokek pirr zêde kevn bê. Her wusa, sawala nekedîkirî û neahlkirî, weke sawala hov û bi wê re ´har´ jî dihê dîtin li ser rewşên wên hêrîşkirinê û hwd re. Lê hinek sawal jî ew mêyla wan ya ahlkirinê nîn a. Ew jî, weke sawalên ku ew nayêna kedîkirin û ahlkirin li wan dihê nerîn. Minaq, gûr weke sawaleka ku ew nayê kedîkirin û ahlkirin li wê hatîya nerîn.Lê kuçik, ew hê di serdemên destpêka şariştaniyê û ankû bicihbûna mirovan û bidest jîyankirinê de kedî bûya. Rewşa jîyane mirov a di destpêka wê de wê, nêçîrwanî pêşketî hebe. Li kurdistanê, piştî destpêka serdemên şariştaniyê re wê nêçîrwanî jî wê xosletên xwe li gorî wê bide rastkirin. Minaq, mirovên ku wê herina nêçîrkirinê, wê ´tajîyên ku ew bi wan nêçîrkirinê dikin´ wê xwe ji xwe re peyda bikin. Tajî, weke cûreyekî ji malbate kuçikan a û pirr bazek a. Li gorî rewşa nêçîrwan tevdigerihin. Nêçîrwanî, wê di demên destpêkê de wê, gelek sawalên ku ew di xwezayê de wê hebin, wê bina armanca nêçîrwanan. Her wusa, piştre li kurdistanê, bo nêçîrkirinê, wê mizraq wê bên kifşkirin. Piştre jî, wê tîrûkavan wê werina kifşkirin. Lê li kurdistanê, çendî ku wê hin bi hin hinekî wê nêçîrwanî jî wê xwe bide domandin jî, lê wê hin bi hin ew êdî newê kirin. Wê mirov, pêdîvîyên xwe wê ji sawalên xwe yên ku ew kedî kirina wê ji wan bidest derxistinê bikin. Minaq, çêlek, meh, bizin û hwd, wê hinek ji wan sawalên ku wê şîr bidin bin. Bi wê re jî, wê sawalên piçûk ên malî ên weke mirişk, alok, kew, qaz, ordek, û hwd, wê werina kedîkirin û wê li malê werina çêkirin. Li malê, minaq, wê mirîşk were rûniştandin û wê hêk bên xistin li binê, ew hêk, wê piştre bina çîçik. Ew çîçik, wê mazin bibin û bina mirîşk. Bi heman rengî wê bi sawalên din ên malî re wê bê kirin. Dema ku mirîşk, li ser hêkan hat dayîn rûniştandin, wê ji wê rewşa wê ya rûniştinê re wê bê gotin "kurk." "Mirîşka kurk", wê hêka nekê. Wê tenê li ser hêkan rûnihê heta ku ew hêk ji wan çîçik derkevin. Piştî ku ew hêk ji wan çîçik derketin, wê êdî wê mîrişk, wan mazin bike.

Ev rewş û gelek rewşên bi vî rengî wê bi demê re cihê nêçîrwanîyê jî bigirin. Lê nêçîrwanî, wê ji dema sûmerîyan ve li kurdistanê di nava civate kurd de wê hebe. Nîşanakên vê jî pirr zêde hene. Her wusa destana gilgamêş û gelek destan û bineterên nivîskî ên ji wê demê, vê vê yekê di xwe de bi şêwayna werênina ser ziman. Di demên sûmerîyan de wê nêçîrwanî, weke jîyanekê bê. Lê li vir dema ku em nêçîrwanîyê weke şêwayê jîyanekê hildina li dest, weke ku em li kurdistanê dibînin, em divê ku wê bi jîyane şivaniyê re wê bi hevdû re werênê ser ziman. Şivanî, wê rexakî wê nêçîrwanî bê di demên berê de. Lê wê piştre ev rewş wê bi gûharê. Şivanî, wê piştre, weke ku em li kurdistanê ji wan demên destpêka şariştaniyê û heta roja me ku em dibînin, wê bi xwedîkirina sawalên ku ew hatina kedîkirin re wê jîyane xwe bide domandin. Şivanî, wê di vê çerçoveyê de wê weke şêwayê xwedîkirina sawalan û ji wan sûdgirtinê bê, weke ku em bi koçerîyê û hwd re dibînin.

Her wusa, di vê çerçoveyê de em divê ku werênina ser ziman ku wê nêçîrwanî, wê bi hûnerî wê were pêş û derkeve li holê. Mirov, çendî dikarê bigirê û ankû zant bike, wê bi wê re werênê ser ziman. Di demên destpêka şariştaniyê de wê mirov, nêçîrwaniyê bikin

û wê sawalan nêçîr bikin û wê dabara jîyane xwe bi wê bikin. Wê jîyane xwe bi wê re bidomênin. Wê ew nêçîra ku wan kirîya, wê xwarina wan bê. Lê piştre, hin bi hin wê nêçîrwanî, bi xwe re wê pêvajoyên gûharandinê wê derbas bike. Minaq, di destpêkê de wê nêçîrkirin bi şêwayê kuştina sawalan bê. Piştre wê, ev bi gûharê, wê bi girtin û kedîkirin û ankû alhkirinê re wê gûharînê bike. Lê çendî ku wê gûharîn bibê jî, wê di nêçîrkirinê de wê kuştina sawalan bi tememî ji holê ranekê. Şêwayê bi kuştinê nêçîrkirin, wê şêwayê nêçîrwaniyê ê herî hov bê. Nêçîrwanîya piştre wê temenê wê li ser ahlkirin û kedîkirinê bê. Wê sawal werina girtin û wê werina kedî kirin. Di nava xwezayê de wê, gelek cûreyên sawalan wê hebin. Mirov jî, wê wan nêçîr bike. Minaq, wê haspan nêçîr bikin. Wê haspan bigirin û wê piştre ahl bikin. Ew ahlkirina haspan, wê li kurdistanê weke çand û pêşketinaka wan ya civakî a pirr zêde wê kevn bê. Wê bi demê re li kurdistanê wê gelek şêwayên nêçîrkirinê wê werina kifşkirin. Çêkirina xefkan û hwd, wê were û bibê. Li kurdistanê, weke ku bûya gotinaka xalkê jî, wê rewşa ´kewê´ wê were ser ziman. Kew, li kurdistanê, dema ku wê di demên berê de wê were nêçîrkirin, wê pêşî, kewek ku berê ew hatî girtin û kedîkirin, wê bê danîn li hundûrê xefkek ku ew hatî vedan. Piştre wê kewên din wê werina cem wê kewê. Her kewa ku ew hat cem wê kewa di xefkê de wê ew jî bikeve xefkê de.

Bi wê re jî wê ´dahbik´ di nêçîrkirinê re wê werina bikarhanîn. Dehbik, amûrek nêçîrvaniyê ye ku bi giranî ji bo girtina çûkan û ajalên bi zerar yên wek rovî, mişk, gur û hirç û hwd, dihê bikaranîn. Lê dahbikên wê bi wan teyrik û çûkan nêçîr bikin jî wê werina çêkirin. Ew dahbik jî, wê dehbikên ku wê ji mûyê teriya hespan û bi girêdana xilboqî dihê çêkirin. Li ser sergoyan ankû wê jî li ser reşahiyek li nav berfan dihê danîn û pê beytik, kevok, çîq û ankû reşçêlek û çûkên hwd, dihên girtin. Lê li kurdistanê kurdan di nêçîrkirinê de wê bi demê re wê amûrên din jî ên ku wê bi wan nêçîrkirinê wê kifş bikin. Ew amûr jî, wê weke ´qosk(jê re ´nêçik´ jî tê gotin)´, ´berkahnîk´ û hwd bin. Qosk, di nêçîrkirina çûk û tayrikan de wê werê bikarhanîn. Berkahnîk jî wê di nêçîrkirina sawalên piçûk û bazek ên weke kîvroşkan û hwd wê were bikarhanîn. Kurdan, di demên xwe yên berê de wê berkahnîk, wê di pevçûnên ku wan kirina de jî wê bikarbênin.

Bi vî rengî, wê gelek şêwayên nêçîrkirinê wê werina çêkirin. Em dibînin ku wê di dema sûmerîyan de wê li kurdistan û mesopotamîya wê mizraq wê werina kifşkirin û bikarhanîn. Ev amûrên xwe parastinê na jî. Her amûrê xwe parastinê, wê di nêçîrkirinê de wê werina bikarhanîn. Piştre wê tîr û kavan wê piştre werina kifşkirin. Tîr û kavan, wê weke kifşkirineka mesopotamiya a herî kevn bê. Î ro di destê me de vegotin û lêkolîn hena ku em dikarin li wan binerin û bibêjin ku wê care pêşî tîr û kavan li kurdistan û mesopotamiya wê were kifşkirin û wê bikarhanîn. Bi wê re jî bi heman rengî mirov dikarê bo girtina haspan û ahlkirina wan û li wan sûwarbûna wan jî vê yekê bibêjê, Her wusa, ev rewşên ku wê care pêşî li ser van axan rû bidin, wê piştre belav bibin û bibina malê pirranîya xalkên din ên li herêmê û ne li herêmê jî. Mîtra weke pêxemberekî axa kurdistan û mesopotamiya ya.Ew berî zayîna îsa li gorî ku mirov ji binterên nîvîskî kifş dike, li dora hezar û sêsed salî û wan dijî. Mîtra bixwe jî, ew hizrên xwe yên olî di xate bawerîya xwe de dihênê ser ziman. Lê mîtra, ew dema ku tefsîra wî dihê kirin, ew weke nêçîrwanekî jî ew dihê tevsîr kirin. Her wusa tîr û kavana wî ya ku ew di destê xwe de digirê, wê piştre di bawerîya wî de were pîroz kirin. Î ro, dema ku wê li ´falan´ were meyîzendin, wê beşa falê ya bi navê ´tîr û kavan´ jî wê hebe. Ev, wê ji

vê rewşa mîtra were û biafirê. Tîr û kavan, em dizanîn ku wê di kalikên kurdan re wê pirr zêde wê were bikarhanîn. Di dema desthilatdarîya kurd a medîya de em dizanin ku wê beşeka ji mirovên naqandî di nava artişa medîya de wê hatibê perwerde kirin ku ew karibê li ser haspan sûwarbûyî ku ew karibê tîr û kavan bikarbênê wê hebe. Ev rewşa van wê demê ên bi hûner, wê di derbarê pêşketina wan de wê têgînekê bide me. Lê bi wê re jî, wê vê jî wê bide nîşandin ku wê di wê demê de wê tîr û kavan were bikarhanîn bo nêçîrwaniyê jî.

Î ro, em dikarin bibêjin ku wê li ber diclê û firatê li kurdistanê û ankû mesopotamya wê jîyane bi komî wê di dem û serdema neolîtîkê ku wê ji salên li dora duwanzdeh hezar salan û heta deh û ankû ne hezar salan, wê weke serdemek kombûnê û bi têgînbûnê bê. Di vê demê de wê mirov, bicihbûnê bikin. Wê di cihê ku ew di wê de dijîn, wê bixwezin ku ew temenê domandina jîyane xwe biafirênin. Her wusa, wê cohtkarîyê pêşbixin. Wê bi wê re jî, wê sawalan hin bi hin kedî bikin bo ku ew wan di jîyane xwe de ji wan sûd wergirin.

Em dikarin bibêjin ku wê serdema neolîtîkî li kurdistanê û herêmên wê, wê li dora duwenzdeh hezar salan wê destpê bike. Dibêt ku ev dîrok kevntir jî herê. Lê berî dema neolîtîkê di serdema peleolîtîkê de jî wê destpêka kombûnê wê hebe. Ev jî, dide nîşandin ku wê ji ya ku em dizanin zêdetirî wê dîroka jîyankirina bi komî a mirovan li kurdistanê wê kevn herê. Herêmên Reha, amed, herêmên botanê ên weke Şirnax, nisêbîn, hezex, Cizîr û hinek herêmên din ên ber çîyayê cudî heta ku wê bigihijê herêmên çolemergê û çelê û hwd, wê di qadek mazin de wê ev rewş bibin. Kifşkirin li ´xirabreşkê´, didina nîşandin ku wê ev rewşa jîyankirinê a li herêmên weke herêmên kurdistanê ên weke Rehayê, wê temenê jîyanê kevntir wê herê. Herêmên berfiratê ên rojavayê kurdistanê û heta ku digihijê Rehayê û ji wir jî heta ber çîyayê kurda, wê di vê çerçoveyê de temenê jîyane zû bicihbûyî wê bi afirênê. Avîbûna herêmê û daristanên wê ên gurr, wê temenek mazin bide çêkirin.

Çendî ku wê komîtî pêşbikeve, wê hin bi hin cohtkarî, şivanî û her wusa kedîkirina sawalan bi wê re wê pêş bikeve. Piştî jîyane bicihbûyî ku ew pêşdikeve û pê de, wê êdî li gorî wê lêgerînên xwe jîyankirinê wê bibin. Her wusa, çemên mazin ên weke diclê û firatê û çemên din ên li kurdistanê, ku ew weke bahrna piçûk in, wê mirov ji wan jî wê xwe bidina jîyankirin. Her wusa girtina masîyan û hwd jî, wê bi wê re pêşbikeve. Girtina masîyan, wê piştre jî wê di serdemên şariştaniyê de wê bi awayekî pêşketî jî wê bibin. Pêşî, mirovan, wê xefkan çê bikin û bi wê masîyan bigirin. Yan jî wê bi mizraqên xwe wê bigrin. Lê piştre di serdemên şariştaniyê de wê bi aqil ji wê re rêyên din ên masîgirtinê wê bên kifşkirin. Minaq, kifşkirina ´şewk´ bo girtina masî, wê vê rastiyê bi xwe re werênê ser ziman. Weke ku çawa ku wê gotina ´masî´ ku weke navê masîyê avê ya, wê di dema sûmerîyan de jî wê di kurdî de ew hebe. Her wusa, weke wê, bi heman rengî wê gotina ´şewk´ê jî wê hebê. Ev herdû gotinên ji kurdî, wê vê rastiyê baştirîn piştrast bikin û werênina ser ziman.

Kedîkirina sawalan, wê piştre wê weke beşek ji jîyane mirovan bê. Wê mirov, minaq, weke ku ew haspan di dest de bigirin, wê ´hefsarên´ ku wê bi serê wan ve bikin û bi wan haspan bikişênin û ankû bidina meşandin, wê bên çêkirin. Bi hefsar re wê ´çêkirina kûrtanan´ jî wê bibê. ´Kûrtan´, wê weke cilik û ankû tişta ku ew dihê danîn li ser pişta sawalên weke haspan ku wê tiştan dênina li ser wê û bi wê bar bikin a. Çêkirina hefsaran û hwd, wê di şêwayekî çêkirina gêsnan ku wê bi wan ardan bikolîn bo

çandinîyê û hwd de bê. Kedîkirin, wê weke aliyekî giring ê jîyane civatî a bicihbûyî wê bi wê re wê hebûna xwe bide domandin. Mirov, wê haspan, gayan û hwd, wê di kar û xabetên xwe de wê bikarbênin. 'Ga´, wê weke sawalaka ku wê di nava çanda kurdistanî de wê weke ku wê bi pîrozîyê ew ji dema sûmerîyan û piştre heta dema mîtratiyê û hwd, wê bên parastin. Di ola kurdistanî a yazdaniyê de jî wê ev hebe. Di pêşketina jîyane bicihbûyî de wê mirov xwe çawa bi wasif bike, wê bi heman rengî wasîfîyan ji sawalên ku ew di jîyane xwe de bikardihênê wê bi wan re bike.

Kedîkirina sawalan, wê weke çandakê wê di nava kurdan de wê pêşbikeve. Her wusa, rewşa kedîkirina sawalan li kurdistanê, wê weke rewşek teybet xwe bide dîyarkirin. Li kurdistanê, ji serdemên destpêkê ên şariştaniyê ve wê weke çandakê wê pêşbikeve. Em bo ku baş rewşa kedîkirina sawalan fahm bikin, em divê ku di serî de li pergale jîyanê a ku ew li kurdistanê pêşketîya li wê binerin. Wê ev pergale civakî a ku ew pêşketîya wê, bi rengê pêşketina xwe re wê di derbarê wê de wê aqilekî baş bide me. Her wusa li kurdistanê, em dema ku wê rewşa kedîkirina sawalan fahm bikin, em divê ku wê jîyane şivaniyê baş fahm bikin. Jîyane şivaniyê û ankû weke bi şêwayê wê yê ku ew di nava civate kurd de ji destpêka pêşketina jîyane komî ve ku ew heya jîyane koçerîyê, wê rastîya wê baştirîn bi me bide ravakirin.

Kedîkirin, wê bo domandina jîyane bicihbûyî ku ew were dayîn domandin bê. Bo vê yekê, jîyane bicihbûyî û ankû pêşketina wê ya bi civatî, wê her wusa bi wê re kedîkirin weke pêdivîyekê wê xwe bide dîyarkirin. Lê li vir, em divê ku vê yekê jî fahm bikin ku ew jîyane cihbûyî ku wê bi wê re wê kedîkirin û ahlkirina sawalan pêş bikeve, em divê ku wê kedîkirin û ahlkirina sawalan weke pêdîvîyekê jî bi wê re hildina li dest. Mirov, bi jîyane xwe ya ku wê ew bi wê bi cihbûnîya xwe re bijî, wê hin bi hin wê pêdîvîyên wê jîyanî wê kifş bike. Wê bi wê re wê, bi ezmûngerî wê bicerb wê fêrê bi wê re bidest bixe. Fêrên ku wê mirov di mejiyê xwe de ew bidest bixe, wê mirov di wê jîyanê de wê hin bi hin bi aqilê wî re derxe li pêş. Piştî pêşketina jîyane komî û pê de, wê di destpêka jîyane komî de wê pêşî di destpêkê bi nêçîrkirinê wê mirov jîyane xwe bidina domandin. Lê piştre wê mirov, wê rewşên din wê pêşbixin. Cohtkarî û çandinî wê were pêşxistin. Bi wê re jî, wê şivanî pêşbikeve. Şivanî û bidest xwedîkirina kerîyên sawalan, wê bê temenê dabarakirina jîyane a malbat û komên ku ew bicih bûna na.

Serdema neolîtîkê wê, di wê de ev karên cohtkarî û çandinîyê, bi komî bihevdû re jîyankirinê û bidest pêşxistina malbatê, şivanî û berhevkirina kerîyên sawalan û hwd, wê hin bi hin pêşbikeve.Ev serdem, wê bê weke seremek navber jî ku wê ji serdema dirêj a pêşketina mirov a peleolîtîkê û heta pêvajoya serdemên şariştaniyê û hwd. Di aslê xwe de wê di serdemên peleolîtîkê de wê, mirov bidest pêşxistina amûrên ku ew karibê xwe bi wan jîyan bike û biparêzê. Bi teybetî dema dawî a serdema peleolîtîkê de wê mirov bo ku ew karibê xwe ji hêrîşên sawal û ajalên xeternek bi parêzê, wê amûrên xwe parastinê wê pêş bixe. Her wusa, wê bidest jîyankirina bikomî a di şikeftan de jî wê bike. Bi hevdû re bi komî jîyankirin, wê hin bi hin wê derkeve li pêş. Di vê çerçoveyê de wê xûy û tevgerên mirov wê bi jîyan û xwezaya wê re wê awa û şekil bistênin. Di vê demê de wê mirov bidest bikarhanîna keviran û bi awakirina wan jî bike. Xîzkirinan jî bikin. Gelek xîzkirinên li hêtên şikeftan ên li kurdistanê, wê ji van serdeman mabin bin. Bo vê yekê, ev weke ´dema kevir´ jî dihê bi nav kirin. Di serdema dawî a bilind a peleolîtîkê de wê mirov, wê hin bi hin fêrî jîyane bi hevdû re bikin. Em bi vê re jî kifş dikin ku wê li kurdistanê li herêmên bakûr, rojava, başûr û rojhilatê kurdistanê, li

deverên bilind û avî û yên ku ew dikarin xwe biparêzên, wê bicihbûn bibê. Her wusa, wê şikeftan bidest bikarhanîna weke malan bikin. Jîyane di şikeftan de wê di serdema dawî a peleolîtîkê de wê bi awayekî vekirî wê zêdetirî wê pêşbikevê. Mirov, wê weke ´malbatên mazin´ wê bi hevdû re wê bijîn. Ev malbatên mazin, wê bihevdû re nêçîrê bikin. Wê di parastinê de wê bi hevdû re bin. Wê bi hevdû re li hemberî telûkeyên ku wê werina serê wan, wê bisekin in. Ev rewş, wê hezaran salan bi ser xwe ve bi jîyane mirov a bi komî û ankû weke malbatên mazin ku ew bi hevdû re dijîn re wê ser wê re bide derbas kirin. Ev jî, wê bi mirovan re wê xûyên jîyanî û hwd ên bi hevdû re bi jîyankirinê wê biafirênê. Mirov, wê fêrî hevdû bibê. Mirov, wê bibînê û wê bi hîskirina xwe wê fahm bike ku ew bi hevdû re bin wê çendî bi hêz bin. Wê xwe xort hîs bikin. Hîskirina bigirseyê re wê xwe zêdetirî bide hîskirin. Mirov, dema ku ew vê yekê bi hîsî bi xwe re kifş dike, wê êdî wê bi komê re wê bijî. Wê bi hevdû re wê heman şikeftê wê parve bikin di jîyankirinê de. Wê di nava heman komê û ankû malbata mazin de wê têkiliyên zayendî wê dênin. Wê bi wê re wê zaroyên komê wê bi afirin.Herwusa, wê ev rewşên bi vî rengî jî, wê girêdanê hin bi hin bi xwe re û bi cihê re wê bide çêkirin.

Ji vê demê û pê de wê mirov, serdema nû ya neolîtîkê wê bijî. Mirovê ku ew êdî di şikeftan de bicih bûya, wê şikeftên xwe weke cihên jîyanê wê ji xwe re bike mal. Wê hin bi hin têgîna malbatîtîyê wê pêş bikeve. Di aslê xwe de wê di vê serdema bi navê neolîtîkê de wê hin bi hin hinekî têgîn jî wê pêşbikeve. Mirov, wê di mejiyê xwe de wê bidest dîtinê bike. Wê toteman biafirênê. Wê mît û ankû mîtolojî wê biafirin. Bi wê re têgînên anamîst wê pêşbikevin. Miirovê ku ew di nava malbatê de dihê dunyê, wê ew xwe aîdî wê hîs bike. Hîsa xwe aîdî malbatê hîskirin, wê pêşbikeve. Ev jî, wê weke aliyekî din ê giring ê pêşketina malbatê a di vê demê de bê. Serdema neolîtîkê, mirov dikarê weke demeka ku wê ew jîyane ku ji serdemên dawî ên peleolîtîkê û hwd ve ku wê di şikeftan de biawayekî malbatî ku wê bidest pêşbiketina xwe bikê, wê li ser wê re gelek dem û pêvajo derbas bibin bê. Ev jî, wê di vê şêwayê jîyanê de wê di mejiyê mirovan de wê hîs, hiş û her wusa hîssîyeta aîdîyetê wê bi afirênê.

Serdema neolîtîkê, wê weke serdemeka ku ev pêvajoyên pêşketînê ê bi jîyane mirov re û bi mejiyê mirov re ku ew weke ku pêşketineka mazin bi xwe re dana çêkirin bin. Mirov wê bi van pêvajoyan wê xwe bi pêşketineka aqlî re wê bibînê. Wê mirov, ji şikeftan wê derkevin. Lê ew şêwayê jîyane di şikeftan de wê di mejiyê mirov de wê ezmûnekê bi mirov re bide çêkirin. Ew bi hevdû re di şikeftê de jîyankirinê de wê xûyan bi mirov re bide çêkirin. Ev ezmûn û xûy, wê di temenê wê de bin ku wê mirov wê ji şikeftan derkeve û wê li deveran wê ji xwe re sitergehan wê çê bike. Ev jî, mal in. Li deverên avî û hwd, deverên ku ew dikarin li wê bijîn, wê sitergehan wê çê bikin. Li ser vê re mirov dikarê hema bibêjê ku wê di vê demê de wê şêwayê avakirina malan wê êdî hin bi hin wê derkeve li holê. Bi wê re bi wê avakirina malan re wê çawa di wê de bijî, wê êdî wê li rê û rêbazên wê bigerihê. Şêwayên ku wê mirov di vê dema ku ew ji xwe re malan ava dike de ku wê bi wê bijî, wê nêçîrkirin, şivanî û danahevkirina kerîyên sawalan û her wusa bi demê re fêrbûna cohtkarî û çandiniyê û hwd bê. Mirov wê li ser van şêwayên jîyanê re wê hin bi hin pêşketinê di jîyane xwe de bide çêkirin, wê xûyên xwe biafirênê, ezmûnê bidest pêşbixe û her wusa wê fêrî jîyanê û jîyankirinê bibê.

.Felsefeya civake kurd, weke felsefeyeka dîrokî ya bi hezaran salan a. Em dema ku bidest dîroka nivîsandina wê bikin, em divê ku ji destpêka serdemên şariştanîyê û her wusa serdemên berî şariştaniyên bikombûna mirovan li hevdû re mirov dikarê werênê

ser ziman. Li vir, divê ku mirov vê yekê werênê ser ziman ku rewşa pêşveçûnên civakî ên li kurdistanê ku em weke ku bi civate kurd re kifş dikin, wê di zikhevdû de û bi hevdû re wê bimeşîn. Awayek û rengekî pêşketinê û pêşveçûnê ê pirrdîmenî wê di zikhevdû de wê hebûna xwe bide domandin. Em dema ku van dîmenan ji hevdû dernexin û nekin ku fahm bikin, emê nikaribin bi awayekî bibaşî hebûna civate kurd bi dîrok û pêşveçûn û her wusa têkiliyên wên navxweyî re wê fahm bikin. Bo ku em wê bi awayekî rast karibin fahm bikin û hildina li dest jî, divê ku mirov bi dîroka wê re li ser wan dîmenên wê yên di zikhevdû de jî serwaxt û xwediyê fahmkirineka bi dîrokê re bê.

Heta roja me jî, dema ku em li rewşa civake kurd dinerin, em dibînin ku ew rewşa wê ya pirrdîmenî wê xwe bide nîşandin. Di roja me de civake kurd a ku hebûna wê hê di bin hêrîşên xadar ên weke yên rejima tirk û hwd de jî wê, ev hêrîşên ku ew dikin wê li hebûna wê ya dîrokî û ji aliyê hebûna xwe ve ku pirrdîmenîya wê bibê. Ev rewşê civake kurdistanê ku heta roja me dijî, weke minaqek bêhempa ya. Em dema ku wê rastîya wê bi awayekî baş fahm bikin, emê bibînin ku serdemên wê yên pirrkevn ên berî dema şariştanîyê, dema şariştaniyê û her wusa serdemên kevnera(´antikk´) ên civakî mirov bi wê re kifş dike. Serdema mîtannî ya Medîya, wê weke serdemek giring a kevnera a civake kurdistanê bê. Her wusa, mirov dikarê vê serdema kevnera li ser dema hûrîyan û gûtîyan re hinekî din jî kevn bibê. Lê ev demên wê, wê weke demna ku ew êdî li ser aqil re dihê pêşxistin in. Her wusa, rewşên pêşketina ola êzdayî, mîtrayî û her wusa berhemên weke yên Zerdeşt ên bi navê ´zend avêsta´ û hwd, wê di vê çerçoveyê de di derbarê wê rastî û rastteqînîya wê de wê, aqilekî baş bidina me.

Di çerçoveya têgîna felsefeya civakî a civate kurd de mirov, divê ku rewşa jîyane ´koçerîyê´ weke berhemek civakî a dîrokî û pirr kevn ku wê bi mejûya civakê re hertimî xwe daya jîyandin û hanîya heta roja me jî, mirov dikarê werênê ser ziman. Her wusa, destpêka vê pergela jîyanê a koçerîyê wê di nava xwe de wê, rewşa jîyane seretayî(´îlkel´) jî wê di xwe de wê bihawênê. Her wusa jîyane destpêkê a seretayî a demên destpêkê ku wê pêşbikevin di destpêkê de wê, ev rewşa jîyane civatkî, wê hizrekê jî bide me.

Serdemên seretayî(´îlkel´) ên destpêka civate kurd, wê her wusa, di vê çerçoveyê de bi wê jîyane wê ya bixwezayê re wê hizirna baş bibina. Jîyane civatî a li kurdistanê, wê hertimî, lingekî wê li ´deştê´ bê û lingê din wê li ´zozana´ li nava xwezayê bê. Di vê çerçoveyê de wê, pergalek ekolojikî a xwezayî wê bi jîyane civatê re wê xwe bide dîyarkirin. Em dema ku dîmenê jîyane civatî ê kurd ê seretayî(´îlkel´) bikin ku wê hildina li dest û fahm bikin, em divê ku di serî de wê jîyane koçerîyê wê baş hildina li dest û fahm bikin. Heta roja me, ev jîyane koçerîyê bi gotinên ´goçberî´ û ankû ´pênaberîya ji herêmên xwe´ re ku hatîya hanîn li ser ziman, di vê çerçoveyê de di aslê xwe de rastîya vê jîyane koçerîyê, ti carî ne hatîya hanîn li ser ziman. Tenê, hinek teorîyên bi vê rengê hatina afirandin û weke kiras, hatina xwestin ku ew li wê jîyane koçerîyê werina kirin. Lê ev kiras jî, hertimî li rastîya jîyane koçerîyê tang berevajî hatîya. Rastîya wê, nekarîya ku werênê ser ziman. Bo vê yekê, hertimî, pirsgirêka fahmkirinê li ser rengê jîyane civatî a kurd re wê, xwe bide dîyarkirin. Ev pirsgirêka fahmkirinê ku ew bi zanebûnî bê, û ne bizanebûnî bê ku ew hatibû afirandin, wê weke pirsgirêkek esasî ya fahmkirina rastîya civatîya kurdistanê jî bê. Li vir, di serî de divê ku mirov rêbaza rast nêzîkatîyê bi fahmkirinê re pêşbixê û bi wê werênê ser ziman. Pirsgirêka nêzîkatîyê, wê weke pirsgirêkek metodolojikî wê xwe bide dîyarkirin.

Nêzîkatîya rast, wê hertimî, nêzî rastiyê bike. Di aslê xwe de mirov, dikarê nêzîkatîya rast weke nêvî bi nêvî fahmkirina wê rastiyê jî bi wê re hilde li dest. Nêzîkatî, wê weke rastîyek teorîkî û felsefîkî wê xwe bi wê re werênê ser ziman. Bi rastîya civate kurd û serdemên wê yên berê û heta roja me re wê ev, zêdetirî xwe bi wê re bide dîyarkirin. Rastîya nêzîkatîyê, wê her wusa rastkirinê bi xwe re werênê li holê.

Li kurdistanê, pirsgirêkek mazin bi rast nêzîkatîyê re xwe dide dîyarkirin. Piştî ku civate kurd, serdestî û serwerîya xwe ji dest da, wê êdî ev pirsgirêk, xwe bide dîyarkirin. Bo vê yekê, weke aliyekî teorîkî û felsefîkî, bi gelek rêbazên wê yên fahmkirinê re divê ku mirov di vê çerçoveyê de bi wê re nêzîkatîya wê hilde li dest. Dîroka civatê, wê bi xwe re wê rastîya wê bi awayên wê yên pêşketinê ên bi dîrokê re wê werênê ser ziman. Her wusa, dîroka civatê, wê rastîya jîyane wê ya dema bûhûrî bê. Her wusa, ji pêşdîtinan dûr û bi awayekî zelal hildana vê li dest û fahmkirina wê, wê weke temenekî w yê giring ê civatî jî bê.

Pêvajoyên pêşketina civatî li kurdistanê, wê her wusa, bi dîroka wê re wê xwediyê mejûyek pirr demdirêj bê. Serdemên civatî n seretayî(´îlkel´) wê, her wusa bi rengên jîyane civatê û xûy û tevgerên wê re li ser rengên pêşketina aqilê wê re jî wê xwe bide nîşandin. Têgîna xalkitiyê, her wusa, dema ku ew pêş dikeve û pê de, wê rêgezên xwe pêşbixe û wê li ser wan rêgezan re wê rêkarîyek civatî wê hin bi hin bi demê re wê pêşbikeve û wê pêvajoyên xwe yên civatî wê bijî. Bi demê re bi pêşketina aqilê civatî re wê ev pêşveçûna civakê, wê xwe bide domandin. Pêşketina aqilê civakê, wê hinekî jî bi mejûya wê ya jîyayî re bê. Her civat, bi mirov bi mirov bi andamên xwe re wê jîyankirinê bike. Wê jîyane wan, weke fêr, cerb û ezmûnek civatî wê xwe bide dîyarkirin. Bi wê re jî, wê êdî ew bi pêşketina civatî re wê xwe bide nîşandin.

Li kurdistanê, jîyane civatî, dîrok û mejûya wê, pirr kevn diçêt. Dîroka wê, dema ku em hildina li dest, em divê ku bi şîroveya xwe re herina demên berî dema şariştaniyê û berî wê jî bi wê re bikin ku wê fahm bikin. Li ser van axan, berî pêşketina jîyane civatî, mirov çawa û bi çi derfetê dijîn û piştre dema ku jîyane civatê bidest pêşketina xwe kir û pê de, wê çi derfetan pêşbixin, her wusa, di vê çerçoveyê de wê weke mijarek fahmkirina vê jîyane civatî û xate wê ya pêşketinê bê.

Jîyane civatî, li kurdistanê, wê di destpêka wê de wê, li dora çemên wê yên weke diclê û firatê û herêmên wê yên avî wê bibê. Em bi wê re jî divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku em, weke ku bi jîyane koçerîyê re dibînin, wê her wusa wê jîyankirin li deverên avî û geş wê xwe bide hevdû. Minaq, ji herêmên kurdistanê ên weke serhedê, wê malbatên koçer, wê bi koçerî, wê herinan herêmên ber avê çemê diclê û firatê û li deverên wan ên baş ku gaya şîn a, wê li wan demsala xwe derbas bikin. Wê, di hundurê wê demsalê de jî wê sawalên xwe biçêrênin û wê ji sawalên xwe zêde şîr, hirî û hwd wê hildin. Ji şîr wê mast, panîr û hwd, bi gelek cûreyên din ên xwarinê re wê çê bikin. Hirî û hwd jî, dema ku ew hildan, wê ji wê ji xwe re cilikên li ser rûniştinê, li xwe kirinê û hwd, wê ji wan çê bikin. Bi vê rengê wê, jîyane xwe bidina domandin. Di vê çerçoveyê de wê jîyanek dewlemend bi xwezaye wê re wê derbas bikiran. Jîyane koçerîyê, wê di nava xwe de wê, gelek dewlemendiyan bi vê rengê wê bihawênê. Lê em divê ku vê yekê jî bi wê re werênina ser ziman ku wê, pirranîya dewlemendîyên wê, wê bi xwezayê û jîyane bi xwezayê ve girêdayî bin.

Di vê jîyanê û rengê wê de wê, destûr û zagonên xwezayê û jîyane xwezayê wê li wê serdest û serwer bin. Wê li gorî destûr û zagonên xwezayê wê werê jîyandin. Bo vê

yekê, ku mirov hertimî vê jîyanê bi gotina jîyane xwezayî re werênê ser ziman jî wê ne xelat û rast bê.
Rastîya jîyane xwezayê ku mirov bi wê re û di nava wê de dijî, wê bi derfetên wê yên ku ew dide me re wê bi sînor bê. Bi vê re dema ku mirov bahse vê bike, divê ku mirov biawayekî binxatkirî bahse têgîn û fêrbûna jîyankirina bi xwezayê re bike. Mirov, dema ku ew, dinava jîyane xwezayê de dijî, êdî mirov fêrî wê dibê. Wê çawa bi wê re bijî û ji wê sûdbigirê, wê fêrî wê bibê. Li vir, fêrbûna bi xwe re wê, aliyekî giring ê vê jîyane bi xwezayê re bê. Jîyane xwezayî, di vê çerçoveyê de ku mirov, çendî dikarê ji wê sûdbigirê û bi wê re bijî, wê bi rengê fahmkirna ji xwezayê re wê biderfet bê. Mirov, dema ku di nava jîyanekê de bijî, fahmkirna wê jîyanê bi ezmûnan wê bi derfet bê. Bi heman rengî, wê di jîyankirina bi xwe re de jî wê wusa bê. Mirov, jîyan dike û ji wê jîyane ezmûn dike, bi wê ezmûnê re fêr dike û bi wê fêrkirinê re jî wê fahm bike. Bi vê rengê, wê pêvajoyek têgihiştinê bi jîyankirina bi jîyane bixwe re ku ew di ahengekê de ya wê, xwe bi mejiyê mirov re û di hundurê mejiyê mirov de wê bide pêşxistin û domandin. Destûreka jîyanê jî wê, bi ezmûnî û fêrbûnê bê. Fêrbûna mirov a ji jîyane wê hertimî bi aqilê mirov re wê bibê.

Dîroka civake kurd a seretayî(´îlkel´) wê me bi xwe re bibê heta serdemên destpêkê. Her wusa, em li vir, divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku wê ev rewşa civake kurd, wê hertimî li wê xwe bi serdestî bide dîyarkirin. Pêşveçûnên cvatî, wê ji xwe re xatekê bidina afirandin. Em dema ku her wusa, dihêne serdemên şariştaniyê, êdî em dikarin dem bi dem li gorî vê xatê wê werênina ser ziman. Dem bi dem çi pêşveçûn bi aqilî û hwd, derketina û çawa û bi çi şêwayê civat bi bandûrkirina, wê êdî bi wê re werê ser ziman. Civate kurd, î ro, dîroka wê ya şariştaniyê, em ku em werênina ser ziman, em divê ku bi demê re dem bi dem wê bi pêşketina wê re û bi wan pêvajoyên wê yên pêşketina bi şariştaniyî re werênina ser ziman.
Li vir, em divê ku vê yekê jî bi awayekî vekirî li vir werênina ser ziman ku wê civate kurd, dîroka wê bide nîşandin ku wê, ew hertimî bi dudîmenî biserekeyî wê xwe bide domandin. Dîmenek wê, li ser reng û xate pêşketina bi jîyane bi xwezayê a weke jîyane koçerîyê û hwd re bê. Dîmenê din ê duyem jî, wê li ser pêvajoyên şariştaniyê ên ku wê bibin wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, li vir, dema ku mirov bahse xate şariştaniyê û pêvajoyên wê ên pêşketinê bike, wê têgînên civatî ên ku dem bi dem derketina li holê jî wê, di dewame wê de wê xwe bibîna berbîra mirov. Minaq, ji serdemên sûmerîyan, têgînên yazdanî û hwd ku di nava civate kurd de pêşketina û dem bi dem li dora hizrên wê yên ku wê, bi wê re werênina pêşxistin ku wê li dora wana bicivatî wê xwe birxistin bike, wê bibin. Ev jî, wê dem bi dem xwe bidina dîyarkirin.

Civate kurd, wê di vê çerçoveyê de weke civatek nûmîne ku em dikarin ji wê, gelek tiştên bitêgînî bi dîroka wê re kifş bikin, wê bibê. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku têgîna yazdaniyê ku wê pêşbikeve, wê bi komelî û ankû civatî wê pêşbikeve. Wê temenê wê biafirênê. Pêvajoyên têgîna yazdaniyê, bi serdestî, li ser pêvajoyên şariştaniyê re wê ji serdemên sûmerîyan û hwd, wê xwe bidina dîyarkirin û domandin heta li roja me. Bi wê re jî wê, pêşketinê bi jîyane civatî re wê bidina afirandin.

Jîyane civatî, ku pêş dikeve, wê êdî ew bê temenê jîyankirina bi rêgezî a di nava destûr û zagonên jîyanê de. Ji xwe, jîyane şariştaniyê, wê weke jîyanek ku ew bi destûr û zagonan hatîya bi rêxistin kirin a. Emê vê yekê bi xate pêşveçûna jîyane civatî re dem

bi dem wê kifş bikin. Jîyane civatî û her wusa mijara têgînên weke yên bawerîyî ên weke yên yazdanî û hwd, wê di vê çerçoveyê de weke mijaraka giring ku miirov divê ku wê baş fahm bike bê. Her wusa jîyane civatî, di vê çerçoveyê de wê xwediyê rastîyekê bê.

Li vir, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku jîyane civatî, piştî pêşketina jîyane şariştanî re wê mifteyên xwe yên bîrkirin û zanebûnê wê biafirênê. Her wusa destûr, zagon, şîrove û salixkirinên ku wê di vê çerçoveyê de werina kirin, wê vê rewşê wê bidina dîyarkirin. Em li vir, di nava jîyane civatî de wê rastiyê biawayekî vekirî kifş dikin ku jîyane civatî, wê hertimî di nava xwe de wê weke dareka ku hertimî çiqilên nû bi wê re şîn dibin û xwe didina li der, wê di nava wê de jî wê, bi vê rengê wê bi jîyane civatî re wê pêşveçûn wê bibin. Wê têgînên nû wê li ser aqil re wê dem bi dem wê derkevina li holê. Wê kom bi kom wê rêxistiniyên nû wê xwe bidina dîyarkirin. Li vir, weke destûreka jîyane civatî ku mirov ji xate pêşketina jîyane civatî a civate kurd fahm dike, wê ew bê ku wê hertimî, li bi hevdû re jîyankirinê wê were lêgerîn. Ev jî, biqasî ku ji wê sedema ku wê li herêmê gelek xalkên ku hebûna wan bi demê re derketîya li holê ku wê bi hevdû re bijîn, wilqasî jî wê ji sedema aramiya di nava jîyanê de ku ew dixwezin ku bi wê bijîn, wê ji wê were. Bi vê rengê, wê ev rewş êdî bi demê re dem bi dem, wê di temenê pêşxistina têgîna jîyane bi hevdû re jîyînê re wê xwe bide dîyarkirin. Minaq, weke ku kurdan, çawa ku di nava jîyane xwe ya civatî de ji aliyekî jîyane li zozana a koçerîyê kirina ku wê bijîn û ji aliyê din ve jî ´jîyane li deştê´ ku em wê dikarin weke jîyane şariştaniyê û jîyankirina wê jî werênina ser ziman, wê ahengek di nava wan de were çêkirin. Her çendî ku weke du lingên jîyanî ên ku dem bi dem wê nakokîyê jî bi hevdû re wê bijîn bin jî, lê wê ev weke rewşna teybet ên bi pêvajoyî ên jîyane civatî bin. Bi demê re mirov, wê li jîyankirina xwe wê binerê. Kî çawa dijî û dema ku ew bi wê rengê dijî ku ew ancama wê baş a û ankû ne baş a, wê jî werina kifşkirin di mejî de. Ev, di aslê xwe de wê nîşanaka pêşketina xêva civatî a jîyanî jî bê.

Li vir ku em bahse xêva civatî bikin, emê li ser jîyankirin, ezmûn û fêrbûnan re herin. Ev wê, her wusa rastîya wê bi pêşveçûnên wê re bide dîyarkirin. Hebûna civatî, bi têgînî, wê xwe bi mejûya xwe re wê bide pêşxstin. Her jîyankirin, wê weke fêrekê wê xwe di mejiyê mirovê andamê civatê de bide rûnandin. Vêca piştî kifşkirin û bidest nivîsandinê kirin jî wê, rewşa xêvkirina civatî a di jîyanê de wê zêdetirî pêşbixe. Nivîsandin, wê karekî bi vî rengî jî wê bi xwe re wê bibînê.

Di destpêka pêşketina jîyane şariştanî de wê mirov, bi mejiyê xwe re tişta ku dît, wê xîz bike. Her wusa, ew xîzkirina ku pêşî li ser hêtên şikeftan ku wê bike, wê weke destpêkekê bê ji jîyane civatî a bihiş re. Piştre wê bi nivîsandinê bike. Her tişta ku hat xîzkirin û ankû piştre ku ew tê nivîsandin, wê bê malê girseyê. Wê bê aqilekî girseyê. Ev jî, wê her wusa wê hin bi hin hebûna girseyê bi derûnî û civaknasîya wê re pêşbixe û derxe li holê. Hebûna jîyane jîyankirina bi hev re a di destpêkê de wê du sedemên wê yên giştî û giring wê hebin. Yek, ew a ku mirov bi teneserê xwe li hemberî wê xwezaya mazin piçûk a û bêhêz a. Dema ku ew bi hevdû re bi hinek mirovên din re tevdigerihê, wê bi hêz bibê. Wê xwe bihêz hîs bike. Di nêçîrkirinê de wê bi hevdû re bikomî wê bikin. Her wusa, li hemberî hêrîşên ku wê bibin, wê mirov ne bi tenê bê. Ev rewş, wê weke rewşek teybet a giring ku mirov dikarê wê werênê ser ziman bê. Sedema din a duyem a bi hevdû re jîyankirinê, her wusa wê ji xizmtiyê û girêdana bi xwûnê destp bike. Mirov, li vir, bi ben û girêdanên fizyolojikî bi hevdû ve girêdayî ya. Rewşên weke

dêyêkti(´dayiktî´), bavîtî, xwûşktî, biratî û hwd, wê bi rengê naqşaya xizmtiyê wê dirêj bibê. Di vê rewşa bi hevdû re jîyankirinê de wê mirov, lênepirsê ku ew çawa û çima bi wan re bikomî dijî. Ev rewşa xwe, wê hêstekê bi mirov re bide çêkirin. Mirov, dema ku di nava wê koma xwe de ya, wê ew xwe bi hêstîyarî di germiyekê de hîs bike. Kengî mirov wê qadrê wê jîyane bi hevdû re di wê demê de wê kifş bike? Kengî ku ew ji komê dûrket û bi tenê ma. Hingî wê xwe bi tenê hîs bike. Wê bîra komê bike.

Mirovê ku bi malbatî bi hevdû re bi komî re dijîn, çendî ku bi girêdana fizyolojikî û biolojikî bi hevdû ve girêdayîna jî, lê wê hin bi hin li ser wê jîyankirinê re wê ben û şêwayên din ên girêdanê wê bi wê re biafirin. Minaq, bi hîs û derûnîyê, bi têkilîdanînên zayendî û civaknasîtîyê û hwd, wê girêdan bi mirov re biafirê. Mirov, di vê çerçoveyê de wê êdî bi şêwayên din wê bê girêdan. Bi demê re wê li ser jîyankirin û ezmûnên jîyankirinê re wê benên derûnî, civaknasî û hwd, wê zêdetirî derkevina li pêş. Di destpêkê de wê kom hemû weke komên malbatî bin. Weke ku çawa ku wê bi kurdan re weke ku wê bi şêwayê aşîrîyê û hwd re wê xwe bide domandin. Aşîrî, wê hertimî bi girêdana bi xwûn û xizmtiyê re wê xwediyê temen bê. Di nava malbatê de hin bi hin dema ku li malbatê endam zêde dibin, wê ev jî bi demê re wê bê temenê afirîna komînê û piştre aşîrtiyê. Ev rewş, her wusa, wê êdî pêşbikevin. Piştre jî, wê li ser wê re tenê têkiliyên têgihiştî ên serdest wê xwe bidina dîyarkirin. Ev şîwayên têkiliyan wê bi demê re wê weke şêwayê têkiliyan ê sereka wê xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku em weke ya serdemên seretayî(´îlkel´) re kifş dikin, wê di nava civatên kurdan de jî wê hertimî wê kalîktî û ankû pîrîtî weke çîneke serdest wê hebe. Ev rewşa civatî, ku piştre bi têgîhiştin û hiş dibê û xwe dide domandin jî, wê weke rewşek giring a vê rengê jîyanê bê. Pîrîtî, wê piştre di nava rengên bawerîyên civatî ên ku wê pêşbikevin jî, wê weke sazîyeka bilind a bi sazûmanî û bi pêşengîyê dike û hertimî serdest a, wê were tefsîr kirin. Di destpêka jîyane komînal a bikomî de wê kom hin bi hin wê biafirin. Piştre jî wê ew kom, xwediyê serokna xweza bin. Ev jî, dapîr û bapîr û ankû mirovên weke wan in. Piştre jî, wê mirovên weke ku ew bihêz in û bi hêzîya xwe derdikevina li pêş wê derkevina li pêş. Ev jî, wê bi sedema parastin û karîna jîyankirin û ankû dana jîyankirinê a bi xwezayê re wê, di temenê wê de bê. Rewşa serdestbûna dapîr û bapîran di nava jîyane komê de wê weke rewşek teybet û giştî a civatî bê. Dapîr û bapîr, bi jîyankirina xwe re wê derkeve li pêş. Ew(´dapîr´ û ´bapîr´), mirovna temen dirêj in. Ew pirr jîyan a û di serê wan de gelek fêr û ezmûnên jîyankirinê hene. Wê ev jî ji wan re bê alikarî ku ew serdest bibin.

Rewşa dapîr û bapîran ku ew weke çînek serdest a civatî na, wê piştre ev rewş di nava pêşketina jîyane civatî a bi komî de wê, were bi têgihiştin kirin jî. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku bawerîyan civate kurd ên pirr kevn û xwediyê dîrokek bi hezaran salan a ên weke êzdatîyê, wê di wê de jî pîr weke dapîr û bapîr, wê bi ´pîrozî´ bina xwediyê mertebeyekê jî. Wê gotina wan newê lê pirsîn. Wê ew hertimî weke hêzek serdest bin. Ku ew ji andamên civatê ên din re bibêjin ku ew herina mirinê jî wê herina mirinê. Ev rewş, heta roja me jî, dinava civate kurd de weke rewşek bi têgînî û pîroz a rûnîştîya. Heta roja me jî, di nava civatê de wê ti kesekî nikarîya ku vê rewşê bike berlêpirsînê û li dijî wê gotinê bibêjê. Mirovê pîr, ku ew dapîr bê û ankû bapîr bê, wê di reng pêşeng û serokekî de bê, wê di reng û şêwayê bawermendekî de bê, wê di reng û şêwayê zane û filosofekî de bê û wê di reng û şêwayê mazinekî gihiştî û

gihayî de bê. Ew hertimî weke yê li pêş rûniştî û ku wê mafê gotina pêşî a bi lêvkirinê wê ya wan bê.

Ev rewşa ku em di şêwayê jîyane mirovên komî ên berî demên şariştaniyê de dibînin, wê piştre jî di nava jîyane şariştaniyê de jî wê pêşbikeve û bi hiş û têgihiştin bibê. Wê ev rewş, weke rewşek teybet bê. Mirovê pîr, weke rastîyek jîyanê a bizane wê hertimî xwediyê pêşengîyek xweza bê.

Mirovê ku ew nû tê dûnyê û zêde ne bi fêr û ezmûn û zanebûn a, di wê rewşê de wê ev mirovê pîr, wê weke mirovê bi fêr, ezmûn û zanebûn bê. Her wusa di vê çerçoveyê de wê derkeve li pêş. Mirovê kal, wê ji wê girseya nezan, bêfêr û bêezmûn re wê bê fêr, ezmûn û zanebûn û wê rêya wan şanî wan bide. Wê herkesek wê li gorî gotina wan wê bi rê ve herê. Wê weke wan bike. Wê weke gotina wan bijî. Ev rewş, wê piştre li berdiclê û firatê, wê bi civate kurd re wê xwe bi hiş bike û bide domandin. Civate kurd, ew teybetîya wê ya ku ew hertimî bixwezayê re dijî û xwediyê jîyanekê ya, wê di vê çerçoveyê de wê êdî xûy û tevgerên xwezayî ên bi vî rengî ku ew berê hebûna, wê di nava wan de jî wê hebin û hebûna xwe bidina domandin.

Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de bawerîya yazdanî a civatên kurd, ku ew li ser wê re wê civatbûnekê bi têgînên hizrî û çandî bi wê êdî wê bi xwe re bidina çêkirin, wê di wê de jî ev rewşên ku em bi şêwayên jîyane seretayî(´îlkel´) re kifş dikin, emê bi wê re jî kifş bikin. Her wusa, wê sazûmanaka bi vê rengê ku ew xwezayê û jîyane xwezayê dike nava xwe de wê bi xwe re pêşbixe û têgihiştin bike.Hişmendîya jîyane civatî, wê di temenê xwe de hiş bihawênê. Dema ku jîyane civatî hişmendiyê bi xwe re bihawênê, wê çaxê kê wê yê ku wê karibê wê hişmendiyê bi fêr û ezmûnên xwe re bide nîşandin bê? Wê ew dapîr û bapîr bin. Di nava jîyane civatî û destpêka pêşketina wê de wê, dapîr û bapîr, wê xwediyê weyn û serokatîyek sereka a bi jîyane civatî re bin.

Pêşketina jîyane civatî, li gorî vê encama ku em bi aqilê xwe digihinê de em, divê ku wê bi wê zanebûna dapîr û bapîran re bide destpêkirin. Divê ku em wê fêr, ezmûn û zanebûna wan ya bi temenê wan re di temenê wê pêşketinê de di destpêkê de hildina li dest. Ev, wê weke aliyekî giring ê ku em divê ku wê, weke aliyekî teybet hildina li dest û wê werina ser ziman bê. Li vir, divê ku mirov wê zanebûna wan bibîr bixin. Ew dapîr û bapîr, weke mirovna ku ew bi temenê xwe re dijîn û dibînin û fêrbin in. Bi wê re wê bina weke mirovna ku ew dibînin ku wê ya rast û ne rast wê çi bibê. Tişta rast û ne rast, wê li gorî lêhatin û lêkirina li pêşveçûnên jîyan mirov a keseyetî û civatî bê. Li vir, wê asta jîyankirina mirov û ya ku mirov wê ji xwe re rast dibînê û mirov dikarê xwe bi wê bide jîyankirin û jîyane xwe bide domandin, wê, weke pîvana wê rastiyê û nerastiyê bê. Di fahmkirina vê de jî wê pîr, weke mirovna temen dirêj ku ew bi ezmûn û cerbkirina bin. Wan bi jîyane xwe re jîyankirina û dîtina. Her wusa bi wê re jî êdî weke ku ew fêr û ankû ezmûn ezmûnkirina. Jîyan kirina. Bi wê re jî, ew ji çi re bi fêde ya û ne bi fêde ya, ew dîtîna û kifşkirina. Heta roja me, gotinaka giring ku ew di nava civatê de dihê gotin heya. Ew jî, zanebûnê didênê aliyekî û ezmûnkirina bi fêrbûna bi jîyankirinê re didênê aliyekî. Ew gotina civate kurd jî ew a ku ew bi vê rengê dibêjin ku "yên ku zêde xwandina bizane na û yan yên ku pirr dîtina bizanebûn in." Ev gotin, wê di demên piştre ên şariştaniyê de wê were gotin. Lê ev gotin, wê tiştekî pirr giring wê ji me re bibêjê. Ev gotin, wê ne gotineka roja me bê. Ev gotin, wê gotineka wê dema ku wê êdî zanebûn pêşbikeve û bihiş bibê û mirov êdî bi wê re zanebûna xwe dinivîsênê, di wê demê de hatîya gotin. Weke gotinaka giringîya fahmkirina ji zanebûnê jî dihênê ser ziman. Lê ji

aliyê din ve jî wê, weke gotinaka ku wê fêrbûn, ezmûn û zanebûn li ser temendirêjehiyê re wê werênê ser ziman. Mirov, dema ku ew zêde dijî, ew fêr dike, biezmûn dike û bi wê bizanebûn dibê. Her timî hewldana çêkirina ahengê di nava mirovê temendirêj ê bi ezmûn û ê piştre ku bidest xwandinê kirî re wê xwestin ku ew were çêkirin. Wê fêrbûn, ezmûnkirin û zanebûna mirov a bidîtina mirov a bi temenê mirov re wê di asta xwandina di asta bilind de wê di nava civate kurd de wê, were hanîn li ser ziman. Ev gotin jî, gotineka vê rewşê ya ku ew bi wê êdî vê rewşê dihênina ser ziman.

Bêgûman, ev rewşa fêrbûna bixwandinê û ya bi dîtina bi temen re, em divê ku hinekî din jî di vê çerçoveyê de li ser wê bisekin in.

Di destpêkên şariştaniyê û pêvajoyên wê yên pêşî de wê, ezmûn û fêrbûn, temenê girtina zaninê bê. Her wusa, bi dîtin, jîyankirinê re wê mirov ezmûnê bike. Bi wê re jî wê fêr bike. Piştre jî wê bi wê re wê zanebûnê bidest bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de têkiliya jîyanê û zanebûnê wê bi jîyankirinê û ezmûnên wê re wê biafirê. Zanebûn, wê di vê çerçoveyê de wê bihiş, wê bikeve jîyane mirovan de. Mirov, wê bi kirinên xwe re wê, wê fêr bibê. Her wusa, wê bi dîtina xwe re wê nas bike. Di nava jîyanê de wê gelek sawal û ajal wê bijîn. Di nava xwezayê wê gelek tişt, sawal, ajal û nebet wê bijîn. Mirov wê van nas bike. Wê ji kîjan sawalê sûdbigirê wê fêrî wê bibê. Wê bibînê ku kîjan ajal bi zirer a. Bi wê re jî wê kifş bike ku kîjan nebet wê weke şînahî, wê baş bê û ne baş bê. Mirov, çendî ku wan fêr dibê, êdî wê bi wan wê bidest jîyankirina jîyane xwe bike. Mirov, vê bi vê rengê bi ezmûn û fêr bike.

Her wusa, fêrbûna bi xûy, tevger, kirin û nêzîkatîyên mirov re wê, derkeve li pêş. Her wusa, mirov wê tiştan bibînê û bi demê re xosletên wan kifş bike. Minaq, dema ku mirov birçîya, divê ku xwarinê bixwe. Dema ku tî ya, divê avê vexwe. Dema ku ew sar û cemidîya, wê li xwe bike. Bi v rengê wê li ser jîyankirin û rewşan re wê, kifş bike. Kifşkirina mirov a di jîyane mirov de wê, bi vê rengê wê bibê. Jîyane mirov, wê di vê çerçoveyê de ji destpêka wê û heta dawiya wê, wê weke pêvajoyek fêrbûnê bê. Mirov, piştî ku fêrî axiftinê bû û zimanê xwe pêşxist û pê de, wê bidest hanîna li ser ziman a serborîya xwe bike. Ev jî, wê bi serê xwe weke şoreşekê bê. Fêrbûna axiftin û nivîsandinê, wê êdî rewşekê din ya biast, rada û pîvan a jîyankirinê bê. Mirov, wê bidest nivîsandina serborîyên xwe bike. Weke ku gûtîyan bi jîyane keyê Urukî Gilgamêş re kir, wê her wusa êdî serborîyên jîyanî wê werina nivîsandin. Ya ku ew tên xwandin, wê ev bin. Ev serborî, wê serorîyên zanînî bin. Her nivîsandin, wê fêrek bê. Her wusa xwandin, wê bi xwe re girtinek bê. Lê mirov, heta ku tê wê astê ku ew bixwênê û di mejiyê xwe de bigirê, wê gelek pêvajoyên demdirêj ên bi fêrbûna bi ezmûnan ji jîyan û xwezayê wê derbas bike.

Heta ku dem werê dema nivîsandin û ji wê xwandinê û ji wê xwandinê girtinê, wê bi meji, laş, rêyên girtinê ên weke gûh, çav û hwd wê pêşveçûnên mazin ên fîzyolojikî wê bibin. Têkiliya dîtina çav, bihîstina gûh û hwd, a bi xêvê re wê zêdetirî bi ast, rada û pîvan bibê. Di çerçoveya rewşa girtina meji de wê, ev rêyên girtina mirovî, wê ew koordînasyona ku bi xêvê re çê dikin, wê xwe li gorî wê amede bike. Her wusa, wê hêst û hîsa bi xwandinê a girtinê, wê zêdetirî wê xort bike. Wê mejî û di wê de xêv, wê karibê bi hevdû re di vê çerçoveyê de wê ahengekê çê bikin. Bi vê rengê, dema ku mejî xwand, wê bi wê xwandinê re wê mejî bi xêvê re wê girtinê bike. Her wusa, mejî wê li ser hişkirinê re wê êdî pêşbikeve. Bi xêvê re wê, rewşên weke jiberkirinê û hwd, wê pêşbikevin. Ev rewş, wê temenê xwandin û girtina ji wê, wê biafirênin. Li vir, rewşa

jiberkirinê a bi xwandinê re teybet a. Afrînerîyek bi wê re heya. Xêv, wê afrînerîyê, bi wê re bikardihênê. Her wusa, her girtina mirov a ku ne weke ya ji wê hatina girtinê û ankû ew binetera ku hatî xwandin a, wê hinekî bi vê rewşa afirandina xêvê ve girêdayî bê.

Hişmendîya li ser ziman û ankû gotinên ziman re ku wê pêşbikeve, wê di vê çerçoveyê de wê hin bi hin derkeve li pêş. Mejî, di vê çerçoveyê de wê bi xwandinê re wê razberîyek şenber a xwe ya xwemalî wê biafirênê. Ji xwandinê girtin, hinekî jî wê bi şêwayê razberîyek şenber bê. Lê ev rewşa bi razberîya şenberî ku ew dibê, wê li ser dîtin û ezmûnan re wê bi şêwayê şenberîya razberî ku ew di afirê re bê. Bi xwandinê re wê mejî, fêrî wê hizra razber bi şenber bike bibê. Lê bi dîtina bi ezmûnê re wê mejî, bi rewşa ku wê dît re wê di mejî de wê bi wêne bike ji ya ku dît û wê ew dîtina wê, weke dîmenekê wê dimejî de wê hebûna xwe bide dîyar kirin.

Fêra bi ezmûna bi xwandinê re ya, wê di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Lê fêra bi ezmûnê fêrkirinê wê bi jîyankirinê bê. Bi xwandinê, wê ew pêwîstîya jîyankirinê, wê li wê ew nebê. Lê ya jîyankirinê wê bi ezmûnkirinê re bê. Kal û pîrên ku ew temendirêj bûn, wan dijîya, bi wê re ezmûn dibûn û bi wê re fêr dibûn û piştre jî bi wê re digihiştin zanebûnê.

Kal û pîr, di her civatê de wê weke andamên wê civatê ên pîr wê hebin. Ankû, mirov dikarê bibêjê ku wê weke andamên wê civatê ên temen dirêj wê hebin. Pêvajoyên jîyanê ên ku ew dijîn û her wusa ezmûnên ku ew bi xwe re çê dikin, wê wan li wê jîyane civate wan jî serdest bike. Di vê çerçoveyê de wê ew jî weke beşek civatê ên ku bi zanebûna xwe serdest wê derkevina li holê.

Di serdemên berî demên şariştaniyê de wê kombûn ji nû ve bibê. Di wan deman wê de mirovê herî bihêz, bav û dê wê weke yên serdest wê hebin. Her wusa, dayik, wê di nava civatê de wê weke yek afrîner wê serdest wê hebe. Em dema ku li xate pêşketina civatî dinerin, em dibînin ku wê di demên destpêkê ên şariştaniyê û ankû berê wê, wê fîgûrên jinê ên serdest û ankû weke serok wê derkevina li pêş. Her wusa, ji pêvajoyên destpka şariştaniyê, weke fîgûrna jinan ku ew li ser taxt rûniştî na û ku weke hêkel bi kevir hatina çêkirin mirov dibînê. Ev fîgûr, di derbarê jîyane demên bûhûrî ên civatî ya destpêkê de wê hizirna bide me.

Ev tiştekî wê bi xwe re bi têgînî bi me re bide çêkirin, ev jî ew a ku wê bê dîtin ku civatîtî, wê li dora jin, dê û bav di çerçoveya weke sazîyek civatî pêşketina malbatê re wê pêşbikeve. Malbat, temenê wê, wê hin bi hin were avêtin. Malbat, wê li dora dayikê û zarokên wê û bi wê re bi hebûna bav re wê xwe bide dîyarkirin. Dê bi zarokên xwe re wê li cihekê bê niştecih. Wê bicih bibê. Derfeta wê, zêde ji gerîn û geryanê re namênê. Bi heman rengî, çendî ku mêr derfeta wî ya gerîn û geryanê hebê jî, ew jî wê bi malbatê ve hin bi hin were girêdan. Di hundurê malbatê de wê ne tenê dê û zarok, weke yên ku ew bicih in wê hebin. Her wusa dapîra pîr û bapîrê pîr jî wê hebe. Ew jî, bi heman rengî wê hebin. Pîrîtî, çendî ku ji aliyê temen dirêjîya xwe ve bizanebûn û serdestiyê ji mirov re dihênê, biheman rengî, bi di nava wan salan de çûyînê re wê ew jî, wê kal bibê. Kalbûn, wê sînorê tevgerbûnê û aktivbûnê kêm bike. Mirov, wê nikaribê wusa zêde bi aktiv bê. Bo vê yekê, mirov, mihtacî bi wê dibînê ku mirov xwe li deverekê bicih bike û di aramiyê de bijî. Ev rewş, wê zêdetirî, ji aliyê bûna niştecih ve wê mirov, amede bike. Her wusa, di vê dema mirov a pîrbûnê de wê hingî zarok û nêwîyên mirovê kal wê li dora wan bin. Bi vê rengê, wê bina malbatek mazin. Ev rewşên jîyanî, wê zêdetirî li gorî

rewş û jîyane xwezayê bin. Çendî ku mirov, di nava jîyane xwezayê de wê, bigihijê derfetên xwe jîyankirinê, wê bi heman rengî wê gelek rewş û telûkeyên ku wê ji jîyane mirov re xaterîyê biafirênin, wê derkevina li holê. Ev jî, wê ji aliyekî din ve wê mirov, bike rewş û pozisyonekê de. Ev rewş û pozisyon, wê rewş û pozisyona parastina jîyane xwe bê. Çendî ku mirov karîya xwe biparêzê ji wan xaterîyên ku ew rastî wan tê, wê karibê jîyane xwe bide domandin. Ev jî, wê ib nasîna xwezayê re wê bibê. Fahmkirina sawal, ajal û her wusa her cûre zindiyên ku ew di wê demê de li dora jîyane mirov dijîn, wê temenekî xwe parastinê jî ji mirov re bide çêkirin û afirandin. Zanebûn, di vê çerçoveyê de wê ji aliyekî ve serdestîya mirov li xwezayê çêbike û ji aliyekî ve jî wê temenê xwe parastina mirov biafirênê. Tişta ku mirov zanibê ku ew telûkeya û wê xaterîyê ji jîyane mirov re çê bike, her wusa ew tişt, wê bo mirov bê weke tişta ku mirov xwe ji wê dûr bigirê bê.

Têgîna xweparastinê wê bo mirov weke têgînek xwezayî a jîyanî bê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî bi wê re werênê ser ziman ku mirov wê têgîna xwe parastinê bi pêvajoyên jîyankirina xwe re bidest dixe. Mirovê kal, vê dizanê. Bo vê yekê, ew hertimî di rênîşandinê de wê bo mirovên li dora xwe wê ew weke serok bê. Wê gotina wî kifşkar bê.

Ev rewşên ku bi jîyane xwezayî a di destpêka kombûna civatkî de ku ew dibin, wê piştre di xate pêşketina jîyane civatî a li kurdistanê de wê xwe bidna domandin. Di vê çerçoveyê de teybetî û xosletên civate kurd ên bi jîyane wan ya bixwezayê re di vê çerçoveyê de wê têgînekê bi me re bidiina çêkirin ku ew ji serdemên berî ppêvajoyên şariştaniyê û heta yên piştre xwe di dewama hevdû de dana domandin in. Em dikarin, wan pêvajoyên pêşî ên bi jîyane xwezayê ên civate kurd, weke pêvajoyên seretayî(´îlkel´) jî werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de civate kurd, wê nûmîneyek baş bê me ku em bi wê di xatekê de wê pêvajoyê hildina li dest.

Civate kurd, heta ku ew dihê roja me jî, wê bi pirrdîmenî wê hebûna xwe bide domandin û nîşandin. Ev pirrdîmenîya wê, bi mejûya wê re afirîya. Dîroka wê, di vê çerçoveyê de wê xwediyê awayekî pêşketinê bin. Di xate civatê de wê, gelek jîyankirin wê werina jîyankirin. Her wusa, bi demê re wê ew jîyankirin, wê di mejiyê mirovan de wê weke xal û ankû nûqtayên xwe lê girtinê ên jîyane mirov din jî bin. Bi demê re ew vegotinn ´mîtîk´ ku wê biafirin û wê li dora wan, hin bi hin zanebûn di mejiyê mirovan de ku wê biafirin, wê li ser serborî û jîyankirina jîyane wan mirovên kal ên berê wan bê. Di vê çerçoveyê de em dikarin pêvajoya afirandina mîtan û ankû afêrendêrîyên mîtolojikî, li sê-pêvajoyan beş bikin. Pêvajoya pêşî a destpêkê, pêvajoya navîn a pêşketinê û bi hişkirinêê û pêvajoya dawî a biaqilkirinê ya. Di pêvajoya pêşî de wê weke ku em bi totemismê û anamîsmê re kifş dikin, wê bi çêkirina wan re wê bibin. Wê di vê demê de wê dager werina afirandin. Mejî, wê li dora wan xwe bigirê. Her wusa, wê hin bi hin ew kombûna li dora hevdû, wê vegerihê weke kombûna li dora wan dager û ankû totemên ku hatina çêkirin. Ev, wê bi pêvajoyî heta serdemên piştre ên bi pêşketina aqil ku wê di wan de wê êdî hebûna ´xwûdê´ wê were kifşkirin û pêşxistin, wê heta wan dem û serdeman wê hebûna xwe bide domandin. Li ser jîyane mirovên pîr û kal re wê zanebûn li navê ´xwûdê´ ku ew dihê kirin wê were baxş kirin.

Çendî ku ew demên destpêkê bi vî rengî pêş dikevin, wê gelek xwûdanên piçûk û mazin wê kifş bikin. Di aslê xwe de em, divê ku wê hebûna wan xwûdanan weke xêveka ku wê hertimî di jîyanê de û li ser hiş û aqil re ku wê bi xwe re bigirê jî em dikarin

werênina ser ziman. Êdî wê li ser wê re wê civatîtî li dora dager û têgînan wê bidest pêşketina xwe bikin. Ew kal û pîrên ku wê di serdemên pêşî de bi aqilê xwe û serborîyên xwe li pêş bin, wê di vê demê de jî weke ku em di nava civate kurd de dibînin, wê li pêş bin û wê vê vecarê wê weke şîrovevanna wan dager û têgînan wê bierkî wê derkevina li holê. Pîr û kal, her wusa wê çawa ku weke şîrovevanên wan dager û têgînan bin, piştre wê weke oldar û ankû şêwirmend, wê bi weyn û erk derkevina li pêşîya wê koma ku ew di nava wê de na. Ev pêvajoya ku wê kal û pîr bi vê rengê wê derkevina li pêş, wê weke pêvajoyek destpêkê a civatî bê. Hin bi hin civatîtî pêş dikeve. Pêvajoyên pêşî ên kombûna civatî, wê li ser temenê aşîr û bi wê re malbatîtîyê bin. Mirovên ku ew bi bendê xizmbûnê û ankû xwûnê ku ew bi hevdû ve girêdayîna. Pêvajoyên ku wê li ser van rewşên jîyankirina bi komî re wê derbas bibin, wê hin bi hin wê ezmûn û fêrê bi mirov re di mejiyê mirov de wê, bidê çêkirin. Ev pêvajoya pêşketina ezmûn û fêran wê heta dema pêşketina hiş, piştre aqil û bi wê re jî pêşxistina nivîsandin û xwandinê jî wê herê. Mirovê pêşî, ew dagerên ku çêkrina ji xwe re wê wan biwate bike. Li ser wê watekirinê kirinê re wê ji aliyekî ve wê temenê pêşketina nivîsandinê û xîzkirinê jî wê bixwe re di mejiyê xwe de biafirênê. Biwate kirin, wê di vê çerçoveyê de wê pêvajoya pêşî a vê pêvajoyê û pêşketina wê bê. Ev pêvajo, wê weke pêvajoyna ku wê li ser ezmûn û fêrên jîyanî re ku wê bimeşê bê.Dager, piştre li ser wan hişkirin û piştre aqil û şêwayên aqil wê pêşbikeve. Mirov, dema ku wê ji destpêka wê hilde li dest, wê li ser navaroka aqil re wê şêwayê metafîzîka aqil jî wê bi pêvajoyên pêşketina wê re wê xwe bide pêşxistin.

Aqil, wê temenê pêşketina reng civatîtîya ku wê ew civakçya şariştanî bê. Di vê çerçoveyê de aqil, wê bi serê xwe bi hebûna xwe re wê destpêka pêvajoyekê bê. Bi wê re jî wê bi serdestbûna wê re wê wê ev pêvajoyê evreyên xwe yên piştre ên bi pêşketina xwe re bi pêşketina civatîtîyê re wê bijî. Pêvajoyên piştre ên şariştaniyê, ku em bidest hildana li dest a wan bikin, em divê ku wê bi pêvajoyên şariştaniyê re werênê ser ziman. Ez li vir, divê ku vê yekê binxat bikin ku wê pêşî pêvajoya xalkîtîyê û xalknasiya wê were û bijî. Piştre jî, wê civaknasî û civaketîya wê, were û bijî.

Piştî ku pêvajoyên aqil û bi zanebûnê re wê destpê bikin, wê bi aqil re wê jîyan were adilandin. Ev pêvajoya biaqil adilandina jîyanê, wê pêvajoya jîyane bikomî a pirr piştre bê. Her wusa, mirov wê bi hiş li jîyanê bihizirê. Rastîya hiş û têkiliya wê ya bi fahmkirina jîyanê re wê bi serê xwe weke mijareka ku wê were hildan li dest bê. Her wusa, mirov wê çawa fahm bike û ankû bihiş lê binerê. Ankû, mirov wê çawa bi hiş werênê ser ziman. Dîtin û nerîn, wê li vir, temenê cihrengîyên ji hevdû cuda bin.

Piştî ku aqil pêşket û pê de, wê mijara fahmkirinaka zelal a di derbarê jîyanê de wê xwe bide hanîn li ser ziman. Gelek mirovên ku wê bihizirin ên weke Mîtra û ankû Piştre Zerdeşt, wê li ser vê rewşê wê bihizirin. Wê bixwezin ku wê jîyane ku heya û hebûna xwe dide domandin fahm bikin. ´Jîyane dervî mirov û ankû dervî dîtin û nerîna mirov ku heya´, wê weke hizrekê xwe di mejiyê mirov de werênê ser ziman.

Li vir, ez divê ku vê yekê werênima ser ziman ku wê di ehengîya jîyanê de wê fahmkirin, hertimî wê car bi car temenê aramiyê jî bê. Lê ev jî wê hertimî weke mijaraka fahmkirinê bê, ku ya ku mirov ew fahmkiriya, ew çi ya, wê ew jî, weke mijaraka hizirkirinê bê. Ya ku mirov weke ji jîyanê fahmkiriya, çendî wê rewşa ku me ew aqil bi wê girtiya wê dihênê ser ziman weke hebûna wê û ankû weke ku ew rewş

bûya. Aqil, wê hertimî afrînerîya wê jî di nava wê rewşa jîyanê de wê xwediyê kifşkirinekê bê.

Di jîyanê de wê hertimî, rastîyek wê hebe. Em divê ku wê rastiyê pêşî kifş bikin û herê bikin. Dema ku mirov ev ne kir, di destpêkê de ew rastîya bi jîyanê re kifşnekir, wê hingî mirov ji rastiya jîyanê dûr bikeve. Ev, wê di nêzîkatîya mirovî a di nava jîyanê civatî de jî wê wusa bê. Di serî de li vir, divê ku mirov rastîya jîyanê "weke xwe" wê kifş bike û werênê ser ziman. Xate jîyanê a civatî, wê di dema jîyane civatî de w, ji ber ne rast fahmkirinên rastiyên jîyanî, wê rasti mudaheleyan wê were û heta ku di ancama wan mudahaleyan de wê gelek civatên dîrokî werina ji dîrokê birin û tûnakirin. Şer û pevçûnên ku bûna ên bo desthilatdarîyê, mirov dikarê rastrast weke şerên ku wê hebûna civatên dîrokê wê ji xwe re bikina armanc bin, werênê ser ziman. Bi wê re jî, mirov dikarê wan şeran fahm bike.

Di serî de şer û pevçûn, weke muhdaleyeka li jîyane civatî ya. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastiya wê werênê ser ziman. Jîyane civatî, her wusa, li vir, mirov divê ku wê bi teybetî hilde li dest. Em dema ku jîyane civatê bi rastîya wê re fahm nekin, emê hingî nikaribin bi wê rastiya wê re nêzîkatîyê li wê bikin. Hêsta desthilatdarîyê a bi serdestîyê re ku diafirê, ew ti carî mirov nikarê bi hebûna civatê re werênê ser ziman. Her wusa, ew hêsteka ku ew bihêz bûya û wê mudahaleyê li jîyane civatê bike bê. Pêvajoyên jîyane civatî ên di dema pêvajoyên şariştaniyê de ku wê biafirin, wê hertimî di vê çerçoveyê de wê rastî hêrîşên desthilatdarîyê wê werin. Pirsgirêka civatan û desthilatdarîyan a bi hevdû re wê weke pirsgirêkek dayimî a demên şariştanî bê. Mirov, dikarê vê pirsgirêkê ji aliyê ramyarî, rêveberî, dadî û hwd re werênê ser ziman. Emê li jêr bahse adilandina ku desthilatdarî li ser gotina ´dadê´ re dikin, emê li ser wê bisekin in. Lê li vir, em hinekî divê ku bi gotinekê jî werênina ser ziman. Çendî ku wê navaroka gotina dadê, bi ya haqanîyetê û her wusa bi têgîna ´wekheviyê´ re wê bê kirin ku werê hanîn li ser ziman jî, lê di aslê xwe de wê ev ji aliyê rastîya civatan ve ku mirov li wê dinerê, mirov wê bibînê ku wê ne wusa bê. Dad bixwe, weke hêzek di destê desthilatdarîyan de ya di serdemên şariştaniyan de. Bi wê re wê mudahaleyan li jîyane civatan bikin. Her wusa, wê mudahaleyê li pêşketina wan bikin. Di vê çerçoveyê de di serdemên şariştaniyê ên bi aqilê felsefeyê de pêşketina zagon û ´dada pozitiv´, wê hinekî vê rastiyê baştirîn werênê ser ziman. Civak, di bin destê desthilatdarîyê de wê ne weke xwe bijî. W weke desthilatdarîyê ku ew dixwezê wê bijî. Ev jî, wê temenê pirsgirêkên civakî ên navxweyî ku wê bi wê re wê derkevin bin. Di serî de pirsgirêk, kengî bi civakê re rûdidin? Kengî ku mudahele li xwezaya civakê û pêşketina wê bûn, wê hingî pirsgirêk bo civatê biafirê. Hêzê di destê desthilatdarîyê de a weke ya bi pergale dadê, pergale perwerde, bi hêzên weke ên leşkerî û hwd re wê, bo ´adilandina´ civakê li gorî xwestekên desthilatdar wê werina bikarhanîn. Têgîna dad û haqaniyet û hwd, bina weke têgînna ku wê bina weke maske ji vê rastîya desthilatdarîyê re.

Em dema ku li serdemên şariştaniyê ên bi pêşketina civakê e li wan dinerin, wê her wusa wusa bê. Pêşketina aqil, wê ji gelek aliyan ve bo kirina xizmeta vê rastîya desthilatdarîyê de wê, were pêşxistin. Her wusa, têgîna jîyane xweza û ya jîyane ´pozitiv´ wê li ser kifşkirinên bi navaroka aqil re wê werina kirin, wê divê çerçoveyê de wê, xwedîyê hemwateyê bin.Her wusa li vir, gotina ´pozitiv ku me bi gotina ´jîyane pozitiv´ re hanî ser ziman, di rengê ´dada pozitiv´ a serdemê de em li vir bikardihênin. Her wusa, ev têgîna pozitiviyê, di çerçoveya kifşkirina ji derve li jîyanê, em

bikardihênin. Xwezaya jîyanê û pêşveçûnên di nava wê de ku wê bi pêşketinî derkevina li holê, wê hertimî, bi wan nêzîkatîyên kifşkar ên li ser aqil re wê bikevina nava nakokî û ne wekheviyê de.

Li vir, bi heman rengî bi vê rengê gotina pozitiv re mirov dikarê ´gotina civake pozitiv´ jî biafirênê û werênê ser ziman. Her wusa, ev rengê pêşketina civatê ku ew a ku ew li ser têgînekê re ku ew di demekê de her cûre amûrên desthilatdarî dihên bikarhanîn û ew dihê afirandin a. Wê ev rengê pêşketina civatî, çendî ku wê kalibê civateka xweza û dîrokî jî wê li wê were esas girtin jî, wê ew ne civakek dîrokî û xwezayî bê. Her wusa, di serdema me de wê, bi vê rengî pêşketinek were çêkirin û wê gelek civakên dîrokî bi rêbazên weke ên bişavtinê û ankû ´asimlasyonê´ re wê di nava wê civake ku hatî çêkirin de wê werina halandin. Ankû, em dikarin bibêjin ku ew dihêne tûnakirin. Di roja me de ew pirsgirêka civakî ku em bahse wê dikin, wê bi pirranî ji vê aliyê ve wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, em li vir, dema ku bi awayekî di xate pêşketina dîrokê re li mejûya bûhûrî dinerîn bi jîyane civatî û ya keseyetî û hwd re dinerin, em dinerin ku wê di vê çerçoveyê de pirsgirêk pirr zêde wê were dîtin. Dema ku mirov ji vê aliyê ve dinerê, ya ku mirov dibînê, ew a ku weke ku aqil û pêşketinên aqil ên bi zanebûnê re jî weke ku hatina xistin xizmeta wê tûnakirina civatên dîrokî de.

Em li vir, divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku civate dîrokî, di roja me de ku ev serdem weke serdemek ´ hemdem´ û ankû ´nûjen´ jî dihê hanîn li ser ziman, herî zêde wê ev gotin bina weke goristana civakên dîrokî. Heta ku wê dem û serdem were vê dem û serdema me, wê bi dehan çand û ziman bi hebûna wan ya civakî re wê ji dîrokê herin û ankû werina birin. Raportên NY(´neteweyên yekbûyî´)´yî ên û ankû UNECO ên di derbarê ziman, çand û civakên ji dîrokê çûna de jî wê vê rastiyê bi gotinên serdema me, wê piştrast bike.

Em dema ku li dîroka civakê dinerin, em dibînin ku wê ji serdemên destpêka pêvajoyên şariştaniyê ve wê weke temenê pirsgirêkên civakên dîrokî bê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku civakên dîrokî, pirranîya wan, weke ku hatina halandin û her wusa li ser wê re civakna ´nû´ weke ku hatina halandin. Di roja me de ew destûrên bingihînîn ên rejim û ankû netewên vê serdemê ku hatina afirandin, wê tenê xizmetê ji vê rastiyê re wê bikin. Di vê çerçoveyê de wê ya ku wê were esasgirtin wê ne civat lê wê desthilatdar û bîrdozîya wê bê. Bo vê yekê ya ku wê hebûna desthilatdarîyê di roja me de wê li ser hebûna civakan re wê were girtin. Ev jî, weke ´nirxeke´ demê a şariştanî hatîya pêşxistin. Ev nêzîkatî, bi xwe re wê bi demê re wê ji şêwayên metingerîyê bigra û heta ku digihijê gelek şêwayên din ên bi vî rengî ên rêveberî û hwd, wê li ser serê civatan biafirênê û bide pêşxistin. Li vir, em divê ku vê yekê binxat bikin û bibêjin ku wê pirsgirêka civakan di destpêka avakirina rêveberî û ankû desthilatdarîyan de wê xwe bide dîyarkirin. Ji wê demê û pê de wê pêşbikeve û mazin bibê. Her wusa bi wê re jî divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê bi bûhûrîna demê re wê ew pirsgirêk, wê zêdetir û maztir bibê. Piştre jî wê pirsgirêk, were wê astê ku ew bixwe were wê astê ku ew bikeve dijberîya wê civake ku ew li ser serê wê bixwe ya. Bi wê re wê civak jî wê dijraberiyê li hemberî wê rêveberiyê wê pêşbixe bo ku ew ne li gorî rastîya wê ya. Yanî, ew rêveberî ber ku ew li hemberî hebûna wê ya.

Civak, weke rastîyek dîrokî, dema ku mirov li ser wê dihizirê, her wusa mirov bi mejûya wê re kifş dike ku civak, bi demê re pêvajoyên pêşketinê dijî. Pêvajoyên serdemên civakê ên berî dema pêşketina şariştaniyê, wê pêvajoyna pêşîya pêşketina

pêvajoyên şariştaniyê na. Di van deman de wê kombûna mirovan wê, bibê, pêşketinê û pêvajoyên jîyanî derbas bike. Bi van pêvajoyan re wê ezmûn û fêr biafirê.

Di nava jîyane komî a ku pêşkeve de wê ew aşîrên hin bi hin wê di temenê de wê pêşbikevin, wê di nava wê de wê hin bi hin mirov wê biafirê. Malbat, dema ku ew diafirê, her wusa, ew aîdîyeta ku wê bi we re wê biafirê. Ev aîdîyeta malê, wê bi şêwayekî xwe yê din, wê di temenê aşîrîtîyê de wê werênê ser ziman. Mirov, çawa wê xwe aîdî wê jîyane bike û wusa hîs bike, wê malbat, di vê çerçoveyê de wê pirr zêde wê fêrker bê. Fêrbûnên malbatî, wê di vê çerçoveyê de giring bin ku mirov wan weke beşek temenî di nava şîroveya xwe ya li ser civakê de wê werênê ser ziman.

Li vir, em divê ku vê yekê werênê ser ziman, fahmkirina malbatê û pêvajoyên wê yên pêşketinê, wê ji aliyekî ve wê bina alikar ji fahmkirina mirov a ji aliyê civakê ve jî. Malbat, wê di vê çerçoveyê de wê bi pêşketina pêvajoyên xwe re wê hêst, hîs û hiş biafirênê. Ew hêst û hîsa malbatê wê di temenê girêdana mirov wê li wê jî bê. Girêdana mirov a bi malbatê ve wê ji aliyên weke hêstî, hîssî, hişmendî û her wusa biolojikî ve jî wê bibê. Malbat, bi van girêdanên xwe ve wê weke mene bingihînî a civatê jî bê. her mirov, wê bixwe aîdî malbatekê bê û xwe aîdî wê hîs bike. Bi wê re jî wê di vê çerçoveyê de wê bi hêst û hêstîyar bê. Wê bi hîs û hîsîyar bê. Wê bi hiş û hişiyar bê.

Mirov û malbat, têkiliya wan bi hevdû re wê rengê pêşketina civatî bi xwe re wê bi bandûr bike. Weke ku çawa malbat wê mene bingihînî a civatê bê, bi heman rengî wê mirov jî wê di wê çerçoveyê de wê xwediyê wate û rastiyekê bê. Girêdana mirov a bi malbatê ve wê, bi kifşkirinên wê ên di vê warê de wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, di nava malbatê de wê hin bi hin wê, mirov bi keseyetîya xwe re wê derkevina li pêş. Keseyetîya dê, keseyetîya bav, keseyetîya kûr, keseyetîya kêçê, keseyetîya mam, keseyetîya metikê û hwd, bi vê rengê wê li dûv hevdû wê pêşbikevin û wê derkevina li holê. Ev şêwayên salixkirina keseyetîyê, wê ji aliyekî ve wê temenê girêdana malbatan û ankû andamên malbatan a bi hevdû ve jî wê biafirênê. Di vê çerçoveyê de wê naqşaya malbatê li dûv hevdû, wê derkeve li holê. Naqşaya malbatê mirov û malbatê, mirov dikarê bi hevdû re ji du aliyan ve wê fahm bike. Aliyek wê bi herikîna dîrokê a bi ber roja me ve bê. Aliyekî din jî, wê di wê dema ku mirov di wê de dijî û bi rewşa têkiliyên xwe yên malbatî ên ku ew heya re wê were ser ziman. Di wê dema malbatê de wê mirov, aîdî malbatê bê. Wê her wusa bi wî û ankû wê re wê andamên din ên malbatê wê hebin. Wê bi wan re hevnasînê bike.

Keseyetîya ku wê mirov bi xwe re biafirênê, wê di vê demê de wê wê bi têkiliyên xwe yên li dora xwe re wê navenda xwe ya civakî û civaknasî wê bi wê re wê biafirênê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê naqşaya malbatê ya demê wê bi wê re wê xwe bide dîyarkirin. Naqşaya malbatê a demî ku rengê firehbûna wê re xwe dide nîşandin, wê rengê yê wê yê malbatî bide dîyarkirin. Mazin û ankû piçûk, hindik-andam û ankû pirr-endam û hwd.Bi vê rengê wê xwe werênê ser ziman. Civak, wê di vê demê de wê bi têkiliyên xwe yê bi firehî re wê, were ser ziman. Çendî ev malbatek fireh û mazin a wê were ser ziman. Dema ku mirov bi dîrokê re jî bahse wê bike, ew naqşaya wê ya bi dirêjehîya malbatê a mejûya wê re wê xwe werênê ser ziman. Her wusa, divê ku mirov bi herikîna malbatê a bi dîroka wê re bi ber roja me ve dirêjehîya wê û bi naqşaya wê ya demî a bi firehiya wê re wê xwe bide dîyarkirin. Malbat, di vê çerçoveyê de wê xwediyê rastiyekê bê. Mirovekî kurd, dema ku bahse kalkên xwe û ankû nefşên malbate xwe ên berî xwe dike, bahse gelek bavikan dike.

Wan li dûv hevdû rêz dike. Ev dirêjiya malbatî a birakendî bi xwe re dihênê ser ziman. Aîdîyeta malbatê wê bi vê rengê bi rengê dirêjîya dîroka wê re wê were ser ziman. Dîroka malbatê, ji aliyê rastîya civakê û pşketina wê ve wê weke rastîyek temen bê. Em dema ku wê baş fahm bikn, emê rastîya civatê jî bi başî fahm bikin.

Em dema ku li ser gotinên ziman re herin, wê hinekî di şîrovekirinê de wê, cûdahî jî wê xwe bide dîyarkirin. Malbat, bi hêst, hîs, hiş û biolojikî ve bi hevdû ve girêdayî ya. Di rastiya malbatê û fahmkirina wê de wê, ev her çar rastîyên bi hêst, hîs, hiş û biolojiya malbatê re wê malbatê werênina ser ziman. Lê dema ku em em bahse rastîya civatê a bi şîrovekirina wê re bikin û hewl bidin ku wê fahm bikin, wê bi hiş re çand û aqil, her wusa bi hîskirinê re xwe aîdî wê civakê hîs kirin û hwd wê derkevina li holê. Kevneşopîyên çandî û hwd ên civatî wê li vir wê li ser gotina civakê re wê hin bi hin wê derkevina li pêş.

Kevneşopî û çand, wê bi civatên dîrokî re wê pirr zêde hebe û li pêş bê. Her wusa, wê zagon û destûrên xwe yên civakî wê bi wê kevneşopîya xwe re wê werênê ser ziman. Kevneşopî, li vir, wê ji gelek aliyan ve bi mejûya civatê a ku ew di hildê li nava xwe re wê giring bê. Em divê ku wê di vê çerçoveyê de wê hildina li dest. Çendî ku em nikarin, civatek dîrokî nikarin bê pêşketina kevneşopîya wê re bi başî fahm bikin, her wusa li ser wê rewşa wê ya dîrokî a kevneşopîkî re nîqaşkirina wê têgîna wê bi gotina ´hemdem´ û ankû ´nûjeniyê´ jî wê ewçendî wê bêwate bê. Nîqaşên bi gotinên weke ´hemdem´ û ´nûjeniyê´ re ku wê li ser kevneşopî, çand, heyîn û kevneşopîya civatek dîrokî ku wê werina kirin, çendî ku wê ji aliyê têgînî ve wê bêwate bin, biheman rengî redkirina nûjenî û hemdemîya civatên dîrokî a her demê jî wê bi heman rengî bêwate bê.

Di sedsale me de gotinên weke ´civake li şûn mayî´ û ankû ´paşverû´ bikarhanîna wan, di aslê xwe de wê, ji aliyekî ve weke şêwayekî hêrîşê jî bê li heyîn û nirxên civatên dîrokî. Gotinên weke ´hemdem´´ û ´nûjen´ û hwd, di roja me de weke şêwayna dayîna herêkirina rejimn roja me jî ya. Têgîna popûlerîteyê, hinekî jî wê vê rastîyê werênê ser ziman.Li vir, em divê ku wê jî werênina ser ziman ku wêke gotinên bi vî rengî bi wan nêzîkatî kirin, wê tenê bi xwe re ne fahmkirinekê bide nîşandin. Ji aliyekî ve jî wê, nîyeta mirov ya baş û ankû xirab bi xwe re werênê ser ziman.

Li vir, em vê yekê jî bi gotina ´civake kurd´ re werênna ser ziman. Civake kurd, weke civakek dîrokî ya pirr kevn a. Dîroka wê bi hezaran salan, heya. Dîroka wê ya bi pêşveçûnên pêşketinên şariştaniyê re wê heta serdemên sûmerîyan wê herin. Her wusa, wê dîroka civake kurd, li ser pergalên wê yên weke bi ´jîyane koçerîyê´ û hwd re wê heta berî serdemên şariştaniyê wê herê. Rastîya jîyane koçerîyê bi pergalî, dema ku mirov wê bike ku fahm bike, mirov wê di vê çerçoveyê de wê weke dîmenekî pêşketî ê jîyanî ku dîroka wê ta serdemên neolîtîkê a dema berî şariştaniyê wê herê. Dema neolîtîkê, mirov dikarê weke demek bûhûrîner a li dem û serdemên şariştaniyê mirov dikarê werênê ser ziman. Di vê demê de wê jîyane bi civatî wê biafirê. Her wusa, zagon û destûrên wê jîyanê wê li gorî ya xwezayê bin, weke ku mirov bi jîyane koçerîyê re dibînin, wê mirov, li gorî xwezayê wê jîyane xwe ava bike. Wê hemû ezmûn û fêrên ku ew bidest dixe, wê di çerçoveya jîyane civatî a bi xwezayê û li gorî rastîya xwezayê bê. Her tişt, wê jixwere û bixwere bê. Wê ti rewşên zêhnî ên weke bi rengî rewîstî û hwd ku alî didina dîyarkirin û ankû pêşîyê digirin wê tûna bin.

Zagonên wê jîyanê wê li gorî pêwîstî û pêwîstînîyên domandina jîyanê bin. Bi wê re jî, wê mirov li gorî xwe û pêdivîya xwe wê ji xwezayê wê ancam bigirê. Bi alikarîya bi

hevdû re wê, jîyane xwe de bidina domandin. Di vê çerçoveyê de wê rewşa civatek vekirî a biminaq wê bi rengê pêşketina civatî a vê demê re wê xwe bide nîşandin û dîyarkirin. Civate neolîtîk, di aslê xwe de wê di vê çerçoveyê de wê bi xoslet û teybetmendiyên civatek vekirî wê bijî. Çendî ku civat, ji xwezayê û jîyankirin û têkiliya bi hevdû re vekirîya, wê bi xosletên civatek vekirî bê. Di aslê xwe de piştî serdemên neolîtîkê, dema ku mirov di bûhûrîna dema şariştaniyê û pêvajoyên wê dijîn, weke ku çawa jîyan û mejî li xwezayê tê girtin, wê bi heman rengî bi xosletên civatên girtî wê bijî. Ji hevdû re girtîbûn, wê temenê pevçûnên civatî ên piştre ku wê bi hevdû re rûbidin jî bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de girtîbûn, di aslê xwe de bi pêşketina aqil û weke artarnatifek xwezayî bi karhanîna aqil û bi erk kirina wê, wê rastîya civate kurdî bi xwe re wê bide afirandin. Rengên têgînên rewîstî û hwd, li vir, divê ku mirov ji bîrnekê û werênê ser ziman ku wê bi demê re wê bi zagon û destûrên navaroka xwe re wê, jîyanê bi aliyekî de li gorî xwe bidina pêşxistin. Ev bi aliyekî pêşxistin, wê di aslê xwe de rastîya xosletên civake girtî jî bi xwe re werênê ser ziman. Ev rewş, di nava civate kurd re ya ku mirov bi wê re dibînê, ew a ku weke ku bi jîyane wê ya xwezayî re wê jîyane koçerîyê, bi zagon û destûrên xwe yên jîyanî ên weke ku ji dema neolîtîkê mana re wê xwediyê teybetîyên civate vekirî bê. Her wusa, li kurdistanê dema ku bahse jîyane koçerîyê dihê kirin, bahse lingê wê yê bi ´jîyane deştê´ re dihê kirin ku ev lingê şariştanbûyî ya. Lingê wê yê duyem jî wê bi ´jîyane zozana´ re wê were li holê ku ev jî jîyane ku dervî şariştaniyê maya û bi wê re dem bi dem weke ku bi pêşketina civate kurd a jîyane koçerîyê re jî hatîya dîtin bi jîyane şariştaniyê re bi nakokî jîya ya heta roja me.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku li kurdistanê jîyane şariştanî, di vê çerçoveyê de wê xwediyê cihêrenginiyekê bê. Em zêde nikarin bi zagon û destûrên şariştaniyê ên ku ew weke ast, rada û pîvan di roja me de dihênê ser ziman, bi wan bi tenê xate pêşketina jîyane civatî a li kurdistanê fahm bikin û wê werênina ser ziman. Li vir, dema ku em wê bikin, wê hertimî kêmesîyek di fahmkirin û bi wê re di hanîna li ser ziman de wê xwe bide dîyarkirin. Weke ku me di destpêka mijarê de jî hanî ser ziman, rengê pêşketin û pêşveçûna civakîyê li kurdistanê wê pirr dîmenî bê. Her wusa, hem bi dîrokê û dirêjehiya wê re ew pirrdîmenîtî heya û hem jî bi wê firehîya wê ya demê re mirov rastî wê rastîya pirrdîmenîtîyê bi wê re dihê. Her wusa, ev rewş, wê weke minaqekê bê ji pêşveçûnên olî û bawerî jî li kurdistanê. Piştî pêvajoyên şariştaniyê, wê di nava civate kurd re wê, pirr zêde rengên ji hevdû cuda ên bi bawerî wê derkevin. Her rengekê ol û bawerîyî ku wê nêzîkatî li civakê kirîya, ji aliyekî ve kirîya. Bi vê rengê, tenê di roja me de jî, bi rengê firehiya wê ya demî re bawerîyên civatî ên kurdî û civate kurd, wê weke êzdayîtîyê, yarsanitî, şebekîtîyê, elewîtîyê, zerdeştitiyê, misilmantiyê û hwd re wê xwe bide dîyarkirin. Bi wê re jî wê gelek şîrove û têgînên hizbî û mezhebî ên di çerçoveyê de ku ew jî bi wê ast, rada û pîvanê pêşketina wê hebin. Di çerçoveya rastîya pêşketina civatîtîyê de ku mirov, mezhebîtîyê hilde li dest mirov wê wê baş fahm bike ku weke darek ku ew hertimî li wê çiqil lê zêde dibin û her çiqil bi rengekî xwe û şîroveya xwe dihênê ser ziman, wê bi wê rengî bi rengên pêşketin û pêşveçûnên nû re wê xwe bide nîşandin û dîyarkirin.

Civate kurd a roja me, ku ew hê bi koka xwe ya dîrokî re dijî, wê ji aliyekî ve xosletên civatek girtî bide nîşandin û wê ji aliyekî din ve jî wê xosletên civatek vekirî wê bi xwe re bide nîşandin û dîyarkirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê, weke civakek bi

pirrdîmenî ku ew pêş dikeve bê. Di aslê xwe de ev rewş, wê hertimî dem bi dem weke ku wê di serdema me de were dîtin, dema ku wê ji aliyê xosletîyên civate girtî ve li wê nêzîkatî were kirin, wê aliyê wê yê din wê pirsgirêk ji wê re xwe bidina dîyarkirin. Bi heman rengî jî wê, dema ku wê ji aliyê xosletîyên civate vekirî ve jî li wê nêzîkatî were kirin, wê pirsgirêk bo aliyekî din, were çêkirin. Ber ku civate kurd, bi xwe re ew nêzîkatîya xwe di van demên dawî de neda dîyarkirin û hertimî rejimên herêmê ên roja me, bi qalibên xwe çûna bi ser wê de wê, ev bê temenê pirsgirêkên dîrokî ên civatî jî bo wê. Hewldana kirina civatê di qalibekî de wê, bi bermeneyên weke bişavtinê û hwd bibê. Ev jî wê dem bi dem qûsandinê li ser pêşketin û pêşveçûna civakê bide çêkirin. Civak, weke sipîndareka ku ew di nava xwe de xwediyê pirr çiqil û aliyan a. Her wusa, di vê çerçoveyê de mirov nikarê tenê bi aliyekî, nêzîkatîyekê û her wusa ji rexekî ve nêzîkî wê bibê. Em weke ezmûneka civate kurd jî dikarin vê yekê werênina ser ziman, ya ku ew dihê dîtin ew a ku em dema ku ji aliyekî ve nêzîkî civate kurd dibîn, em di nêzîkatîyekê û tenê ji aliyekî ve nêzîkbûn û ankû bi qalibên pêşdîtinî nêzîkî wê bûn û bi wê hewldana kirina civakê bi pêşketina wê re di nava qalibekê de ew hertimî bi wê re bûya weke pirsgirêka nêzîkatîyê ya li civakê. Hebûna civakê, ne li gorî pêşdîtinên mirov ên bi aqilane bi mejûya wê re di dîrokê de bi rê ve diçê. Wê li gorî ahenge xwe ya pêşketinî a jîyanî wê pêş de herê. Dema ku mirov, bi aqilê xwe re weke ku mirov di sedale me de dike ku ew xwe bi dîzaynkarê civakê bi erk bike, weke ku dibê ya wê jenosîdên civatan derxe li holê û yan jî wê civakan ji dîrokê bibê. Di her aliyan de jî wê civakên dîrokî werina ji dîrokê birin. Yan jî, wê bi rewşek bi vî rengî re wê rû bi rû bê mayîn. Em li vir di dewama wê de wê jî werênina ser ziman ku civak, desthilatdarî û ankû rêveberî, wê hertimî di vê xalê de werina berhevdû. Mejiyê desthilatdar, ku ew çendî dike ku bi aqilane bihizirê jî, wê hertimî li gorî hebûna civake dîrokî wê weke kiresekî tang bimênê. Bi vê rewşê re mirov dema ku wan mudahaleyên desthilatdarîy ku ew li jîyane civakê dike, mirov wê sedema hatina wê ya berhevdû a bi civakê re jî fahm dike. Pirsgirêka hebûna têgîna ´welat´ê jî wê di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Di dîrokê de welat, wê weke sazîyekê wê piştre di pêvajoyek piştre a pêşketî a serdema şariştaniyê de wê derkeve li pêş. Bo civatê, pirsgirêka rêvebirina welêt, şêwayê sazûmana wê, zagon û destûrên wê û hwd, w bi hemû aliyên xwe yên din re jî wê welat, piştî ku ew weke têgînekê derkeve li holê û serdest bû û pê de wê, wê bê navenda pirsgirê û ´îhtlafên´ bi dîrokê re jî. Hewldana "meşrû" dîtina têgîna welêt li ser hebûna civatan re û bi wê re hewldana bi destûr û zagonên wê û hwd re dîzaynkirina civakê û ankû civakan di nava sînorekê de ´weke hevdû´, wê temenê pirsgirêka giştî a hebûnî ya civak û têgîna welêt a bi hevdû re bê.

Civak, hertimî dixwezê ku ew li ser koka xwe pêşbikeve. Ew bi pêşketina xwe re dikarê têgîna xwe ya dadî, ahengî û felsefîkî jî biafirênê. Ji dervî wê ve bi nêzîkatîyên adilandinê nêzîkatî li navaroka civatê û hebûna wê kirin, tenê û tenê ji civakê re pirsgirêkên hebûnî diafirênê. Î ro, gelek pirsgirêkên civatî ên civate kurd, hem di roja me de û hem jî di demên berê de, mirov kifş dike ku ew ji vê rewşê derdikevin li holê.

**27.08.2018.Kurdistan, Cizira bota, Abdusamet yigit**